

KT

**Zanîngeha Mardîn Artkluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

Teza Lîsansa Bilind

**ŞÎROVEKIRINEKE DENGSAZÎ Û FONOLOJÎ
DI KURDIYA KURMANCÎ DE**

**BARZO OMAR MAHMOUD
14711010**

**Şêwirmendê Tezê
Associate Prof. Dr. Rafik Sulaiman**

Mêrdîn 2016

**TC
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili Ve Kültürü Anabilim Dalı**

Yüksek Lisans Tezi

**Kurmanci Kürtçesinin Fonetik ve Fonolojik
Analizi**

**BARZO OMAR MAHMOUD
14711010**

Danışman

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mardin 2016

Republic of Turkey
Mardin Artuklu University
Institute of Living Languages
Dept. of Kurdish Language and Culture

A Phonetic and Phonological Description of The Kurmanji Kurdish Language

**M A THESIS By
BARZO OMAR MAHMOUD**

Supervised by:
Associate Prof. Dr. Rafik Sulaiman

Mardin 2016

KABUL VE ONAY

BARZO OMAR MAHMOUD tarafından hazırlanan Kurmanci Krtesinde Fonoloji ve Fonetik Analiz (irovekirineke Dengsaz û Fonoloj Di Kurdiya Kurmanc De) adındaki alıma, 27.05.2016 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jrimiz tarafından Krt Dili ve Kltr Anabilim Bilim Dalında Yksek Lisans Tezi olarak oybirlięi ile kabul edilmitir.

Danıman : Do. Dr. Rafik SULAIMAN

ye : Yard. Do. Dr. Hayreddin KIZIL

ye : ęrt. Gr. Mikail BLBL

Yard. Do. Dr. Mustafa ztrk
Mardin Artuklu niversitesi
Trkiye'de Yaayan Diller Enstits Mdr

JI BO RÊVEBERIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊYÊ

Ev xebat bi navûnîşana (Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî De) ya xwendekar Barzo Omar Mahmoud di tarîxa 27.05.2016 de ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

Şewîrmend : Associate Prof. Dr. Rafik SULAIMAN

Endam : Yard. Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

Endam : Öğrt. Gör. Mikail BÜLBÜL

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên wan hîndekaran in ku navê wan li jor hatine nivîsîn.

Yard. Doç. Dr. Mustafa Öztürk
Rêveberê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Diyarî:

Ez gelek keyfxweş im vê tezê diyarî bikim bo xanima xwe, Firyal Hesên, û herdû zarokên xwe, Kardo û Nermîn, yê ku gelek êş û zehmetî bi min re dîtî, ji ber dîrketina min du salan ji welat berdewam kir, her ev bû sedema peydabûna astengiyên jiyana wan.

Spasname

Di amadekirina babeta vê tezê de ez dixwazim spasiyên germ bidim wan kesên ku alîkarî bi min re kirin û xwe bi min re mandû kirin û gelek guhdarî dane pirsên min, weha daxwaziyên min bi singeke fere pêk tanîn:

1. Gelek spasî bo birêz Prof. Dr. Rafîk Sulaiman, şêwermendê min di vê tezê de, yê ku ne tenê bi nerînên xwe yê zanistiyane û rêbazkarane, wek pîsporê filolojiya ziman, ev tez zengîn kir, lê belê wek hevalemî dilêş û dilsoz jî alîkariya min ji her alî ve dikir. Ez dikarim wê yekê bêjim: Eger ne ji wî bûya, ev tez weha dernediket.
2. Gelek spasî bo birêz Dr. Safia Zevengî, pîspora zimanvaniyê, ya ku li Hewlêrê xwe baş mandû kir di xwendina teza min de, û têbîniyên xwe yê zanistiyane û rêbazane bo min dişandin.

Naverok

- Diyarî.....	i
- Spasname	iii
- Naverok.....	v
- Kurtebêje	vii
- Kurte	ix
- Abstract	xi

0. Despêk 1

1. Beşê Yekem: Dengên Kurmancî di Şîrovekirina Dengsaziyê de	10
1.1. BIRR I: Şîrovekirina Dengsazî û Ziman	11
1.2. BIRR II: Taybetmendiyên giştî yên Dengên Ziman	15
1.3. BIRR III: Dengdêr û Taybetiyên wan	21
1.4. BIRR IV: Dengdar û Taybetiyên Organîkî.....	30
1.5. BIRR V: Dengdar û Taybetiyên Fîzîkî.....	35
1.6. BIRR VI: Dengdarên Kurdî û Taybetiyên Awarte.....	40
1.7. BIRR VII: Encamên Beşê yekem	47
2. Beşê Duyem: Fonêm di Zimanê Kurdiya Kurmancî de	50
2.1. BIRR I: Pêşkiyeke Giştî di Fonolojî de	51
2.2. BIRR II: Deng û Fonêm û Alofon di Kurmancî de	55
2.3. BIRR III: Fonêm û Alîfba	63
2.4. BIRR IV: Fonêmên Kurmancî di Şîrovekirina Fonolojî de.....	70
2.5. BIRR V: Alîfbaya Îro û Dengên [u], [ɨ], [ə]	78
2.6. BIRR VI: Dengdarên Stûr di Kurmancî de	83
2.7. BIRR VII: Zirrdeng di Kurmacî de [q, h, g, ɣ] / [ق - ح - غ - ع].....	100
2.8. BIRR VIII: Encamên Beşê Duyem	112
3. Beşê Sêyem: Dengrêşî di Kurmanciya Kurdî de	119
3.1. BIRR I: Sîmayên Cudaker di Kurmancî de	120
3.2. BIRR II: Dengrêşî di Kurmancî de	132
3.3. BIRR III: Birrge di Kurmancî de	155
3.4. BIRR IV: Tekez di Kurmancî de	178
3.5. BIRR V: Awaz û Ton (Intonation) di Kurmancî de	191
Encam	199
Çavkanî	207

Kurtebêje

Hêma û Nîşan û Têbînî

Di nivîsîna lêkolînê de hin hêma û nîşan bikar tên ku her yek watayeke taybet bi xwe ve digirê, ku ew jî ev in:

	dengên nerim	dengên stûr, şêweya (A)	dengên stûr, şêweya (B)
1	r r	Ṛ ṛ	rr
2	k k	Ḳ ḳ	kk
3	l l	Ḷ ḷ	ll
4	p p	Ṕ ṑ	pp
5	ç ç	Ḷ ḷ	çç
6	t t	Ṫ ṭ	tt
7	s s	Ṣ ṣ	ss
8	z z	Ṥ ṥ	zz
9	d d	Ḍ ḏ	dd
10	hemze	əə	
11	dengê alofon e	ɛ ɛ	
	dengên arebî	tîpên latînî	
12	ع	ġ ġ	
13	ح	h h	
14	خ	ç ç	

Di nivîsîna lêkolînê de hin îşaret û hêma têde bikar tên ku her watayekî taybet bi xwe ve digire, ku ew jî ev in:

/ / çêl fonêman dike wek fonêma /s/

[] çêl dengên û alofonan dike wek em bêjin dengê [s]

' ' wê peyvê bisînor dike wek zarave yan wek tişteki mirov li ser biaxive

" " çêl wê yekê dike ku ev peyv hatiye wergirtin

V vowel (dengdêr)

C consonant (dengdar)

Têbînî: Ji bilî wan hêmayên ku me li jor dane xuyakirin çî cara di vê tezê de hate dîtin ku tîpek du caran bi dû hev de hatiye nivîsîn, wê watayê dide ku mebest jê dengê stûr e, wek tîpa (rr) di peyva (birr) de, yan (s) di peyva (ssed) de.

Kurte: Ev tez hewldanek e bo şîrovekirin û destnîşankirin û dabeşkirina dengên zimanê Kurdiya Kurmancî di kategoriyên deng û fonêm û alofon û girafîman de, nemaze, diyardeya dengên awarte wek armançeke sereke di beşê yekem û duyemê vê lêkolînê de di çarçova yasayên dengsazî û fonolojî de hate analîzkirin, ku li encamê du fonêmên nû di Kurdiya Kurmancî de destnîşan dike, ew jî /r/eya hejok û /k/eya babirr. Lêkolîn herçende mêtoda wesfdarî û sînkronî gelek rûber girtiye lê dest tavêje riya analîza paradigmatîkî û sîntagmatîkî di çarçova mêtodên zimanvanî, wek: binyatgerî û dabeşkerî û erkpêderî (wezîfî) û berwurdkarî û beramberkirin û têvajoyî.. htd.

Ev tez ji despêkekê û sê beşan pêkhatiye, ku di **despêkê** de giringî û zehmetî û armanc û mêtod û pilana lêkolînê dide xuyakirin, herweha amaje bi wan lêkolînên Kurdî di dengsaziyê de kiriye, yên ku berî vê tezê hatine nivîsîn, û raya xwe di wan de daye. Di **beşê yekem** de taybetiyên organîkî û fîzîkiya dengdar û d dengdêran daye ronîkirin, herweha tête ser wan diyardeyên awarte ku di dengên zimanê Kurmancî de hene, diyar dike, ku ev bi xwe dikeve ber yasayên çarçova fonetîkî de. Weha li dawîya beşê yekem nivîser 46 dengên xwerû di Kurmancî de destnîşan dike.

Di **beşê duyem** de ew çil û şeş deng dikevin bin şîkirina fonolojî de ji bo ku deng û alofon û fonêm ji hev bêne cudakirin û dabeşkirin ku du fonêmên nû têde diyar dibin.

Di **beşê sêyemê** dawî de piroseya ristina van deng û fonêman di kategoriya birrge û peyvê de şîrove dike, ku bi dû de tê ser şîrovekirin û analîzekirina diyardeyên astê kertkirina fonolojî (suprasegmental level) yên ku di şeweya nivîsînê de diyar nabin, wek: sîmayên cudaker, tekez (stress), ton û awaz (intonation), ku di astê axaftina ziman de derdikevin.

Bi vî awayî lêkolîn dibe hewldanek bo ronîkirina diyardeyên dengsazî û fonolojî di zimanê Kurdiya Kurmancî de bi awakî weha wek çawa em ji hiriyê ta çê dikin, paşê em wî tayî dirêsin û bi riya tevnê qumaş jê durist dikin, bi dû de em wî qumaşî dikin cilûberg li xwe dikin; wilo jî tez di riya sê beşan de wek sê xelean lêkolîn pê ava dibe: ji destnîşankirina dengên zimanê Kurmancî, û hîlbijartina fonêman û sîmayên wan di bêjînga fonolojî de. Paşê, çilo ew deng û fonêm birrge û peyvvan drust dikin, herweha çilo tekez û awaz di peyv û risteyên zimanê Kurdiya Kurmancî de diyar dibin. Li dawî em digihin wesfekî dengsazî û fonolojî ji zimanê Kurdî re, ku lêkolîn di vê tezê de dibe hokarê bidestxistina encamine nû di Kurmancî de.

ÖZET

Bu tezde betimleyici, yapısal, işlevsel, metinsel, karşıtsal, dağıtımsal ve karşılaştırmalı dahil pek çok dilsel yöntemlerin kullanıldığı pragmatik ve sentagmatik bir anlayışa bağlı olarak fonetik ve fonolojik analizler çerçevesinde Kürtçenin en yaygın konuşulan lehçelerden biri olan Kuzey Kurmanci lehçesinin ses ve fonemlerinin kapsamlı bir betimlemesi ele alınmaktadır. Kurmanci lehçesinde yazılan bu tez sunuş ve üç bölümden oluşmaktadır. Sunuşta tezi kalem alan yazarın bir yandan referansların yokluğu diğer yandan Kürtçe dil bilimsel alanındaki teknik terimlerin yetersizliği yüzünden karşılaştığı güçlükler anlatılmaktadır. Dolayısıyla yazar bu açığı kapatmaya yönelik Kürtçe dilsel terminolojisini zenginleştirmeyi hedefleyerek bu teknik terimlerin İngilizceleri temelinde yeni Kürtçe terimleri üretmek zorunda kalmıştır.

Birinci bölümde Kürtçenin bazı ünsüz seslerinin söyleyiş ve fiziksel özellikleri ele alınmaktadır. Bu ünsüz harflerin bazıları nefesli, nefessiz (k), çarpmalı (r) ve titrek (r) gibi üçüncü bir boyutu vardır. Bu bölümün sonunda Kürtçenin Kurmanci lehçesinin bütün alt lehçeleriyle birlikte 46 altı sese sahip olduğu belirtiliyor.

Ünlü ve ünsüz seslerin Kürtçe sisteminin fonolojik özelliklerini belirten ikin bölüm ise bu 46 sesi ele alıyor. Yazar bu seslerden 34 sesi Kurmancinin fonem sistemine dahil olduğunu düşünüyor ve bunları iki yeni fonem daha ekliyor: ötümsüz nefessiz /k/ ve yine ötümsüz ama nefesli /k/. Yazar Kurmancinin ses kapanmaları arasında üç yönlü bir ayırım – ötümlü, ötümsüz nefesli ile ötümsüz nefessiz arasında – sergilediğini belirtiyor. İkinci fonem ise çarpmalı /r/’ye karşı titrek /r/. Yazar ayrıca Farsçadan alınmış olan mesela 7 /haft/ sayısındaki gırtlaktan gelen /h/ fonemi gibi üç ünsüz fonemi de inceledikten sonra bu fonemlerin Kürtçede kullanılmasının gerek olmadığını öneriyor.

Son bölümde ise Kürtçenin kurmanci lehçesinin fonem ve alofonlarının ayırt edici özellikleri ele alındıktan sonra yazar fonetik bağlamında Kürtçe hece yapısını tarif ederek, Kurmancinin vurgu ve tonlama kalıplarına yönelik ölçü teknikleri ile parçalı materyalin bu birliğini ve uyumunu saptamak suretiyle anlam varyasyonunda bazı fonetik parametrelerinin etkilerini incelemeyi hedefliyor.

Abstract

This thesis is an attempt to provide a comprehensive description of the sounds and phonemes of one of the most widely spoken dialect of Kurdish, namely, Northern Kurmanji within the framework of phonetic and phonological analysis, depending on the paradigmatic and syntagmatic way of analysis within several linguistic methods: descriptive, structural, functional, textual, contrastive, distributionary, and comparative.

This thesis, written in Kurmanji Kurdish, consists of an introduction and three chapters. The introduction shows the difficulties which the author faces in studying the Kurdish language issues because of the lack of references on one hand, and the poverty of technical terms in fields of Kurdish linguistics, on the other hand. So he was obliged to derive and design new Kurdish terms in contrast with the English ones aiming at enriching the Kurdish linguistic terminology.

Chapter one deals with the articulatory and physical characteristics of the Kurdish sounds which are manipulated by several so-called articulators, especially in consonants, some of which have a third dimension voice of aspirated and non-aspirated of the sound [k], flap [r] and trill [r]. This chapter concludes to a fact that Kurdish Kurmanji, with all its subdialects, has 46 sounds .

Chapter two, describing the phonological characteristics of the Kurdish system of consonants and vowels, deals with 46 Kurdish Kurmanji sounds of which he chooses 34 sounds to be the Kurmanji phoneme system, suggesting two new phonemes, the voiceless non-aspirated /k/ in contrast with the same voiceless sound /k/ which is aspirated, emphasizing the fact that Kurmanji exhibits a three-way distinction among the stops – between voiced, voiceless aspirated, and voiceless non-aspirated – giving rise to a style three-way stop distinction. The second phoneme is the trill /r/ in contrast with the flap /r/. Besides, the author studies the three borrowed consonant phonemes which have diffused into the inherited (Iranian) component of the lexicon, e.g. the numeral 7 /haft/ with pharyngeal /h/, suggesting that there is no need to use these borrowed consonant sounds in the Kurdish phoneme system.

The last chapter studies the distinctive features of the Kurdish Kurmanji phonemes and allophones, then he describes the structure of the Kurdish syllable within the framework of combinatory phonetics, identifying the prosodic structure of stress and intonational patterns of Kurmanji, and the association and alignment of these patterns with the segmental material, aiming at examining the effects of some phonetic parameters on the variation of meaning.

Destpêk

Lêkolînên zimanvanî û akadîmî di warê zimanê Kurdî de van çend salên dawî dest pê kiriye piştî ku hikumeta Turkiya ev delîve bo Kurdan vekir ku çend zanîngeh li Turkiya rê ji xwendkaran re vekir ku zimanê Kurdî bixwênin û lêkolînan tê de amade bikin. Nemaze, zaravê Kurmancî û Zazakî ku pêwîstî bi gelek hewldan û xebatên giring heye ta ku bikarê rê li pêşiya xwe veke û bikare riya lêkolînên zanistî xweş bike.

Astengiyên Tezê

Di nivîsîna vê tezê de ez pêrgî hin **zehmetî** bûm ku babeta dengsaziyê bi vê tevahiya bebet, ku gelek beş û çiqil û şaxmijarên hemereng tê de hene, kêşeya termînolojiya dengsaziyê yek ji zehmetiyên herî sext bû ji ber ku karekî weha gelek lêgeran jê re divê. Ne tenê wilo jî, lêkolîn di vî babetî de bi zaravê Kurmancî bi dest min neketin, jibîlî ew beşê «fonolojî» ku di pertûkên rêzimana Kurdî de hatine, wek ya Celadet Bedirxan û ya Reşîdê Kurd, Qenatê Kurdo, û ya Sadiq Beha-edînê Amêdî û hinên dîtir. Piraniya van pirtûkan basa dengên ziman kirine lê pirtir di têgeha tîpê de dihat, wek em bêjin "tîpên bêdeng" yan "tîpên bideng" ku ev têrmên gelemperî di zimanên dîtir de jî weha bê hûrbînî dihatin, ji bilî ku meydana van pertûkan di meydanake teng de ku hin durvên deng didan xuyakirin, belê derbas nedibûn nav lêkolîna dengsaziyê bi termînolojiya xwe ya zanistiyane ve ku her têrmek pênaseyêke xwe ya taybet heye, hem jî navlêkiririneke watadar û terxanbar heye. Ez vê yekê dibêjim ne ku tenê lêkolîn di vî babetî de ji aliyê zanistî ve zehmet e, lê ya herî giran ew bû ku ez pêrgî gelek têrm û zaraveyên deqsaziyê dibûm bê ku hember wan bi Kurdî hebe. Vê yekê hin dijwarî ji min re tanî, nemaze di lêgerana pey peyvên Kurdî de di ferhengan de wek Hembane Borîne ya Hejar, Ferhenga Mihabad ya Giyo Mukiryani, û gelekên dîtir ku min navê wan ferhenga li dawiya lêkolînê di nav serekaniyan de anîne¹; herweha lêgeran di nav nivîsarên zaravên Kurmancî û

¹ 1- Tereq Waisi (2008) : Ferhengî Zanistî Ingîlîzî – Kurdî ,belawkirdinewey Pertûk, Kitêbxaney Kurdî (li ser Web)

2- Marûf Qeredaxî Mardoxî (1972) Ferhengî Kiştûkal , dû berg, Çapxaney Dar Al Selam, Bexda

4- Q. Kurdo, Z. Yûsif (1983) Ferhengî Kurdî –Rûsî (Sorani), Dezgay Çapemenî y Zimanî Rûsî, Mosko

5- Alî Nanewazade (2005): Ferhengî Kurdî Herman, Çapxaney Wizaretî Perwerde, Kurdistan, Hewlêr

6- Heme Kerîm Arif (2006): Ferhenga Govend û Zinar, Çapxaney Wizaretî Perwerde, Kurdistan, Hewlêr

7- M. Amîn Doskî (2009): Ferhenga Spîrêz Kurdî-Arebî, Çapxaney Hecî Haşim, Hewlêr

8. Gharib, Kamal Jalal ferhengi zaniyari (Scientific Dictionary) Vol I Kamaran Press, Sulaymaniya, 1974,438 p.

Soranî de yên pêwendîdar bi babetê fonetîkê ve, bi ser ku gelek kêmbûn ta radeyekê ku hin car milê min bi nivîsîna babet giran dibû, lê her ez di nivîsîna vî babetî de geşbîn bûm, ku karê xwe bibim serî, û berhem bidawî bikim.

Inca, ji bo ku lêkolîn di astekî têrûtesel de were, ez li nav gelek zaravên Kurdî de geriyam bo ku ez li hemî navan agadar bim û dû re ez ya li gor baweriya xwe hilibijêrim. Min pêşî berê xwe da herdû şêwezarên serekî di zimanê Kurdî de: Kurmancî û Soranî, ji nav wan serçaweyan: Bi riya lêpirsiyanê li nav xelkê. Paşê min berê xwe da nivîsarên çapkirî, lê ti serekanî dewlemend yên zaravê Kurmancî dest min neketin. Vê dawiyê ez pêrgî belavoka Kurmancî² bûm, di jimareyên wê yên pêşî de navên endamên dengkirinê tê de hatibûn, bi ser ku gelek ji wan li nik min diyar bûn, lê dîtina wan têrûteselî û dupatkirinê li ba nivîser çêdike. Lê di zaravê Soranî de ez pêrgî du pertûkên pisporane hatim, ji bilî çend gotaran di hin govar de. Bi rastî, ev lêkolîn karekî baş bûn di warê beşek ji têrmên dengsazî de, herçende ji aliyê gelek çiqil û şaxên babet ve tê de kûr nediçûn. Lewre min nexwest ez ciyawaziyê di hin têrm (zarave) de kûr û fere bikim, tenê aliyê kêmbûn dagirim eger bikarim.

Inca, zimanê Kurdî ta niha gavên nû dide ku hêştî di despêkê de ye, ji ber wilo astengiyên lêkolînê li pêşîya xwendekar hene ku yek ji wan nebûn û kêmbûna lêkolînan bi zimanê Kurmancî, her ev jî kêşeya termînolojî bi xwe re têne meydanê, ku di dema nivîsîna vê lêkolînê de min gelek azarî û zehmetî kişand ji ber nebûna têrmên dengsaziyê di kurmancî de. Min çiqas pirsî ez pêrgî lêkolînên Kurmancî nehatim ji bilî hin pertûkên

9. Gharib, Kamal Jalal (1979): ferhengi zaniyari (Scientific Dictionary) Vol II (through letter d) KZK Press, Baghdad, 403 p.

10. Gharib, Kamal Jalal (1975): ferhengi zaniyari wenedar (Illustrated Scientific Dictionary). al-Ajyal Press, Baghdad, 102 pp.

11. Gorani, Ali Seydo (1990): Ferhanga Kurdi Nûjen (kurdi- Arabi), Omman, Jordan

12. Hazhar Mukiyani (1991): Farhang-e Kordi Farsi (Kurdish Persia Dictionary) Hambana Borîne, Tehran : Suresh Press, 1991 1032 p. (A4 Size) (Also available in 2small volumes)x-19-429510-8

13. Kori Zaniyari Kurd (Kurdish Scientific Academy), Zarawey kargêrî (Aministrative terms.KZK Press, Baghdad, 1973-74 169 p.

14. Mukriyani, Giw (1961): ferhengi mehabad (Mahabad Dictionary), Kurdistan Press, Hawlir (Arbil), 1961,795 p.

15. Nizamoddin, Fazel(1977)estere geshe (The bright Star) [farhang-i kurdi- arabi] al-Ajyal Press, Bagdad,771 p.

16. Qaradaghi Mardukhi, Ma'ruf (1972): ferengi Kishtukal (Dictionary of Agriculture), Dar al-Salam Press, Baghdad,Vol. I 1972, 198 p. Vol. II 1973, 157 p.

17. Wahby, Taufiq and Cecil John Edmonds (1966): A Kurdish-English Dictionary Oxford University Press, London,179p. - x-18-039873-2

18. M. Amîn Doskî (2009): Ferhenga Spîrêz Kurdî-Arebî, Çapxaney Hecî Haşim, Hewlêr

²- *Belavoka Kurmancî li Ewropa derdiçê, û ji sala 1991 ne des pêkiriye, em bi hêvîne ku karê xwe berdewam bikê, ji ber ku ez wa dibînim ku en rojname yek ji nivîsarên herî girînge di warê leksolojiya zimanê Kurdî (peynasî) de.*

rêziman wek ya Sadiq Beha-edîn Amêdî pêve û gotara Dr. Fadil Umer. Ez naçar bûm ku çend lêkolînên zarê Soranî bixwînim ku bo min bû alîkariyek hem jî li gelek ferhengan vegeyriyam ta bikarim ew zarave û têrma sivik û tekûz hilbijêrim. Ji bilî vê yekê jî hin car min têrmên nû beramberî hin têgehên dengsazî vejandin û jinû dariştin ku ev bi xwe di baweriyaya min de serbarekî nû ye di lêkolîna dengsazî de ku dibe bingehek bo xebatên paşerojê.

Giringiya Tezê

Lêkolîn bi zimanê Kurdiya Kurmancî wek ez dibînim gelek kêr in. Vê valebûnê ez tehdam ku lêkolînekê akadîmî amade bikim di buwara dengên zarê Kurmancî yê ku ez bi xwe bi şîrê wî mezin bûme. Dengsazî şaxek e ji şaxên zimanvaniyê, di warê sazîkirin û duristkirina dengên zimanên mirovan de dixebitê, çî di aliyê kar û erkê wan de, yan jî di warê dengkirin û fîzîkiya wan de. Ev lêkolîn herçende li ser mêtoda şîrovekirin û şîkirina tîyoriya dengsazî û fonolojî ya lêkolînên kilasîkî û nûjen hatiye duristkirin, lê dîsa çend kuncên tarî di şîrovekirina dengsaziya Kurdî de hene ku pêwîstî bi lêkolînê heye ku encamine nû bide wekçawa zimannasên Kurdê Sovyêta berê, wek Qenatê Kurdo û Bakayêv bi ser ku zimanzanîne payebilind in, belê hin cudahî navbera baweriyên wan yên zimanî û baweriyên alîfbaya Celadet Bedirxan de heye, nemaze di dengên Kurmancî yên stûr de wek [p] [k] [t] [ç] [z] [r] [l] [s] [d] bi şeweya fonêm dane nasîn ku ta niha gelek rewşenbîrên Kurd vê kêşeyê didin pêş, bi awakî ku cudakirina van dengên bikeve şeweya grafîman de, ango tîpeke ciyawaz bo her dengê ji van dengên terxan bibe, da ku xwendina nivîsîna wan rast bête naskirin. Ev kêşe yek ji sedeman bû, ku ez tehdam berew nivîsîna vê lêkolînê, nemaze ji aliyê fonolojî ve hate lêkolînkirin. Di baweriyaya min de wa ye: nabe her yek çilo dipeyive, wilo binivîse; herçende nêzikayî navbera rênivîsê û axaftinê tiştekî baş e, belê kêşeyên ziman wek Ferdinand de Saussure da xuyakirin di danîna çend têgehên wek axaftin û zarav û ziman ku ziman dibe ew dezgehê hawbeş navbera endamên netewe de lê axaftin karekî takekesane ye û zarav jî guhartineke cografî bi xwe re têne û nabe bibe pîver bo danîna rênivîsê bo nimûne Omerî ji (Diyarbakir)re dibêjin: (Ciyarbakir). Milan li Derbêsiyê dibêjin (werrê)ye ango (wilo) ye. Koçer di hin peyv de dengê [k] dikin [g], wek: ji (lorik)ê re dibêjin (lorig). Lewre ya baş ew e ku em pîverên ziman wek şeweyekî standard bigirin. Ji ber ku ziman dibe dezgehê ku xebat û hewldanên gel û netewe tê de diyar dibin, lewra pîverên ziman wek pîverên standard têne jimartin, inca ne her dengê hate ser ziman bibe tîp bikev ser kaxezê de. Belê ev kêşe sê kategoriyên

fonolojî dide pêş: fonêm û alofon û fon. Dabeşkirina dengên Kurmancî bi şîrovekirina tiyoriya dengsazî dariştineke nû girtiye û armançeke pîdagogî pêre têne, nemaze di riya nexşe û wêne û cedwelan de, wek wênenexşa endamên dengkirinê ku hem sazgeha deng bête naskirin, hem jî awayê derbirrîna wan dengan bi zimanê Kurmancî tete wesfikirin, ku termînolojiya zimanvaniyê pê dewlemend dibe. Ya duyem jî min du fonêmên nû li ser bingeha tiyoriya fonêm di zimanê Kurmancî de destnîşan kiriye, her ev jî encama lêkolîneke fonolojî ye di beşê duyem de diyar dibe. Mijara sêyem lêkolîn di zirrdengên Kurmancî de herçende ji alî zimanzanan ve amaje lê hatiye kirin, belê şîrove lê nebûye wek ku di vê lêkolînê de hatiye. Ji bilî van tewerên ku min behs kirin ku di beşê yekem û duyem de hatine, çar mijarên giring di têgehên fonolojî de tîn, ku ev jî babetên beşê sêyem bûn: sîmayên cudaker û birrge û tekez û awaza peyvê û ristê bi hin agahiyên nûjen tete şîrovekirin.

Mijara Tezê

Bi kurtî em bêjin, ev tez şîrovekirina dengên zimanê Kurdî (zarê Kurmancî) ye, ku herdû astan, yekem û duyem, dide ber xwe, û di çarçova sê beşan de pêk tê:

Beşê Yekem: Dengên zimanê Kurmancî.

Beşê Duyem: Fonêm di Kurmancî de.

Beşê Sêyem: Dengrêş: sîmayên cudaker, birrge, tekez, awaz.

Babetê vê lêkolînê di rêbazeke wesfî û sînkronî de hatiye sazkirin, ku bi riya serincgirtin û têbînîkirin û şopandin û xwendina pertûk û lêkolînên têtildar amade bûye. Ev tez di çarçova despêk û sê beş û encam û çavkaniyan de hatiye avakirin:

Lêkolîn di beşê yekem de despê dike ku taybetmendiyan organîkî û fîzîkî yên dengên zimanê Kurdiya Kurmancî ji aliyê dengsazî ve, wek sazgeha dengan, û awayê derbirrîna wan, şîrove û jimara dengên zimanê Kurmancî destnîşan dike ku digihe 46 dengan, herweha kategoriyên dengan wek: dengdêr û dengdar, dengên girr û kip, dabeşkirina dengan li gor sazgeha deng, yan li gor awayê dengkirinê, yan li gor lerînsazî (vibration of vocal chords) şîrove dike.

Di beşê duyem de dengên zimanê Kurmancî dikevin ber lêkolîna fonolojî de ta ku fonêm û alofon û dengên awarte ji hev cuda bibin, û kîjan deng yan fonêm pêwîst e wêneya xwe di şeweya grafîman de diyar bike ji bo ku di piroseya nivîsînê û şeweya standard ya zimanê Kurmancî de wek alîfba bikar werin. Di vî beşê de dengên zimanê Kurmancî li ber roniya şîrovekirina fonolojî dabeş dibin. Xala herî giring di vî beşê de

lêkolîna diyardeya dengên stûr e, wek armenceke sereke di tezê de diyar dibe ku nivîser du fonêmên nû, yên ku lêkolînên berî niha de nehatibû xuyakirin, tê de destnîşan dike, wek pêşniyar jî pêşkêşî zimanvanan dike. Herweha diyardeya zirrdengan (dengên ku ji zimanê Arebî ketine nav Kurdî de), yên ku bûne zirrfonêm di zaravê Soranî de, hate şîrovekirin, ka ev deng dikevin ber fonêmên zimanê Kurdî de? Yan ne? Eger em wan wek zirrfonêm bipejirênin, ji xwe tîp bo wan pêwîst dibin. Wek diyar e cihê van zirrdengan di sîstima alîfbaya Kurmancî de ya ku îro em pê dinivîsin nîne. Di dawî de em digihin hin encaman sebarek dengên Kurmancî û jimara fonêman tê de diyar dikin.

Di beşê sêyem de, em dengên zimanê Kurdî li gor sîmayên cudaker (distinctive features) şîrove û dabeş dikin, ku ev sîma têgehekî dengsazî û fonnolojî ye ku gelek dem dixwe ta mirov bikare van sîmayan beramber her dengêkî biçespêne. Bi dû de em tene ser şîrovekirina awayê ristina van deng û fonêman di çarçova birrge û peyvên de, wek yekîneyên watar û bingehîn di avakirina ziman de; wilo, em dikevin qonaxa piroseya dengrêşî de, ku çend diyardeyên suprasegmental tê de derdikevin wek: tekez (stress)³ û ton û awaza di peyv û firaz û risteyên ziman de.

Mêtodên Lêkolînê

Di Lêkolîna dengsaziyê de min pişt bi gelek rêbaz û metodên şîrovekirinê girê da, ku wesfdarî devereke berfere girt lê yên dî jî wek binyatgerî û berawurd û beramberî û têvajoyî û diyakronî û hinên dîtir bi awakî ku ez bikarim analîza ziman bi şeweyeke zanistiyane ji hev vekim û bigihim encamine rast û durist. Bi mîtodeke wesfdarî û beramberî (contrastîve) di pêkhatyên ziman de ku ji tavil(sîgment)ên bêwata wek dengên rûten(abstract) despê dike, ta ku ew deng dikevin qûnaxa vewejartinê de, ango dengên bingehîn û dengên awarte û dengên standard û yên nestandard ji hev bêne cudakirin, ku di bêjînga fonolojî de pirose xwe digihêne dawî ku jimara dangan ji 46-an di warê sîstima fonêmsazî de kêmîr dibin, wilo jî dikevin ber warê girafimên nivîsînê de. Di beşê sêyem de avakirina wan deng û fonêman tê, ku pêkhatyên ziman di çarçova birrge û peyvê de tê, wek yekîneyên seretayî di ruwê watasaziya ziman de durist dibin, wekçawa em ta ji hiriyê çêdikin, û wan tayan di riya tevne de dirêsin û dikin qumaş, paşê em wî qumaşî dikin cilûberg li xwe dikin. Wilo jî ziman di riya tevinsazkirin û hûnandina wan fonêman de birrge û peyv û riste xwe ava dikin, ku pevre di sîstîmeke taybet de devok û zarav û ziman

³ Hin nivîser peyva (guvaş) beramberî (stress)ê bikar tînin. Lê ez peyva tekez xweşîktir û watar dîtir dibînim ji ber ku piroseya stress ku dengêkî qurs û giran dixwe ser birrgeyê de, ne ku diguvêşe. Guvaştin û bilindkirina dengêkî ji nav çend dangan di wata û pirose de ji hev dûr in. Belê peyva (tekez) ku giraniya xwe dide ser birrgeyê peyvê heman wata dide.

ava dibe. Mîtoda vê lêkolînê wek qonaxên duristkirina cilûbergan ku hirî dibe ta, ya ku dibe qumaş, yê ku dibe cilûberg, wilo jî deng dibe fonêm dibe birrge û peyv, yên ku dibin devok û zarav û ziman.

pêkhatayên beşên lêkolînê

- | | |
|--|-------|
| 1. Deng | hirî |
| 2. hilbijartina fonêmên standard | ta |
| 3. dengrêşî: birrge û tekez û awazê peyv û firaz û riste | qumaş |

Zimanvanî îro roj di cîhanê de roleke giran di nav zanyariyê de dibîne, ku dengsazî beşekî giring ji liqên wê ye. Di vê lêkolînê de emê dengên zarê Kurmancî li ber hin têgehên dengsazî û fonolojî şîrove bikin ku çend ketîgotiyên sereke tê de diyar dibin. Ya dîtir jî emê sîstima dengên Kurmancî li ber tîyoriya dengrêşî û sîmayên cudaker (distinctive features) û birrge û tekez û awaz destnîşan bikin ji ber ku hin zimanzan çend pîrsgirêk pêşniyar kirin ku tevliheviyek navbera têgehên fonolojî û fonetîkî de bi xwe re anî wek dengên (k, ç, p, t, s, ...) bi şêweyekî weha derdikevê ku li gor nerîna wan û ya gelek rewşênbîrên Kurd ev deng pêwîstî bi tîpine dîtir heye. Ev lêkolîn bersiva van pîrsgirêkan dide. Herçende Celadet Bedirxan ev buwar bi şêweyekî zanistî diyar nekiriye, lê wî bi hestê xwe zaniye ku ev deng pêwîstî bi tîpan nîne lewre jî ev deng bi şêweya tîpan di alîfbaya Bedirxan de diyar nebûne.

Di alîkî dîtir de şîrovekirina dengsazî û fonolojî termînolojîyeke zimanvanî bi xwe re anî ku dibe bingehek û amadekariyek bo xebatên zimanvaniyê yê paşerojê. Încê me dît pêwîstî bi pênasekirina hin tîrmên sereke heye herçende di beşê duyem de hatiye ku ew jî ev e:

1. **deng**, fon (phone - sound) çêl tevahiya dengên zimanekî dike, fonêm, alofon û zirrdeng, ewên ku di ziman û zarav û devokan de derdikevin. Mînak bo vê tîrmê:

Diyarbekir	[d] deng e
Ciyarbekir	[c] deng e
2. **alofon** - alophone - (şêwedeng hevaldeng) ew wêneyên dengên ku temsîla wan di alîfbaya ziman de cih nagire.

Diyarbekir	[d] deng e, /d/ fonêm e
Ciyarbekir	[c] deng e, [c] alofon e

3. **fonêm** (phoneme) ew dengê standard e ku temsîla şêwedengine dîtir jî dike, herweha fonêm dibe regezê herî giring di sîstima dengên ziman de ku jêr (sound patteren) dibêjin.

Diyarbekir [d] deng e, /d/ fonêm e

Ciyarbekir [c] deng e, [c] alofon e

4. **girafîm** (grapheme) ew nîşan e ku di nivîsînê de jêre tîp dibêjin û di sîstima alîfba de bikar tê.

Nivîsînên dengsaziyê berî vê tezê

Dengsazî di nav Kurdan de li despêkê di nav nivîsîna rêziman de bû, ku beşek ji pertûkê behs û axaftin li ser deng û tîpên Kurdî bû, wek em bêjin rêzimana Celadet Bedirxan⁴, gramêra Mekinzî⁵, Alîfbaya Tewfîq Wehbî, û rêzimana Qenatê Kurdo⁶ û gelekên dîtir. Belê di salên heftêyî de piştî damezrandina Korî Zanyarî Kurd li Kurdistana Başûr kar û xebateke zimanvanî lê geş bû, M. Emîn Hewremanî pertûkek bi navê (Fîlolojiya zimanê Kurdî) belav kir, babetekî dengsazî ji aliyê Mes'ûd Mihemed li kovarî Korî zanyarî Kurd belav bû, ku ew jî bi navê (Fonetîk Çîman Bo Bikat) ku bi rastî lêkolîneke têr û tesel e di hin têgehên dengsaziya zaravê Soranî de, nemaze di guncandina hevaltîya dangan de. Ji bilî vê, lêkolîna Dr. Pakîze Refîq Hilmî bi navê (Le Kuwêwe Dest bikeyn be Destûrsazî Rêzimanî Kurdî, Elfûbê û Deng le Zimanî Avista de) di Govarî Korî Zanyarî Kurd, bergî duyem de belav buye. Herweha Dr Wurya Umer Emîn lêkolînek di govarî Korî Zanyarî Kurd, bergî bîstem de bi navê (Fonetîk û Fonolojî) belav kiriye. Lê du berhemên zanyarî di mijara dengsaziyê de di zaravê Soranî de belav bûne ku ew jî yekem ya Dr. Ewrehmanî Hacî Marif (1976): Zimanê Kurdî li ber roşnayî fonetîk de, , Bexda. Berhemî duyem ya Xazî Fatihh Weys (Gazi Fatih Wais), Fonetîk, Bexdad, 1984, çapa yekê. Ev herdû pertûk û çend lêkolînên Dr Wurya Emîn roleke geş di lêkolîna dengsazî de durist kir ku bû dergehek bo vê lêkolînê. Belê şîrovekirina van lêkolînên Kurd pirtir di warê zaravê Soranî de digere, herçende amaje bi Kurmancî di hin xalan de dibû, lê bi şêweyekî têr li ser taybetiyên fonolojiya devokên Kurmancî ne-anîne ziman, herweha hin cudahî di wesfkirin û dabeşkirina hin deng de ne wek hev hatiye, herweha di buwara binyata birrêgê

⁴ - Mîr Hereqol Azîzan, Rêzana Elfabêya Qurdi, çapxana Terekî, Şam, 1932

⁵ - David Neil MacKenzie (1961), Kurdish dialect studies, London

⁶ - Qenatî Kurdo (Kordoyêv), rêzimanê zimanê Kurdî, Mosko, 1957

de, û buwara dengrêsiyê, û guhartina dengan, û hemerengiya dengsaziya Kurdî dîsa di baweriya min de hin kêmanî di lêkolînên wan de hene, wek em bêjin taybetiyên hin dengên Kurmancî û Soranî ku zimanê Kurdî ji yê Farisî cuda dike; ev taybetî bi xwe xaleke giring e, cara yekem e ku ez di vê lêkolînê amaje lê dikim. Ya dîtir di lêkolînên dengsazî de hûrbîniyeke zanistî jêre divê ku em nekevin nav mijûmorana termînolojiyeke giran û tarî de, wekçawa di lêkolînekê de weha hatiye: "Kurdish is a phonetic language i.e. it is written as it is pronounced".⁷ Ango (zimanê Kurdî zimanekî fonetîkî ye, çilo tê dengkirin, wilo tê nivîsîn), ev gote ne hewqas hûrbîn e jiber ku zimanê Kurdî yê standard ta niha nehatiye destnîşankirin, ev aliyek e. Ya dîtir têgeha fonetîk wa dide ku her yek çilo taxêve, ber e wilo binivîse, ev gelemşeyiyê têne meydanê, ji ber ku gelek şêweyên fonetîkî hene ku nabe di rênivîsê de diyar bibe yan jî dê gelek asteng li pêşiya zimanê standard derbikevin, wek hin dibêjin (diya min) û hin dibêjin (ciya min), (diyarbekir yan Ciyarbekir); hin devokên Badînan li şûna bêjin (dikim) dibêjin (tikim), inca eger weha be, dê xelkên Omerî li gor axaftina xwe bi dengê (ч) çeyna Arebî binivîsin. Ji ber vê yekê nabe em bêjin zimanê Kurdî fonetîkî ye, ya rast ew e em bêjin zimanê Kurdî fonemkî tê nivîsîn, piştî ku zimanzan li ser destnîşankirina jimara foneman bigihin yek bîrûrayê ji aliyekî ve, û danîna girafîman angoyê tîpan ku her fonemek tîpeke cuda werbigire û bikeve warê sîstima rênivîsê de. Lê dîsa hin fonem hene belkî riya danîna tîpekê jêre negerek e, wek fonema (hemza) ku dikeve seretaya dengê dengdêr de di despêka peyvê de wek peyvên (agir, arî, aza, ûr, ox, em, ev, in, êl, av, aw) bi rênivîsa tîpên Arebî heye, lê di rênivîsa tîpên Latînî de peyda nabe pêwîst e em têgehên fonolojî ji yê dengsaziyê cuda bikin. Helbet gelek xalên dîtir hene ku di nivîsînên rêzimanên Kurdî de hatine min amaje bi wan kiriye û xistine bin ronîya lêduwan û gengeşê de û min baweriya xwe di wan têgehan de daye xuyakirin.

Hêjayî gotinê ye ku vê dawiyê piştî ku tez kete ber nîqaşê de ez agadar bûm ku tezek li ser dengsaziyê di sala çûyî de hatiye amadekirin, min jî pêwendî bi nivîserê tezê kak Zafer re kir, yê ku nemerdî nekir, heme yekser tez bo min rêkir. Berî her tiştî ez destxweşiya nivîser dikim ku hewlek di hin aliyên dengsaziyê de li gor pêçêbûnên xwe daye, nemaze yê taybet bi devoka Serhedî ve pabend e. lê gelek alî û rûçikên dengsazî ku min di tezê xwe de dane xuyakirin di teza birêz Zafer de peyda nabe⁸. Ji xwe kar û xebat di tezan de weha ye ku her yek ji me ya pêwîst ew e wê valahiya ku heye dagire.

⁷ Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran, *Published by Canadian Center of Science and Education*, International Journal of English Linguistics Vol. 1, No. 2; September 2011, www.ccsenet.org/ijel (rûp 74)

⁸ Zafer Açar (2015), Devoka Devera Filistanê, Teza lîsansa Bilind 121302102, Zanîngeha Bingolê, Enstîtuya zimanên Jîndar, Beşa ziman û Edebyata Kurdî.

Armanc

Ev lêkolîn li dora çend armancan digere: Ya pêşî binyata dengên ziman çilo durist dibê, ya dudan em hewl didin wî têgehê bidin xwêner ka sîstima deng û fonêmên zimanê Kurdî, nemaze yên Kurmancî, ji aliyê sazgeha deng ve, herweha awayê dengkirinê ango ew cihê ku deng jê derdikeve û awayê derbirrîna deng, û çilo ji hev têne dabeşkirin û kategoriyên wek (deng û fonêm û alofon û girafîm), (dengdar û dengdêr), (gir û kip), (aspirated û unaspirated) û hinên dîtir, ku di encamê de du fonêm li sîstima zimanê Kurmancî zêde dibe. Herweha diyarkirina dengan di tevin û têkista ziman de ka çilo têne sazkirin û hûnandin û çî guhartin û hemecorî di sîstima dengên Kurmanciya devok û standarde de saz dibe. Herweha şîrovekirina diyardeyên fonetîkî û fonolojî wek (sîmayên cudaker û birrge û tekez û awaz û ton, wekçawa berzî û nizmiya dengan di wata û sîstima fonolojî de derdikeve, ku risteya hewalder ji ya pirskirinê cuda dike. Li dawî weha diyar dibe ka çend deng û çend fonêm û çend alofon di zaravê Kurmanciya îro de hene, çî devok û çî standard. Ev lêkolîn herçende lêkolîneke zanistî ye di dengên zimanê kurmancî de, lê dîsa armanceke pêdagocî jî pêktêne, ku lêkolîn wek tezeke Akadîmî di warê dengsazî û fonolojiya zimanê Kurmancî de, û bi zimanê Kurmancî tê nivîsîn û amadekirin ku ev bi xwe dibe seretayek eger em nebêjin bingehê bo geşekirina danîna termînolojiya dengsaziyê di astê tezên akadîmî de.

Ev lêkolîn şîrovekirineke dengsazî û fonolojî ye, bi mîtodeke wesfdarî û sînkronî li taybetiyên dengên axaftina zaravê Kurmancî dikole bi armanca kar û xebatekê ber bi standardkirina dengên zimanê Kurdiya Kurmancî û dagirtina wê valahiya ku di nivîsên berê de hatiye. Ya dawî jî hewldanek e bo bilindkirina astê zimanê Kurdî di warê şîrovekirinê de ango (metalanguage) kûev bi xwe hestekî netewî serfiraz ava dike.

Berî ku ez vê despêkê bidawî bikim, dixwazim wê yekê tekez bikim ku di zimanvanî de wek tiyorî gelek nerînên hemereng hene, lê ya pêwîst ew e ku ev dergeh herdem vekirî bimêne bo danûstandinê li ser bingeha azadiya derbirrînê ta hemû pevire bigihin çareseriyê. Ne hişkiya şkestinê, ne nermiya bişaftinê, bo xweşiya danûstandinê.

Beşê Yekem

Dengên Zimanê Kurdî di Şîrovekirina Dengsazî de (Taybetmendiyên Organîkî û Fîzîkî di Dabeşkirina Dengên Kurdiya Kurmancî de)

Ziman "deng in her miletek mebesta xwe pê dibejê"⁹

Di vî beşê yekem de emê dengên ziman bi giştî û dengên Kurdiya kurmancî bi taybetî bidin ber zagonên dengesaziyê bo ku wan ji du aliyan ve şîrove û analiz bikin, taybetmendiyên organîkî û fîzîkî, ango sazgeh û awayên derbirrîna dangan, dengdêr û dengdar, girr û kip, dabekirina dangan, mîkanîzma dengesaziya awartebûn û stûrbûna hin dengdar di Kurmancî de. Li dawî emê jimara dangan û dabeşkirina wan di Kurdiya Kurmancî de diyar bikin, ku ev encam dibe mijara lêkolînê di beşê duyem de yê ku van dangan dixê ber şîrovekirina fonolojî. Ev beş di çarçova van birr û teweran de dabeş dibe:

- 1.1. Birrê Yekem: Ziman di Şîrovekirina Dengsazî de
- 1.2. Birrê Duyem: Taybetmendiyên Giştî yê Dengên Ziman
- 1.3. Birrê Sêyem: Dengdêr û Taybetiyên Wan
- 1.4. Birrê Çarem: Dengdar û Taybetiyên Organîkî
- 1.5. Birrê Pêncem: Dengdar û Taybetiyên Fîzîkî
- 1.6. Birrê Şeşem: Dengdarên Kurdî û Taybetiyên Awarte
- 1.7. Birrê Heftem: Encamên Beşê yekem

⁹ Ibin Cinni, Alxessa-iss, Cizi 1, rûpel 33 (bi zimanê Arebî ye)

Birr I 1.1. Ziman di Şîrovekirina Dengsazî de

Zana û ronakbîr û bîrmendên cîhanê bi tewawî û bi giştî giringî dane rola ziman di dîroka mirovayeti de, wekçawa Vindrîs weha wesf dike ku dahênan û afirandina ziman bû sedema ji hev cudakirina du qunaxan di dîrokê de ku hem dawî bi dîroka heywanî û hem jî bû despêka dîroka mirovayetiye¹⁰. Ev wê yekê diyar dike ku ziman e yê ku mirov ji heywan cuda dike. Inca ziman yek ji wan dahênanên herî giring e di dîrokê de, lewra milletên dinyayê pûtedan û guhdan li zimanê xwe kirine, ku eva han jî di warê nivîsîna pertûk û ferheng û rêziman û lêkolînan de diyar e.

Dengsazî wek zanist di sê aliyan de dabeş dibe: 1. aliyê berhemhênana deng (phonation), 2. aliyê ku deng tê de tê guhastin, 3. Aliyê ku deng tê de tê wergirtin (Joseph Vendryes rûp 43)¹¹. Inca, em dikarin bêjin ku bikarhênana ziman sê faktor tê de peyda dibin: axêver û gote û bihîser bi awakî dîtir nivîser û name û xwêner.

Vindrîs pûte daye aliyê guhastina deng û lereyên ku di deng de peyda dibin wek takerekî saykolojî li nik bihîser didê¹². Zar û lêv di drustkirina zingêniya deng de roleke xweyî karîger heye bo nimûne awayên bilêvkirina dengên ziman li nik xelkên Cizîra Botan û Koçerên devera Silopî ku, bo nimûne, risteya (were, em biçin molê) ku dengkirina peyva (malê) bûye (molê), ango dengê [a] bi awakî weha derdikevê wek tu du rengan, em bêjin, sor û şîn, li nav hev bixin, ew jî wilo piçek ji dengê [o] bi ser [a]de dikin, ku deng ne [a]ya zelal e, û ne [o]ya zelal e, heme tevlihev e, lê heman dengê [a] li nik axêverên devera Hezex ta bigihê Nisêbînê zelal derdikeve, ango ciyawazî nav wan de diyar e, û hincar axaftina Cizîrayan li nik xelkên dîtir dibe cihê qerf û galteyan. Herwekî Vindrîs li ser vê mijarê axiviye di awayên derkirina dengên de ku şeweya giroverkirina lêvê roleke giring tê de dibîne, her ev jî di şanogeriya Xanedanê Bircuwazî (Bourgeois Gentilhomme) de ya şanonivîsê Firansî, Molière, diyar dibe ka akter çilo lêvên xwe bi awakî weha çê bikê ku deng şeweyeke taybet bistêne¹³. Dengên gerûyî wek [k] tete guhartin ligor ku piştî ziman bighê paş-asmank yan pêş-asmank wek dengê [k] ya paş-asmankî ya Almanî di peyva (kub) de¹⁴ û heman deng di Kurmancî de di peyva (ko) de.

¹⁰Joseph Vendryes, Al-Luxxe, wergernadina Abdulhem'd addewaxilî û M. Al-Qesas, Çapxane Licnet Al-Beyan Al-Arabî, Qahîra1950 (rûp 1) (bi zimanê Arebî ye)

¹¹ H. b. (rûp 43)

¹² H. b. (rûp 43)


¹³ H. b. (rup 46)

¹⁴ H. b. (rup 48)

Wek ku gelek zimanzanan berî niha jî dane xuyakirin ku danûstandin û hevgihaştin navbera mirovan de bi riya ziman pêktê, û di vê pêwendiyê de sê alî rola xwe tê de dibînin ta ku ev pêwendî pêk were, ew jî ev in:

1. axêver, 2. kenala gihaştinê: ziman, 3. bihîzer

Sosêr ev hizir weha di (wêne 1) de daye xuyakirin (*axêver, ziman, bihîzer*)¹⁵



Inca ev hersê takil (element) dibine pêkhênerên giftûgoyê navbera mirovan de, axêver bi riya dengkirinê ku komek yan birrek ji dangan wek (a, b, r, z, î, o, û, n, i, ê ... tad) bi şeweyeke taybetî tene rêzkirin û bêjeyekê yan peyvekê didin, ku watayekê yan têgehekî yan navekî yan ramanekê didin, wek (ba, bar, baran, za, zar, zaran, zarî, zaro, bi, bir, birin, birîn, be, ber, bêr, bor, bîr, bûr, ... tad). Wek van komikên dengên me anîne ziman ji wan re peyv tê gotin û her çend peyv bi awakî dîsa pevre tene rêzkirin û risteyekê ava dikin ku watayekê yan mebestekê didê xuyakirin, wek em bêjin:

1. Were. 2. Here. 3. Were malê. 4. Here bajêr. 5. Were mala min

Lêkolîn di warê dengsazî de wek zanist li astê Rojava jî ne ji mêj ve hatiye, ne wek rêziman ku ji çaxê Yonaniyan ve bingeh jêre hatiye danîn. Lê wek ku zimanzan dupat dikin ku dahênana tîpan ji bo nivîsîna ziman di cîhanê de, ev bi xwe nîşana şiyarbûnê ye di warê naskirina dengên ziman de. Lê belê dengsazî li Ewropa wek zanist di sedê nozdehan de ronî dît, lê ev zanist di despêka sedê bîstan de pêşket û binçîneyên tîyorî jêre hatin danîn, nemaze li ser destê zimanzanê binavûdeng Sosêr û damezrênerên qutabxana **Pirag** (L'Ecole de Prague)¹⁶ ya ku gelek zimanzanên çendnijad tê de beşdar bibûn, ji wan jî yê

¹⁵ Ferdinand de Saussure 1915: Course in General Linguistics Edited by Charles Bally and Albert Sechehaye In collaboration with Albert Riedlinger, McGraw-Hill Book Company. New York Toronto London (rûp 11)

¹⁶- N. S. Trubetzkoy (1971 second edition): Principles of Phonology, wergêrana Englîzî Christiane A. M. Baltaxe, Berkeley and Los Angeles, University of California Press. (rûper V translator`s Foreword)(rûper 66)

herî navdar Trobetskoy «Troubetzkoy»¹⁷, yê ku yekemîn tiyorî di fonolojî de danî, û Roman Jakobson «Jakobson» damezrênerê tiyoria duwaneyî (suna-aî) di piroseya lêkdanên dengsaziyê de¹⁸

1.1.2. Dengsazî wek pênasê (Phonetics)¹⁹

Li gor ku di Ferhenga Routledge²⁰ û (Wikipedia, The Free Encyclopedia) de hatiye, peyva (phonetics) ji peyva Yonanî φωνή, phone = sound/voice) hatiye. Ev buwar di dengên ziman de dixebitê û dikolê. Ev xwendin taybetiyên rasteqîne yên dengên axaftinê û dengên ne-axaftinê (non-speech sound) di astê derkirina deng û bihîstina wan, û naskirina wan de diyar dike. Ev hemû beramberî fonolojî tê, ya ku di astê sîstima deng û dengên rûten (abstract sounds) de dixebitê (wek fonêm û durvên cudakar). Dengsazî pirtir di siruştaya deng û xwe de dikole, ne di têvajoya (context) ku tê de di ziman de bikar tê. Lewre, gengeşe di warê wata de (semantics) nakevê ber vî astê lêkolîna dengsazî de. Ya baş ew e em vê pênaseyê bi zimanê Englîzî jî danin ku ew jî ev e: "Phonetics is the branch of linguistics that studies the nature and mechanisms of human speech sounds independently of the meanings that those sounds are used to convey".²¹ Ferhenga Routledge Dictionary of Language and Linguistics bi kurtî nîvîşkê wê didê xuyakirin: "phonetics studies the concrete articulatory, acoustic, and auditory characteristics of all the possible sounds of all languages"²² angû: Dengsazî di taybetiyên organîkî û fîzîkî û bihîstinê yê tevahiya dengên hemû ziman de dikole.

Belê aliyekî dîtir heye ku jêre **Fonolojî (Phonology)** dibêjin, ku dengên ziman ji barê dengsaziyê derdixê û dike astê wata û erk ku deng di sîstîmeke zimanvanî de tê xebitandin, lewre deng ji astê rûten dikevê astekî sîstîmdar û orgenîze de,²³ bo nimûne astê sîntaksî navbera peyva (dixwazê) ya ku di rêjeya dema nihokê de ye, dibe (xwest) di rêjeya dema buhêrkê de ku dengê /z/ku gîr e dibe kip, û dengê /s/ didê. Di baweriya min de, û

¹⁷- damezrênerê tiyoria duwalî di piroseya lêkdanên dengsazî de:

¹⁸ - N. S. Trubetzkoy (1971 second edition): Principles of Phonology, wergêrana Englîzî Christiane A. M. Baltaxe, Berkeley and Los Angeles, University of California Press. (rûper 66)

¹⁹ Ev peregraf ji Wikipedia, the free encyclopedia

²⁰ - Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork.

²¹- David Crystal © 2008 A Dictionary of Linguistics and Phonetics 6th Edition. ISBN: 978-1-405-15296-9

²² Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork. (rup 895)

²³- David Crystal © 2008 A Dictionary of Linguistics and Phonetics 6th Edition. ISBN: 978-1-405-15296-9

ligor xwendina min di herdû aliyên dengên ziman de, sînorên fonetîk û fonolojî di gelek ruwan de dikevin nav hev de, bi awakî yek ya dîtir şîrove dike.

1.1.3. Şîkirina Dengsaziyê:

Zanîna ziman naskirina dengên ziman e²⁴, dema ez zimanê xwe dizanim, ji xwe dengên ziman jî nas dikim, wilo ez dizanim çî deng tê de hene û çî deng tê de nînin, bo nimûne dengê ث ya Arebî û Englîzî di Kurdiya Îro de nîne. Axêverê Englîzî ji xwe re dizanê ku jimara dengdêrên zimanê Englîzî ji pêncan bêhtir e, ku van peyvên ji hev cuda dike, wek: *bit, beat, bet, bait, bat, boot, but, boat, bought* ...htd herçend pênc girafîm (a, o, u, i, e) tenê di alîfbayê de bikar tên ku nuwêneriya van dengdêran dikin. Diyar e hawtakerî (mutabeqe) navbera dengên û tîpan de nîne. Wilo jî yê Kurd dizanê dengdêrên zimanê Kurdî ji pêncan bêhtir in, dema van peyvên ji hev cuda dikin wek *bar, ber, bêr, bir, bîr, bor, bûr, ...* inca peyv bi şêweya dengesazî xwe diyar dike û di riya *phonemic transcription* ji aliyekê ve û *phonetic transcription* ji rexekê din ve ku li ser bîngeha dengesaziya axaftinê şîrove dibe.²⁵Inca deng ji du aliyên ve têtê şîrovekirin:

1.1.3.1.1. Erkdariya deng

Mebest ji şîrovekirina dengesazî her ew e ku takilên (element)²⁶ dengî di gote û riste û bêjeyên ziman de hişkere bike, û van takilan li gor erkên wan dabeş bike. Eger me du goteyên Kurdî gotin: (1. *Kuro, here.* 2. *Kuro, were.* 3. *Kuro, mere.* 4. *Kuro, dere*) wa diyar dibe ku yek deng di yek tevinê de û di yek cihê de tê guhartin (**h, w, m, d**) û ew jî dibe sedema guhartina wata û erk û mebesta axêver, wek çawa dengê /h/ di Englîzî de bi heman rol radibe ku jêre rola cudakerî (distinctive function) وظيفة تمييزية dibêjin, ku ji bilî vê rolê jî wek peyv xwe cuda dike ji peyvên wek (ill, pill, bill, ...htd.). Herweha roleke dîtirî deng heye, ew jî rola derbirrînê ye²⁷, û her ev jî şêweya saykolojî ya axêver dide xuyakirin bê ku em dengên gotinê ji hev vekin, wek em di bersivê de bêjin (belê) ku ligor awayê dengkirinê - bihêzkirina birgeyekê – du watayan dide xuyakirin: yek jê pêkenîn e, û ya dîtir pê xweşkirin e.

1.1.3.2. Bê-erkiya deng


²⁴ Fromkin, Victoria A. and Robert Rodman. 1998. *An Introduction to Language*. Fort Worth, TX: Harcourt Brace. ji beşê Introductuon: Linguistics: The Scientific Study of Human Language (rûp11).

²⁵ Dafydd Gibbon (2007): *Introduction to Linguistics: Phonology: encoding words*, B.A. British And American Studies, Basic Module 2, Winter Semester 2006/2007, Class Website PDF (rûp 21)

²⁶ Weha hate bîra min ku peyv (takil) beramberî peyv (element) a Englîzî baş dît. Peyv (takil) li nik Mesûd Mihemed diyar dibe wek tiştêkî biçûk ji nav gelek tiştan, bê ku watayeke taybet jêre diyar dike.

²⁷ Neil Smith and Deirdre Wilson (1979): *Modern Linguistics*, Penguin Books, USA. (rup 70)

Di ziman de wa heye ku hin diyardeyên dengsazî hene ku pêwendî bi devok û zaravên hemecor heye, û bi hîç awayî nabe sedema guhartina têgehiştinê yan wataya peyvê wek: hin Kurd dibêjin (mar) û hinên dîtir heman peyv dibêjin: me'er). Weha jî (tal /te'el), (jeher / jeher), (jar / hejar). Zimanvan wa dibînin ku lêkolîn di dengên ziman de gava pêşî ye di lêkolînên zimanvanî de, ji ber ku deng madeya xav e di axaftina mirovan de. Ev zanista han pêşî li nik Areba û Hindiya derket, dûvre li nik Ewropiya des pê kir, û bi awakî zanistî û bergîrtir ji yê pêşî bi pêş de çû. Bo nimûne Ferahîdî navê ferhenga xwe kir (Al-Ayn العین) ji ber ku wî didît ku dengê (ع aayn) (ا) yekemîn deng e ji aliyê sazgeha dengkirinê ve, belê ev bi xwe şaş e, yekem deng (hemza) ye û bi dû de dengê /h/ê tê. Areba guh dida dengên ziman di çarçêweya zimanê Arebî de, ango mohreke taybetî werdigirt, belê lêkolînên Ewropiyayî di warê dengên hemî zimanan de bûn, ango di çarçêweya giştî de dihat.



Birrê II: 1.2.

1.2. Taybetmendiya giştî ya dengên ziman

Di vî beşê lêkolînê de emê taybetmendiyên organîkî û Fîzîkî diyar bikin, yên ku di sazkirin û dabeşkirin û kategorîkirina dengên ziman de roleke giring dibînin. Ji ber ku kategoriyên deng li ber ronîya şîrovekirina dengsaziyê têne dabeşkirin û guhartin, ku gelek hokar wek **sazgeha** her dengêkî, yan her komêk deng, **lerînsazî**, **taybetiyên fîzîkî**, ligor radeya girtin û vekirina sazgeha her dengêkî (closure of articulation) û awayê derketina her dengêkî, ka xişokî ye yan teqînkî, nerm tê yan req tê, dirêj tê yan kurt. Ev hokarên dengkirinê dibine pîver bo dabeşkirina dengên hemî zimanan bikar tînin, lê her zimanek hin guhartin di van dangan de drust dike ku şêweyê taybetî werdigire wek em bêjin dengê [s] di Kurdî de ne heman [s]a Arebî ye, û ne heman [s]a Englîzî ye ji ber ku gelek pîver di sazkirina deng de kar dikin yek jê awa û girtin û vekirina sazgeha dangan ne wek hev tînin, tanî di yek zimanî de deng [s] di (rist), (sal), (sol), (sîr) de bi tewawî ne wek hev tînin. Wîlo jî di mosîqa de meqamên hevbeş navbera mîletan de hene wek em bêjin meqamê Beyat ku di Kurdî û Farisî û Arebî û Turkî de heye, ku her çar li ser yek rehendê nota xwe drust dikin, lê dema her çar mîlet mosîqa li ser vê meqamê lêdidin, mirov bi hesanî dikare wan ji hev cuda bike wek em bêjin strana (kevokê) di beyata Kurdî de gelek cuda ye ji ya ku Areba xwest kirasekî Arebî lê bikin, lê nikarîbûn, ji ber taybetiya Kurmancî tê de. Di ziman de jî deng di nav birrek dengên dîtir de diyar dibe ku ev bi xwe kartêkirinekê li ser deng bi vê hevdengiyê re tînin, bo nimûne dengê [a] di (na)ya nerênî de di hin devok de di bêvilê re dertê, wek (navim) ku dengê [n] ji xwe ji bêvilê dertê, inca kartêkirinê li ser sazgeha dengê [a]dike, ya ku ji dev derdikeve lê bi hevaltiya [n] re dibe hindêk ji baya dengê [a] di bêvilê re dertê, inca wek dengêkî nêzîkî [o] drust dibe, û wek (novim) saz dibe. Peyva (nîne) di devoka serhedî de dibe wek (ninne) ku dengê [î]ya dirêj hinekî kurt dibe, û hewa pirtir ji bêvilê dertê herçende ku tekez (strês) di vê peyvê de li ser birrgeya pêşî tê. Mebesta ew e ku her dengêkî di ziman de kirasekî taybet li xwe dike ku ji zimanên dîtir cîyawaz e.

Endamên axaftinê roleke giring di drustkirin û sazkirina dengên ziman de dibînin. Di dengsazî de, sazgeha dengdaran (the point of articulation) ew cih e, ku hingaftina endamên laş ji sîstîma dengkirinê bi awakî tînin ser hev, û deng tê de saz dibe, ku ev jî navbera endamekî bizoz (active) wek zarê mirovan û endamekî rawestiyay û pasîv wek hin deverên asmankê dev. Dengên dengdar bi alîkariya organên nerim wek zar û organên hişk wek esmankê dev, ligel awayên dengkirinê dengdar bi taybetiya xwe dertê.

Di polênkirina dengên ziman de çend pîverên dengsazî hene ku her yek bi xalekê ji ya dîtir cîyawaz e, çî bi hoya **sazgeha dengkirinê**, û çî bi hoya **awayê dengkirinê**, û çî jî

bi **pestin û hêza tewjima hewayê**, ev hersê bar dibin hokarê hemecoriya van dengan, bo nimûne du core dengên ziman hene, ji wan re dibêjin: dengdêr û dengdar.

Dengên ziman, wek hatiye zanîn, şêweyeke taybetî ye ji wê hewayaya ku ji sîpelka mirovan derdikeve û di boriya hewayê re derbas dibe, lê ev hewayaya han bi awakî fîzîkî derdikeve û li encamê şêwedengek drust dibe, û durvekî xwey taybetî distênê. Ev deng dema ji qirikê tê der bi rê de pêrgî hin keleman dibe, ku ew jî: yan du deste masûlkeyên ... ku jêre (dengejê - têlên dengî) dibêjin, yan jî hewa dema ku di qirikê de derbas dibe pêrgî zimanbiçûk dibe, yan jî rexek ji zar (dawî, navîk, serî) digihê esmankê dev (pêş-esmank, nav-esmank, paş-esmank), yan zar ligel pidûwan, yan zar ligel diran, yan lêv ligel diran, yan jî tiştê ji van endaman nagihin hev, ango hewa bi hesanî ji pişikê derdikeve û derbasî dev dibe, lê berî ku ji dev derkevê, herdû lêv şêweyeke taybetî drust dikin, ku ji hev vedibin, belê vekirina van lêvan, heye lêva jor û jêr nêzîkî hev bin, wek nivvekirin bê, û heye dûrî hev bin. Ev şêwe vekirin dengê xweyî taybetî drust dike, wek em bêjin drustkirina dengê [î] vekirina herdû lêvan ne wek ya barê dengê [a] ye. Weha jî dengên dîtir yê dengdêr, wek: û, u, e, i, ê, o. Încê, drustkirin û dabeşkirina dengên ziman bi awakî giştî li ser çend faktorên corawcor radiweste ku ew jî ev in:

A) Li pêka sazgeha ku deng jê derdikeve: ji nav lêvan, yan ji bêvilê, yan ji nav diran û lêvan, yan ji gewriyê, ji zengelorê, ji dev bi gihaştina dawîya zar li gel zimanok, ji zar û esmankê nerim (paş-esmank), yan esmankê hişk (pêş-esmank), ji zar û diranan derdikeve ta ku pê tê axaftin.

B) Li pêka fîzîk û awayê derketina hewayê, ango awayê derbirrîna van dengan, ka çilo ji sazgeha xwe derdikeve: çiqas fere ye, çiqas teng e, çiqas vekirî ye. Ya dîtir jî gelo tewjima hewa ji dereke hişk dertê, yan ji dereke nerim derdikeve? Gelo hatina hewa çiqasî xurt û bihêz e, û çiqasî bilez û sivik tê, yan giran tê?

Ev kartêkirinên han hemî jî şêweya deng destnîşan dikin, bo nimûne dengên ku ji teqîna bumbê derdikeve ne wek dengê ku ji teqîna şûşekê yan fincanekê dertê, dengê ku ji birrîna caw tê, ne wek dengê ku ji birrîna dareke hişk bê, yan dareke tîr bê, ka ev hewa ji sîpelkan dertê û di dev re, yan di bêvilê re, derbas dibe ku tengbûn û girtina riya hewayê bi awakî westaw yan teqandî/teqîw yan xişokî yan zirîngok, yan bêvilok drust dibe ..htd. Ev hemî jî dibine fekterên sazkirina deng û dabeşkirina wan ku ji hev cuda dibin, her wilo jî wek fonêm tene jimartin ku her fonêmek tîpeke taybet dide, wek dengê [b], [p], [s], [v] ... htd.

Ji kategoriyên giring di nav destnîşankirina dengên ziman de sê celeb diyar dibin:

1) **Dengdar û dengdêr**

Dengsazî cudawaziyê dixê navbera du nîfşên dangan de, ewên ku hewa ji sîpelkan ta dev û bêvilê bê tegere derdikeve, dengdêran drust dibin; ew dengên ku hewa di cihekê ji cihên sazgeha deng de tegere dikeve pêşiyê de yan tê girtin û ji nêşkêve derdikeve ku bi vî awayî dengên dengdar drust dibin.

2) Dengên girr û dengên kip

Girrî û kipiya dengên ziman ji lerîn û nelerîna herdû dengejêyên qirikê saz dibe ku bi axaftina dengê [b] jehên qirikê dilivlîvin û dilerin, belê bi axaftina dengê [p] jehên qirikê nalivin. Ev jî dibe sîmayekî cudaker navbera dengên ziman de.

3) Dengên devkî û dengên bêvilok

Tevahiya dengên ziman di riya kortika dev re drust dibin, belê sê deng hene wek [m], [n], [ng] di riya kortika bêvilê re çêdibin.

1.2.1. Taybetmendiya Dengdêr û Dengdar

Ev dulayeniya han dengdêrîbûn û dengdarîbûn bi hebûn û nebûna tegereyan (keleman) di pêşiya wê hewayê ku ji sîpelkan derdikeve û di boriya hewayê re ta gewriyê, ta herdû kortikên dev û bêvilê, ta kortika lêvê. Eger hewa serbest û bê kelem derbas bû, dengên dengdêr drust dibin. Lê eger hewa bi rê de pêrgî hin keleman bû, çî ji endamên axaftinê û çî ji şeweya dengkirinê, wilo dengên dengdar drust dibin. Dengên dengdar ew deng in ku bi tegere tê zarkirin, ango endamekî nav dev, yan nav gewriyê, dibe tegere (kelem) li pêşiya hewayê bi şeweyeke ku dengêkî taybetî derbixê. dengdar zehmet bêne bihîstin eger dengdêr bi pêşde yan bi paşde neyên.. Lê ew dengdarên ku sazgeha wan ji lêvê ye, ji wan re (lêvkî – labial) dibêjin, wek [p] û [b]. Wilo jî dengine dîtir hene ji serê zar derdikevin ji wan re dirankî dibêjin, wek [t], [d]. Dengdar û dengdêr di Kurmancî de li gor Celadet Bedirxan 31 in:

Heşt Dengdêrên (vowel): *a, e, u, î, o, ê, û, î*

Bîst û sê dengdar (consonant):

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Lê dema em dipeyivin, hin dengên dîtir jî hene, ku Celadet wek tîp û girafîm nexistine alîfbaya Kurmancî de, lewra tîp bo wan nedanîne. Lê, ligor hin pisporên dîtir wek Dr. Qenatê Kurdo û Bakayêf jimara fonêmên alîfbaya Kurdî ji yê Celdaet cuda ye. Ev ciyawazî di jimara fonêman de navbera alîfbaya Celadet û pisporên dîtir de di warê dengên sîstima Kurmancî de dibe sedemek ku em li dengsaziya Kurmancî vegehin û ji nûve vê kêşeyê vewejêrin.

1.2.2.Lerînsazî di Dengên Ziman de (voicing - girr û kipî)

Di dengsazî de du têrim hene: (voiced sounds) û (unvoiced sound), ev herdû têrim çend peyvên hemecor di Kurdî de wergirtine wek (kip û awazdar), (dengdarêt bideng û dengdarêt kêmdeng/bêdeng), (girr û kip). Herdû peyvên dawî herî libar in û sivik in, lewre min bi xwe (girr) û (kip) bikar aniye. Dengên dengdêr di zimanan de bi tevayî dikevin ber corê girriyê (voiced) de, lewra dengdêrên zimanê Kurdî a, e, i, î, o, u, û hemû girr in, belê dengdar ji aliyê lerînê ve du cor in: beşek **girr** tê, û beşê dîtir **kip** tê.

Axaftin bi xwe ji alîkî ve berhemê piroseyeke pêwîst e di bêhinvedana (breath) ku hewa di bin pestin(fişar)a sîpelkê de di dev de yan di bêvilê de derdikeve. Ciyawazî di navbera van dangan de li gor wê yekê tê, ku her endamek ji endamên bêhinvedanê roleke xwe di derxistina deng de dibîne. Ev jî wek amêrên mosîqî yê pifdar, wek em bêjin bilûr ya ku çend qul tê de hene, û bi girtin û vekirina van qulan, deng û awaz tê guhartin, herweha fişara hewayê **rezmekê** /(rythem) drust dike.

Hişkbûn û nerimbûna organên dev û qirik û bêvilê dengên ne wek hev drust dike, wek dema herdû lêv diçin ser hev dengên [p] û [b] çê dikin. Weha jî hevgihaştina lêva jêr ligel diranên jor dengên [f] û [v] drust dike. Dema dengejê²⁸ di qirikê de digihin hev dengê hemza [ə] drust dibe, ku jêre bi Englîzî (glottal stop) dibêjin. Dengejê bi rola girr û kipiya dengên ziman radibin, ku li encama wê hewayê ji sîpelkê derdikeve, pê re jî jehên qirikê yan dilerizin (dilerin/dihejin) û dengên ziman bi girr derdixin, yan jî nalerizin û dengên ziman bi kipî derdikevin. Di ser qirikê re hevgihaştin û kosp (obstruction) navbera hin organên giringî dîtir de çêdibe (ku ji wan organan re bi Englîzî (the supraglottal organs of speech) dibêjin, ku hingivandin navbera beşek ji zar ligel esmankê nerim (melaşûya nerim), yan ligel esmankê hişk, yan ligel diranan yan li gel pidûwan çêdibe.

Di zanista fonetîk de barekî wa heye deng dema ku di qirikê (qirikê) re derbas dibe, pêrgî herdû deste masûlkeyên bi qirikê ve girêdayîne dibe. Li vir wek me berî niha jî got erkê van masûlke wek du tîlên amêrên mosîqî ne, inca şidandina wan û sistkirina wan ji alîkî ve, û gihaştina wan bi hev ve ji alîkî din ve dibe hokarê livîneke bilerîn, dema ku hewa tê re derbas dibe, lewre lerîna van dengejêyan şeweyeke taybetî didê deng, her ev jî wek diyarde bi Englîzî (voicing) jêre dibêjin. Lê hin dengên ziman hene ku ev lerîna dengejêyan pê re nayê, û ji van dangan re (dengên kip – voiceless sound) tê gotin; hin deng hene ev lerîn pê re heye, ku ji van dengên bilerîn (girr – voiced sound) tê gotin. Li ser vê bingehê dengê ziman bûne du cor: dengê kip, û dengên girr.

²⁸ Dengejê: (vocal chords)

1.2.3. Dabeşkirina dengên Kurdî yên girr û kip

Di zimanê **Kurdî** de ev herdû core deng, girr û kip, hene. Dengê dengdêr (î, i, u, û, o, e, ê, a) li gel diftongan (-xwî, -xwe, -xwê, -xwu, -xwa) tên, ku hemî jî ji corê girr in. Belê dengê dengdar herdû cor tê de hene, emê di vê cedwela xwarê de dengên dengdar bi herdû coran diyar bikin , ew jî ev in:

1. Dengdêr, hemî girr in

2. Dengdar, beşek girr in, û beşek kip in

Dengên zimanê Kurmancî					
nîvdengdêr	dengdêr		Dengdar		
	dengên girr			dengên kip	
	a	b		p	þ
y	o	d	ð	t	ţ
w	û	g		k	ķ
	u	c		ç	č
	e	v		f	
	i	z	ẓ	s	ś
	î	j		ş	
	ê	g̃		x	
	uî	m		h	
		n		h̃	
		ŋ		ə	
		l	ḷ	q	
		r	ř	ɣ	
2	9	13	4	13	5
46 deng					

Newekheviyek di parvekirina dengdaran di girrûkipî de navbera du zimanzanên Kurd de peyda dibe, dengên (h̃, x, q) ku li nik Dr. Ewrehmanî bi kipî diyar dibin, lê heman deng li nik M Emîn Hewremanî bi girrî têne jimartin, bi ser ku herdû nivîser ji yek zaravî ne. Ji

alîkî dî ve, Xazî Fatîh Weys²⁹dengê[ĥ] (girr) dibîne, lê Massoud Rahimpour (kip) dibîne³⁰. Ez bi xwe dengê [ĥ] dengêkî kip dibînim. Cihê amajepêkirinê ye ku zimanzanên Areba ku xudiyê dengê [ĥ] ne, vî dengî kip dibînin. Wais dengê [ɣ- ɛ] wek fonêm nabîne, lewre naxê nav fonêmên Kurdî de³¹.

1.2.4. Dengên Devkî û Dengên Bêvilok (Nasals)

Piştî ku hewa ji sîpelkan derdikeve û qirikê derbas dike, dikeve gewriyê û di vir de du cok tên pêşiyê, ya wê di herdû cokan re derbas bibe, yan di yekê ji wan herdiwan de bibûre. Tevahiya dengên ziman di riya kortika dev re drust dibin, belê sê deng hene wek [m] , [n] , [ŋ] di riya kortika bêvilê re çêdibin.

1.2.4.1. Dengên devkî

Dengên zarî ew deng in ku hewa di dev re derbas dibe, bê ku riya xwe bi bêvilê bixê, piroseya vê jî waye ku zimanok bilind dibe û sazgeha bêvilê tê girtin û riya dev li pêşiya derbasbûna hewayê vekirî dimênê. Di Kurmancî de jibîlî hersê dengên bêvilok, dengên dîtir hemû di dev re dertên, ango devkî ne.

1.2.4.2. Dengên Bêvilok

Dema ku hewa di coka bêvilê re derbas dibe, dengên vê riyê ji wan re bêvilok tê gotin. Piroseya vê jî wa ye, ku zimanbicûk bi xwar de dadikeve da ku beşekî hewa bikarê di bêvilê re derbas bibe (ev bi xwe ji aliyê teknîkî ve wek sazgeh tê jimartin, lê bi awakî giştî wek şeweya dengkirinê tê jimartin. Dengên bêvilok di Kurdî de sisê ne ku ew jî ev in: [m], [n], [ŋ]

Birr III: 1.3.

1.3. Dengdêr (vowel sound)

Dengdêr dengine giring in di axaftinê de, ji ber ku bê wan, beşê dengdar nikarê saz bibe, û nikarê rola xwe jî di dengkirinê de bibîne. Ya dîtir jî **birrge** bê dengdêr nikare drust bibe, herçiqs dengdar hebin. Herweha awazên riste û awazên stranê bi arîkariya dengdêr drust dibin. Jimara dengdêran ji zimanekî ta zimanekî dîtir tê guhartin: di yekê de hindik in û di yekê dîtir gelek in, bo nimûne di Kurdî de (8) dengdêr hene, û di Arebî de (6) dengdêr hene, herçend hin zimanzanên Areba tenê (3)êya tînine ziman, lê ew bi xwe şeş in.

²⁹ Xazî Fatîh Weys (1984): Fonetîk, çapî yekem, le çapkirawekani Emîndarêti Giştî y Roşinbîrî û Lawanî Nawçey Kurdistan, Zincîre jimare 5, rup 60 (bi zimanê Kurdiya Soranî)

³⁰ Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran, Published by Canadian Center of Science and Education, International Journal of English Linguistics Vol. 1, No. 2; September 2011, www.ccsenet.org/ijel , (rup 75)

³¹ Xazî Fatîh Weys (1984), (rup 60)

Lêkolîn di babeta dengdêr de cara yekem li ser destê zimannas Robert Robinson³² di sala 1617 hatiye kirin, ku pênc dengdêrên serekî destnîşan kiriye: [i:] [i] [e] [o] [u] û çî organ di drustkirina wan de beşdar in. Bi dû Robinson de, Dektor Wallis³³ di sala 1653 de hat. Û di sala 1867an de zana A. M. Bell lêkolînek li ser çilo dengdêr têne drustkirin, û ev jî li ser sê beşan lewa kiriye, ku ew jî ev in:

- 1) dengdêrên ku bi zar têne drustkirin.
- 2) dengdêrên bi lêvê têne drustkirin
- 3) dengdêrên ku bi lêv û zar saz dibin.

1.3.1. Taybetmendiyeên Organîkî û Fîzîkî yê Dengdêran

Wek em tev dizanin ku sazgeha dengên dengdêr pirtir di kortika dev de tê, lê jibîlî vê jî, du kortikên dîtir hene: kortika lêvê û kortika bêvilê. Ev herdu kortik jî roleke dengsazî digêrin bo sazkirina hin dengdêrên zimanan wek ku di Fransî de hin dengdêr hene pêwîstî bi kortika bêvilê hene da ku saz bibe. Di vî tewerî de emê taybetmendiyeên dengên dengdêr bidin xuyakirin

Dengdêr hemî bê asêkirina endamên axaftinê derdikevin, û hemî girr in. Di sazgeha deng de organ bi awakî taybetî tete livandin ku yan bêliv(pasîv) e, ango ji cih nalebitê, yan bizoz (aktîv) e (ji cih dilebitê). Çar radeyên tengbûn û fArebûnê di dev de drust dibin, ev jî ligor bilindkirina zar û vekirina dev tê. Herweha pergala parçê ziman bi şêweyê asoyî di dev de. Fakterê sêyem di giroverbûna lêvan de tê. Fakterê çarem bêvilokî yan nebêvilokî(nasalversus nonnasal) ye, ka ba hindik yan gelek di bêvilê de derbas dibe, yan tenê di dev de dibûre³⁴. Di vê cedwela jêrî de barê vekirin û girtina dev li gel bilindbûn û nizimbûna zar, hem jî termînolojiya dengsaziyê ronî dibe. Valabûn navbera zar û esmank ku barê dev drust dibe ka çiqas vekiriye û çiqas girtî ye ligor ku çiqas zar bilind e yan nizim e, her li ser piroseyê dengdêr tê wesfdan wek ku di vê cedwela jêrî de ronî dibe³⁵:

Dev teng (close)	bilindbûna zar gelek e	(high)
Dev vekirî (open)	bilindbûna zar gelek kêma e.	(low)
Dev nêvekirî (open-mid)	bilindbûna zar navçe ye.	(mid)

³² Xazî Fatih Weys 1984, rûpel 64

³³ H. b. r. 64

³⁴ Marcus Kracht Introduction to Linguistics, Department of Linguistics, UCLA, 3125 Campbell Hall, 450 Hilgard Avenue, Los Angeles, CA 90095–1543. PDF copy. kracht@humnet.ucla.edu rûpel (rup 15 – 20)

³⁵ Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 80)

	Sazgeha dengdêr	Dengên dengdêr
	pêşik (front)	[i]
zar	navîk (central)	[e]
	paşik (back)	[u]
lêv	girover (rounded)	[û]
	nîvgirover half rounded	[o]
	gêkirî (spread)	[a]

Belê li ser taybetiyên dengdêr bi şeweyeke zanistî pêwîstî bi amêrên teknolojî heye, ku yekem hewldan di vî warî de zimanzan Conz (Gones)³⁶ li sala 1929 kolaye. Paşê bi sedan lêkolîn di vî barî de pêkhatin. Di dengsaziya dengkirinê de dengdêr bi wî awayî drust dibin ku hewa yekser di boriyên cîhazê henasedanê de serbest dibûrê, ango ti tegere û kelem nakevin pêşiya wan de. Ango rê li pêşiya hewayê vekirî ye, lewre pêrgî sikir û rawestan û vekirina jinişkava nabin, jiber wilo jî xişênî yan teqênî nabe. Dengdêr bi siruşt xwe girr in (voiced), ango di piroseya dengkirinê de herdû dengejê têne hejandin û lerizandin. Sê faktor roleke giring di drustkirina dengdêran de dibînin: **barê dev û barê zar û şeweya lêvê**. Ciyawazî di navbera van dengdêrên Kurdî de di riya van hokaran de çêdibe:


1. Sazgehên deng wek şeweya vekirina lêvan di tengbûn û ferebûnê de.
2. Maweya dirêjbûna deng,
3. lêvkîbûn û pozkîbûn
4. sêkuçka dengdêran/sêgoşka dengdêran
5. Fیزیolojiya endamên axaftinê.

Rola Lêvê: Herdû lêv, nemaze ya xwarê, dilivin û çend şewe distênin ku girover/xir dibin di çêkirina dengan de wek giroverkirina teng bo drustkirina dengê [û], yan giroverkirina vekirî di çêkirina dengê [o] de, yan jî pehinkirina herdû lêvan bo drustkirina dengê [ê] de. Şeweya asayî ya herdû lêva di drustkirina dengê [e] de. Weha jî dengên [i], [î], [u], [a] bi şeweya livîna herdû lêvan drust dibin.

Rola Zar: Di dengkirina dengên dengdêr de **zar** bi şewe û durvê xwe ve bi roleke giring radibe. Ya dîtir divê em zanibin ka çilo ev dengdêr ne wek hev in. Di vê xalê de

³⁶ Çavkaniya Marcus Kracht (rup 15 – 20)

livîna zar ya asoyî, ku ev jî pêşvexistina beşê pêşîka zar û bilindbûna wî berew esmankê hişk ve, yan paşvexistina beşê dawiya zar ku bikevê beramberî esmankê nerim, ango ew berê şaqolî navbera banikê zar û esmank, ya dîtir ew beşê zar ku bilind dibe navbera pêşîkê û paşîkê de ye, wek di vê wêneya jêrî de du dengên dengdêr [œ] [i:]³⁷ diyar in:



barê ziman bi dengên /i / /a/
wêne 3

Di dengkirina herdû dengên dengdêr[i:] [i] beşê pêşî ji zar bilind dibe, bo vê yekê ji van herdû dengdêran re dibêjin dengên dengdêrên pêşîk. Lê hin dengdêrên dîtir hene ku beşekî dîtir ji zar bilind dibe, wek [û] [a]

Celebên dengdêran:

Li ser pîvera ku me li peregrafa çûyî de bas kir, hin zimanzan sê cor dengdêr ji hev cuda dikin, û hinên dîtir wan dikin du cor, ango ya navîkê hildiweşênin:

1. Dengdêrên pêşîk³⁸ (pêşîka zar) ku banikê zar xwe nêzîkî pêş-esmank dike, wek dengên [i] [e] derdixe.
2. dengdêrên navîk³⁹ (navîka zar) ku ji zar cihê xwe di navîka dev de digirê.
3. dengdêrên paşîk⁴⁰ (paşîka zar) ku dawiya zar cihê xwe beramberî esmankê nerim û zimank digirê, wek [u] derdixe.

Lê hin zimanzan giringiyê didin ne tenê zar û esmank, lêbelê **şeweya vebûna lêvan**, ji ber ku ti girtin yan xişên navbera wan de çênabê.

dev	pêşîka zar	paşîka zar
-----	------------	------------

³⁷- Wêne ji pertûka Peter Rouch, *English phonetics and phonology, a practical course*, wergêr Xalid Hedad bi zimanê Arabî, rûpel 17

³⁸ dengdêrên pêşîk (front)

³⁹ dengdêrên navîk (central)

⁴⁰ dengdêrên paşîk (back)

girtî (closed)	i:	û
vekirî (open)	œ	a


Inca, di dengkirin û sazkirina dengdêran de, **lêv û zar** roleke mezin dibîne. bo nimûne, dema dengê [û] saz dibe, du endam şeweyeke taybet distênin, ew jî lêv û zar in⁴¹:

1) Zar ji hersê aliyên xwe ve pêşîk û navîk û paşîk (ku rûwê jorî yê zar in) ku hin car wek (pišta zar) bikar hatiye, yan (banikê zar), bilind dibe, yan nizim dibe li gor her dengdêrekî.

2) Ew valayiya navbera rûwê zar û esmankê dev di dengkirina dengdêran de wek hev nayê, bo nimûne, di dengkirina dengê [î] de pišta zar bilind dibe û nêzîkî esmank dibe. Belê di dengkirina dengê [a] de valayî navbera zar û esmank gelek dibe.

3) Dev û lêv girover dibe, lewre ji dengdêrên wilo re girover(round)⁴² yan bazinkî dibêjin.

4) Ya dîtir zar bi paş ve diçê, ku jêre paşîk⁴³ dibêjin. Wênenexşa (4) dabeşkirina dengdêrên Kurdî didê xuyakirin⁴⁴



- Di dengkirina dengê [î] de dev qîç dibe, ango (spread), û zar jî bi pêşve diçê ku ev bar jêre (pêşîk)⁴⁵ tê gotin ango ev deng bi pêşîka zar, û qîçbûna lêvan tê wesifdan.

- Di dengkirina dengê [î] û [û] de, zar nêzîkî esmank dibe.

- Di dengkirina dengê [a] de, dev bi ferehî ji hev vedibe, û jêre dibêjin **ferewan**

- Di dengkirina dengdêran de, esmankê nerim (paş-esmank) bilind dibe, yan nizim dibe dema ku dengdêr dibin bêvlok, ku ev diyarde di zimanê Frensî de heye.

- Giroverbûna lêvan (lip-rounding) yek ji durvên sazkirina dengên dengdêr e, lê hin dengên dengdar jî vî barî distênê wek dengê [w]⁴⁶

⁴¹ Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 79)

⁴² girover (round)

⁴³ Paşîk – back

⁴⁴ Ji pertûka Fonetîk ya Xazî Fatihh Weys, Bexda, 1984, rûpel 66

⁴⁵ pêşîk front

• **Radeya vebûna dev (kortika dev)** û valayiya nav dev de, çiqasî fereh e û çiqasî teng e, ku ev bi xwe hemecoriya nav dengên dengdêr de drust dike. Radeya vekirinê bi livîna zar ya stûnî ve bend e, ango ew pentayî (distance *مسافة*) yan ew valayiya navbera esmank û banikê zar. Inca dengdêr di piraniya zimanê cîhanê de li ser çar radeyên vebûnê têne dabeşkirin, çiqas fereh e û çiqas teng e, ku ev jî dibe sîfetek ji dengdêran re⁴⁷:

1. **Dengdêrên girtî** (close) mebest jê valabûn navbera zar û pêş-esmank hinekî teng e.
2. **Dengdêrên nîvgirtî** (half close) mebest jê valabûn navbera zar û pêş-esmank ji ya dengdêrên girtî pirtir e
3. **Dengdêrên vekirî** (open), mebest jê valabûn navbera zar û esmank fere ye.
4. **Dengdêrên nîvvekirî** (half open) mebest jê valabûn navbera zar û esmank ji ya dengdêrên vekirî kêmtir e

Lê hember vê yekê hin bîrûrayên têvel hene ku vê dabeşkirinê sazkar û hûrbîn nabînin, ji ber ku vekirina dev ji zimanekî ta zimanekî, ji mirovekî ta mirovekî dîtir di heman ziman de ne wek hev tê, ev jî li fîzyolojiya cîhazê axaftinê li nik axêver vedigerê û ligor şêwezare jîngeha civakî ku mirov tê de mezin bûye û xwedî bûye.

• **Maweya dirêjbûn û kurtbûna deng**

Dirêjbûn û kurtbûna deng dibe hokarek di cudakirina dengdêran de li nik hin ziman, wek em bêjin dengê [î]ya dirêj û dengê [i]ya kurt di herdû peyvên (mîr) û (mir); (sîr) û (sir); (fîr) û (fir), helbet bi seda peyvên wilo hene ku her yek ji wan watayeke nû dîtir didê û ciyawaze ji ya dîtir. Wilo jî dengê [û] û [u] ek peyvên (kûr) û (kur). Lê eva han hin car û di hin peyvên taybetî de nabê hokarê cudakirinê navbera peyvan de, wek em bêjin (kû) yan (ku) her yek wata didê. Inca mawe nabê sîmeteke cudakar di hemî zimanan de.

• **Sêkuçika Dengdêran**


Hin zimanzan dabeşkirina peregrafa bûrî hesanîtir dikin, ango li şûna çar rehendan dikin sê rehend, her ev jî jêre dibêjin sêkuçika dengdêran, yan sêkuçika bincî/ serekî, ji ber ku sê dengdêrên serekî⁴⁸ tê de tîn, û dibin bîngeha dabeşkirina dengdêran di piraniya zimanên cîhanê de, ew jî ev in: ser (fethhe) [e], bor(demme) [u], jêr(kesra) [i], ku di vê

⁴⁶ Heman sereçaviya bûrî (rûpel 101)

⁴⁷ Mareo Pie (1998): Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 79-80)

⁴⁸ dengdêrên serekî ango cardinal vowels bi Englîzî.

wêneya xwarê de diyar dibe, min jî li gor boçûna xwe wêneya vawelên Kurdî rêkxist ku ew jî ev e:



Herweha hin ziman hene ji van hersê dengdêran pêve di wan de nîne, wek zimanê Arebî û zimanê Eskîmo, û Arebî pişt bi maweya deng girê didê bo cudakirina navbera van dengdêran: dengdêrên kurt û dengdêrên dirêj. Ya dîtir jî dema tê gotin ku piraniya zimanên cîhanê di vê sêkuçûkê de beşdarin her wê mebestê didê ku ev şeweya herî nêzîke navbera van zimanan de, belê her zimanek sîstima dengdêrî bi awakî têvel pêktênê, bo nimûne dengê [i] di Kurdî de ne wek ku di Arebî de tê, û her ev jî ne wek ku di Fransî de tê.

Destnîşankirina taybetiyên dengdêran:

Sêkuçika dengdêran ji aliyê sazgeh û radeya vebûnê ev in⁴⁹:

dengdêrê [i]ya kurt û pêşik û teng û serhevdeçûyî.

dengdêrê [u]ya kurt û paşik û girtî û girover

dengdêrê [e]ya kurt û navîk û vekirî

wêne 6 barê zar/zar di dev de didê xuyakirin⁵⁰:



wêne 6 vawelên kurt /i/ /u/ /e/

⁴⁹ Mareo Pie (1998): Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 79-80)

⁵⁰ Wêne 15 ji ber pertûka Besam Berekê bi navê feonetika giştî bi Arebî, rûpel 80

1.3.2. Wesfdana Dengdêrên Kurdî

Yekem: Dengdêrên Kurdî li gor dirêjahî û kurtiya wan dibine du girûp:

Pênc dirêj in: [a], [ê], [o], [û], [î]

sisê kurt in: [e], [i], [u].

Duyem: Dengdêrên Kurdî yên dirêj

[a]: zar ji paşîk ve bilind dibe û ber bi xwarê ve nizim dibe

[î]: sazgeha wê li pêşîka zar tê ber bi paşve dilive

[ê]: sazgeha wê li pêşîka zar tê dema ku zar li naverastê ye

[û]: li paşîka zar saz dibe dema ku zar berew pêşve diçê. Ev deng li devera Badînan wek diftongê [wî] diyar dibe ku lêv şeweya moçkirî (girover) digirê.

[o]: Ev dengdêr li paşîka zar tê bi awayê ku zar ber bi xwarê digel pişkdariya esmankê nerim deng saz dibe, yan jî zar li naverastê ye digel pişkdariya esmankê dev.

Sêyem: Dengdêrên kurt sisê ne:

[e]: degekî kurt e, li navîka zar derdikeve, zar ne bilind e û ne nizim e

[i]: dengdêrekî kurt e, sazgeha wê li navîka zar e, dema ku zar li naverastê. Li dawiya peyvê kêr diyar dibe jibîlî hin peyvên daçek wek (li, bi, di, ji).


[u] sazgeha wê li navîka zar e, lê lêv şeweya moçkirinê (rounded) distênê. Ev deng ne di pêşîya peyvê de tê, ne jî di dawî de tê.

Çarem: Xazî Weys li gor ger û liva zar di dev de dengdêrên Kurdî dike du grûp û weha dabeş dike:

1) [i], [î], [ê], [e] bi pêşîka zar drust dibin

2) [a], [o], [u], [û] bi paşîka zar drust dibin⁵¹.

Dabeşkirina dengdêran di vê nexşê jêrîn de diyar dibe (Xazî Weys)⁵²



⁵¹ Xazî Weys (rup 66)

⁵² Xazî Weys (rup 66)

1.3.3 Dengên Nîvdengdêr (nîvçevawel) [y], [w]_(semivowel)

Cihê sazbûna van herdû dangan di dev de weha tê ku zar dihingivê esmankê dev bi awakî xişikandin tê de çê dibe, her wilo jî dibe nêzîkî dengên dengdarên xişok. Wilo dengê [y] drust dibe, û dema zar dihingivê zimanok dengê [w] derdikeve. Em jibîr nekin ku herdû lêv di derxistina dengê [y] de ji hev dûr in, lê di ya [w] de girover in⁵³.

	şêweya herdû lêvan	cihê axaftina deng
[y]	ji hev dûr in	pêş-esmank
[w]	girover in	zimanokê

Ev herdû deng ji aliyê dengsazî ve li ser dengdêran tete jimartin, lê ji aliyê dengrêsiya fonolojî ve dikeve ber dengdaran de. Lewra di beşê bê de emê taybetiya wan a fonolojî destnîşan bikin.

1.3.4. Zodenga dengdêr a rasteqîne[ui]

Di piraniya devokên (Badînan û Botan û Koçeran) de zodenga [-ui] li şûna dengê sade yê dirêj [û] bi piranî bikar tê, ev zodeng gelek nêzîkayî li zodenga zimanê Fransî dike, wek:

bûk buîk

dû = duî

rû = ruî

mû = muî

nû = nuî

Di baweriya min de ev zodeng [ui] ya herî rast û drust e, ku lêv bi pêş de diçe û girover dibe û paşîka zar li gel paş-esmank nêzîk dibe ta ku deng derdikeve, wilo ev deng dikeve ber dengên dengdêr de, ji ber sedemên fonolojî min weha baş dît ku lêkdana vê zodengê bi alîkariya dengdêra [u] be, ne [w] be, û bi dû de dengê dengdêrê [î] ku herdû pevra werin bi şêweya [ui] drust e.

⁵³ Besam Bereke, zanista dengsaziya giştî (ilim Al-Eswatil Amm), rupel 92, bi Arebî

Birr IV 1.4. Dengdar

Dengên dengdar roleke giring û berfere di bunyata ziman de dibînin, lewra, bo destnîşankirina wan hindêk faktor tê de rola xwe dibînin ku zimanzan wan bixê pîver, ku ew jî ev in:

- 1) Sazgeha derbirrîna deng, (devkî, bêvilok, lêvkî, gewrî, ...htd.)
- 2) Şeweya derbirrîna deng (tewjimok, westaw, xişok ...tad)
- 3) Derçûna hewayê bitegere (dengdar) yan bêtegere (dengdêr)
- 4) Girrûkiya deng di lerînsazî de (voicing)

1.4.1. Taybetmendiya Organîkî ya Dengdaran

Ziman di bunyata xweyî fîzîkî de deng in, lê ne ku çî dengê be, yan jî ku werê, wek dengên ziman tene jimartin. Dengên ziman bi xwe şeweyeke taybetî jî wê hewayê ku jî sîpelk/pişika mirovan derdikeve û di boriya hewayê re derbas dibe ta ku deng durvekî xweyî taybetî bistênê, bi rê de her dengê pêrgî hin endaman dibe ku dibe egera drustbûna wî dengî, ev endam jî evin: yan du deste masûlke ku jêre tîlên dengî dibêjin, yan jî hewa dema ku di qirikê de derbas dibe pêrgî zimanbiçûk dibe, yan jî rexek jî zar (dawî, naverast, serî digihê esmank (pêş-esmank, paş-esmank), yan zar û pidû, yan zar û dinan, yan lêv dinan, yan jî tiştêk jî van endaman nagihin hev, ango hewa bi hesanî jî pişikê derdikeve û derbasî dev dibe, lê berî ku jî dev derkevê, herdû lêv şeweyeke taybetî drust dikin, ku jî hev vedibin, belê vekirina lêvan heye lêva jor û jêr nêzîkî hev bin, wek nîvvekirin bê, û heye dûrî hev bin. Ev şewe vekirin dengêkî xweyî taybetî drust dike, wek em bêjin drustkirina dengê dengdêrê [î] ku vekirina herdû lêvan ne wek ya barê dengê [a] ye. Weha jî dengên dîtir ya dengdêr, wek: [û], [u], [e], [i],[ê], [o]. Dengên ziman wek [s], [m], [h], [î]...htd her yek yan her hinek jî cihekî taybetî derdikevin ku endamên dengkirinê beşdariya sazkirina wan dangan dikin. Ji van derên ku deng tê de saz dibin jêre **sazgeha** dengên ziman (point of articulation) tê gotin. Sînorên sazkirina dangan di navbera du sazgehên serekî de ye: **qirik û lêv**.

Dengên dengdar wek me berî niha da xuyakirin ku hewa di cihê derxistinê deng de şeweyeke taybetî distênê bi awakî ku tegerek yan kospekdikeye pêşiya hewayê de, mebest ew e ku ew cih yan ew derû yan ew qula ku ba tê re dertê hinekî teng dibe bi awakî ku deng tewjimokî yan xişokî yan bêvilokî dertê. Zimanzanê Fransî Martînê jî dengên [k] û [g] re dengdarên banekî dibêjê, yê ku bi alîkariya piştê zar ligel esmankê nerim saz dibin,

lewre ji wan re (banekî – dorsal) dibejê. Ev ciyawazî ne tenê li nik Kurdan heye, lêbelê li nik zimanzan û dengsazê cîhanê jî heye, ku ji nik wan hatiye ba me. Helbet ti şaşî ji aliyê zanyarî ve di vê neyeksaniya navbera zimanzanan de nîne, tenê her rola endamekî yan organekî didê xuyakirin. Ez vê yekê dibejim da ku xwêner yan lêkol haya wî ji vê yekê hebê, û nekevê şaşîyan de. Inca di sazkirina dengên ziman de du organ tê de beşdar dibin wek di van dengên jêr de di zimanê Kurdî de:

- 1) Serê zar ligel pidûwan dikeve, dengê [t] û [d] drust dike.
- 2) Navîka zar ligel pêş-esmank (esmankê req), dengê [ç] û [ç] drust dikin.
- 3) Dawiya zar ligel paş-esmank (esmankê nerim), dengê [k] û [g] çêdibe.
- 4) lêv di çêkirina dengên [b], [p], [m] û [w] de beşdar in.
- 5) Lêva xwarê ligel diranên jor dengên [f] û [v] çêdikin.

1.4.2. Dabeşkirina Dengdaran ligor Sazgeha dengkirinê (a place of articulation) bi du hokaran tê destnîşankirin: ew jî bizoz (aktîv) û (pasîv), bo nimûne lêva jêrî çalak digihê lêva jorî ya ku mend e, inca dengekî wek [m] didê, jêre (dulêvî) dibêjin, yan jî digihê diranê jor dengê [f] didê û jêre lêvûdirankî⁵⁴. Zimanzan dengdaran li ser pênc sazgehên (dengsazderên) bizoz yê bingehîn⁵⁵ dabeş dikin, ew jî ev in⁵⁶:

1. Dengdarên lêvkî [p, b, m, w]
2. Dengdarên pêşîka zar [d, t, c, ç, z, j, s, ş, l, l̥, n, r, f]
3. Dengdarên banekî ku ew jî cihê navîk û paşîka zar digirê ku jêre bi Englîzî "dorsal consonants", dibêjin, wek dengên [g], [k]
4. dengdarên qirikî "laryngeal dengdars". Wek dengên [h] û [ʕ]
5. Dengdarên pidûkî, ku sazgeha wan pidû ye, wek dengên [n, t, d, s, z, l]

Sazgehên Dengdarên Kurdî

Di baweriya min de, em dikarin sazgehên bingehîn bo dengdarên zimanê Kurdî bi awayê jêrîn wesf bikin:

1. **Lêvkî**: sazgeha deng dikeve navbera herdû lêvan de: [b, p, m, w]
2. **Lêvdirankî**: sazgeha deng dikeve navbera lêva xwarê û diranê banî. Dengên [v, f] tê de tên.


⁵⁴ Marcus Kracht Introduction to Linguistics, Department of Linguistics, UCLA, 3125 Campbell Hall, 450 Hilgard Avenue, Los Angeles, CA 90095–1543. kracht@humnet.ucla.edu (rup 16-19)

⁵⁵ (five basic active articulators)

⁵⁶ Heman serekaniya bûrî


3. **Diran-pidûkî** : navbera pêşiya zar û diranên jor û pidûan: dengên [t, ʈ, d, ɖ, z, ź, s, ś, n, r, ř, l] tê de tên.
4. **Pêş-esmankî**: navbera parçê nivî yê zar û esmankê hişk û paş piduwan dengên [c, ɟ, ʃ, j, ʎ, y] tê de tên.
5. **Paş-esmankî**: navbera dawiya zar û esmankê nerim dengên [k, g, x, ɣ] tê de tên.
6. **Zimanokî**: navbera dawiya zar û zimanok (zimanbiçûk) dengê [q] tê de tê.
7. **Gewrî**: Navbera qurmê zar û dawiya gewriyê: dengên [ħ , ʕ]
8. **Qirikî yan jêyî** (glottal): Navbera pêkhênerên qirikê de: [h, ʕ]
9. **Dengên bêvilok**, wek dengên [m , n, ŋ] ku zimanbiçûk bi xwar de dadikeve da ku hewa bikarê di bêvilê re derbas bibe (ev bi xwe ji aliyê teknîkî ve wek sazgeh tê jimartin, lê bi awakî giştî wek şeweya dengkirinê tê jimartin⁵⁷.
10. **Dengên rexekî/layî**: Bo dengkirina dengên rexekî, hewa di aliyên zar û dirana ve derbas dibe pirtir ku ji serê zar ve tê. Zimanin hene ku yek dengê layî [l] tê de diyar dibe, û hinên dîtir hene ku ji yekî pirtir in, wek Espanî "l" û "ļ"; di Hindî de dengên rexekî yên diran û esmank hene. Hin zimanên Qefqasî pênc yan şeş dengdarên layî hene

Wêneyên sazgeha dengdaran bi awakî giştî⁵⁸ ev in:



⁵⁷Marcus Kracht Introduction to Linguistics, Department of Linguistics, UCLA, 3125 Campbell Hall, 450 Hilgard Avenue, Los Angeles. (rup 16-19)

⁵⁸Wêneyên sazgeha deng ji petûka Besam Berekê, ilim eleswat el-am, Beyrût, lebanan.



1.4.3. Navlêkirina Sazgehên Dengdaran

Di destnîşankirina sazgehên deng de, zimanzan ne wek hev li kêşeyê dinerin, her yek giringiyê didê endamekî ji endamê sazkerinê û bi navê wî endamî hevalnav li deng dike. Lewre, di xwendina fonetîk de mirov pêrgî gelek têrman dibe, ku hincar eva han dibe sedema sergêjiyê û têngihiştinê, bi taybetî ji xwênerên sava re, yan xwênerên nepispor. Bo nimûne, têrima dengdarên banekî⁵⁹ li nik zimanzanê binavûdeng Martînê derdikeve, lê ev têrim li nik hin zimanzanên dîtir dernakevê. Dengdarên banekî ew deng in ku bi alîkariya piştî zar saz dibin, wek (k, g) ku ji wan re (banekî – dorsal) dibêjin, ango derketina deng ji paşîka zar ber bi esmankê dev ve. Di van dengdaran de du celeb hene:

- 1) celebek bi alîkariya pêşîka zar saz dibin,
- 2) û celebek bi alîkariya paşîka zar derdikevin.

Dengdarên serê zar⁶⁰ her yek li gor sazgeha drustkirina deng nav lê tê kirin, ev celeb heye ku serê zar bilind bibe û bihingivê diranên jor⁶¹, wek deng [t] di peyva Kurdî (tak) de, yan jî ji wan re bi Arebî نطعية أسلية tê gotin, ango serê zar bilind dibe û dihingivê pidûwên diranên jor⁶², wek dengê [t̤]êya stûr ya peyva tîr (pîvazên tîr), yan (tenî) bi zarê Aşîtan di Kurdî de, yan di peyva Englîzî (touch) de, yan di peyva Arebî (طال) . Herweha dengê [s] dengê banekî ye ku piştî zar dihingivê pidûwan. Dengê [g] / [ġ] di peyva Arebî (غرب) de sazgeha wê ew e piştî zar dihingivê zimanokê (zimanbiçûk). Dengine dîtir hene ji wan re (fîkedar⁶³) dibêjin, wek (s, z, ş, c) ku her ev jî ji celebên dengên xişok in⁶⁴.

⁵⁹dengdarên pişteki (dorsal dengdar –ji peyva "dorsum" a Latîni hatiye)

⁶⁰Dengdarên serê ziman

⁶¹serê ziman bilind bibê û bihingivê diranên jor

⁶² yan jî serê ziman bilind dibe û dihingivê pidûwên diranên jor ûji wan re bi Arebî نطعية أسلية gotin

⁶³Dengên fîkedar

⁶⁴Di vê peregrafê de vegere pertûka Martînê bi zimanê Arebî hatiye wergerandin

Her dengek ta dertê pirtir ji endamekî tê de beşdar dibe, lewre jî zimanzan, wek me berî niha jî got, di navlêkirina sazgeha deng de ne yek in, bo nimûne dengên [d], [t], [n] li ba zimanzanekî dirankî hatine, û li ba zimanzanekî dîtir **zimankî**. Lê bi rastî sazgeha dengên wek [d], [t], [n] ne tenê diran beşdariyê tê de dike, pêşîka zar jî rola xwe ligel diranan tê de dibîne, ango du organ/endam, bi kêmanî, di sazkirina deng de beşdar in. Vêca hin zimanzan navê yek endamî bitenê didin, nemaze, ku her yek giringiyê didê endamekî û navlêkirin bi vî endamî (organî) tê, bo nimûne, hin zimanzan, wek: Dr. Wurya Emîn⁶⁵ ku di lêkolîna wî de û di cedwela wî de weha hatiye ku sazgeha dengdarên [d], [t], [n] diran e, bo wilo jêre dirankî wek nav lêkiriye. Ji alîkî din, em dibînin vaye hin zimanzanên Kurd jî lipêka yên cîhanî têrimên weha dideynin, ku xwêner tûşî hin tevlihevî dibe, nemaze ew xwênerê pisporiya wî di vî babetî de kêm e, yan nîne. Ez bi xwe vê diyardeya han vedigerênim du tiştan: siruşt drustkirina sazgeha deng ku du organ tê de beşdar in, inca anîna du organan di yek têrimî de, hin dirêjî didê zarawe, lewre zimanzan navê yek organî bikar tênê, lewre ciyawazî tê meydanê. Xazî Fatîh Weys dengdarên [d, t, z, s, l, n, r, f]⁶⁶ dirankî didê qelem û di cedwela wî de tên. Lê heman dengên Weys li nik *Dektor Ewrehmanî Hacî Marîf*⁶⁷ derdikevin di nav vê girûpa han de, ew jî ev in: [d, t, c, ç, z, j, s, ş, l, ʎ, n, r, f] di bin navê zuwanekî – pêşî hatiye. Baş e ev deng li ba yekî dirankî tê gotin, û li ba yekî dîtir zimankî tê.

Têbîniyeke dîtir heye, ew jî sazgeha dengên [q] [x] [g̃] [h] [h̃] li gor ku li nik sê zimanzanên Kurd hatiye: Ewrehman Hacî Marîf û Xazî Weys, û Wurya Emîn wek ku di berhemên xwe de dane xuya kirin, min jî ew yek di vê cedwela jêrîn de kom kirine bo ku em wan sazgehan bidin berhev, ku ew jî ev e:

Ewrehman	Xazî Weys	Wurya Emîn
1. lêwekî (labial) dulêvî: b, p, w, m	lêwî: b, p, w, m, f, v	lêwî (<i>bi-labial</i>) b, p, w, m
- danelêv f, v		lêwdanî (<i>labio-dental</i>) f, v
2. zuwanekî:	danî: d, t, z, s, l, n, r, f	didanî <i>dental</i> d, t, n
- pêşî: d, t, c, ç, z, j, s, ş, l, ʎ, n, r, f	melaşûyî (req): paş- esmanî c, ç, j, ş, ʎ, y	pûkî (الطوي <i>alveolar</i>) z, s, c, ç, l, ʎ, r, f

⁶⁵Wurya Umer Emîn, (Kurdî)Fonetîk û Fonolojî, govarî Korî Zanyarî Kurd, bergî bîstem, rûpel 348

⁶⁶Xazî Fatîh Weys, Fonetîk, rûpel 60

⁶⁷Dektor Ewrehmanî Hacî Arîf, zimani kurdî leber roşnayî fonetîk de, Bexda, 1976, rûpel 40

- nîvî y - dawî k, g	melaşûyî (nerim): pêş- esmankî g, k, ĝ, x	pûkemelaşûyî (<i>Palatal-alveolar</i>) <i>pidû-esmankî j, ş, y</i>
3. qirikî (glottal): q, x, ĝ, h, ĥ, ɸ	zimanebiçkole (uvula) q	nermemelaşûyî (<i>velar</i> <i>طبيقي</i>) g, k zimanokoyî (uveolar) q, x,
	qirikî ĥ, h	gerûyî (<i>pharynga</i>) l: ĥ, ɸ
		jêyî (<i>glottal</i>) h

1.4.4. Dabeşkirina Dengdarên Kurdî ligor Sazgehên Deng

Sazgeh bi 29 dengdarên xwe ve yên zimanê Kurdî, ligel hersê zirrdengan, li gor vê lêkolînê hatine. Emê ji organên pêşî ku lêv e despê dikin ta digihê organên herî jêr ku qirik e, ew jî weha tê:

1. dulêvî: [b], [p], [m], [w]
2. lêvûdiranî: [v], [f]
3. diranî: [d], [t], [n]
4. pidûkî: [z], [s], [r], [ʃ]
5. pidû-esmankî: [c], [ç] [j], [ʃ]
6. pêş-esmankî: [l], [l̥], [y]
7. paş-esmank⁶⁸: [x], [ĝ], [g], [k]
8. zimanokî: [q]
9. gerûyî /gewrî: [ɸ], [ĥ]
10. qirikî/ jêyî: [ə], [h]

1.4.5. Hin zimanzan wek Ewrehmanî Hacî Marif dengdarên Kurdî bi ser lêv û zar û qirikê ve dabeş dike, ku ew jî ev in:

1. Rola lêvê: [b], [p], [m], [w] [v], [f]
2. Rola zar: Zar roleke çalak I derbirrîna dengên ziman de, k ligor livîna zar ji pêşîka zar yan navîka zar yan paşîk, ku bi vî awayî dabeş dibin:
 - A. Pêşîka zar: [d, t, c, ç, z, ş, l, l̥, n, r, f]
 - B. Navîka zar: [y]

⁶⁸*Paşpehnik: melaşûyî nerm*

C. Paşîka zar: [k, g]

3. Rola qirikê : [q, x, ĝ, h, h̄, ɸ]

Birrê V 1.5. Dengdar û Taybetmendiyan Fîzîkî

(Ligor Şêweya derbirrîna dengan di dengkirinê) (Mode of Articulation):

Dengên ziman têne dabeşkirin **ligor şêweya derbirrînê**, şêweya dengkirina dengan, ango ew awayê ku hewa tê de derbas dibe ji sîpelkan ta derve. Bo nimûne, hinek deng weha derdikevin ku rêjgeha hewayê di cihekî de tê girtin û ji nişkêve vedibe, deng wilo bi teqînî derdikeve, lewre ji van dengan re (teqiyok)⁶⁹ tê gotin. Birrek dengdarên dîtir hene awayê derketina wan wa ye ku rêjgeha hewayê teng dibe û hewa di wî cihê de xişokî jê derdikeve, ango bixişan e, lewre ji van dengdan re (xişok) dibêjin. Inca emê dengên zimanê Kurdî ligor şêweya derbirrînê dabeş bikin:

Sê Şêweyên Bingehî bo dengan

Sê şêweyên bingehî (Basic sounds: buzz, hiss, and pop) ji dengan di cîhazê axaftina mirovan de hene ku roleke mezin di axaftinê de dibînin:

(1.) Guvêna hejandin û lerîna dengejêyan di qirikê de ku jêre (laryngeal buzz) tê gotin. Sazgeha qirikê û dengejêyan roleke giring di şêweya drustkirina deng de dibîne, nemaze ku hin taybetiyên deng saz dike, wek radeya bilindbûn û girrûkipiya deng, dema ku dengejê dihejin deng girr dibe wek dengê [b], lê dema ku dengejê nahejin deng kip dibe wek [p]. ev bi xwe taybetiyek e di destnîşankirina dengên ziman de, bo nimûne li van dengên jêr :

kip (voiceless)	girr (voiced)
S	z
F	v
P	b

Eger mirov destê xwe danê ser gûzeka qirka xwe, dê bi wê lerîna ku di dengê [z] de ye, hest pê bikê, lê di [s] de hest pê nakê. Wilo jî ev lerîn di dengên bêvilok de wek [m, n] de heye û di hemî dengên dengdêr de wek [a]

Ciyawaziyeke dîtir navbera dengê [p] û dengê [b] de heye. Yê pêşî tewjima hewayê xurt e ku jêre (aspiration) dibêjin, lê yê duwa deng bê tewjim û pûfên drust dibe.

⁶⁹ Nivîserên Soran ji van dengan re (teqîw) dibêjin, lê ez navê (teqiyok – plosive) lê dikim.

(2.) **Hisîna hewayê ku di sazgeheke tesk de dibûrê.** (The hiss of turbulent flow)
 Jêdereke dîtir ji deng e heye ku rêjgeha hewayê teng dibe û hewa bi şêweyekê derdiçê ku xişên tê de saz dibe, ango hewa bi rewanî derbas nabê, di sazgehê de du endam nêzîkî hev dibin ta radekê ku hewa bi xişênî (friction) tê de derbas dibe, lewre ji van dengan re **xişok** (fricatives) dibêjin, wek nimûne dengên [f] [v] [s] [z] [ʃ] ...htd.

(3.) **Veteqiyok**⁷⁰ (The pop of closure and release)

Di piroseya peyvîna hin deng de core asêbûnek (constriction) yan reng guvaştinek li cihekî di endamên (organên) peyvînê de çêdibe, ku hewa nikarê jê derbas bibe û axêver jî li ser berdana hewayê berdewam e. Di vir de palpestin (pressure) li ser aliyê paş yê cihê asêkirî drust dibe. Eger asêbûn ji nişkave vebû, core veteqînek di berdana deng de drust dibe, ku em dikarin jêre navê (veteqîn) lê bikin, inca, ew dengên ku bi vî awayî dertên em dikarin ji wan re (veteqiyok) bêjin. Dengnas vê diyardeya han ya dergirtin û vekirina jinişka di piroseya dengsazkirinê de jêre (focusing on the closure) dibêjin. Di piroseya lêkxişanê de dengveteqîn di gelek cihên cîhazê peyvînê de çê dibe, bigire ji lêvan ta qirikê. Sê nimûneyên bernas (common) hene, ew jî ev in: [p], [t], [k]

1.5.1. Dabeşkirina dengdarên Kurdî li pêka Awayê Dengkirinê:

- Piştî ku me aliyê fîzîkî di derbirrîna dengên dengdar de da xuyakirin emê dabeşkirina wan di zimanê Kurdî de li pêka awayê wan taybetmendiyên saz bikin, ku ew jî bi şêweyêke giştî dibine çar beş:

I. dengdarên kospek[westaw/teqîw/peqînkî ku dibine du birr, devkî û bêvlok

II. dengdarên xişok/xişedar

III. *dengên bêxişan /şkandek, şikawe):* [c], [ç]

IV. *dengên zirîngok (resonant):* A. bêvilok B. lerok (*vibrant*).

I. Dengdarên kospek/westaw/teqîw /teqiyok/peqînkî

Ji wan dengan re kospek yan teqîw yan westaw dibêjin ji ber girtina cihê hewa tê de derbas dibe çî herdû lêv bin wek dengê [p], [b], yan serê zar û pidû ku [t], [d] didin, dawiya zar û paş-esmank (esmankê nerim) ku [k], [g], yan dawiya zar û zimanok ku dengê [q] dertê, wilo jî girtina zengelorê/qirikê ku dengê hemza[ə]dertê. Inca emê werin ser van dengdarên kospekên Kurdî ku dibine du birr, devkî û bêvlok:

A. Dengdarên kospekên devkî

Di vî barî de dawiya esmankê nerim ku zimanok tê bilind dibe bi awakî ku dergehê hewayê tê girtin li pêşiya riya diçê bêvilê bo ku hewa tenê di dev re derbas bibe ku ji wan dengên kospekên dev re dibêjin (oral sound), dengên zarî yan devokî. Lê dema zimanok

⁷⁰ Min ev têrim (teqiyok) bikar anî li pîvana tewjimok

dakevê ango nizim bibe, dergehê hewayê li ber qula dev tê girtin û hewa tenê di bêvilê re derbas dibe ku ji van dengan re dengên bêvilok (nasal sound) dibêjin,. Niha emê dengên kospekên dev bo we diyar bikin:

Dengê [b], [p]

Dema dengê [b] tê gotin/dengkirin, herdû lêv bi ser hev de tên û ew hewa ji sîpelkan derdikeve bi tewawî radiwestê û ji nişkêve herdû lêv ji ser hev radibin û hewa derdikeve û diteqê, lewre teqîw(plosive), û westaw(stop) ji dengên weha re dibêjin. Belê herdû dengejêyên zengelorê/qirikê dilerizin û dihejin, inca bi vî awayî dengê [b] destnîşan dibe:**[b]dengdar, girr, kospek, dulêvî**

Dengê [p] ku dengêkî kip e, beramberî dengê [b] radiwestê ku dengêkî girr e, her ev sîma ciyawaziyê navbera [b] û [p] de didê xuyakirin û taybetiya fonemî didê dengê [p] ku ev deng di zimanê Arebî de şêwedeng (allophone) e, û nabê fonem.

Sîrovekirina dengên kospek weha tê:

- [p] dengdar, kip, kospek, dulêvî, nestûr(nerim)**
- [p̥] dengdar, kip, kospek, dulêvî, stûr**
- [t] dengdar, kip, kospek, serê zar û pidû, nestûr**
- [t̥] dengdar, kip, kospek, serê zar û pidû, stûr**
- [d] dengdar, girr, kospek, serê zar û pidû, nestûr**
- [d̥] dengdar, girr, kospek, serê zar û pidû, stûr**
- [k] dengdar, kip, kospek, dawiya zar û esmank, nerim**
- [k̥] dengdar, kip, kospek, dawiya zar û esmank, hişk⁷¹**
- [g] dengdar, girr, kospek, dawiya zar û esmank, normal**
- [q] dengdar, kip, kospek, dawiya zar û zimanok, normal**
- [ɣ] dengdar, ne girr û ne kip, kospek, qirikî**

B. Dengdarên kospekên bêvilok

- [m] dengdar, girr, kospek, dulêvî, bêvilok**
- [n] dengdar, girr, kospek, pidûkî, bêvilok**

II. dengdarên xişok û rewan

⁷¹ Wek yasayeke fonolojî di zarê Soranî de dengê /k/ û /g/ dibe wek dengê /ç/ û /c/ dema ku dengdêrê /ê/ bi dû wan de werê , (Before front vowels /k/ and /g/ become front palatal). Di beşê fonolojî de emê vê yekê diyar bikin.

Ji wan dengan re xişok dibêjin yên ku hewa di cokeke teng de dibûrê bi awakî ku xişokiya deng derdikeve eger xurt be, lê dema ku hewa bi nermî tê re bibûre deng bi rewaneyî tete der.

xişok	girr		v		z	j	ĝ	ç	
xişedar	Kip		f		s	ş	x	ĥ	h
<i>fricative</i>									

Zimanzan sazgeha dengên xişok bi vî rengî wesf didin:

1. Lêva xwarê/jêr û diranên jor wek dengê [f], [v]
2. Diran dengên [ث] û [ذ] di Kurdî de nîne, ji bilî hin zarav yan devok
3. Banikê zar ji pêşve ku du celeb deng tên:
 - A) Dengên fîkedarê pidûkî, ku serê zar nêzîkî piduwên jor dibe û du dengên [s] û [z] didê, lê dengê [ş] ji heman sazgehê derdikeve lê zar bi paşve dikişê û nêzîkî esmankê nerim dibe û wilo deng [s] stûr dibe .
 - B) Pêşîka zar nêzîkî pidûwê jor û esmankê req dibe ku dengên [ş], [j] didê.
3. Bankê zar ji paşve ligel zimanok: dengên [x], [ĝ][ç][ğ]
 - A) Gewriyê: [ĥ][ç][ĥ] , [ç]
 - B) Zengelorkî, dengejêyî/qirikî: [h], [ə]

[f] dengdar, kip, xişok, lêvdirankî

[v] dengdar, girr, xişok, lêvdirankî

[s] dengdar, kip, xişok, fîkedar, pidûkî

[ş] dengdar, kip, xişok, fîkedar, pidûkî, stûr

[z] dengdar, girr, xişok, fîkedar, pidûkî

[ž] dengdar, girr, xişok, fîkedar, pidûkî, stûr

[ş] dengdar, kip, xişok, pidûkî-esmankî

[j] dengdar, girr, xişok, pidûkî-esmankî

[x] dengdar, kip, xişok, zimanokeyî

[ĝ] dengdar, girr, xişok, zimanokeyî

[ĥ] dengdar, kip, xişok, gewrî

[ç] dengdar, girr, xişok, gewrî

[h] dengdar, kip, xişok, zengelorkî

III. Dengên şikawe (*affricate*) ango xişan tê de dişkê

Sê deng in: [c], [ç], [č] wek sazgeha dengê [ş]e, belê ev deng lêkdayî ne, ango di şeweya derbirrîne de xişok û teqîw] tewjimok in: [c], [ç], [č]

[c] dengdar, girr, şkestî, pidûkî-esmankî

[ç] dengdar, kip, şkestî, pidûkî-esmankî, nerm

[č] dengdar, kip, şkestî, pidûkî-esmankî, hişk

IV. Dengên zirîngok (*resonant*) sê celeb in: bêvilok, lerok, layî

A. Dengên bêvilok [m], [n], [ŋ]

[m] dengdar, girr, lêvkî, bêvilok, zirîngok

[n] dengdar, girr, zarekî, bêvilok, zirîngok

[ŋ] dengdar, girr, zarekî, bêvilok, zirîngok

B. Dengên hejok/lerok/givok (*vibrant*): [r], [r̥]

[r] dengdar, girr, zarekî, nehejok (yekler) (flap)

[r̥] dengdar, girr, zarekî, hejok (lerok)(trill), stûr

C. Dengên Layî (laterals)

Bo dengkirina dengên layî, hewa di aliyê zar û dirana ve derbas dibe pirtir ku ji serê zar. Zimanin hene ku yek dengê layî, [l], tê de diyar dibe wek Englîzî, û hinên dîtir hene ku ji yekê pirtir hene, wek Espanî "l" vs. "ļ"; di Hindî de dengên layî yên diran û melaşû û xwehrok hene. Hin zimanên Qefqasî pênc yan şeş dengdarên layî hene. Di Kurdî de du cor [l] hene, yek normal e, ya dîtir stûr e.

[l] dengdar, girr, zarekî, lerok, nerim

[l̥] dengdar, girr, zarekî, lerok, stûr

Birr VI. 1.6. Dengdarên Kurdî û Taybetiyên Awarte:

Di vî birrî de du mijar hene ku dikevin ber taybetiyeke zimanî de wekçawe zimanê Kurdî hin ji van taybetiyan hildigire. Mijara yekem zodenga goşiyê [xw-] di Kurdî de.

Mijara duyem: stûrbûna dengdarine Kurmancî ku bi riya hin piroseyên dengsazî, ev deng bi şêweyeke taybet wekû kopiyeke dîtir ji dengê bingehîn derdikeve.

1.6.1. Mijara Yekem: Zodenga [xw-] di Kurdî de

Di wesfkirina dengên wek di peyvên [xwe], [xwezî] [xwê] [xwîn] [xwar] de hin bîrûra û şîrovekirinên ciyawaz derdikevin: Aya ev zodeng(dîftong) dengdêrkî (vocal) ne wek [-we]? Yan goşiyê dengdarkî(consonantal) ne, ku [xw-] ye di peyva (xwe) û (xwezî) û yên dîtir de, yan [gw] wek di peyva (gwîz) û (gwêz) de, herweha [kw] di peyva (kwîr) de, weha jî di zaravê Soranî de goşiyê [cw-] di peyva (cwê) de heye. Emê li vê mijarê bikolin bikin: Di zimanan de du cor dengdêr hene: 1. Celebê sade weha heye wek [a], [e], [i], [î] ...tad. 2. Celebê zodeng (dîftong), ango du dengdêr pevve dibin, wek yek dengî tê bilêvkirin. Peyva (diphtong) wek zarawe di dengsaziyê de bikar tê, û çêl wî barî dike ku du dengdêr pevte wek dengêkî û di yek qalibê yekbirreyê de tê bilêvkirin, weha jî wek yek fonêm têne jimartin, wek dîftonga [ai]ya Englîzî di peyvên (high, fight, I) de, û dîftonga [ei] di dawiya peyvên (play, say, pay) de. Di zimanê Kurdî de şêwedîftong di qalibê birrge de tê, lê ev zodeng bi dû dengdêrkî taybet de diyar dibe, wek (x, ş, k, c, ç) û pê re dibe hevalbend, ango ligel dengdarên dîtir jî dernakevê. Ya dîtir jî ew e ku zodenga Kurdî pirtir bi dengdarê (x)ê re diyar dibe, ango derketina zodengê ligel dengdarên dîtir di roja îro de gelek kêmbûye. Fakterê dîtir di naskirina zodenga Kurdî de ew e ku Celadet Bedirxan dengê (w) bidû dengdar de wek tiştêkî neguhêr aniye. Inca bidû dengê seretayî de wek (x) yan (k) dengê (w) wek parçek ji laşê dengdarê pêşî xwe didê berçavkirin, wek: [xw-, kw-, gw-], inca bi dû herdû dengên seretayî dengdêrek tê ku ev jî ligor peyva Kurdî ye, wek van nimûneyên jêrîn:

pêkhêner	Peyv	wata
x+w + v	xwîn/xûn	blood
c+w+ v	cwan/cuwan/ciwan	young
k+w + v	kwîr/ kor	blind
g+w+ v	gwîz	nut

Di zaravê Soranî de ji bilî dengdarên jor du dengdarên dîtir jî hene [şw], [ç]

ş+w + v	şwên/şûn	place
ç+w + v	çwar/çar	four

Jimara Peyvên bi dengdarê (x)ê ji yên dîtir pirtir in, wek:

xwî	xwîn	blood
-----	------	-------

xwê	xwê	salt		
xwa	xwar	ate (eat)		
xwe	xwe, xweş, xwezî	self,	nice,	wish

Di encamê de, li gor ku di ristina fonolojî ya vî barê [xw-] û [-we], em weha dibînin ku pabendiya van dengdêran bi dengine dengdar ve wek [xw-, kw-, şw-, çw-, cw-] weha diyar dike ku ev yek nakevê ber zodengiya dengdêrkî de, belê dibe wek goşiyekî dengdarkî, lewra jî nîvdengdêrê [-w] ku di fîzîkiya hem dengdar û hem dengdêr de xwe dirêse, dikare ligel dengdarên [x-, k-, ş-, ç-, c-] di yek birrgeyê de xwe saz bike. Ji ber van hoyan em nikarin li vî barê fonolojî wek zodengên dengdêrkî vî barî wesf bikin û nav lê bikin, inca ya baş ew e ev bar wek goşiyên dengdarkî were wesfdan û şîrovekirin, wek çawa goşiyên dengdarên [st-] yan [şt-] ku dikevin pêşkeya birrge de.

Tiştê balkêş ew e ku ev zodengiya [xw] û hevalên wê di zimanê Farisî de nîne, ji ber wilo em dikarin bêjin ku ev diyardeya fonolojî taybetmendiyeke zimanê Kurdî ye, ku yek ji armancên vê tezê ye ku roniyê bavêje ser.

1.6.2. Mijara duyem:

I. Piroseyên Awartebûna Hin Dengdarên Kurdî

Dervî taybetiyên sîstimrew, hin taybetiyên awarte di sîstima dengsaziya ziman de kar dikin, ku hin deng şêweyeke bîjok digire, ku ev jî encama hin piroseyên fîzyolojî û kodengsazî (sociophonetics) ⁷², drust dibe, wek:

- 1) Hawdengkirin
- 2) Tengbûna sazgeha deng: A) Paş-esmankîbûn, B) Pêş-esmankîbûn
- 3) Bapekî û babirrkî
- 4) Berbêvildan

Emê bi kurtî van piroseyên dengsaziyê bidin naskirin, bo ku em bikevin mijara xwe ya ku pabendî diyardeya stûrbûna dangan di zaravê Kurmancî de:

1. Hawdengkirin (coarticulation) ango, ango dengkirineke hevalê ya normal e, û di ferhenga zimanvanî de weha dide naskirin: "the occurrences of sounds that correspond to

⁷² Ez naçar bûm ku du têrimên Kurdî beramberî herdu têrimên Englîzî danim ku bapekî beramberî (aspiration) tê, û babirrkî bermaberî (non-aspiration) tê, ku ev herdu têrim ligor pirose û mîkanîzîma dengkirina dangan hatine drustkirin. Wilo jî hin têrimên dîtir wek paş-esmankîbûn beramberî (Velarization), û pêş-esmankîbûn beramberî (palatalization), herweha hawdengkirin beramberî (coarticulation), tengbûna sazgeha deng beramberî (glottalization), û kodengsazî beramberî (sociophonetics) tê.

speech sounds are not discrete units"⁷³. Ev bi xwe di baweriya min de şêweguhartineke awarte ye ku di piroseya axaftina hin deng de di hin ziman de peyda dibe"

2. Piroseya **tengbûna sazgeha dengan** (glottalization) weha ye ku tengbûneke taybet, çî hindik û çî gelek, bi awakî ku hin guhartin dikeve deng de (irregular total or partial glottal closures, ku dengên **stûr** wek [p], [t], [k] drust dibe. Di hin ziman de dengdarin dikevin barê ku jêre (tengbûyî, glottalized) dibêjin, ango sazgeha pêş-esmank yan paş-esmank teng dibe. Li encamê, du bar têne holê: Berek heye ku jêre (**pêş-esmankîbûn**) dibêjin ango ku pêşîka zar bilind dibe bi aliyê pêş-esmank ve. Barê dîtir **paş-esmankîbûn** e, ango (velarization) ku paşîka zar bilind dibe bi awakî nêzîkî li paş-esmank dike. Bi vî awayê dengsazî, deng piçîskî tê guhartin û wek stûrbûnekê tê de çê dibe.

3. Berlûtdan (nasalization)⁷⁴:

Di vir de paş-esmank bi du rola radibe:

- 1) Girtina sazgeha bêvilê dema ku zimanok bilind dibe (tê hildan).
- 2) Vekirina dergehê bêvilê dema ku zimanok nizim dibe (dadikeve xwarê), hewa dikarê serbest di herdû dergehan, bêvil û dev re, derbas bibe. Inca sazkirina dengan (dengkirin – articulation) bi awayê girtî ne wek sazkirina dengan bi awayê vekirî ye. Inca bi nasalization hemî sazkirin dengên ciyawaz didin, ku nabin wek wan dengên ku (nonnasalized) ku riya bêvilê girtî ye. Berlûtdan (nasalization) ew e ku dengê [m] ji [b] cuda dike, wek: (mad, bad) di Englîzî de, (mar, bar) di Kurdî de, dengê [n] ji [d] wek (not, dot)a Englîzî û (new, dew)a Kurdî.

4. Herweha barekî dîtir heye ku ew jî **giroverbûna lêvan** (lip-rounding) bo dengkirina hin dengdêrên ziman, ku lêv ji şêweya giroverbûnê diçe şêweya pehinbûnê.

II. Stûrbûna Hin Dengdar di Kurdiya Kurmancî de:

Di zimanê Kurmancî de nih dengên dengdar wek [p], [k], [t], [ç], [s], [z], [d], [r], [l] di birrek peyv de piçekî stûr dibin ku me ev şêwegirafîm bo wan daniye: [p̥], [k̥], [t̥], [ç̥], [s̥], [z̥], [d̥], [r̥], [l̥] wek dengê [s] di peyva (sêl) ku dengê [s] normal derdikeve, lê heman deng di peyvên wek (sor, sal, sol, sar) piçekî stûr dibe [s̥], ku hinekî bi ser dengê Arebî de diçe lê jê siviktir e.

⁷³ Ferhenga Roultdge

⁷⁴ Têrim berlûtdan Soranî ye ji (ber + lût(bêvil) + dan) pêkhatiye. Min dikarî ez li şûna peyva (lût) bêvilê denim, lê wilo peyv dirêj dibe ji ber ku bêvil ji du birrgeyan pêkhatiye. Em dikarin peyva poz bikar bînin ku dibe (berpozdan). Lê di baweriya min de berlûtdan siviktir û belavetir e.

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
normal	[p]	[k]	[t]	[ç]	[s]	[z]	[d]	[r]	[l]
stûr, şêwe A ⁷⁵	[p̥]	[k̥]	[t̥]	[ç̥]	[s̥]	[z̥]	[d̥]	[r̥]	[l̥]
stûr, şêwe B	[pp]	[kk]	[tt]	[çç]	[ss]	[zz]	[dd]	[rr]	[ll]

Min jî weha baş dît ku ez têrmekî Kurdî beramber vê diyardeya dengsazî bibînim, lewra min jêre peyva (stûrbûn) wek têrimekî giştî bo hemiyana herçende hemî nakevin ber piroseya stûrbûnê de, hin ji wan babirrkî tîn wek /k/, hin hejok tîn wek /r/, û hin stûr tîn wek /s/ û /t/. Babirrkî weha ye dema axaftina hin dengdar, ba di cihê sazkirina deng de, piçekî tê birrîn heçku sazgeha deng teng dibe bi awakî ku ba bi awakî tê de derbas dibe, ne wek carên dîtir ku ew deng piçekî ciyawaz diyar dibe. Di zimanê Kurdî de heye ku hin dengên dengdar bi şêweyeke ciyawaz ji dengê normal saz dibe, ev ciyawazî di astekî weha de ye, ku hin kes hest pêdikin, û hin kes hest pê nakin. Ev diyarde di analîzkirina dengsazî de şîrove dibe ku çend rêçke digire, ku yek ji wan bapekî û babirrkî ye (aspiration û nonaspiration), hevdengkirin (coarticulation), paş-esmankîbûn (velarization), pêş-esmankîbûn (palatalization). Ev dengên awarte ta niha wek alofonan di Kurmancî de tîne jimartin, lewra emê wan bi firehî bidin ber lêkolînê di beşê fonolojî de ka ev hemî alofon in, yan hinek ji wan alofon in, û hinek fonêm in? Ev xal bi xwe yek ji armancên ku vê lêkolînê xwe lê daye. Ev şêwedeng di dengsazî de di bin çend piroseyên fonetîkî de tîne analîzkirin:

1. Bapekî û babirrkî (aspiration, nonaspiration), ango derketina bayê bi şêweyeke asayî û normal di drustkirina dengdarên wek [p], [k], [t], [ç] derdixe; lê heman deng bi şêweyekê tê guhartin ku hin kes hest bi wê guhartinê nakin, lê her heye ku deng piçekî stûr dibe. Piroseya stûrbûna hin dengdar li encama babirrkîyê çêdibe, ku cihê deng piçîskî teng dibe bi awakî weha ku ba bi kotekî derbikeve, inca deng pê stûr dibe wek [p] ku herdû lêv tîn ser hev bi awakî ku ji piroseya normal pirtir xwe didin hev heçkû birrîn dikeve cihê derketina baya ku ji gewriyê derdikeve. Her wilo jî sazgeha dengên dîtir jî wek [k] bankê zar xwe ji paş-esmank nêzîktir dike ku cihê derketina bayê tengtir dibe û bi zorê jêderdikeve, bi vî awayî dengê [k̥]eya stûr drust dibe. Dengên dengdarên banekî, ango ewên bi alîkariya bankê zar saz dibin, wek (k, g) ku ji wan re (banekî – dorsal) dibêjin, ango derketina deng ji bankê zar ber bi esmankê dev ve derdikeve. Di van dengdaran de du

⁷⁵ Mebest ji (Stûr A) û (stûr B) her ew e ku bi du şêwegirafîm di vê tezê de diyar dibin

celeb hene: celebek bi alîkariya pêşîka zar saz dibin, û celebek bi alîkariya paşîka zar derdikevin.

2. Di dengsazî de dengkirina hin deng bi şêweyeke weha drust dibe ku hin ciyawazî dikeve awayê dengkirinê de, wek fonêma /s/ bi du dangan tê: [s]¹[s]² normal û stûr, wek peyva (sor), ku hin vê peyvê normalkî dibêjin û hinên dîtir stûrkî. Ev piroseya şêweya axaftinê jêre (coarticulation)⁷⁶ dibêjin. Dengdarên serê zar⁷⁷ her yek li gor sazgeha drustkirina deng nav lê tê kirin, ev celeb heye ku serê zar bilind bibe û bihingivê diranên jor⁷⁸, wek deng [t] di peyva Kurdî (tak) de, yan jî serê zar bilind dibe û dihingivê pidûwên diranên jor⁷⁹, wek dengê [t]êya stûr ya peyva tîr (pîvazên tîr), yan (tênî) bi devoka Aşîtan di Kurdî de, yan di peyva Englîzî (touch) de, yan di peyva Arebî (طال)⁸⁰. Herweha dengê [s] dengê banekî ye, ku banê zar dihingivê pidûwan, lê ev deng stûr dibe dema ku gewrî jî pê re teng dibe (pharyngealized) di dengkirina /s/de di peyvên wek: (seg) û (sed) (McCarus, 1992; Wais, 1984)⁸¹.

3. Paş-esmankîbûn (Velarization)⁸²

Paş-esmankîbûn ew kartêkirineke dengsazî ye di hin deng de çêdibe, di wê piroseyê de tê, ku dawîya zar bilind dibe û axaftina deng tê guhartin wek stûrbûna dengê [t] di Kurdî de, belê fonêm drust nakê, lê heman deng di Arebî de tê û bi erkê fonêm radibe û dikeve ber sîmayên cudaker (distinctive features) wek diyaredeyeke fonetîkî û fonolojî tê jimartin ku çar deng di Arebî de dikevin ber vê diyaredyê, wek [t], [d], [s], [z] ku çar hevaldengên wan hene heçku her dengê stûr bûye. Piroseya paş-esmankîbûnê, yan jî stûrbûna dengên dengdar⁸³ beramberî pêş-esmankîbûnê (tenikbûna deng)⁸⁴ tê, ku ya pêşî jêre di zimanê Englîzî de dengê [l]eya dawîya peyva (ill) dengê paş-esmankî ye (velarized)⁸⁵. Dengê

⁷⁶ Ji ber vê yekê hin zaraweyên dengsazî tene meydanê, lê berî ku em li ser zaraweyên rawestînin emê ji we re dengên Kurdî ku ev diyarde tê de peyda dibe, wek:

⁷⁷Dengdarên serê ziman

⁷⁸serê ziman bilind bibê û bihingivê diranên jor

⁷⁹ yan jî serê ziman bilind dibe û dihingivê pidûwên diranên jor û ji van re bi Arebî tê gotin

⁸⁰ji wan dangan re bi Arebî tê gotin.

⁸¹Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran, *Published by Canadian Center of Science and Education*, International Journal of English Linguistics Vol. 1, No. 2; September 2011, www.ccsenet.org/ijel (rup 75)


⁸² *What may be regarded as the opposite process to palatalization is known as velarization, in which the back of the tongues raised, as during the articulation of the velar dengdars themselves*

⁸³ Paş-esmankîbûn (velarization) yan jî stûrbûna dengên dengdar

⁸⁴Pêş-esmankîbûnê (tenikbûna deng / palatalization)

⁸⁵R. H. Robins, *General Linguistics, an Introductory Survey*, (rûpel 100).

[ll]eya stûr di Kurdî de heye û bi heman piroseyê drust dibe, ku ev deng di zarê Soranî de wek fonêm bikar tê, Lê di zarê Kurmancî de wek alofon bikar tê. Di wêneya jêrî de şeweya sazgeha herdû dengên [l], ya stûr û ya tenik/normal⁸⁶:



Dengê [ğ] / [Ġ] ku ji Arebî ketiye nav Kurdî de, di peyva Arebî (ğerb), (ğerîb) de, û peyva (ğar) yan (filankes bixar/bilez hat) ya Kurdî, sazgeha vî dengî ew e ku paşîka zar dihingivê paş-esmank ku nêzîkî zimanok (zimanbiçûk) dibe. Dengine dîtir hene ji wan re fikedar⁸⁷ dibêjin, wek (s, z, ş) ku her ev jî ji celebên dengên xişok in⁸⁸. lê dengê [ğ] nakeve ber dengên stûr de-

4. Pêş-esmankîbûn:

Piroseya pêşesmankîbûnê ew e ku sazgeha deng tê guhastin, bi awakî ku pêşîka zar bilind dibe da ku bi pêş-esmank ve bihingivê, wekçawe dengê [k] ku paş-esmankî ye dibe [ç] ku pêş-esmankî, wek: peyva (Turkiya) dibe (Turçiya), (dayikî û dayiçî) di zarê Soranî de. Ev guhastin di sazgeha deng de drust dibe dema ku bi dû dengê [k] yan [g] de dengê [î] yan [ê] were, dengê [k] û [g] dibe [ç]. Weha jî di zimanê Arebî de wek (kîfek) dibe (kîfeç). Lê ev diyarde di kurmancî de nîne.

5. Hejokî: Ev pirose bi dengê [r] ve pabend e, eger carekê tenê pêşîka zar xwe li piduwan bixe dengê [r]eya normal derdikeve, lê eger du caran yan ji carekê pirtir be ji xwe dengê [r]eya hejok derdikeve ku hinekî ji ya normal cuda ye. ev dengê hejok di vê lêkolînê de wek fonêm cara yekem di Kurmancî isbat dibe.

6. Tevahiya dengên stûr [p̣], [ḳ], [ṭ], [ç̣], [ṣ], [ẓ], [ḍ], [ṛ], [ḷ] di vê cedwela jêrîn de sazgeh û awayê derçûna wan diyar dibe:

		lêv	diran-	pêş-	paş-	zimanok	gewrî	qirik
--	--	-----	--------	------	------	---------	-------	-------

⁸⁶ Claire-A. Forel & Genoveva Puskás, (1986): Phonetics and phnology, University of Geneva

⁸⁷Dengên fikedar

⁸⁸Di vê peregrafê de vegere pertûka Martînê bi zimanê Arebî hatiye wergerandin

			pidû	esmark	esmark			
westok	voiceless	p	t	ç	k	q		ə
	unaspirated	ḫ	ṭ	č	ķ			
	voiced	b	d	j	g			
	emphatic		ḏ					
xişok	voiceless	f	s	ş	x		ĥ	h
	voiced		z	j	ĝ		ç	
	emphatic		ś					
			ź					
bêvilok		m	n					
layî			l ḷ					
nejok hejok			r ř					
rewan		w		y				

• **Di dawîya birrê şeşem de** em dikarin wê yekê bêjin ku me barê dengsazî yê goşiyê [xw-] ji alîkî ve, û yê dengên stûr ji alîkî dî ve di Kurdiya Kurmancî de da xuyakirin, ku bi van herdû xalan ev beş bidawî hat, lê berî em dergehê vî beşî bigirin, emê encamên dawî di birrekî taybet de ku birrê heftem e bo we diyar bikin:

Birrê Heftem: Encamên Beşê Yekem

1.7.1. Encamên Beşê Yekem

Di şîrovekirina dengsazî de destnîşankirina sazgeha her dengê û wesfêkirina aliyê fîzîkiya deng du hokarên giring in bo naskirin û dabeşkirina deng. Di vê lêkolînê de û li gor analîzkirina tiyoriya dengsazî, me tevahiya dengên zaravê Kurmancî dabeş kirin, çî ji aliyê sazgehên wan ve (lêvkî, bêvilokî, devkî, pidûkî, pêş-esmarkî ...) û çî ji aliyê awayê derbirrînê ve, wek (westok, tewjimok, xişok, ...). Bi vî awayî kategoriyên deng hemû tê de ronî bûn, dengên normal û dengên stûr, dengdar û dengdêr, girr û kip, ...tad. Li dawî, ez gihame wê encamê ku tevahiya jimara dengên sade yê ku di axaftina zimanê Kurmancî de derdikevin **46** deng in, ku ew jî ev in:

[a] , [b] , [c] , [ç] , [č] , [d] , [d̥] , [e] , [ê] , [f] , [g] , [h] , [ə] , [i] , [î] , [j] , [k] , [k̥] , [l] , [l̥] , [m] , [n] , [ŋ] , [o] , [p] , [p̥] , [q] , [k] [r] , [r̥] , [s] , [s̥] , [t] , [t̥] , [u] , [û] , [uî] , [v] , [w] , [x] , [ğ] , [ɣ] , [y] , [h̥] , [z] , [z̥]

1. Jimara tevahiya dengên Kurmnacî 46 deng in

- Jimara Dengdarên normal: 28
- Jimara Dengdarên stûr: 9
- Jimara Dengdêran 9

2. Dengên ku di sîstima alîfbaya Bedirxan de wek tîp diyar nabin 15 deng in, ku bi vî awayê jêrîn dabeş dibin:

- Dengdarên Arebî: [h̥] , [ɣ] , [ğ] 3
- Dengên hemza [ə] û dengê alofon [ŋ]: 2
- Dengên stûr bê tîp in: 9
- Dengdêra devokî [uî]: 1

3. Jimara alîfbaya îro 31 deng in:

- Dengdar: 23
- Dengdêr : 8

1.7.2. Deng û girafîm û jimar:

Dabeşkirina dengên Kurdî bi girafîman weha di vê cedwela jêrî de tê:

	dengdêr	nîvdengdêr	dengdar			
	dengên gîrr	dengên gîrr	dengên gîrr		dengên kip	
			normal	stûr	normal	stûr
1	[a]	[w]	[b]		[p]	[p̥]
2	[o]	[y]	[d]	[d̥]	[t]	[t̥]
3	[u]		[g]		[k]	[k̥]
4	[û]		[c]		[ç]	[č]
5	[uî]		[v]		[f]	
6	[e]		[z]	[z̥]	[s]	[s̥]
7	[ê]		[j]		[ş]	

8	[i]		[ĝ]		[x]	
9	[î]		[m]		[h]	
10			[n]		[ĥ]	
11			[ŋ]		[ə]	
12			[l]	[l̥]	[q]	
13			[r]	[r̥]	[ç]	
	9	2	13	4	13	5
46 dengên Kurmancî						

Xwendewarêkî Kurd heye bipirsê:

Baş e, Ji van çil û şeş (46) dangan em îroroj bi sih û yek (31) tîpan dinivîsin ango ew pazde (15) dengên dîtir bi kû ve diçin? Çima temsîla wan di sîstima alîfbaya Latîniya Kurdî de nîne?

Bersiva vê pirsê di beşê duyem de tê.

1.7.3. Xiştexaneya dabeşkirina dengên konsonatên Kurmancî

Li ber roniya şîrovekirina dengsazî ya bûrî, min jî 37 dengdarên Kurmancî di vê cedwela xwarê de dabeş kirin ku ew jî ev e:

→										
Sazgeha dengkirinê										
awayê derbirrînê		lêvkî	lêvdiranî	diranî (<i>Dental</i>)	pidûkî	Pêş-esmankî	Paş-esmankî	zimanokeyî	gewrî	jêyî
Kospek ↓ Plosive	girr	b		d			s			
	kip	P p̥		t t̥			k k̥	q		
şkestî <i>affricate</i>		girr			ç					

	kip				ç ċ				
xişok <i>fricative</i>	girr		v		z ź	j	ĝ		ɥ
	kip		f		s ś	ş	x		ĥ ə h
bêvilok (nasal stops)	girr	m		n ŋ					
Rexkî/layî / انزلاقي /	girr				l	l̥			
hejok givok (<i>vibrant</i>)	girr				r r̥				
rewan (glide)	girr	W				y			



Beşê Duyem Fonêm di Zimanê Kurdiya Kurmancî de

Di vî beşê duyem de emê wan (46) dengên zimanê Kurdî yên ku di encama beşê yekem de hatine xuyakirin, emê wan dangan bixin bin bêjînga fonolojî de ka kîjan alofon in, û kîjan fonêm in? Aya kîjan deng dikarin bibin tîp di alîfbaya Kurdî de? Aya dengên stûr dikarin bibin fonêm? Aya dengên Arebî di Kurdî de zirrdeng in? Yan zirrfonêm in? Bersiva van pirsan û van mijaran di vî beşê de diyar dibin, emê hewl bidin ku wan şîrove

bikin bo ku em li dawî bigihin encamekê. Li dawiya beş em dikarin encaman bi giştî bixwênin, herçende encamên her mijarekî di tevna lêkolînê de diyar dibin. Ev beş di çarçova van tewer û birran de tê:

- 2.1. BIRR I: Pêşekiyeke Giştî di Fonolojî de
- 2.2. BIRR II: Deng û Fonêm û Alofon di Kurmancî de
- 2.3. BIRR III: Fonêm û Alîfba
- 2.4. BIRR IV: Fonêmên Kurmancî di Şîrovekirina Fonolojî de
- 2.5. BIRR V: Alîfbaya Îro û Dengên [u], [ɨ], [ə]
- 2.6. BIRR VI: Dengdarên Stûr di Kurmancî de
- 2.7. BIRR VII: Zirrdeng di Kurmacî de [q, h, g, ɣ]/[ق - ح - غ - ع]
- 2.8. BIRR VIII: Encamên Beşê Duyem

Lê berî ku em li ser encamên beşê bûrî rawestin, emê pêşekiyeke tîyorî di hin aliyên têkildar yên tîyoriya fonolojî de bidin xuyakirin, bi dû de emê dest bi lêkolîna wan mijaran yek bi yek bikin.

BIRR I 2.1.

2.1.1. Pêşekiyeke Giştî di Fonolojî de

Li gor zimanvan A. Martinet sîstema ziman bi du piroseyan şîrove dibe ku jê re dibêjinê: jihevvekirina zoparî, bo nimûne, peyva (hesp) nîgarekî dengbar e, bi dev tê gotin, bi guhan tê bihîstin. Nîgarê dengbariya peyva “hesp“ ji van dangan saz dibe: [h-e-s-p]. Çi peyv heye her ji dengên dengdêr û dengdaran drust dibe. Her zimanek çend dengdêr û çend dengdarên wî hene ku mirov dikare bi hezarê peyvên bêjimar ji wan çê bike. Vêca, jihevvekirin li nik Martinet du aliyan digire:

- 1) Aliyê yekem parvekirina dengdêr û dengdarên ziman dibe despêk
- 2) Aliyê duyem parvekirina peyvê ye⁸⁹.

Inca, **dengsazî** bingeha şîkirina fonolojî ye, ku di derhênana hemî dengên axaftina mirovan de dikolê û şîrove dike. Belê **fonolojî** di ristîk û ristina dengên zimanekî taybet de dikole çî di astê peyvsazî û ristesazî û axaftinê de be, yan di sîstima rênivîsa ziman

⁸⁹ Profesor : Piere Lecoq, Zanîngeha Sorbon - Parîs , Wergêr : Kevirê Dîko, govara Pirs, jimar 10 (rup 34)

(**orthography** design) de be. Herweha destnîşankirina giringiya her dengê fonetîkî ka çilo axêver (xudan ziman) van dengan rave dike.

Fonolojî dibe du beş:

- 1) Yek jê fonolojiya kertkirinê ye ku jê re (Segmental phonology) dibêjin, ya ku di warê fonêmên dengdêr û dengdar (vowel û dengdar) de dixebitê.
- 2) Beşê dîtir jê re dibêjin: (suprasegmental or prosodic phonology) ku di diyardeyên dengsaziyê de dikole, yê ku di ser fonêman re tèn, wek: Tekez (hêza birrgeyên peyvê), herweha tundî (intensity), ton (tone, pitch) û awaz (intonation)⁹⁰

Li gor dengnas Bertil gelek babetên dengên ziman bi têgehên tiyoriya fonolojî têne analîzekirin wek hokarên erkdar û yên bê-erk, ku li encamê **alofon, fon, varyent, û fonêmên** ziman diyar dibin⁹¹. Fonolojî (phonology)⁹² ew lêkolîn e ka çawe deng birêkûpêkî di zimanan de têne rêzêkirin, bi awakî her dengê watayek yan erkek di çarçova peyvê de dide. Sîstima fonolojiya ziman van xalên jêrîn hildigirê:

- 1) Deng û durvên deng, û yasayên ku wê yekê destnîşan dike ka çawe deng ligel hev rast tèn ku dengrêsi ji vê piroseyê re tê gotin.

Fonolojî yek ji çend ruwaletên ziman e (one of several aspects of language) ku pêwendî bi hin ast û aspektên dîtirî zimanvanîyê ve heye, wek: dengsazî (phonetics), peyvsazî (morphology), ristesazî (syntax). Cihê fonolojî di vê nexşaya hîrakiya hawkar de ya astên zimanvanî ronî dibe⁹³, herweha di hêla fonetîk û fonolojî de Trobtiskoy kêşeya beramberkirinê (contrast) dide xuyakirin û weha di wêneya jêrî didanê⁹⁴:


⁹⁰Dr. Atif Medkûr (1980): ilm Al-Luxe beyn Alqedîm we Al-hedîs, Kuliyyet Al-Adab, Camiyet Aqhîre. (rûp 42)

⁹¹Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork.

⁹²Min hin zanyarî ji tora Internê⁹² derbarî pênasîna fonolojî (What is phonology) derêxist û di vê peregrafê de hatin tomar kirin bo ku em sûd jê wergirin.

⁹³Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork.

⁹⁴Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, 1983 (rûp 43)



Zimanzanên Ewropî, bi tevayî, têrma (**fonêm**) di warê zanista ziman de bikar tînin û weku “piçûktirîn takedeng di ziman de didin naskirin, ku jê pê ve nayê letkirin (qetkirin - kertkirin - segmentation), herweha di riya (fonêm) de wata jev tîn cudakirin”⁹⁵. Fonêm (phoneme) di bingeha xwe de peyveke Yonanî ye, û ji bêjeya (phone) = (deng) hatiye dariştin, ku wilo jî peyva (phonetic) û (phonology) ji (phone) hatine derxistin û çêkirin. Binyata deng (structure sound)ên ziman ji du aliyan ve dikeve ber lêkolînê de⁹⁶:

Yekem: Dengsazî (phonetics): diyarkirina fîzîkiya ziman di pêlên deng de, çilo ev deng tîn dengkirin û drustkirin û naskirin⁹⁷.

Duyem: Fonolojî (phonology) nuwandina zêhîniya dengên e wek beşek ji sîstima nasîna nîşankarane ye (symbolic cognitive system), ango çilo ev kategoriyên dengên rûten (abstract sound categories) bi awakî taybetî tîne rêzkirin û di piroseya ziman de lev siwar tîn, ku di çarçêweya bêje û peyvê de wata didin. Binyata dengên ziman pêrgî gelek kêşeyan dibe, wek⁹⁸:

- 1- Twêjkarî, fîzyolojî û fîzîkiya cîhazê axaftinê.
- 2- Dengên axaftinê wek ku di alîfbaya cîhanî de hatine.

⁹⁵ Twaddell, W.F. 1935. On defining the phoneme. (Language Monograph 16.) (Repr. in M.Joos (ed.), Readings in linguistics, vol. 1: The development of descriptive linguistics in America since 1925. Chicago, IL, 1966. 55–80.)

⁹⁶ Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 40 - 45)

⁹⁷ Dr Kemal Bişir (2000): 'Ilm Al-Aswatt, Dar Xerîb, Qahîra (rûp 65 . 70)

⁹⁸ Dr Kemal Bişir (2000): 'Ilm Al-Aswatt, Dar Xerîb, Qahîra (rûp 66- 70)

- 3- Siruştaya taybetiyên fonolojî û birêkûpêkirina wan di tavil (segments) û birrge û peyvande.
- 4- Guhartin di dengê morfêman de di navtêkistên cîyawaz de (contexts).
- 5- Rêbaza zanyariya binyata dengên ziman wekçawe zarok hînê axaftinê dibin.
- 6- Hemecorî (variation) di binyata deng de, çî ew guhartinên di nav zar û devokên zimanekî de peyda dibin, û çî ew guhartinên ku bi bûrîn û derbaskirina demê re çêdibin, yan jî ew guhartinên dengsazî ku di bin kartêkirina zimanekî dîtir diyar dibin.

Axaftin diyardeyeke ezmûnkarî ye ku dengsazî li ser rêbaza zanistên siruştî ava dibe. Fonolojî wê rêbazê pêktênê ya ku di lêkolîna sîstima rêzimanî de bikar tê. Ev zanist çend buwarên lêkolîna zimanvanî di warê sîstima fonêm û dengên ziman de werdigirê, ku ew jî ev in:

- Zanista dengên ziman
- Zanista erkên zimanvanî yên dengên ziman.
- Ziman wek dezgeheke komelayetî ye, cîhanek ji pêwendî û rol û bihamendiyan ava dike.

Têgehên zimanvanî wek **fonêm** û **alofon** û **morfêm** ...htd giştî ne, ango ne taybet in bi vî zimanî yan wî zimanî, lê belê bo hemî zimanan bikar tên⁹⁹. Fonêm weku takedengekî zimanî li ber roniya fonetîk û fonolojiya tê naskirin, herweha fonolojî li ser bingeha fonêm ava dibe¹⁰⁰. Fonetîk ji wî beşê zimanvanî re (linguistics) tê gotin, yê ku li ser fîzîkiya bilêvkirina dengên dixebite, ango sazgeha her dengê ji rexê (dev û lêv û ziman û diran û bêvil û qirikê û...) ve nîşan dike. Lê herçî fonolojiya, li ser radeya dengên di ristika peyvê de dixebite, û taybetiyên sîstima her zimanekî ji yên zimanê dîtir dide xuya kirin. Lewra “fonolojî”, tiştekî taybetî ye, lê fonetîk tiştekî giştî ye”, bo nimûne, komika goşiyê (-nd-) di zimanên Hindo-Îranî û Hindo-Ewrûpî de gelek peyda dibe, wek (gund, bend, kundir, zend) di Kurdî de; wek (“hand”= dest, “grand”=mezin) di Englîzî de, Herweha komikên ji du dengên dengdar (consonant) pêktên, taybetiyeke fonolojî ye di zimanê Kurdî de, û ev jî li ser sîstimeke taybetî rêve diçe.

⁹⁹Mistefa Herekat (1998): Al-Lisaniyat Al-Amma we Qedaya Al-Arabiya, Al-Mekteba Al-Israiya, beyrut (rupel 14)

¹⁰⁰S.H. Olu Tomori (1985): The Morphology and Syntax of Present-day English: An Introduction, Heinemann Ltd, London.(13-16)

Martînê (Martinet) û peyrewên dibistana wezîfî ya zimanvanî li ziman dinere wek pêkhateyeke parvedayî ku bi awakî zoparî hatiye parvedan¹⁰¹ ku du astan werdigire: astê jor û astê jêr:

1. Di astê jor, wek yekem tê jimartin, ziman ji pêkhate û parên watadar wek riste û firaz û peyvan pêktê, ku para herî biçûk di van pêkhateyan de (monêm) e
2. Di astê jêr de, wek duyem tê jimartin, her monêmek ji yekîneyên bêwta pêktê ku biçûktirîn dane fonêm e¹⁰².

Martînê (Martinet) di pertûka xwe de (Martinet, Andre (1989): function et dynamique des langues, Paris) ku sala 1989 belav kir, tê de dibêje¹⁰³: (di sala 1960 de, dema min pertûka xwe ya bi navê (éléments de linguistique générale) nivîsand min peyva (phonique) bikar anîbû, lê niha ez peyva (vocale) baştir dibînim ku li şûna wê bikar bînim. Helbet sedema vê guhartinê vedigerênê dîtina wî ya îro ne wek ya berî bîst sala ye, ku peyva (vocal) watayên ku ew dixwazê pirtir ji (phonique) hildigirê.

BIRR: II 2.2.

2.2. Deng û Fonêm û Alofon di Kurmancî de

Di beşê bûrî de me, em gihane wê encamê ku jimara dengên zimanê Kurdî (Kurmancî) digihe 46 dangan, Jibo temsîlkirina dengên zimanê Kurdî: çi alofon bin, çi zirrdeng bin, yan zirrfonêm bin, ez naçar bûm ku hin girafimên Latînî wek nîşane, yan em bêjin, sîmbol (symbole) bikar bînim:

- Dengên stûr: [r, l, p, t, k, ç, s, z, d]

-Zirrdeng: [h, v, g]

- Fonêmbênîşane: /ɔ/

- Zodengê devokî [u]

- Dengê [ŋ]

Dengên Kurmancî bi tevahî di vê cedwela jêrî de diyar dibin:

¹⁰¹Mistefa Herekat (1998): Al-Lisaniyat Al-Amma we Qedaya Al-Arabiya, Al-Mekteba Al-Israiya, beyrut (rupel 12)

¹⁰²Andre Martine (1989): Wezîfet Al-Alsun we Dinamiyatiha, tercemet Nadir Sîrac, Beyrût. (rûpel 69)

¹⁰³Andre Martine (1989): Wezîfet Al-Alsun we Dinamiyatiha, tercemet Nadir Sîrac, Beyrût. (rûpel 69)

	Dengdêr	Nîvdengdêr	dengdar			
			dengên girr		dengên kip	
			normal	stûr	normal	stûr
1	[a]	[w]	[b]		[p]	[p̰] (pp)
2	[o]	[y]	[d]	ḍ (dd)	[t]	[t̰] (tt)
3	[u]		[g]		[k]	[k̰] (kk)
4	[û]		[c]		[ç]	[ç̰] (çç)
5	[uî]		[v]		[f]	
6	[e]		[z]	[z̰] (zz)	[s]	[s̰] (ss)
7	[ê]		[j]		[ʃ]	
8	[î]		[ĝ]		[x]	
9	[î]		[m]		[h]	
10			[n]		[h̰]	
11			[ŋ]		[ə]	
12			[l]	[l̰] (ll)	[q]	
13			[r]	[r̰] (rr)	[ɣ]	
	9	2	13	4	13	5
			46 dengên Kurmancî			

Emê vê encamê di vî beşî de bixin ber lêkolîneke fonolojî ka ev çil û şeş deng çima bi sih û yek tîpan tête nivîsîn? Baş e, ev bû nêzîkî not salî¹⁰⁴ em bi 31 tîpan dinivîsin, ku navbera jimara 46 û 31 cudahiya 15 dengên ku di piroseya axaftina rojane de diyar in, lê di rênivîsê de wundayî mane. Hin ji van dangan di nav nivîseran de dibe cihê gengeşekirinê wek dengê [k]eya normal di peyva (ker)¹de bi wataya celebek ji heywanên xwemalî ye, û [k]eya stûr di peyva (ker)² de – ew kesê ku nabihîze -ku her heman şêweya rênivîsê wergirtiye, lê watayeke cuda distêne; herweha dengê [ç]eya normal û [ç]eya stûr. Lê hin deng jî hene, ji xwe, nakevin bîra rewşenbîr û nivîseran de, wek dengê hemza ku di seretaya fonêma dengdêr de derdikeve bi mercê ku bibe despêka axaftina birrê yan peyvê wek:

(arî), (di-axêve), (ne)

¹⁰⁴ji despêka sedsala bîstan ve ye, ku pirtir li dema derketina govara Hawarê, ya Celadet Bedirxan, ku sala 1932 an û virde.

(əarî) , (di-əaxêve) , (neə)

Tenê peyvek heye di hin devokên Kurmancî de diyar dibe, ku hemza di dawî de tê, ew jî peyva (ne) dema ku dibe bersiva pirseke tekez xwaziyê wek:

Pirs: Gelo bavê te li mal e?

Bersiv: neə

Lê hin ji wan dengan eger bihayê xwe di sîstima ziman de hebane, gerek nivîskarên Kurmancî ta niha bêdeng neman. Jibilî dengên stûr, sê dengên dîtir hene wek [h̄],[ç], [ĝ]ku ji zimanê Arebî hatine nav Kurdî (ango herdû zarav: Kurmancî û Soranî). Di vî beşî de emê wan 46 dengan bixin bin analîza fonolojî de piştî ku ji analîza fonetîkî ya beşê bûrî de bider-encam bû, nemaze ew dengên di axaftina piraniya devokên Kurmancî de peyda dibin, lê di Kurmanciya standard a nivîsînê de ne diyar in. Berî ku em dergehê lêkolînê vekin, ez dixwazim van çil û şeş dengan bi awakî destnîşan bikim û dabeş bikin:

- 1) 31 deng ku îroroj di Kurmanciya standard de wek fonêm û alîf be bikartên.
- 2) 9 dengên konsonatên stûr [f], [l], [pp], [k], [t], [ç], [s], [z], [d], di piraniya axaftina Kurmancî de diyar dibin, lê beramberî wan di sîstima alîfbaya Latîni de - ku Celadet Bedirxan daniye - nehatine.
- 3) sê deng hene u ew jî [ə] û [uî] û [ŋ] in, wêne û tîp bo wan nehatine.
- 4) Sê zirrfonêm yan zirrdeng [h̄] ,[ç] , [ĝ] ku ji Arebî ketine Kurdî de.

Tevahî dibe: 9 dengdêr, 2 nivçedengdêr, 35 dengdar

Tevahî dibe: 9 dengdêr, 37 dengdar (nivçedengdêr li ser dengdaran tene jimartin)

2.2.1. Tevahiya Dengên Kurmancî


Berî ku em dest bi lêkolîna vî babetî bikin, emê aliyê fonolojî yên van çil û şeş dengên zaravê Kurmancî diyar bikin ku beramberî her dengê peyvekê wek nimûne bidin, bo ku bikeve ser hêla fonolojî de:

jimar	Deng	nimûne peyv
1	[a]	agir, baran, zana, ana, niha, kar, daw, nan, man
2	[b]	ba, ban, ber, bar, bin, bajar, bez, bafîn, dibe,
3	[c]	cil, cû, co, car, can, camêr, gurc,
4	[ç]	ço, çax, çemdiçe, maç, çil, çol, çwal, çen, çê, çek, çîz,
5	[ç̣]	čo, çav, çem, çif, çil, çûv, çinçin,
6	[d]	dar, dûr, dîn, dîtîn, derz, derbas, kadîn, bend,

7	[d]	dasî
8	[e]	ez, em, hejîr, zer, name, erê, xame, paye, per, ger, ber
9	[ê]	êzing, êvar, êm, êl, ê, hêk, zêr, kewê, kêl, têr, rê, tê, pê,
10	[f]	firîn, difire, fêrkirin, fûriya, şkeft, heft, derf, berf
11	[g]	gav, digihe, bang, gazî, gel, gor, gûz, gov, guhan, berg
12	[h]	havîn, behî, birh, hilm, haveyn, hawîr, hawar, hatin
13	[î]	dil, min, li, jin, im, hin, kil,
14	[î]	în, dîl, masî
15	[j]	jar, ji, bej, tajî, mewîj
16	[k]	ker, ka, kar, ken, kem, kotek, kozik, keland, kil, kal(spî), kin, kelek(zû dikelin)
17	[k]	qer, qa, qar, qen, qem, qop, pek!, pekandin, qil, qilor, qone, qund, qul, qal(pîr), qin, qeleqa ser avê.
18	[l]	bel, bil(î), çil 40, mil,
19	[l]	be, bi, bi,or, çil, lotik, laz, bi,do,
20	[m]	mêr, mak, motik, min, mêş, êm, kê, nimandin
21	[n]	nêr, nêzîk, nas, ben, genî, arzenî, kenî,
22	[o]	ox, ol, kol, çol, xapo, soro, dohtin, tole,
23	[p]	par, pîr, pend, por, pel, pêl, peyv, çip, zîpik, fîp
24	[pp]	ppar, ppîr, neppendî, ppengihî, ppez, ppoz, depp,
25	[q]	qêrîn, qul, qaz, qûn, qîr, serqot, beq, ziq, feq, teq
26	[r]	ber, mer, birîn, bir, gur, çir, wer, derav(pere), here,
27	[r]	berr, merr, birrîn, birr, gurr, çirr, werr, derrav
28	[s]	ser, sê, sînem, sakûl, bist, sist, westin, mast, sêv
29	[s]	sol, sal, selik, sohtin, sewik, sofî, sor,
30	[ş]	şar, şîv, şeş, şek, şad, şahî, beşîşî, teşî, hiş, reş, kêşe
31	[t]	ta (nexweşî), têr, tenê, tisî, gotin, xwestin, best,
32	[t]	torî, tarî, ta, tolik, zotik, serqot, totik, tazî
33	[u]	gund, gur, Kurd, gul, wurr, kul, kun, kum, guh,
34	[û]	ûr, bûk, çûn, bûn, nû, zû, dûr, zûrîn, mû, tû, berrû
35	[v]	vir, van, viyan, zava, vajî, vale, virr, zevî, nevî, kovî
36	[w]	wir, wan, werîn, werzîn, tewer, dew, kew, dawî


37	[x]	xap, xanî, xwîn, xwe, xwar, xwê, xav, xaç, berx
38	[y]	yar, yan, yek, yên, beyar, diyar, deydîk, pey, mey
39	[z]	zanîn, zêr, zîpp, zû, zelal, zevî, țazi, xwezî, xwezûr
40	[ž]	žor, žotik, žirî, žalim,
41	[ĝ] [Ĝ]	ĝerîb, ĝar, baĝ, ĝeriqî, ĝenî, ĝezal, ĝeynî,
42	[ç] [Ç]	çewteçewt, çireçir, çenî, çeynik, çeşîr, çaqîl,
43	[ĥ] [ح]	ĥerî, ĥewcehar, ĥizûr, ĥemû, ĥezkrin(ĥejkirin) ĥazir, ĥeyf, ĥopo, ĥewş, ĥaşa, ĥinne, ĥewz, ĥebek, ĥenek, ĥimĥimî, ĥarik,
44	[ə](hemza)	əem, əûr, diəaxêve, əêm, əox, əof, əerê, əneə
45	[ŋ]	bang, meng, heng
46	[ui]	buîk, zuî, nuî, muî ,şuîr, amuîr, duîr, tuîr, duî, huîr

- Dabeşkirina dengan li gor alîfbaya C. Bedirxan:



- C. A. Bedirxan ji 46 dengan 31 deng wek fonêm dîtiye, û hemberî wan tîpên alîfba danîne, ku îro roj em bikar tênin. Wilo 15 deng di sîstima alîfbaya Bedirxan de wek tîp diyar nabin ev in: 3 [ĥ][ç] [ĝ] Arabî, 2 [ŋ],[ə] 9 stûrk, dengdêrê devokî [uî].

- Berî ku ez dest bi wesfdan û şîrovekirina fonolojî bikim, û bi armanca movîkirina mijarên lêkolînê, ezê wan 46 dengan bi awakî weha dabeş bikim, ku xwêner zûtir li têrim û têgehên bigihe, ta ku li encamê ber guhartinên nû yên vê tezê bikeve vê dabeşkirina jêrî de:




- Hinek zimanzan zodengên [-aw, -ew, -êw, -ay, -ey, -êy, -oy, -ûy] wek dîftongên dengdêrî dibînin. Eger ev wa be, jimara tevahiya dengên Kurmancî tevî dîftongan (zodeng) digihe 54 dengan. Ev lêkolîn van wesfdanan li gor tiyoriy fonolojî rave dike û digihe encamên dawî.

Inca, emê li ser wan 46 dengên Kurmancî lêkolînê di astê fonolojî de bikin da ku em têgehên fonolojî wek fonêm û alofon û deng(fon) û zirrdeng û zodengan ji nav hev vewejêrin û encaman li dawiya vî beşî darêjin.

2.2.2. Dengên ziman:

Deng ew dane(yeke)ya ku di piroseya axaftinê de tê dengkirin û bihîstin û bimebest tê famkirin, deng ew e ku axêver û bihîser herdû hest pê dikin, weha jî sazgeha wî, û awayê derbirîna wî, û bi hemû durvên dengkirina xwe ve diyar e. mebest jê ew e, ew dengên ku dikevin nav tevna bêje û peyva axaftinê de û watayekê dide her ew deng e, ku bi Yonanî jê re fon (phone) û bi Engilîzî jê re (sound) dibêjin. Dema em peyva (sol) dibêjin, sê deng tê de diyar dibin [s - o - l] mebest navê pêlavê ye bi Kurdî. Lê bi dengkirin û bihîstina peyva (sêwî) yek hest pê dike ku [s - ê - w - î] çar deng in. Lê dema em peyva (çil) dibêjin, sê deng tê de diyar dibin [ç - i - l] mebest navê jimara (40) bi Kurdî. Lê bi dengkirin û bihîstina peyva [ç - i - l] yek hest pê dike ku [l]eya dawiya peyvê hinekî stûr tê gotin û tê bihîstin. Ya dîtir jî peyva duyem watayeke nû dide herçende ku yek atmosfêr bikartê ango hersê dengên peyva yekem û bi yekrêzê hatine ristin, lê tenê herdû dengê [l]¹ [l]² du wêneyên cuda ne, ango bi tewawî nabin yekdeng, inca ev kêşe bi fonolojiya çareser dibe ka herdû dengên [l]¹ [l]² du fonêm in? yan yek fonêm e. Eger herdû deng wek du fonêm were jimartin, ji xwe, pêwîst e ku herdû wek du tîpan bikeve nav sîstima alîfba de, lê eger herdû dangan bi yek fonêmî bijimêrin, ji xwe yek ji wan alofon e, û yê dîtir fonêm e, inca herdû deng bi yekfonêmî têne jimartin, û bi yek tîpê di sîstima alîfbayê de tête temsîlkin.



2.2.3. Fonêm (phoneme)

Ji wan dengan re (fonêm) dibêjin, yên ku di ziman de peyvan drust dikin. Bi guhartina fonêman, wata tê guhartin¹⁰⁵, bo nimûne eger em fonêma (o) di peyva (sor) de bikin (a), wê peyveke nû û watayeke nû ava bibe, ku ew jî (sar) e, weha jî eger di şûnê de (i), yan (î), yan (e) hate danîn, wê çend peyvên dîtir wek (sir, sîr, ser) bidê me. Lêkolîna fonolojî di pêwendiyên pragmatîkî de roleke ronakbar tavêje ser analîzekirina babet ku dikare li ser sîstima dengên ziman bixebite, û ji biçûktirîn deng despê bike, ku jê re dibêjin fonêm. Zimanzanên Ewrûpî, wek Sosêr û Blomfîld û Trobitskoy, di pênasîna fonêm de li ser yek bîrûrayê diçin, ew e ku fonêm:

1- Biçûktirîn takedeng e di ziman de.

2- Divêt rastiya saykolojî tê de diyar bê, ku xudiyê ziman hest bi bûna fonêm bikê¹⁰⁶.

3- Eger dengê tenê di peyvekê de bi dengê dîtir hate guhartin, û vê guhartinê watayeke dîtir bi xwe re anî, ew dengê pêguhartinê fonêm e, wek van cotepeyvên jêrî (minimal pair), ku her car dengê bi tena xwe tê guhartin, û watayeke nû di peyvê de peyda dike¹⁰⁷.

Li gor yasayên fonolojî, fonêm dengekê nimûneyî ye ji nav çend dengên ku her hemî jî yek wata didin tê hilbijartin, ango pîver her wata ye, çî dengê /s/eya stûr bê wek peyva (ssal) ya (ssor), (ssewik), (ssed) û çî jî /s/eya normal be. Wilo jî fonêm durvê xwe di şeweya girafîm de werdigirê ku ew jî di warê nivîsînê û rênivîsê de (tîp) jê re tê gotin. Jiber wilo jî jimara tîpan li gor jimara fonêman tê.

Dema em peyvekê dibêjin wek (ber, zer, kor, beran, guhartin) em her peyvekê wek dengê yekparçe dibêjin bê ku em peyvê parçe bikin lê dema em peyvê di aliyê dengsaziyê de şîrove bikin, em jinû têne ser parçekirin û parvekirina parên biçûk yên di pêkhatiya peyvê de diyar in, wek peyva (ber) ku sê deng [b],[e],[r] tê de beşdar in. Di lêkolîna dengsaziyê de dengên peyvê ji aliyê fîzîkî ve tên şîrovekirin ka tûj e, yan kef e? çirr e yan nerim e, yan sirt e, dirêj e, yan kin e? ka lerîn û pêla deng çawa ye? Ka sazgeh(derû)ya deng ji aliyê fîzyolojî ve çilo ye? Ji gerûyê ye, yan ji bêvilê ye, yan ji lêva ye? Herweha awayê bilêvkirinê xişokî ye, yan kospek e?¹⁰⁸ Herçende xwendina her dengê bi tena xwe ti watayan nadê, lê dema em dengê ji hersê dangan bi dengê dîtir diguherênin wek em dengê [z] li şûna [r] danin, peyveke nû dide me ku ew jî (bez) e. Bi vî awayî em dikarin gelek peyvên nû bi watayên nû mebesta xwe diyar bikin wek:

dengê dawî ber, bez, ben, bel, bes, bej, beg,

¹⁰⁵ George Yule (2006) the Study of the Language, Cambridge University Press (rûp 42-43)

¹⁰⁶ Xazî Weys (rûp 41)

¹⁰⁷ Bas Aarts and April McMahon (2006) The Handbook of English Linguistics by Blackwell Publishing Ltd, 9600 Garsington Road, Oxford OX4 2DQ, UK (rûp 498)

¹⁰⁸ Mistefa Herekat (1998): Al-Lisaniyat Al-Amma we Qedayya Al-Arabiya, Al-Mekteba Al-Israiya, beyrut (rupel 12)

dengê navîkê bêr, bar, bîr, bor, bir, bên, bûr,

dengê pêşî ker, zer, ser, şer, cer, der, per, mer, her, fer, ger,

Bi vî awayî bo me diyar dibe ku pêguharta dengê peyvê dibe hokarê çêkirina peyvên nû ku eva han di bin piroseyeke fonolojî de tê, ango ev diyarde ji aliyê qanûnên fonolojî ve tête şîrovekirin, yê ku bi wezîfe û erkên vewejartin û ciyawaziyê tene avakirin¹⁰⁹ ku siruştê lêkdan û parvedana ziman wek pêkhate diyar dike, hêjay gotinê ye ku Trobitiskoy û Martînê û gelek zimanvanên dîtir tekeze li ser rêbaza erkdariyê (wezîfe) kirine ku fonêm wek yekîneyekî fonolojî regezekî giring e di avakirina ziman de¹¹⁰. Fonêm wek "biçûktirîn dane di lêkolîna ziman de"¹¹¹ li gor pênasekirina Trobitiskoy du wezîfeyan pêktênê: yek jê wataya peyvê destnîşan dike wek peyva (zar) û (dar), ya dîtir peyvan ji hev cuda dike wek (zar) û (sar), (ber) û (bar), (jêr) û (jor).¹¹² Ji ber wilo "fonêm wek biçûktirîn daneya deng e ku bi riya wê wata ji hev tene cudakirin"¹¹³ herçende Trobitiskoy giringiyê dide aliyê organîk û bihîstina deng ku fonêm hin car şêweyên hemereng tê de diyar dibin wek dengê [k]eya (ka) bi wataya pûşê hêrtî û (ka) bi wataya li kûderê ye, yan dengê [s]eya stûr û normal, yan dengê [p]êya çirr û [p]êya normal di şêweya standard ya peyva (par) ango sala çûyî, û (par) beşek. Ev varyentên deng di fonêm de jê re alofon (alophone) dibêjin. Di baweriya min de Trobitiskoy tê de rast çûye ji ber ku di piroseyê axaftinê de hin fonêm bi tewawî nikarin yek şêwe deng bidin, jiber wilo jî têgeha alofon hate meydanê ku bibê destnîşankerek bo wan varyentên deng di daneya fonêm de. Inca em dikarin weha şîrove bikin ku fonêm şêweya standard ji dengên ziman dinwênê wekçawa di astê morfolojî de morfêma (wilo) bibê standard ji wêneyên (welê) û (wer-rê) û (wanîko) ku ji van re alomorf (alomorph) tê gotin. Bo vê yekê, Trobitiskoy di destnîşankirina fonêm de li gor wezîfe û erkên fonêm çend destûr danîne ku ew jî ev in:

1. Eger du deng di yek peyvê de dikarin cihê hev bigirin bê ku wata peyvê biguhere, ji xwe ew herdû deng du wêneyên dengî ne bo yek fonêm, ango du alofon in¹¹⁴, wek (sal) û (şal) ti wata nayê guhartin, lewra herdû deng [s] û [ş] du alofon in bo fonêma /s/. wilo jî di Englîzî de du alofonên dengê [l] hene: [l]eya tarî (dark), û [l]eya zelal (clear), lê [l]eya zelal fonêm e.

¹⁰⁹Mistefa Herekat (1998): Al-Lisaniyat Al-Amma we Qedaya Al-Arabiya, Al-Mekteba Al-Israiya, beyrut (rupel 13)

¹¹⁰- Dr Qedûr, Ahmad Mehemd (2008): Mebadi' Al-Lîsaniyat, Dar Al-Fikir, Dîmeşq (rûp 146)

¹¹¹ Şahîn Ilm Al-luxa rûp 121

¹¹² Dr Qedûr, Ahmad Mehemd (2008): Mebadi' Al-Lîsaniyat, Dar Al-Fikir, Dîmeşq (rûp 145)

¹¹³ Muxtar, Ahmad Umer : Diraset Al-Sot rup 151)

¹¹⁴ Dr Qedûr, Ahmad Mehemd (2008): Mebadi' Al-Lîsaniyat, Dar Al-Fikir, Dîmeşq (rûp 146)

2. Lê eger du dengan cihê hev di yek perwaza dengî yan yek qalibê dengî yê peyvekê de girtin, ku li encamê wata wê peyvê bête guhartin, ji xwe ew herdû deng du fonêm in¹¹⁵, wek dengê [r]eya normal û [r]eya stûr ku bûye [rr], wek : (birîn) û (birrîn). Weha jî di Arebî de dengê [s]eya normal û [s]eya stûr du fonêm in ji ber ku bi riya wan dengan wataya peyvê tê guhartin, wek: (sare) ango (royîşt), û (şare) ango (çêbû).

ji ber wilo jî hindêk ji zimanzan weha dîtin ku fonêm daneyekî libar e bo drustkirina alîfbaya ziman. Her di vê têvajoyê de zimannasê Englîzî, Conz (Jhones) weha dibîne ku sîstima nivîsîna wurdekar pêwîstî bi tiyoriya fonêm heye ku bibê rênuwên bo danîna alîfba.¹¹⁶

Ev hokarên me derbarî fonêm şîrove kir, Dafydd Gibbon bi heman wata, mijara destnîşankirin deng wek fonêm bi çar fakteran ve girê dide, ew çar fakter ev in¹¹⁷:

1. Biçûktirîn takilê deng e, ku dibe hokarê cudakirina watayên peyvê bi riya beramberkirina zopeyvan de. (The minimal word-distinguishing sound segment (based on the *contrastive function* of phonemes)
2. Bikare bibe biçûktirîn pêkhate di binyata birrge de.
3. Hebûna sîmayên cudaker di binyata deng de.
4. Ji alofonan pêk tê (consists of a set of allophones), ango: şêwedeng (alofon) jê re hebin.

BIRR III 2.3.

2.3. Fonêm û Alîfba

Zimannasê zankoya Cambridge, George Yule, di pertûka xwe de weha dibêje: "Her dengêkî watacudaker di ziman de wek **fonêm** tête naskirin. Dema em alîfbaya zimanekî hîn dibin, em fonêmên wî zimanî bikar tînin, ku di têgeha fonêm de xwe dide naskirin, û bi şêweya tîpan berçav dibe" ku weha hatiye: ((*Each one of these meaning-distinguishing sounds in a language is described as a phoneme.*))¹¹⁸. Ziman axaftinek e di navbera mirovan de peyda dibe, û di riya dengan de tê gotin û bihîstin. Belê ev dengên hanê li ser sîstimeke taybetî ya her zimanekî ava dibe, ku ne tenê dengkirin û bihîstin e, lê belê şêweyeke dîtir jî wergirtiye, ku ew jî nivîsîn û xwendin e. Nivîsîn bi xwe diyardeyeke

¹¹⁵ Dr Qedûr, Ahmad Mehemd (2008): Mebadi' Al-Lîsaniyat, Dar Al-Fikir, Dîmeşq (rûp 147)

¹¹⁶Muxtar, Ahmad Umer : Diraset Al-Sot rup 145)

¹¹⁷Dafydd Gibbon Introduction to Linguistics: Phonology: encoding words, B.A. British And American Studies, Basic Module 2, Winter Semester 2006/2007 (rup: 2o) <http://wwwwhomes.uni-bielefeld.de/gibbon/Classes/Classes2006WS/IntroductionToLinguistics/06-IntroPhonology.pdf>

¹¹⁸George Yule the (2006) Study of the Language, Cambridge University Press (rûp 42)

şaristanî ye, mirovan di rêveçûna dîrokê de peyda kiriye, ku wêne ji van deng û kîte û peyvên ziman re hatine afiradin, da ku mirov têkiliyên xwe ne tenê di rêça axaftinê de bidê xuyanîkirin, lêbelê di riya rênivîsê de jî drust bikê. Lewra, eger em îro li rênivîsa zimanan meyze bikin, dê çend alîfbayên ciyawaz li ber çavên me xuyanî bikin. Lê ya giring ew e ka gelo ta çi radeyî ev wêne (ango tîp yan pît) dikarin dengên ziman nîşan bikin? Di nivîsîna zimanên cîhanê de, çend sîstimên alîfba hene: Latînî, Sînî, Arebî, Ermenî û Kilêrkî û hinên dîtir, lê pirtir emê şêweya tîpên Latînî weku nimûneyeke serekî bikar bînin, û her ev şêwe tîp îro di Kurdî de li nav Kurdên Tirkîyê û li nav Kurdên Sûriyê belav e. Lê Kurdên Iraqê û Iranê tîpê Arebî bikar tînin.

Di zimanê Englîzî de, hin caran, du tîp wek (sh) û (ch) wêneya dengê tenê didin, ku (sh = ş), (Ch = ç), weha jî carna sê tîp û çar tîp wek (tia) û (cia) wêneya dengê /ş/ didin. Rênivîsa zimanê Arebî li ser bingeha dengdaran tê avakirin, bo nimûne peyvên wek: (ketebe) كتب (kutîbe) كتب û (kutub) كتب li gor rênivîsa Kurdî hatine danîn, lê eger em li pêka rênivîsa Arebî danin, wê yek wêne bidê, ku ew jî, (كتب = ktb). Bi rastî ev diyardeya han gelemşeke mezin li ber xwênerê zimanê Arebî dideynê, jiber ku yek wênepeyv sê watayên têvel dide. Rast e, eger (ser فتحة, jêr كسرة, bor ضمة) vê tevliheviyê çareser dikin, lê gelek caran ev (ser û jêr û bor) di nivîsîna rojnamegerî û gelek şêweyên çapemeniya Arebî de nayên nivîsandin, jiber ku (fetha û kesre û demme) di rênivîsa zimanê Arebî de wek tîp nayên jimartin û nayên danîn, herçende ku ev hersê deng (ser û jêr û bor) sê fonêm in. Lewra em nikarin bêjin ku zimanê Arebî fonêmîkî tê nivîsandin. Kêşeya rênivîs û xwendina ziman bi awakî drust û sazkar bû hoyeke mezin jibo lêpirsiyarî û danîna lêkolînên hemereng di warê ziman de. Zimanzanên Ewropî, bo vê yekê, gelek gavên pêşketî di vî warî de avêtine, û ziman weku diyardeyeke giştî dane ber lêkolînên zanistî ku di van beşan de pêktê¹¹⁹:

- 1- Dengsazî (Fonetîk - Phonetics).
- 2- Fonêmsazî (Fonolojî - Phonology).
- 3- Peyvsazî (Morfoloj - Morphology).
- 4- Ristesazî (Syntax).
- 5- Watasazî (Semantics), ...htd.

2.3.1. Binyata Ziman û Rênivîs

¹¹⁹Mareo Pie(1983): Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûpel 42-46)

Binyata ziman, ji kîjan alî tu weryê, yek yekê tewaw dike, lewra rênivîsa ziman pêwendiyêke xurt bi deng û fonêmsaziyê ve heye, ango çawa binyata dengsaziyê (deng) e, weha jî binyata rênivîsê wekû biçûktirîn dane her (tîp) e, weha jî di navbera (deng) û (tîp)an de (fonêm) e. Tîpên ziman di aliyê dengkirin û bilêvkirinê de ji wan re (dengên ziman) tê gotin, lê ne her dengê ji qirik û devê mirovan derkeve dengên ziman in, wek: kuxk, girî, ken, tilîlî, kûtênî, û gelekên din. Lê belê mebest ji van dengan ew dengên ku peyva watadar çêdikin. Di warê nivîsînê de ev deng, piştî ku têne hilbijartin li gor lêkolînên dengsazî û fonêmsazî, dibine sê nîş, ango sê zarawayên nû diyar dibin, ligel zareweyê çaran ku ev jî girafîkî ye (graphic), ku ew jî ev in:

1. **deng**, fon (phone - sound) çêl tevahiya dengên zimanekî dike, fonêm, alofon û zirrdeng, ewên ku di ziman û zarav û devokan de derdikevin.
2. **alofon** - alophone - (şêwedeng hevaldeng) ew wêneyên dengên ku temsîla wan di alîfbaya ziman de cih nagire.
3. **fonêm** (phoneme) ew dengê standard e ku temsîla şêwedengine dîtir jî dike, herweha fonêm dibe regezê herî giring di sîstima dengên ziman de ku jêr (sound patten) dibêjin.
4. **girafîm** (grapheme) ew nîşan e ku di nivîsînê de jê re tîp dibêjin û di sîstima alîfba de bikar tê.

Dibêjin xewna zimanzanên cîhanê ew e ku axaftin û nivîsînê gelek nêzîkî hev bikin, çimkî pêwendiyêke xurt di navbera dengên ziman û tîpên nivîsînê de heye. Çawe ku (tîp) wêneya dengê ziman e, bi awakî giştî, wilo jî ev (wêne) pêwîstî bi fonêm heye ku bikarê xwe bi şêweyêke rêkûpêk diyar bikê¹²⁰. Bo wilo jî fonêm dibe wek wêneyekî giştî hember çend şêwedengên taybetî yên ziman ku ji van şeweyên taybetî re alofon “alophone” dibêjin. Jiber wilo jî, jimara alofonan di ziman de ji ya fonêman pirtire, û carna jî nayên jimartin, bo nimûne tîpa (p) di van peyvên Englîzî de weke (sip, spit, pit) sê dengên têvel dide, bi awakî ku herkes belkî nikarê vê cudakariyê zû nasbikê. Herweha tîpa (a) weku fonêm di peyvên (agir) û (abar) yan jî di peyva (abaran) de yekşêwe deng nadê, her ewe ku dirêjahiya dengê (a) di peyva (abar) û (-an) a (abaran) de dirêjtir e, ango ji dengê (a)ya (agir) yan (abar)ya (abaran) pirtir e. Weha jî dengê (lamê) = (l) di navbera peyvên (welahî ل) û (ebleh ل) di zimanê Arebî de ne wek hev in. (l)eya peyva (welahî) ji ya peyva (ebleh)

¹²⁰Bas Aarts and April McMahon (2006) The Handbook of English Linguistics by Blackwell Publishing Ltd, 9600 Garsington Road, Oxford OX4 2DQ, UK (rûp 495- 499)

stûrtir e. Lê eva han nabê sedema peydakirina nîşanên taybetî yan jî tîpên cudawaz ji herdû dengên têvel re, ku dikevin ber baskê alofonan de.

Ji alîkî din ve, carna, tîpek di zimanekî de di rênivîsê de du dengan di axaftinê de dide, weku tîpa (x) di zimanê Englîzî de di peyva (box) = (boks) de, ku dengên (k+s) dide. Herweha dîsa di Englîzî de û di hin zimanên dîtir de jî dengê yan (fonêmek) bi çend tîpên têvel yan jî dûbarekirina yek tîpê, wekû (ee – ee – e - ea) di peyvên (see, meet, me, eat) de derdikeve.

Ev çêşine rênivîs zehmetkariyekê têxê navbera xwendin û nivîsînê de, her weha carna jî astengiyê têxê ber têgehîna xwêner ji peyvê re, wek çawa di rênivîsa Arebî de, peyva (ktb = كتب) bi sê awayên cuda tê xwendin ku her yek ji wan watayeke cuda dide, vêca eger em xwendina (ktb - كتب) li gor rênivîsa Kurdî binivîsin, yê çend peyvên têvelwata bidê me. Ew jî evin:

1- *ketebe* = *nivîsî*. 2- *kutub* = *pertûkan*. 3- *kuţibe* = *hate nivîsandin*.

Ev şêwe rênivîs havilê qonaxeke dîrokî ye, ku ji kevin de wilo dest pê kiriye û ta niha wilo maye. Hêjayî gotinê ye ku rênivîsa zimanê Kurdî seranserî çaxê misilmantiyê ta despêka sedê bîstan li pêka rênivîsa Alîfbaya Arebî diçû, ji bilî ku hin guhartin ketine vê rênivîsê de jiber ku alîfbaya Arebî nikarîbû hemû dengên zimanê Kurdî nîşan bikê.

Ya dîtir jî, herçend zimanzanên Kurdên Îraqê gelek guhartin xistin Alîfbaya Arebî de, ku bikarê tevayiya fonêmên zimanê Kurdî nîşan bikê, lê digel wilo de jî Alîfbaya Arebî nikarê cihê tîpên Latînî bigirê ku kirasekî spehî û drust li zimanê Kurdî dike di şêweya rênivîsê de, û divê em hemî kar jibo yekîtiya rênivîsa Kurdî bikin, ku tîpên Latînî baştirîn şêwe ye ji zimanê me re. Herweha rênivîsa Kurdî ya Latînî ji wan gelemşeyên ku di zimanên Englîzî û Elmanî û Firansî û Arebî û gelekên dîtir de hene, dûtir e. Helbet zimanzanên Kurda di despêka sedsala bîstan de, li dema ku rênivîsa Kurdî danîne, bi hişmendiyeke hevçax li zimanê xwe temaşe kirine bi mebesta drustkirina Alîfbayeke çak û serrast û bêkêmasî, ku weha lê hatiye jimara tîpan gelek nêzîkî jimara fonêman bê. Jiber wilo jî em dikarin bêjin ku zimanê Kurdî fonêmkî tê nivîsandin, û vê riya han jî hiştiye ku rênivîsa zimanê Kurdî ji yên gelek milletên dîtir hesanîtir û serkeftûtir bê. Gerek em jî kar û keda pêşiyên xwe, nemaze mirovekî wek Celadet Bedirxan û Qenatê Kurdo û Tewfîq Wehbî û gelekên dîtir ji bîr nekin ku ev rê bo me vekirin û bi hestekî zanistî karîna dengên Kurdî nas bikin û alîfbayeke rast û drust jê re danin. Ji ber ku ew hewlên berî wan ango

yên sedsalên 18 û nozdehan û yê berî wan jî bi alîfbaya Arebî gelek kêmasî di wan de hebû wek van herdû wêneyên jêrîn bo we bênim rojevê.

2.3.2. Du Hewldanên Kevin di Danîna Alîfbaya Kurdî de

Emê dused û bîst û pênc salan vegerin paş de, ka dengên zimanê Kurdî çilo dihate destnîşankirin, inca emê du hewldanan belû bikin: yek ya Garzonî ye, yê ku bi navê "Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda yê ku di navbera salên (1787 – 1802) de nivîsiye.¹²¹ Hewldana duyem di sala (1869) de ye, ya Samuel A. Rea ye, ku pertûkek bi navê: "A brief Grammar and vocabulary of the Kurdish Language of the Hekarî District, missionary of the A. B. C. F. M. In Kurdistan" nivîsiye.

1) Hewldana Yekem ya Garzonî

Pêşî, emê herin nav pertûka Garzoniyê Îtalî,¹²² wek yekemîn rêzimanivîsê zimanê Kurdî. Ya baş ew e em konkrît li kêşeyê binerin, û wêneya alîfbaya wan wek wêne bi tîpên xwe ve wek ku tê de hatiye bo xwêneran li vê tezê danin: wêneya yekem ya Garzonî ye¹²³, ew jî ev e:

ALPHABETUM PERSICUM			
Latinum.	Persicum.		
1 A a alif	ا ايف	13 Z z ze ze	ز زه
2 B b be	ب به	14 Z z ze ze	ژ ژه
3 P p pe	پ په	15 S s sin	س سین
4 T t te	ت ته	16 X x xin	خ شین
5 T t te	ت ته	17 S s sad	ص صاد
6 G g gim	ج جیم	18 S s sad	ض ضاد
7 G g ge	ج ج	19 B b ba	ط طا
8 F f fe	ح ح	20 B b ba	ظ ظا
9 X x xe	خ خ	21 K k kin	ع عن
10 D d dal	د دال	22 G g gain	غ عن
11 D d dal	ذ ذال	23 F f fe	ف فه
12 R r re	ر ره	24 Q q qaf	ق قاف
		25 K k kaf	ک کاف
		26 K k kaf	ک کاف

¹²¹Dr. Raffik Sulaiman, (Destnivîs), lêkolînek zanistî di Dêroka Gelê Kurd û Zimanê wî de, Madîna Artuklu University, 2016. Tê de hatiye ku Garzonî (1762 an-1835an): di çarcova şanda mîsyuna kenîsê de bo Mezopotamiya Mosul û Kurdîstanê hatibû şandin.

¹²² Dal P Maurizio Garzoni Grammatical E Vocabulario Della Lingua Kurda, Roma MDCCLXXXVII (Rup 14- 15 - 16 – 17)

¹²³ Dal P Maurizio Garzoni Grammatical E Vocabulario Della Lingua Kurda, Roma MDCCLXXXVII (Rup 14- 15 - 16 – 17)

Latinum.	Perficum.
27 L l lam	ل ل لام
28 M m mim	م م ميم
29 N n nun	ن ن نون
30 ه ه hē	ه ه هاء
31 V u vau	و و واو
lamalif la	لام اليف لا
32 I i ic	ي ي ياء

Wek diyar e ku dengên zimanê Kurdî di nivîsînên kevin de her di warê alîfba de dihate destnîşankirin ku hin tevlîhevî di danîna alîfba de hebû bi awakî weha dihat ku celebê deng, kurtî û dirêjahiya dengdêran, kêşeyên alofonan û fonêman, nediketin bîra zimanzanên wê demê, ji ber ku di wê demê de, hêşta dengsaziyê bi xwe ew pêşketin nedîtibû, lewra danîna alîfba pirtir dikete bin siha tîp û girafîmên zimanekî dîtir de ku nivîser tê de gihiştî bû, bo nimûne, em li alîfba Garzoniyê Îtalî wek yekemîn kes tê jimartin ku pirtukek di rêzimanê Kurdî de bi navê "Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda" di navbera salên 1787an- 1802an de nivîsiye¹²⁴. Herweha pertûka wî yekemîn rêziman e ku di Kurdî de hatiye nivîsandin. Di baweriya min de Garzonî ketiye bin kartêkeriya nivîsîna Melayên Kurda, yê wê demê de, dema alîfba ji zimanê Kurdî re daniye, ku hin alofon û şêwedengên ziman wek fonêm dîtiye, û jê re tîpek li gor dengsaziya tîpên zimanê Arebî saz kiriye, û dengên Arebî yê stûr wek (ض ص ظ ط) bikar anîne herçende ev dengên stûr wek alofonan di Kurdî de bikar tên, lê hin dengên dîtir tê de hatine ku di Kurdî de ne diyar in, wek (ذ ، ث) ne di dema îro de, û ne di serdema Garzoniyê hejar de. Wek diyar e, Garzonî di hewldana xwe de nikariye dengên zimanê Kurdî wek fonêm nas bike, heçku melakî Kurda alîfbaya Arebî daniye ber xwe û di bin navê Kurdî de alîfbaya zimanê Arebî (cîm, kaf, lam, mîm, nûn, zal, ...) jê re daniye. Ya dîtir, wêneyên dengdêrên Kurdî tê de yekcar nehatiye wekçawa di rênivîsa Arebî de giringiyê pê nadin. Garzonî her wilo çûye mijarê ku ji hersê dengdêrên /a/ , /î/ yan /w/ pê ve pê re diyar nebûye li gor agahiyên di pertûka wî de hatine. Garzonî, ne tenê bi şêweyê fonetîkî xwestiye dengên Kurdî destnîşan bike ku dengên stûr û dengên devoka wek fonêm daniye, lêbelê alîfbaya wî, heme bêje, di terzê alîfbaya Arebî de hatiye, jibîlî ku tîpine Arebî tê de hatine ku yekcar di Kurdî de nînin wek (ذ ، ث) ku dibe cihê gomanê ku heme ji ber alîfbaya Arebî hatiye nivîsîn, yan kesekî dîtir jê re daniye.

¹²⁴ Rafîk Sulaiman, (Destnivîs) tê de hatiye ku Garzonî (1762 an-1835an): di çarcova şanda mîsyuna kenîsê de bo Mezopotamiya Mosul û Kurdistanê hatibû şandin.

2) Hewldana duyem ya S. A. Rea

Piştî pertûka Garzonî bi 67 salan, pertûkeke dîtir di rêzimanê Kurdî de derket ku hewldaneke serkeftîtir e. Ev pertûk bi navê "A Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hekarî District, 1869 ya Samuel A. Rea" ku tê de gelek ciyawazî navbera Rea û Garzonî de heye, pertûka Rea di destnîşankirina dengên sîstima zimanê Kurdî de gelek pêşketî ye, ku herdû celebên dengdar û dengdêr ji hev cuda dike; ev bi xwe nîşana pêşketinê ye di ravekirina ziman de, ku bîst û pênc dengdar in, û dih dengdêrên sade ne, û sisê zodeng in. Herweha beramberkirina dengên Kurdî bi herdû celebên ligel yên Englîzî rast çûye, heta di danîna tîpan de, temsîleke zanistî daye deng, heçkû nivîser wek zimannasekî şîrove dike, lê hûrbînî di hin dengdêran de ne hewqas di cihê xwe de hatiye, ku ketiye bin kartêkeriya zaravê Hekarî de, ku dih dengdêrên devoka Hekariya xistine fonêm¹²⁵. Ya dîtir, ji nav dengên Arebî tenê dengê (Ğ) aniye, ku bi du tîpên (gh) hember daniye, wekçawa dengê /x/eya Kurdî bi (kh) temsîl kiriye. Wêneyek ji tîpên pertûka wî vaye li jêr hatiye:

ORTHOGRAPHY.

The characters here used for expressing the Kurdish sounds are as follows :

VOWELS. *a* has the open *a* sound in *far, father*.
ã, the flattened sound in *hat, man*.
â, the broad sound in *all, awful, or*.
ē, the "long *a*" sound in *fate, male, they*.
e, the sound in *met, pen*.
ī, the "long *e*" sound in *meet, mete, pique*.
i, the sound in *pin, pit*.
o, the sound in *note, boat*.
u, the sound in *rule, moon, fool*.
ũ, the "neutral vowel" sound in *but, come, blood*.
ai, the sound in *aisle*, "long *i*" in *pine*.
au, the sound of *ow* or *ou* in *cow, sour*.
oi, the sound in *boil*.

CONSONANTS. *b, d, f, g, h, k, l, m, n, p, r, s, t, v, w, y, z*, are sounded as in English, *g* always with its "hard" sound, as in *get, give, go*, and *r* with distinct trilled utterance, as in German or French.

ch, j have their English sounds in *church, judge*.

sh, zh have the sounds of *sh* in *she*, and *s* or *z* in *pleasure, azure*.

kh, gh are deep guttural spirants or fricatives.

Encama tewerê sêyem (Fonêm û Alifba):

¹²⁵Samuel A. Rea(1869): A brief Grammar and vocabulary of the Kurdish Language of the Hekarî District, missionary of the A. B. C. F. M. In Kurdistan. (rûp 119 – 120)

Bêgoman danîna sîstima nivîsînê di zimanê Kurdî de karekî giring e ku her tîpek ji alîfba bête terxandin bo her fonêmekî, ango fonêmkirina alîfaya Kurdî, wekçawa guhartineke xuya di nîşankirina alîfaya Arebî de drust bûye jibo temsîlkirina fonêmên Kurdî ku zaravê Soranî li Kurdistana Iraqê û ya Îranê bikar têne. Ev jî bi riya danîna xalan li ser beşek ji tîpên Arebî wek dengdarên (چ پ ژ گ)¹²⁶, wilo jî guhartinek di Latînî de çêkirin bo ku bikare temsîla fonêmên Kurdî bikin. Tewfîq Wehbî di ferhenga xwe ya Kudî-Englîzî de pêşniyara du tîpan /sh/ beramberî /ş/ kir, û /ch/ beramberî /ç/ danî. Lê, li dawî Hikûmet Iraqê weha ji wan xwest ku alîfaya Latînî bidin alîkî, û bi alîfaya Arebî bi kirasekî nûjen li dengên zimanê Kurdî bikin.

BIRR IV 2.4.

Fonêmên Kurmancî di Şîrovekirina Fonolojî de

2.4.1. Jimara fonêmên Kurdî li nik zimanzanên sedeyê bîstan

Ta niha ez pêrgî jêderekî wa têrûtesel nehatime ku derbarî hemû aliyên dengên zimanê Kurdî bide ber xwe. Ez vê yekê dibêjim, û ez bi xwe jî nikarim vî alî têr bikim, ji ber ku lêkolîn di vî warî de berî her tiştî pêwîstî bi amêrên dengsaziyê heye ku giriftariyên deng bi riya teknoloji werin çareserkirin, yan jî wê dîsa kêmbê, wek vî berhemê nav destê we de, sedema dîtir jî ew e gelek kêşeyên aloz û bîrûrayên ciyawaz derbarî dengên zimanê Kurdî hene, nemaze di barê dengên diyalektên Kurdî de. Kêşeya jimarên dangan - wek Dr. Ewrehman Hacî Marif¹²⁷ daye xuyakirin- (di hin rêzimanên kevin de ne wek hev in, bo nimûne dengên dengdêr li nik F. Justi¹²⁸ û S. Yegîzarof¹²⁹ nêzîkî (15)a ye, lê li nik E. B. Soan¹³⁰ û R. F. Jardine (10) in¹³¹. Dr. Hacî Marif di nivîsara xwe de hin rastiyan diyar dike

¹²⁶Kurdish Orthography, a historical view (rup 1)<http://www.kurdishacademy.org/>

¹²⁷- Ev beş li ber pertûka zimanê Kurdî li ber roşnayî fonetîk de

¹²⁸- F. Justi, Kurdishe Grammatik, 1880, pp.1- 102

¹²⁹- S. Yegîzarof dîrokeke Etnografî kurdî Kurdî Parêzgeha Yerîvan, Teflîs, 1891

¹³⁰- E. B. Soan, Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language, London, 1913, pp. 1-5

¹³¹- R. F. Jardine, Bahdînan Kurmanji, Grammar of the Kurmanji of the Kurds of the Mosul division and surrounding districts of Kurdistan, Baghdad, 1922.

dema ku dibêje: (danana Alîfbaya Latînî li sala 1929 bo Kurdên Sovyêtê¹³² û li sala 1930 – 1931 bo Kurdên Sûriya, gaveke mezin bû di xuyakirina dengên dengdêr û dengdar) de. Alîfbaya Kurdê Ermenistanê li ser bingeha Alîfbaya Latînî hatibû danîn, ya ku bo nivîsîna zimanê kêmatiyên Welatê Sovyêtê hatibû danîn. Alîfbaya Kurdên Sûriya jî li ser bingeha (Alîfbaya Latînî – Tirkî) hatibû danîn. Jimara tîpên dengdêr di wan herdû Alîfbayên me anîn ziman yek in, ku (8) in. Lê jimara tîpên dengdar (coseonant) di wan herdû Alîfbayan de ne yek in: di ya Kurdê Sûriya de 25 tîp in, û di ya Kurdê Sovyêtê de 30 in. Ev ciyawazî ne encama cudabûna diyalekta ye, ji ber ku herdû nivîs di yek diyalektê de ne, lêbelê ciyawazî her ew e ku hin deng di Alîfbaya Kurdên Sûriya de wek fonem nehatin jimartin. Dr. Ewrehmanî nedaye xuyakirin ka danerê vê Alîfbayê kî ye, tenê jê re dibêje Alîfbaya Kurdên Sûriyê. Gelo ev alîfba ya Celadet e, yan ya mirovekî dîtir e, nizanîm!!?

V. S. Sokolova di pertûka xwe de ya ku derbarî zimanên Îranî nivîsiye, bi şêweyeke rast û zanistiyane li ser fonetîka diyalekta Kurdên Xuresanê şexilîye, û 9 deng bo dengdêr daniye, û 30 deng bo dengdar destnîşan kiriye. Di vî barî de Qenatê Kurdo û Çerkezê Beko jî (9) dengdêr, û (30)dengdar. Lê Kerîmê Eyûbî û A Simîrnûva bo dengdêr (11) deng, û bo dengdar (26) deng. Li nik D. N. MacKenzie (8) deng bo dengdêr di zarê Kurmancî de, belê (9) deng bo dengdêr di zarê Soranî de. Di sala 1932 li Şamê Herekol Azîzan (Celadet Bedirxan) di bin navê ((Rêzimana Elîfbêya Kurdî) namêlkeke bîst rûpelî bi pênc zimana (Kurdî, Fransî, Turkî, Arebî, Farisî) belav kiriye, tê de 8 deng bo dengdêr, û 23 deng bo Dengdar daniye. Celadet Çalî Bedirxan di sala 1953 pertûkek di rêzimana Kurdî de belav kiriye. Di sala 1970 de li ser bingeha vê pertûkê Rojê Lîsko bi awakî feretir û bi navê xwe û navê Celadet Bedirxan pertûkek di rêzimana Kurmancî de bi zimanê Fransî belav kir.

Bo em vê yekê dûdirêj nekin, emê cedwelekê bi navê daner û jimara dengan, dengdêr û dengdar, li jêr danin, ew jî ev in:

Pertûkên Rêzimana Kurdî	Zarav	dengdêr	dengdar
F. Justi û S. Yegîzarof	Kurmancî	15	
Alîfbaya Kurdê Ermenistanê 1929	Kurmancî	8	30
Alîfbaya Kurdên Sûriya 1930 – 1931	Kurmancî	8	25
V. S. Sokolova ¹³³	Kurmancî	9	30
Qenatî Kurdo ¹³⁴ û Çerkezê Beko ¹³⁵	Kurmancî	9	30

¹³² - Xalidê Çeto, Kurdên Erministana Sovêtê, Yerîvan, 1965 (rûpel 116- 120)

¹³³ V. S. Sokolova, derbarê fonetîka zimanên Îranî, Mosko, Lîningrad, 1954

¹³⁴ Qenatî Kurdo (Kordoyêv), rêzimanê zimanê Kurdî, Mosko, 1957

¹³⁵ Çerkezê Beko (Bakayêv), zimanê Kurdên Azirbaycan, Mosko, 1965

Kerîmê Eyûbî û Asimîrnûva ¹³⁶	Kurmancî	11	26
Celadet Çalî Bedirxan 1932 ¹³⁷	Kurmancî	8	23
Celadet Çalî Bedirxan 1953 ¹³⁸	Kurmancî	8	
Rojê Lîsko û Celadet Çalî Bedirxan 1970 ¹³⁹	Kurmancî	8	23
Reşîdê Kurd 1956 ¹⁴⁰	Kurmancî	8	23
D. N. Mekenzi ¹⁴¹	Soranî	9	
Tewfîq Wehbî ¹⁴²	Soranî	8	25
Nûrî Çelî Emîn ¹⁴³	Soranî	12	32
Tahir Sadiq ¹⁴⁴	Soranî	6	28
M. Emîn Hewremanî ¹⁴⁵	Soranî	8	27
Mesûd Mihemed ¹⁴⁶	Soranî	8	
Maşoud Rahimpour(2011): The University of Tabriz ¹⁴⁷	Soranî	8	30
University of Victoria Phonetic Database; UVPD 1999 ¹⁴⁸		8	30

2.4.2. Fonêm di Pîvanên Şîrovekirina Fonolojî de

Ta niha me dengên zaravê Kurmancî kom dikir û taybetiyên wan yên dengsazî, herweha me hebûna wan jî di hundurê peyvê de wek nimûne da xuyakirin. Ya dîtir jî me fonêm li gor tiyoriya fonolojî da naskirin ku giringtirîn dane ye di dengsazî de herweha piraniya zimanan li ser bingeha fonêm ava dibin. Di beşê bûrî de û di despêka vî beşî de me anî bîra we dengên zimanê Kurmancî (46) deng in.

Wek me berî niha jî da xuyakirin: bo destnîşankirina fonêm di ziman de sê pîverên bingehî wek sê taybetiyan pêwîst e di deng de hebin ta ku bibê fonêm, ew jî ev in:

- 1) **Sîmaya watacudaker (the meaning-distinguishing feature)¹⁴⁹**
- 2) **Diyarbûna deng bi rêjeyekî bilind di ziman de (high frequency)¹⁵⁰**

¹³⁶ Kerîmê Eyûbî û A simîrnûva, diyalekta Kurdê Mukrî, Lîningrad, 1968

¹³⁷ Mîr Hereqol Azîzan, Rêzana Elfabêya Qurdi, çapxana Terekî, Şam, 1932

¹³⁸ Celadet Bedirxan, Grammaire Kurde, Paris, 1953

¹³⁹ Emir Djeladet 'Alî Bedir khan et Roger Lescot, Grammaire Kurde, (Dialecte Kurmandji paris, 1970

¹⁴⁰ Reşîdê Kurd, Rêzimana zimanê Kurdî 1956

¹⁴¹ D. N. MacKenzie, Kurdish dialect studies, London 1961

¹⁴² Tewfîq Wehbî, xwêndewarî baw, Bexdad, 1933

¹⁴³ Nûrî Elî Emîn, Rêzimanê Kurdî, Silêmanî, 1960

¹⁴⁴ Tahir Sadiq, Rênûs, çonyetî Nûsînê Kurdî, Kerkûk, 1969

¹⁴⁵ M. Emîn Hewremanî, fonetîkî Zimanê Kurdî, Bexda, 1974

¹⁴⁶ Mesûd Mihemed, Fonetîk çîman bo bika, ((Govarî Korî Zanyarî Kurd)), bergî sêyem, , beşî yekem Bexda 1974

¹⁴⁷ Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran (rup 73-75)

¹⁴⁸ Mahjoub Zirak (2014): (rup 79)

¹⁴⁹ George Yule the (2006) Study of the Language, Cambridge University Press (rûp 42-43)

3) Watacudakerî di riya destûra beramberkirina cotepeyvvan (contrast of minimal pair)

Fonêmên zimanê Kurdî dibine du nifş: dengdêr û dengdar (consonants and vowels). Zimanê Kurdî bi alîkariya van herdû nifşên dangan: dengdêr û dengdar drust dibe. Bêje û peyv wusa şêweya xwe distênin û her yek ji wan watayeke taybetî dide. Bo vê yekê, me du lîste ji peyvên Kurdî, li gor hatina her dengêkî yan her tîpekê danîne, ew jî ev in:

2.4.2.1.Dengdar (consonants)

Dengdar ew fonêm in, yan ew deng in, ku hewa ji qirikê ta di dev û bêhvilê re derbikeve, pêrgî hin organan dibe, ku her ev jî şêweyeke taybetî ji deng derdixê, bo nimûne, dengê (m) û (p) bi riya organa lêvê drust dibe, wilo jî dengên ziman yên dîtir.... htd. Di Alîfbaya Kurdî de, li gor ku îrroj kar pê tê kirin (23) dengdar hene, wek ku Celadet Bedirxan destnîşan kiriye. Eva han jî gelekî nêzîkayiyê li rastiya sîstima dengsaziya zimanê Kurdî dike, bi ser ku eva han li Kurdisatanê bi şêweyeke hindik yan gelek tê guhartin, nemaze li nik Kurdên Iraqê, ji alîkî ve, û li nik Qenatê Kurdo ji alîkî din ve. Lê eger cotepeyvên zimanê Kurdî danin ber hev emê wa bibînin ku fonêmên dengdar li gor cotepeyvvan jimara wan digihê 26 fonêman, herçende ku sê fonêmên dîtir (h̄, ğ, ڤ) / (ح, غ, څ) hene ku bi hindîkayî di zimanê Kurdî de bikar tên. Inca bûna van hersêkan di Kurdî de cihê biryardaneke giştî ye, çî wan ji nav fonêmên Kurdî bijimêrin, yan jî wan ji Kurdî dûrbikin.

Ji wan (46) dangan (31) sih û yek deng berî niha isbat bûye ku Fonêmên Kurdî ne, yên ku Bedirxan tîpên Latînî beramber wan daniye, îrroj wek alîfbaya Kurdî bikar tên. Goman li ser van dangan nîne ji ber ku di piratîkê de ev deng wek fonêm di şêweya girafimên tîpên Latînî de bi seda pertûk hatine nivîsîn û çapkirin. Ya giring jî ew e tikesî ji xwendevanan yan ji nivîseran gazin jê nekirine. Inca emê wan dangan bixin ber destûra beramberkirina cotepeyvvan de bo ku ruyê fonêmî tê de diyar bibe:

Cotepeyv (minimal pair):

Li ser destûra cotepeyv (minimal pair), em dikarin fonêman di zimanê Kurdî de destnîşan bikin, ku ev jî di riya beramberkirina her du peyvvan, yan her çend peyv, ku her peyvek ji wan watayeke xweyî taybet dide, lewra jî dengên peyvê di rêzîkirineke sîstîmdar de diyar dibin û wata didin, fonêm li ser du beşan parve dibin: dengdar û dengdêr:

¹⁵⁰ Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran (rup 73-75)

1. Fonêmên Dengdar di Kurmancî de:

/p/ par

/b/ bar

/t/ tar

/d/ dar

/k/ ker

/g/ ger

/ç/ çar

/c/ car

/f/ fîr

/v/ vîr

/s/ sar

/z/ zar

/ş/ şar

/j/ jar

/m/ mar

/n/ nar

/l/ al

/r/ ar

/r/ vir, fir

/f/ virr, firr

/x/ xar /xx/ ê/ êar

/y/ yar

/w/ war

/h/ har

/q/ qor kor

Cotepeyv	dengdar	Jimar
----------	---------	-------

bar	par	b p	2
car	çar	c ç	2
sar	zar	s z	2
dar	tar	d t	2
jar	şar	j ş	2
mar	nar	m n	2
mar	mal	r l	2
kor	gor	k g	2
virr	firr	v f	2
virr	wirr	w	1
xûz	kûz	x	1
yar	war	y	1
yar	har	h	1
kor	qor	q	1

2.4.2.2. Nîvçedengdêrên [y], [w] di Kurdî de

Pirsek tete meydana van herdû dengan, ka nîvçedengdêrin, yan nîvçedengdar in?

Dema mirov dengdêrên girtî wek [i] û [u] bi awakî derbixê ku kortika dev heme bêje nayê vekirin û ti dengdêrên dîtir jî wilo çê nebin, ku ev dengên[w] û [y] hem wek dengdêr tîn, hem jî wek dengdar tîn, ango nêzkî li herdû celebên, dengdar û dengdar, dikin, lewre jî ev deng ku şeweya [y] û [w] digirin, dikarin hevaltiya hem dengdaran bikin, hemî jî hevaltiya dengdêran bikin. Ev herdû deng nêzikî dengdêrên xişok û rewan in, her ji ber wilo jî, gih jê re dibêjin nîvçedengdar, û gih jê re dibêjinnîvçedengdêr (nîvçevawel).

Di Kurdî de, bi hemû zaravên xwe ve, bi hevalbendiya dengdêrekî sade ligel dengê [w] yan [y] bi mercê ku rawestan li ser dengê dawî yê nîvçe hebe, zodengan drust dike wek:

Grûpa A): birawestan zodengên dengdêr dide, heçkû [w] û [y] **dengdêr** in.

1. [-aw] daw, gaw (ga û ...), [daw]
2. [-ew] ew, dew, kew, xew [dew]
3. [-îw] nîw, dîw, nîw (nîv), çîwçîw[nîw]
4. [-êw] zêw, mêw, nêw, pêw „[zêw]
5. [-ay] nay, way, hay[way]
6. [-ey] hey hawar, deydîk, meyger, weywey, hey

7. [-êy] pêyda, têyda, lêyda (Sorani) pêyde (pê bide, bide wê/wî)
8. [-oy] doy (di Sorani de pirtir derdikeve); doy xwardewe, wî dew vexwar

Girûpa B): bêrawestan, ango, eger rawestan şkest, zodeng ji hev vediqete, dengên [w] û [y] wek **dengdar** diyar dibin, ku dengên [w] û [y] dibine parçek ji birrgeya duyem, wek:

- | | | |
|-----------|--------------------|----------------|
| 1. daw | dawa xwe girê de | da-wa |
| 2. dew | dewê te tirş e | de-wê |
| 3. nîwnîw | nîwnîwa kitikê ye. | nîwnî-wa |
| 4. zêw | here nav zêwê | zê-wê |
- wilo jî yên dîtir.

Wek em dizanin ku di Kurdî de di hemû devok û zaravan de du dengdêr pevra di yek birrgeyê de komsaz nabin, ango goşiyê dengdêran di Kurdî de peyda nabe; tenê herdu dengên [w] û [y] bi erkê girêdana peywendiyên fonolojî radibin, ku dengdêr eger hatin nik hev di piroseya morfolojî de, nîvçedengdêr navbendiyê navbera wan de drust dike. Ji ber wan rûçikên fonolojî ku ev herdu fonem hildigirin, dikarin hevaltîya herdu celebên dengên dengdar û dengdêrbikin, her ev bi xwe taybetîyeke dengdarkî(konsonatkî) ye, lewra, ev herdu fonem /y/ û /w/ dikevin ber celebê dengdaran de. Ji ber wilo jî, em dikarin weha bêjin ku ev herdu fonem /y/, /w/ li gor yasayên fonetîkî dengdêr in, lê li gor peyrewkirina fonolojî dengdar in, ku bersiva pirsê me di seretayê movikê de hat.

3. Dengdêrên Kurdî(vowels)

Dengdêr, ew fonem in, ku hewa wusa ji dev û qirikê derdikeve bê ku endamek ji dev di riya wê hewayê de rawestê, û ligel dengdaran peyvên ziman ava dikin. Ji van dangan re (vowel = dengdêr = *صائت*) dibêjin, ew jî heşt in: **a, e, u, ê, o, û, î, i**

Dengdêr du celeb in:

1. Dengdêrên dengkurt ku sisê ne: (**e, i, u**)
2. Dengdêrên dengdirêj ku pênc in: (**a, ê, î, o, û**)

Di sîstîma ziman de peyv yan bêje nikarê li ser bingeha dengdêran tenê xwe ava bikê, pêwîstî bi dengdaran heye jibo ku peyv û riste û gotin bi şêweyeke drust pêkwere. Inca fonemên dengdêr di zimanê Kurdî de li gor cotepeyvên Kurdî ev in:

cotepeyvên Kurdî	fonem
(dar, dêr); (zar, zêr); (kal, kêl); (şêr, şar)	a, ê

(kîl, kil); (şîr, şir); (bîr, bir); (pîr, pir)	î, i
(der, dar); (zer, zar); (kel, kal); (şer, şîr);	e
(kun, kon); (gur, gor); (kuç, koç); (kur, kor)	u, o
(dûr, dor); (kûr, kur); (tûr, tor); (dor, dûr)	û

dengdêr Peyv

a	dar, zar, kal, şar, gar, çak, jar, bar, ban, par
ê	dêr, zêr, kêl, şêr, gêr, çêk, jêr, bêr, bên, pêr
î	dîrok, zîrek, kîl, şîr, gîr, çîk, jîr, bîr, bîn, pîr
i	diran, zirç, kil, şir, gir, çik, jin, bira, bin, pir
e	der, zer, kel, şer, ger, çek, jen, ber, ben, per
u	dur, zurne, kul, kun, gur, kuç, kund, kur,
û	dûr, zû, kûr, şûr, hûr, çûk, tûr, bûk, bûn, rût
o	dor, zor, kol, şor, gor, çok, tor, bor, bo, por

Bi vî awayî fonêmên her zimanekî têne jimartin û diyarkirin. Lê ew fonêma ku watayekê nû dide, nikarê bi tena xwe, ango dervî ristika peyvê, watayekê bidê, lewra dibe wek tiştêkî rûten¹⁵¹ (abstract مجرد). Vêca rêzkirina fonêman di rêkxistineke taybetî de birrgeyekê, yan jî, carna, morfêmekî drust dike, bo nimûne, peyva (koledar) ji heft fonêman pêktê: (k + o + l + e + d + a + r), û ji sê birrgeyan: (ko + le + dar), lêbelê ji dû morfêman (kole + dar) drust dibe.

Dengdêrên Rêza Pêşik û Navîk û Paşik:

Dengdêr di hersê zaravên Kurdî de (Kurmancî û Soranî û Zazakî) yek in, ku ji aliyê dariştina sazgeha deng ve ser sê rêzan diyar dibin¹⁵² ku ew jî weha tînen:

1. Dengdêrên rêza **pêşik**: /î/ wek (pîr, zîrek, pîrek, tîr), /ê/ wek (mêş, pêş, mê)
 /î/ lêv hawbeşî bilêvkirina vî dengdêrî nake.
 /ê/ serûyê zar hawbeşiya bilêvkirina wê dike, lêv hawbeşiya wê nake.
2. Dengdêrên rêza **navîk** /e/ , /i/ , /u/
 /e/ lêv hawbeşiya bilêvkirina wê nake, wek peyvên: (erê, belê, name)
 /i/ dengêkî kurt û sivik e di navîka peyvê de tê, lêv hawbeşiya wê nake, wek peyvên (dil, kirin, bira/bra ...)

¹⁵¹(rûten) ji du peyvên sade pêkhatiye: (rût + ten). Min jî ev peyv wek zarawe drust kir li şûna (abstract مجرد)
¹⁵²Q. Kurdoşev (1984), Rêzimanî Kurdî be kerestey diyalêktî Kirmancî û Soranî, wergernadina Dr. Kurdistan Mukiryani, Emîndarêtî giştî Roşinbîrî Lawan, Hewlêr.

/u/ lêv hawbeşiya wê dike. Ev fonêm bi dû dengên /t/, /d/, /k/, /g/ de pirtir tê, wek: tund, tup, turk, durust, durr, gur, guv, gun, gul, kur, kurd, kun, kuxk ...

3. Dengdêrên rêza **paşîk** /a/ , /o/ , /û/

lêv hinekî beşdariya bilêvkirina van dengdêrên jêrîn dike:

/a/ wek peyvên(av, aw, ba, za, baran, zava, gav, xav, Zara, Dara)

/o/ lêv hawbeşiya wê bi tewawî dike, wek: (roj, kom, ox, of, ol, jor)

/û/ lêv hawbeşiyêbi tewawî dike û girover dibe, wek peyvên (zû, dûr, kûr)

• **Wesfdana Dengdêran bi Kurtî:** Dengdêr li gor hin fakteran têne wesifdan, her ew jî **zar** û **lêv** in, bi vî awayî derdikevin:

1- Sazgeha dengdêr li ser parçê zar tê, ew beşê ku ji zar bilind dibe: (**pêşîka zar** – front), yan (**navîk** - middle/central) yan jî (**paşîk** (back), wek van nimûneyan:

Dengê [i] di peyva (bir) de pêşîk e.

Dengê [e] di peyva (ber) de navîk e.

Dengê [u] di peyva (kur) de paşîk e.

2- Çendayetiya bilindbûna zar:**bilind**(hiğ), **navincî**(mid), **nizim**(low).


3- Pileya vekirina lêvan û dev: **vekirî**(open), **nîvvekirî**(half open), **girtî**(close).

4- Li pêka şeweya lêvan: **girover** (rounded), **nîvgirover**(half rounded), **gêr**(spread).

• **Wesfdana Dengdêrên Kurdî di vê cedwela jêrîn de diyar dibe:**

	Features
[i]	front, close, short, spread
[î]	front, close, long, spread lip
[e]	front, half open, short, spread lip
[ê]	front, half open, long, spread lip
[a]	back, open, long, neutral
[o]	back, half open, long, round lip
[u]	back, close, short, round lip
[û]	back, close, long, round lip

Di lêkolîna Dektora Mehjûb de ev nexşa jêrîn ya wesfkirina dengdêrên Kurmancî ku di bin navê (Vowel inventory in Kurmanji) de wilo hatiye¹⁵³:



BÏRR: V 2.5.

Fonêmên Alîfbaya Îro û Dengên [uî], [ŋ], [ɞ]

Piştî ku me tîyoriya fonêm da xuyakirin, emê di vî birrî de, birrê pêncem, li ser (31) tîpên alîfbaya Kurdî, ku Celadet Alî Bedirxan danîbû, wek fonêmên Kurdnijad têne jimartin, rawestin, ligel sê dengên dîtirî Kurdî, ku ew jî ev in:

- dengdêrê zodengê [uî], dengê bêvilok [ŋ], dengê hemza [ɞ].
- Nih dengên stûr di Kurmancî de hene pêwîstî bi lêkolînê heye ka fonêm in yan alofon in, ev mijar ji ber giringiya wê emê jê re birrê şeşem biterxênin.
- Bi vî awayî sê dengên Arebî [h], [ç], [ğ] di dest me de dimênin ku dibin mijara birrê heftem bi navê (zirrdeng di Kurmancî de) tê.

2.5.1. Sih û Yek Fonêmên Alîfbaya Îro:

Fonêm ku îro roj di zimanê Kurdî de bikar tên ji xwe hemî Kurdnijad in, ku ji kevin de di zimanê Kurdî de hene, ji bilî dengê /q/ ya ku di bin kartêkirina zimanê Turkî û Arebî de bûye tavilek ji sîstima fonêmên Kurdî. Hêjayî gotinê ye ku ev her sih û yek fonêmên alîfbaya Kurmancî bi heman hêzê di zaravê Soranî û Zazakî de bikar tên, ku dibe nîşana yekêtiya zaravên Kurdî ku bi yek alîfbayê binivîsin. Ev 31 fonêm dibin du celeb:

1. Fonêmên dengdêr heşt in / a o u û e ê i î /
2. Fonêmên Dengdar 23 fonêm in, wekçawa di vê cedwela xwarê de sazgeh û awayê derbirrîna van fonêman destnîşan dike:

¹⁵³Mahjoub Zirak (2014), (rup 148)

dengdar	lerînsazî	lêvî	zimankî (apical)	pêş- esmankî	paş- esmankî	zimanokeyî	qirikî
kospek occlusives	kip	p	t		k	q	
	girr	b	d		g		
	kip			ç			
	girr			c			
xişok (fricative)	kip	f	s	ş	x		h
	girr	v	z	j			
bêvilok	girr	m	n				
Layî	girr		l				
flap	girr		r				
tri], givok	girr						
Rewan	girr	w		y			

2.5.2. Pazde Deng di Kurmanci de

Piştî ku me dengên fonêmbar dan xuyakirin ku tevahiya wan 31 fonêm in yê ku wek tîp di alîfbaya îro de bikar tên; bi vî awayî ji nav tevahiya (46) deng di destê me de dimênin ku di nivîsîn û xwendina Kurmanciya Latînî de bikar nayên; ew jî weha tên: dengdêrê Koçerî[**uî**], dengê bêvilokî [**ŋ**], dengê hemza [**ʔ**], nih dengên stûr, sê dengên Arebî. Ji vir û pêde emê li ser van dengên rawestin ka gelo ev deng dikarin bibin fonêm yan behra wan tenê alofon bimênin, yan hin ji wan zirrdeng in yan zirrfonêm in. **Zirrdeng** ya **zirrfonêm** ango ew dengên ku di bingeha xwe de ne Kurdnijad in, ku li encama pêwendiyên dîrokî û komelayetî û cografî ev herçar fonêm /ğ/, /h/, /ç/ û /q/ ji zimanên Arebî hatine nav Kurdî, ku ev jî bi riya hevbeşiya dîne misilmantiyê çêbûye. Îca wek van dengên her di tevna peyvên Arebî de diyar dibin, wek: (*Quwet bê, hewz, gêzel, Merçê*).

2.5.3. Dengdêrê Diftonga /uî/

Di piraniya devokên (Badînan û Botan û Koçeran) de zodenga [-uî] li şûna dengê sade yê dirêj [û] bi piranî bikar tê, ev zodeng gelek nêzîkayî li zodenga zimanê Fransî dike, wek nimûne di van peyvên jêrî de diyar dibe:

bûk = buîk dû = duî
rû = ruî mû = muî

Ev zodeng ya herî rast û drust e, û dikeve ber dengdêran de, ji ber sedemên fonolojî, min dît ya baş ew e lêkdana vê zodengê bi alîkariya girafîma[u] be, ne [w] be, û bi dû de girafîma [î] ku herdû pevra werin bi şêweya [uî] drust e. Ev zodeng di Kurmancî de wek alofon têtê jimartin ji ber ku di şûna fonêma /û/ de têtê, ku tenê di hin devokên Kurmancî de diyar dibe, ji ber wilo jî nakeve ber taybetiya diyarbûna giştî de wek (high frequency) ya hemû devokên Kurmancî. Lewra, zodenga/uî/ nehatiye bijartin wek fonêm ji ber ku ev deng li şûna dengdêrê sade ya /û/ di devera Badînan û Botan de bikar tê (dihê), ango deng şûngirekî devokî ye, lewra nakeve nav sîstima fonêmên ziman de, tenê wek deng û alofon dimêne, û pêwîstî bi tîpeke alîfbayî nîne.

2.5.4. Dengê bêvilok [ŋ]:

Ev deng [ŋ], herçend nivîserekî Kurd, Maşoud Rahimpour¹⁵⁴ di lêkolîna xwe de vî dengî wek fonêm di zarê Soranî de dibîne, lê ez bi xwe vê rayê drust nabînim, ji ber ku diyarbûna wî gelek hindik e, ji ber wilo jî, piraniya zimanzanên Soranî vî dengî wek alofon dibînin. Wilo jî, her di Kurmancî de, ev deng nikare bibe fonêm, tenê dengê devokî ye, ji ber ku diyarbûna wî hindik e û rola wî di drustkirina peyvên de nîne, lewra ev deng dikeve nav beşê alofonan de.

2.5.5. Dengê Hemza: [ʔ], [ə]

Dengê ((hemza)) di dengsazî de jê re bi Englîzî (glottal stop) dibêjin û girafîma wê jî ev [ʔ] e, lê min girafîma [ə] jê re baştir dît. Ferhenga Routledge Dictionary wek dengê axaftinê (speech sound)¹⁵⁵ dide naskirin ku di mîkanîzma dengkirinê de diyar dibe dema ku qirik têtê girtin û carake dîtir ji nişkave têtê vekirin bi awakî weha ku deng tewjimokî dertê. Ev deng tenê di despêka dengdêran de diyar dibe, lewra weha têtê naskirin ku hemza bi xwe ew deng e ku pirtir di seretaya dengdêr de têtê, yan jî em dikarin bêjin ku despêkirin bi dengdêr (vowel) pêwîstî bi diyarbûna (hemza) heye, ango di piroseya despêkirina bilêvkirina dengdêr de wek piroseyeke fîzyolojî diyar dibe, lê (hemza) wek şêwe û tîp di

¹⁵⁴Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran, Published by Canadian Center of Science and Education, International Journal of English Linguistics Vol. 1, No. 2; September 2011, www.ccsenet.org/ijel

¹⁵⁵Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork.

Alîfbaya Kurmanciya Latînî de nîne, belê di tîpnivîsa Arebî de heye, wek: (أ ء ئ و). Herwerha dengê ((hemza)) wek tîp di alîfbaya zarê Soranî û Kurmanciya Kurdên Iraqê de diyar dibe, nemaze ku tîpên Arebî rê didin şêweyeke weha derbikeve, wek (ئ/ه) bi navê hemza tê naskirin. Hin zimanzan dengê (hemza) wek fonêm dibînin. û hin jî wek deng û fon lê meyze dikin, lewra ti şêwetîp jê re nabînin. Ez bi xwe vî dengî wek fonêm dibînim ji ber hoyên zimanvanî ku mirov hest pê dike, herweha dikeve tevna drustkirina birrge de. Diyarbûna hemza weha tê:

1) Hin peyv hene wek (neə) ku (hemza) di dawî de tê, lê cihê (hemza) di piraniya peyvên ziman de pirtir di seretaya peyvê û birrgeyê de tê, wek:

Kurdiya Latînî		Tîpnivîsa Arebî
ez	əez	ئەز
ûr	əûr	ئور
êvar	əêvar	ئيفار
agir	əagir	ئاگر
axaftin	əaxaftin	ئاخافتن
ajotin	əajotin	ئاژوتن

2) Di zimanê Kurdî de hin kar hene, ku bi dengdêr des pê dikin, û wek em dizanin di seretaya wan dengdêran de (hemza) diyar dibe, wek: axaftin, ajotin, anîn, êşan... htd. Di piroseya gerdankirinê de "kar" çend pêşrêsan werdigirê, wek (di-) û (bi-) û (ne-) û (na-). Inca di xelesa hevghiştina dawiya pêşrêse de ku dengê (i)ye ligel dengdêrê despêka regê kar (-a) yan (-ê) yan (-î) tê, bi vî awayî du dengdêr digihin hev, wek em dizanin, herdû li hev nakin, di vir de du çare hene:

1. Jibo (hemza) bê xwendin, xêzikek (dash) bikeve navbera herdû dengdêran de, wek: (di-axêvim), bi vî awayî dengê (a)ya (-axêvim) ji sereta ve tê xwendin.

2. Jibo (hemza) neyê xwendin: Lê eger em xêzikek nedanin, wa pêwîst e ku dengdêrek dengdêrekî dîtir bixwê, yek yekî dixwê, nemaze yê dirêj yê kurt dihilênê, lewra bi vî awayî diyar dibe, wek:

Erênî:

jêder	rêjeya nihokê	rêjeya ferman	
	hemza tê xwendin	Hemza nayê	bi- reg

	di- reg		xwendin	
axaftin	di-axêvim	di@axêvim	taxêvim	baxêve
ajotin	di-ajom	di@ajom	tajom	bajo
êşan	di-êşim	di@êşim	têşim	bêşe
hanîn	dihênim	dihênim	tênim	Bihêne/ bêne
anîn	di-ênim	di@ênim	tênim, tînim	bihêne / bêne
hênan	dihênim	dihênim	tênim	bihêne / bêne

Nerênî:

rêjeya Erênî		rêjeya nerênî
di- reg		ni/ne/na- reg
di-axêvim	taxêvim	naxêvim, ne-axêve
di-ajom	tajom	najom, nejo,
di-êşim	têşim	nayêşe
dihênim	tênim	bihêne
di-ênim	tênim tînim	nayênim, na-ênim, ne-êne

- 4) Li dawiya peyvê: Wek diyar e dengê (hemza) di zimanê Kurdî de di seretaya dengkirina dengdêr de diyar dibe, nemaze ew peyvên ku bi dengdêr despê dikin, wek (axaftin, ajotin, enirîn, ûr, arî, agir, ez), lê dibe ku hemza bikev navîka peyvê de wek (axaftin) ger bikeve rêjeya karê nihokê ku dibe (di-axêvim) bi danîna xêzikeke biçûk navbera herdû dengdêran de tê danîn, bo parastina herdû morfêman, ji ber ku di axaftinê de peyv tûşî vemirandina hind deng dibe, wek guhartinên dengsazî nav lê dikin wek (assimilation). Lê eger wa hat ku peyveke biyanî, nemaze, yên Arebî dawî bi dengê (hemza) bû, ev deng nayê bilêvkirin, wek peyva (قضاء) û (بلاء) a Arebî di Kurdî de bûye (qeda) û (bela) ku ti (hemza) tê de nayê bilêvkirin. Di hin peyvên Kurdî de dengê (hemza) dibe (ع) wek: (asman) dibe çesman عه سمان

asman	عه سمان	çesman
ûr نوور	عوور	çûr
aferîn	عافرين	çafêrîn
qur-an	قورعان	qurçan

BIRR VI 2.6.

2.6. Dengdarên Stûr di Kurmancî de

Di zimanê Kurmancî de **nih** dengdar [p], [k], [t], [ç], [s], [z], [d], [r], [l] hene, di birrek peyv de piçekî stûr têne bilêvkirin ku me bi du şêwe girafîm dan nîşankirin: Şêweya yekem û hesan: ku dengê stûr bi tîpa xweya normal lê dubarekirî, wek: [pp], [kk], [tt], [çç], [ss], [zz], [dd], [rr], [ll] (ji ber ku hin car ev dubarekirin di nivîsînê de hesanîtir tê). Şêweya duyem¹⁵⁶: bi girafîmên taybet yên wîndoza min ev şêwe hilbijartin [p̣], [ḳ], [ṭ], [ç̣], [ṣ], [ẓ], [ḍ], [ṛ], [ḷ].

Inca, wek dengê [s] di peyva (sêl) de bi şêweyeke normal derdikeve, lê heman deng di peyvên wek (sor, sal, sol, sar) piçekî stûr dibe ku şêweya [ṣ] distêne, ku herçende hinekî bi ser dengê Arebî de diçe, lê jê siviktir e. Wek diyar e ku nih dengên dengdar di Kurmancî de dikevin ber guhartineke dengsazî de ku 4 deng ji wan wek [p], [k], [t], [ç] di bin piroseya **bapekî û babirrkî de** (aspiration û nonaspiration)¹⁵⁷ de tên. Min jî têrmeke nû beramber peyva aspiration darişt ku ew jî (**bapek**) û (**babirr**) ji ber ku, di piroseya dengkirina deng de, hinek birrîn dikeve bapekîna dengkirinê de, û ev yek dibe sedema ku deng piçîskî stûr bibe bi awakî weha ku hin kes di dengkirina hin deng de hest pê dikan, û hin kes hest pê nakin. Di zimanan de diyardeya stûrbûna hin dengdar heye ku bi Arebî jê re dibêjin dengên (mufexxem) ku di nav Kurdan de bi gelek têrman nav lêdikan wek (qelew, giran, hişk, stûr) ku di ruyê normal de dengê bingehîn heye ku jê re (zirav/tenik/sivik...) dibêjin, wek ku di cedwela jêrî de diyar dibin:

Normal			Nenormal (stûr)		
1	p	par (beş, behr)	p̣	pp	p̣ar (sala bûrî)
2	t	ta (navê nexweşiyekê ye)	ṭ	tt	ṭa (tayê dirûtinê)
3	k	ka (kanî azad ?)	ḳ	kk	ḳa (ka êmê heywana ye)
4	ç	Çol	ç̣	çç	ç̣av (ççav)

¹⁵⁶ Min ev girafîmên taybet ji bernameya (windows) hilbijartin.

¹⁵⁷ Ev herdu **têrim (bapekî û babirrkî)** di vê lêkolînê de beramber (aspiration û nonaspiration) dariştin. Weha jî (**bapek**) beramberî **aspirated** tê, û (**babirr**) beramberî (non-aspirated) tê

5	s	ser	ś	ss	śe, śeg, śelik (sse, sseg, sselik)
6	z	zer	ź	zz	peź, źor (pezz, zzor)
7	d	dar	ḍ	dd	ḍasî (ddasî)
8	r	der	ř	rr	řoj, bîřîn (rroj, birrîn)
9	l	lorik	ļ	ll	ļotik (lлотik)

Li gor gera min, min wa dît ku hin dengdarên stûr di hin devokên Kurmancî de ji hin devokên dîtir pirtir diyar dibin, yan kêmtir, herweha hin dengdarên stûr bi devokekê tenik tên wek dengê [r] di peyva (derew) de di nav roavayian de tenik tê, lê li nav Aşîtan heman peyv bi [r]eya stûr dibêjin. Inca eger ev stûrbûna deng wek /s/eya stûr nebê sedema wê yekê ku fonêmeke nû were meydanê, ji ber ku peyveke nû bi watayeke nû nayê nav ziman, ku ev deng bibê fonêm û tîpeke nû derbasî alîfbaya Kurdî bibê. Lê dengê [r] ku stûrbûna wî jimarek ji peyvan drust dike, dikare bibe fonêm. Inca stûrbûna deng, eger nebe hokarê peydabûna peyvên nû, ji xwe ew deng alofon e, û heger peyvîne nû jî dan, lê jimara wan peyvan gelek hindik bû, dîsa nikare bibe fonêm. Bo ronîkirina vê diyardeyê, emê ruyê fonolojiya van dengên yek bi yek di movikên bê de vepexêrin, lê niha emê van nih dengên bi nîşan û girafîm û peyvekê bo herdû wêneyên deng ji we re diyar bikin, ku ew jî ev in:

	fon ¹	fon ²	peyv	wata	alofon		peyv	wata
1	[p]	[p]	par	beş	[p̰]	[pp]	par	sala çûyî
2	[t]	[t]	tor	net	[t̰]	[tt]	tor	çiyayê torrê
3	[d]	[d]	dar	dartû	[ḍ]	[dd]	dasî	hesiyê masî
4	[k]	[k]	ker	heywanek	[k̰]	[kk]	ker	nabihîze
5	[s]	[s]	sal	year	[ś]	[ss]	şal	dema salê
6	[z]	[z]	zîrne	amêrê mosîqa	[ź]	[zz]	zîrne	amêrê mosîqa
7	[ç]	[ç]	çem	kulmek	[č̰]	[çç]	çem	robar
8	[l]	[l]	bel	guhbel	[ļ]	[ll]	beļ	çavbeļ
9	[r]	[r]	bir	wî tiştekek bir	[ř]	[rr]	birr	beşek

Diyardeya stûrbûn û tenikbûna hin dengdar navbera zimanê Arebî û zimanê Kurdî de ciyawaziyeke fonolojî heye, ew jî ew e ku dengên Kurmancî di sînore fonetîk de diyar

dibin, ango wataya peyvan ti pêwendî pê nîne, lewra wek alofonan bikar tên, lêbelê di zimanê Arebî de ev stûrbûn bi şêweyeke fonolojî derdikeve ku herdû deng wek du fonêman di alîfbayê de diyar dibin wek ciyawazî navbera (sare سار) û (sare صار) de heye, ku herdû (sîn) du fonêm in. Lê di zimanê Kurdî de wata navbera (sal) û (sâl) de nîne, lewre stûrbûna deng di Arebî de fonêman drust dike, lêbelê di Kurdî de alofonan dide, ango şêweyên fonêm in. Dengên [s], [z], [t], [d] di Kurdî de çi asayî bin, yan jî hinekî tenik bin, yan hinekî stûr bin, her heman fonêm in. Guhartina deng bi şêweyeke wek stûrbûn yan tenikbûn, heye bikeve ber sînore dengsazî de, ku deng di şêweya alofonan de diyar dibin, û heye bikeve ber sînore fonêmsaziyê de, ku deng di şêweya fonêman de tene şirovekirin, wekçawa di zimanê Arebî de dikeve ber sînore fonolojî de, ango her dengek fonêmek e, û di nivîsînê de jî her dengek çi stûr û çi tenik tîpek jê re heye.

Di beşê bûrî de, min bal kişande ser vê diyardeyê û bi navê (awarte) da xuyakirin, ji ber ku hin zimanzan bi têrma (irregular) didane naskirin, lewra peyva (awarte) hate bîra min. Ev mijar ji zû ve bas li ser çê dibe, ku lêkolên Kurdên Sovyêtê wek Bakayêf¹⁵⁸ û Qenatê Kurdo û hinên dîtir jî, berî hemiyana wan despê kirin, wek hin dibêjin ku balkişandin di vê mijarê de ji ber ku heman diyarde di zimanên Qefqasî de heye, bi taybetî di Armenî de wek ku Mahjoub dide xuyakirin "The Soviet scholars, many of whom also know Armenian, have no doubt been influenced by the existence of this feature in Armenian as well"¹⁵⁹. Lê dixwazim wê yekê bêjim ku rastiya fonêm wek pîvan di lêkolînên wan de ne hatiye destnîşankirin, tenê wek deng hatine pejirandin, û ev jî nayê qebûlkirin, lewra me pêwîstî bi lêkolînê heye da em bizanin ka kîjan deng ji wan nih dengan fonêm e, û kîjan alofon e. li gor yasayên fonolojiya zimanê Kurmancî, dide nîşankirin. Ji ber vê yekê jî vê lêkolînê xwe da pêş.

Gelek bîrûrayên şaş di nav zimanzanan de belav dibin wek Dr Mehjoub ji yekî dîtir fikreke şaş girtiye ku dengê **hemza** di zimanê Kurdî de ji Arebî hatiye nav Kurdî dema ku dibêje "while the glottal stop /ʔ/ and pharyngealized /ħ/ are borrowed from Arabic (Khan1976)"¹⁶⁰. Baş e eger mirov bi awakî zanistî lê binerê ka çilo dengê dengdêr bi tena xwe derbikeve bê ku despêk bi hemza bibe, ne di Kurdî de, û ne di Arebî de, û ne di ti zimanan de, çê nabe, heta em bêjin me ji wan biriye yan wan ji me biriye. Ev bi xwe diyardeyek e, bi fîzyolojiya dengkirin û bilêvkirinê ve pabend e; ka çilo ez bêjim (ez) eger

¹⁵⁸ BAKAEV, Ć ERKES XUDOEVĆ. 1973. Jazyk kurdov SSSR. Moscow: Nauka. Deng K k g

¹⁵⁹ Mahjoub Zirak (2014): Phonetic and Phonological Changes in Obsolescing Languages, Hiroshima University, a doctoral thesis (rup 81)

¹⁶⁰ Mahjoub Zirak (2014) (rup 39)

hemza nekeve pêşiya dengdêrê /e/ de. Ya dîtir jî, nivîsîna Kurdê Iraqê û Îranê ji xwe bi alîfbaya Arebî ye, û girafîma hemza di alîfbaya Arebî de heye, lê di alîfbaya Latînî de nîne, lewra dengdêrên despêka peyvê di nivîsînê de rût diyar dibin, bê ku tîpeke taybet bo hemza hebe, lê diyardeya fonolojî di gelek buwaran de ne li gor şeweya dengsaziyê tê, ev tiştêkî naskirî ye û siruştî ye. Lêbelê dengê / ħ - ح/ di bingeha xwe de ji Aramî hatiye nav Kurmancî ne ji Arebî, belge jî bo vê yekê heye.

Kêşeya dengê stûr pirtir di Kurmancî de xwe belû dike, lê di zaravê Soranî de dengin wek [s] û [t] û [z]hewqas diyar nabe. Di zaravê Soranî de herdû dengên [r]a stûr û [l]a stûr wek du fonêm û du tîpantêne jimartin, û ev yek di şeweya alîfbayê de diyar e ku nîşana cudakirinê navbera herdû [r] û [r̥], û herdû [l] û [l̥] li gor alîfbaya Arebî hatine danîn. Di zaravê Kurmancî de ta niha ti dengê stûr wek fonêm nehatine pejirandin, tenê [r]eya normal fonêm e, lê [r̥]eya stûr lêkolîn tê de nebûye. Emê di vê xalê de li ser dengên stûr ji aliyê fonolojî ve rawestin ka gelo ev deng dikarin bibin fonêm yan ne? Yan jî tenê wek alofon diyar dibin. Încê berî ku em li ser wan dengên stûr, yek bi yek rawestin, emê diyardeya alofonan di ziman de bidin naskirin.

2.6.1. Dengên Kurmancî Navbera Fonêm û Alofon de:


Di zimanvanî de û nemaze di dengsaziyê de hin têge hene pêwîstî bi naskirin û ravekirinê heye ku bikarin bigihin mebesta lêkolînê. Încê têrimên dengsazî wek (fon - phone) ango deng, yan şewedeng (alophone), û fonêm (phoneme), pêwîstî bi pênasekirinê hene. Li gor lêkolînên Englîzî pênase weha tên: *fon* ew dengê ku şeweyeke xweyî taybet ji pêla deng heye. Ango (A phone is a sound that has a definite shape as a sound wave). Di dengsazî de "alofon" yek ji çend dengên yeksan e, yê ku ji heman fonêmê ne¹⁶¹. Di Kurdî de beramberî zaraweya (alofon), em dikarin (şewedeng) yan jî (hevaldeng) danin, lê ne (tîpên cêwî) ku eva dawî, li nik rêzimannivîsên me diyar bû. Ji wan dangan re alophone (alofon)¹⁶² ya şewedeng dibêjin, ew dengên ku di peyvê de guhartineke biçûk werdigirin û wek varyantên deng (variants) têne jimartin¹⁶³, çî li gor devok û zaravê wan mirovên ku dipeyivin, wek: dengê (p)eya giran di peyva (penîr)de û dengê (p)eya asayî û normal di

¹⁶¹- From Wikipedia, the free encyclopedia This article is about the sense of "allophone" used in linguistics. For other senses, see [allophone disambiguation](#)).

¹⁶²David Crystal: A Dictionary of Linguistics and Phonetics 6th Edition. © 2008 ISBN: 978-1-405-15296-9

¹⁶³Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, 1983

peyva (perperîk) de, yan jî li encama şêwe-axaftineke takekesane were, wek: mar û (мечр), yan hişk û (чиşk).



Hêjayî gotinê ye jî, ku diyardeya alofonan di lêkolînên zimanê Kurdî de bi zarawayekî Kurdî tête pê, ku ew jî (tîpên cêwî) jê re tê gotin. Herçende zaraweya (tîpên cêwî), ku Celadet Bedirxan pêkaniye, ne di têvajoya lêkolîna dengsaziya fonem û alofonan de hatiye, lê dîsa her li bayê alofonan tê, lewra em dikarin têrim yan zarawe ji alîkî ve biguherênin, û li şûna (tîpên cêwî), em (dengên cêwî) bikar bînin, jiber ku diyardeya cêwîbûnê ne di warê tîpan de tê, lêbelê di warê dengên de tê, nemaze dengên ku nakevin ber şeweya foneman de. Lê dîsa di heman bar de cêwîbûna dengên dikare bikeve ber tîpêhekî zimanvanî drust de, ji ber ku mebest ji cêwîbûna dengên, sazgeha herdû dengên cêwî yek e, wek em bêjin maka wan yek e, lê guhartineke dengsazî biçûk tê de çê bûye, heye ku kar li wata bike, û heye lê neke. Eger wata guhart jixwe fonem e, ne alofon e. Lê heger ne guhart ji xwe alofon e.

fon ¹	dengê normal		fon ²		dengê stûr	
	peyv	wata	dengê stûr		peyv	wata
p	par	behr	ṗ	pp	ṗar	ṗar, sala çûyî
k	kar	îş	ḵ	kk	ḵar	kar, çîlîka bizinê
l	bel	guhbel	ḷ	ll	beḷ	çavbell, (vekirî)
r	bir	stand	ř	rr	birr	parçek
t	tarê	tarik	ṭ	tt	ṭarî	şeva reşî tarî
ç	çil	40	č	çç	čiḷ	berçemk
s	sor		ś	ss	śor	rengê dor
z	zor		ź	zz	źor	zorê bidiyê.

d	das		ḍ	dd	ḍasî	dasiyên masiyan
---	-----	--	---	----	------	-----------------

Bi serincdanê wa diyar dibe ku dengên (ç, q, ḥ)¹⁶⁴ di bingeha zimanê Kurdî de nînin, û evane ji zimanê Aramî û Arebî hatine nav Kurdî. Lê eger em du peyvên wek (sal) bi (s)eya tenik carekê bêjin, û careke dî di heman peyvê de bi (s)êya stûr, gelo wata wê biguherê? Helbet, na. Vêca herdû dengên (s), çî ya stûr, û çî ya tenik, ti guhartinê naxin wataya peyvê de, jiber wilo jî wekû van dengan ji wan re varyent "variants"ên deng dibêjin, ango (guhartek), ku di têrmînolojiya zimanvanî de yek ji herduwan wek şêweya dengê standard tê hilbijartin û di bin navê (fonêm) de tête destnîşankirin. Dengê dîtir ku zimanzanê Kurdan bi cêwîbûn tanîne ziman, navê wî di zimanvanî de dibe (alofon – alophones) yê ku ji van dengan di zimanan de pir in, wek du dengên (s), yek stûr, û yek normal di van peyvên jêrî de tên, wek:

stûr	tenik	wata
<i>śed</i>	<i>sed</i>	<i>100</i>
<i>śal</i>	<i>sal</i>	<i>year</i>
<i>śor</i>	<i>sor</i>	<i>red</i>

Carna sînoren fonolojî û fonetîkî ji zimanekî ta zimanekî dîtir nabine wek hev, û eva han jî kêşeya (fonêm û alofon) têne meydanê. Di zimanê Kurdî de çend deng hene bi du şêweyan têne bilêvkirin, yek stûr e, yan hişk e, yê din yan nerm e, yan tenik e, ew jî ev in: [r, r̄ - l, l̄ - p, p̄ - k, k̄ - t, t̄ - ç, ç̄ - s, ś - z, ź - l, l̄ - d, ḍ]

Niha emê li ser van dengên stûr rawestin ka gelo hemû wek alofonan diyar dibin? yan hinek ji wan fonêm in, û hinek alofon in?

1. Dengên / R̄ r̄ /

Du dengên stûr di Kurdî de pirtir diyar dibin, yek jê /r̄ /e, ya dîtir /r̄ /e, ku herdû jî di zarê Soranî de wek du fonêman têne jimartin, û jiber wilo jî bûne wek du tîpên ciyawaz, ku bi danîna nîşanekê li ser (r) û yek li ser (l) ji hevalên xwe yê cêwî têne cudakirin. Ev (r̄) û (l̄) hinekî ji yê dîtir têvel in, ango hinekî bi ser şêweya fonêm de diçin, nemaze,

¹⁶⁴Hin zimanzanên dîtir jî wa dibînin ku (حرق)¹⁶⁴ di bingeha zimanê Kurdî de nîne.

dengê (f). Lê belê dengê (l) di zaravê Kurmancî de bi şêweyeke drust û tewaw cihê fonêm nagire.

Dengê [r], [f] wek fon¹, fon² li gor vê lêkolînê herdû fonêm in, ev deng di hin peyvan de stûr û hejok dibe, inca ev stûrbûn guhartinekê jî di wataya peyvê de bi xwe re tîne, wek van herdû peyvên (birîn) û (birrîn) - ku dengê /r/eya stûr yan bi niçikekê li ser, yan bi nivîsîna du (rr)eyan hatiye tete cudakirin, weha ciyawaziyekê di wata de navbera herdû peyvan de diyar dike, û eva han jî di van herdû risteyan de xuyanî dike, wek:

1. a) **birîn**: Birîna dilê min kûr e.
- b) **birrîn**: Birrîna daran erdê zuwa dike.

Zopeyvên wek (bir) beramber (birr), (zirav) beramber (zirrav), (ber) beramber (berr), (gir) beramber (girr), (wir) beramber (wirr), (barîn) beramber (barrîn) wê rastiyê nîşa me dike ku ev herdû deng du fonêmên serbixwe ne, ne du alofonên yek fonêmî ne, wek zimanên dîtir. Inca emê li jêrê hewl bidin ku gelek nimûneyan bînin da ku deng bikare cihê xwe di nav fonêman de drust bike, wek:

2. a) **bir**: Min pertûka xwe bir.
- b) **birr**: Îro min birrek zilam dît. ar: nebte, cemaçet, serb, (f. sp.)¹⁶⁵
birr kirin fesilkirin (f. sp.)
3. a) **birî**: hate birin maaxûz
- b) **birrî**: mehir birrî, birryar
4. a) **navbir**, navbirî: yê ku berî niha navê wî hate ser ziman, (almezku)
- b) **navbirr**: navbera sîpelkê û zikê mirovan de, berzex, haciz
5. a) **birra**: birayê minî mezin ne li mal e.
- b) **birra**: birra, te wilo kir. Ango aya bi rastî te wilo kir. Yan jî: Bira, ew kurê ji diya min birayê min e.
6. a) **ber**: pêşî, berê fêkî?/genim, bergirtî, beravêtin.
- b) **bermalk**, ber bi, bergorr (f. sp)
- c) **ber**: kevirek, berik,
- d) **berr**: cilika rûniştinê (sicade),
7. a) **berê**: berê me nizanîbû em vî karî bikin, berî niha, dema bûrî
- b) **berrê**: Berrê bişo, sicadê bişo
8. a) **barîn**: Baran dibare

¹⁶⁵ (f. sp.) : Ferhenga Sipîrêz, Dihok

- b) **barrîn** çêlk dibarrê barrîna pezî (fer. Spirêz), barrîna çêlekê
9. a) **zirav**: Bejina vê keçikê zirav e
 b) **zirrav**: Zirravê min têşê
10. a) **gir**: Mala me li serê gir e
 b) **girr**: Girrê xwe pê dixwerênê
11. a) **wir**: Azadî ne li vir e, li wir e
 b) **wirr**: Azadî ne virr e, lê wirr e
12. a) **a wir**: pertûka wir
 b) **awirr**: awirrtûj, awirrê çavê te tûj in.
13. a) **çir** e?: çima (devokî heyê)
 b) **çirr** e: ne nerm e, nayê cûtin, devera himbiz
12. a) **çira**: find.
 b) **çirre/ra**: çima...? (deokî heyê)
13. a) **çire**?
 b) **çirrên**, çirrandin
 c) **çirr**: lezic, (çirrê) navê lîstkê ye, dibêjin min li çirra wî da, min zora wî bir
14. a) **kirr**, kirrîn: Min xanî kirrî, filankes belakirr e.
 b) **kir**, kirin, filankes dengnekir e, ango gelek naştexile.
15. a) **kirrê**: kirrê xwe dayê; filankes bikirr e (cirmexweş)
 b) **kirê** (acar): xaniyê kirê, kirêkar, filankes belakirr e
16. a) **gor**: Li vê gorê, ev kiras li gora te ye.
 b) **gorr**: gorr (tirb), gorrîstan, bingorrkirin. (Ez gorî te bim watayeke dîtir dide).
17. a) **vir**: vê derê, vî cihî
 b) **virr**: derrew
18. a) **mir**: filankes mir, ango wefat bû, çû ber dilovaniya Xwedê.
 b) **mirrar**: ew kes yan ew heywan mirrar bûye.
19. a) **kur**: min du kur hene.
 b) **qurr**: Bayê kurr, min pora xwe kurr kir, porqurrê.
20. a) **korr**: koma zanyaran, Korrî Zanyarî Kurd.
 b) **qor**: ew kesê nabîne.
21. a) **rrik**: rrikaberî (munafese), rrika xwe dide xelkê, filankes birrik e.
 Lê dibêjin filankes mêrrik e, ango rrika wî mêyîne ye.
 b) **mêrik**: ew mêr, mêrik û mêrrik ne yek in, du peyvên cuda ne..
22. a) **mer**, mere, neçe

b) **merr**, merr e, ew amêrê erdê pê dikolin.

23. a) **mirik**, navê gudekî ye dikeve nêzîkî Hezex.

b) **mirrik**, mirrek, ev der bûye mirrik dema ku av li nav xweliyê dixin.

24. a) **mir**: filankes mir.

b) **mirr**: avê go mirr û hate xwarê. navê dengê mirrîna avê (mirrêna baranê)

• Peyvên bi [r]eya stûr gelek hene di Kurmancî de, wek: Firro: ferşik, firrkirin 1. avê firrke, 2. piroseya azyîna hesp, veçîrîn, firrîn, firrinde, lêgerr, firrandin derrew)(f.sp), kirrkirr (dengê cûtina xwarinê), kirrkirîka guh. Kirrkirînok, rreq,

• Piraniya [r]eya despêka peyvê stûr e, wek: rreq, rrez, rroj, rronak,

Li gor wan nimûneyên ku me li jêr dan xuyakirin, dengê [r]eya stûr dikare bi hesanî bibe fonêm ji ber ku hêzeke xwe di nav ferhenga Kurdî de heye û dikare bi roleke watasazî û leksîkolojî di nav peyvên zimanê Kurmancî de rabe. Încê ez wa dibînim ku dengê [r]eya stûr ne ku bi ser fonêm de diçe, lê fonêmeke bihêz e jiber ku wata pê tê guhartin, û peyvên ferhengî bi tevavî têra xwe hene, ku barê fonêm hildigire, ango pîverên danîna fonêm wek watacadaker û têrdiyarbûn di vî dengê de heye. Lewra, ez bi xwe pêşniyar dikim ku di nivîsînê de dengê /r/eya stûr bi girafîmeke ciyawaz bête nîşankirin wek tîpeke alîfbaya Kurmancî, bo ku ciyawazî di girafîma tîpan de jî bête xuyakirin. Wilo jî, giriftarî çareser dibe. Hêjayî gotinê ye ku Celadet Bedirxan dengê /r/eya stûr wek fonêm nedaniye. Di baweriya min de nefonêmkirina /r/eya stûr tiştekî ne drust e, jiber ku gelek peyv di zimanê Kurdî de hene bi /r/eya stûr tene naskirin, wek (wirr, birrîn, kerr, gurr, birrek, girr) di van cotepeyvan de, wek:

girr	gir
gurr	gur
birrîn	birîn
wirr	wir
birrek	birek

Lewra, pêwîst e ku tîpeke taybet bi vê fonêmê hebe. Piştî ez li nav sîmbolên kompyûter geriyam, min sê sîmbol jibo dengê /r/eya stûr dîtin, ew jî ev in:

Ř ř , Ʀ ƣ , Ǻ ǻ

Ji nav hersê sîmbolan em dikarin wêneyekî taybet hilbijêrin, pêşniyareke dîtir jî heye ku di şeweya rênivîsê de du (r)eyên bidû hev de dikarin dengê /r/eya stûr bidin, wek: (wirr, birrîn, kerr, gurr, birrek, girr), lê dîsa ya baş ew e ku kongirekî zimanvanî li dar bikeve, û

vê birryarê bide, jibo ku mijar mafê xwe bi tevahî û komxwazî bistêne, û heger birryar hate standin, ya pêwîst ew e ku di rageyandinê de belav bibe.

2. Dengê /l/ paş-esmankî (velar), /l/eya pêş-esmankî (palatal)

Dengê / l̥ /eya stûr ku sazgeha wê paş-esmank e, ew jî wek dengê /rr/e ye, ku di beşek ji peyvan de, di zaravê Soranî de gelek heye, ku ev bi xwe li nik zarê Kurmancî bi piraniya zaravê Soranî peyda nabe. Yan jî heger hebe guhartina wata tê de gelek kêr e, wek dengê /l/ di (guhbel) de tenik e, lê di (çavbeļ) de stûr e. Ji ber wilo jî ez pêwîst nabînim ku tîpeke dîtir, yan ciyawziyek navbera herdû dengên /l/eyê: ya stûr û ya nerm de, hebe. Ya dîtir jî dengê /l̥/eya stûr û ya nerim ew watayên nû yên gelek nadê, tenê hin peyv bi teliyên dest têne jimartin, hene, wek:

nerm	stûr	
çil (40)	çil (çil̥)	berçemk
bel	beļ	
çabeļoţ		

Lewra ev stûrbûn nakeve ber pêkhatina fonemekî nû de, ku her ev dengê stûr wek alofon tê, bo nimûne: peyva (diļ)a zaravê Soranî çî bi (l̥)eya stûr, û çî bi ya nerm her yek watadide. Weha jî peyvên xiştexaneya jêr de dengê /l/ navbera herdû zaravên Kurdî de ne wek hev tên, lê ti guhartin nakevewata de, wek:

Kurmancî	Soranî
(l̥)eya asayî	(l̥)eya stûr: (l̥)
<i>gul</i>	<i>guļ</i>
<i>bel</i>	<i>beļ</i>
<i>mal</i>	<i>maļ</i>
<i>heval</i>	<i>hevaļ</i>
<i>tal</i>	<i>taļ</i>
<i>gol</i>	<i>goļ</i>

Lewra jî, di zaravê Kurmancî de diyarbûna [l̥]eya stûr nahiye wê radeyê ku bibe fonêm. Ev kêşe bi nerîneke seretayî û serpeyî, wa diyar dibe ku (l̥)eya stûr nakeve ber fonêm de, tenê wek alofon xwe diyar dike.

3. Dengê [k], [k̄] Du fonêm in: bapek(aspirated) û babirr (nonaspirated)

Dengê [k] di aliyê xweyî fonetîkî de bi du şêweyan tête dengkirin¹⁶⁶: sazgeha vî dengî ew e ku paşîka zar xwe digihêne paş-esmank. Dema ku babirr dibe ango sazgeh tengtir dibe dengê [k] piçek guhartin tê de saz dibe bi awakî weha ku axêverên Kurmancî dikarin hest pê bikin. Dengê [k̄]eya babirr ta niha wek alofon bikar tê. Lê [k]eya bapek (nerim) wek fonêm tê jimartin. Dengê [k̄]eya babirr pirtir ji van dengên stûr yên dîtir dibe cihê gengeşê û pirsyariyê, ji ber ku rêjeya nimûneyên zopeyv (minimal pair) bo beramberkirinê berçav e. Di encama beramberkirinê de navbera herdû şêweyên dengê [k] watacadakerî rêjeyek berbiçav tê de diyar dibe, wek van nimûneyan:

	babirr (stûr)	wata	bapek (nerim)	wata
1	қанî	serê қанийê	kanî	Ka Azad
2	қен	қена porê	ken	ne jina kenokî, ne mere gerokî.
3	қа	пûşê hêrkirî	ka	bide min
4	қал	pîr	kal	sipî (şebeşê sipî)
5	қerr	nabihîze	ker	heywnê guhdirêj
6	қер (kirin)	ji kirin, limêjker	ker	guhdirêj
7	қир (қirin)		kirr	(belakirr)
8	қêr	bikêrhatî	kêr	ev kêr nabirre
9	қил	kîlê çavan	kil	av dikilê
10	қак	birader	kak	pir sipî,pora wî kak e
11	қар	dikarê	kar	îş
12	қарек	қahr,	karek	min karek kir
13	қитик	pisîk (cat)	kitik ¹⁶⁷	'dried figs'
14	қин	kurt	kin	nik
15	қур	bayê қур pora xwe қур bike	kur	zarokê nêr

Tiştêkî dîtir, dengê /k̄/eya peyva (қirin) babirr e, û ev peyv yek ji peyvên herî çalak e di Kurdî de ku bi seda peyvên lêkdayî bi riya wê çêdibin, wek (sorkirin, limêjkirin, reşkirin, sipîkirin, nûkirin, başkirin, xêrkirin, stûrkirin, tazîkirin, lêkirin, pêkirin...htd).

¹⁶⁶Vegere dawiya beşê yekem yê vê tezê ku basa aliyê fonetîkî dike di peregrafa taybetiyên awarte de.

¹⁶⁷Mahjoub (rup 81)

Rêjeya navê kara (agent person) ji vê peyvê weha tê (limêjker) ku parçeyê (-ker) bi dengê hişk tê gotin, lê eger bi dengê nerim hate gotin wataya peyvê gelek dûr dibe. Ji ber ku (-ker) wek nerim (ker) ew heywanê guhdirêj dide, lê bi /k/eya hişk wataya (qirin) dide. Peyveke dîtir heye ku heman qalib e û heman deng (qer) in, lê têvejoya wan nabe yek, ji ber ku (-qer) bi tena xwe ne wata dide, û ne bikar tê, her wilo morfêmeke pabend e, lê (qer) peyveke serbixwe ye û serbest e, bi tena xwe bikar tê. Emê van hersê bêjeyên yekşewenivîs bixin têvejoya risteyan de bo ku wata û bikarhênan ronî bibe, wek:

- 1) Ev zilam limêj**ker** e.
- 2) Ev zilam **qer** e, ango denga nabihîze.
- 3) Simo li **kerê** suwar bûye.

Zopeyvên Kurdiya Kurmancî wek (kal) beramber (qal), (ken) beramber (qen), (kar) beramber (qar), (kanî) beramber (qanî), wê rastiye nîşa me dike ku ev herdû deng du fonêmên serbixwe ne, ne du alofonên yek fonêmî ne wek zimanên dîtir, yan wek ku ta niha em pê dikin. Inca, piştî ku jimarek ji nimûneyên ciyawaz yê zopeyvên zimanê Kurmancî, ez wa dibînim ku dengê [k]e di zimanê Kurdiya Kurmancî de pêwîstî bi dû fonêman heye, ji ber ku ev herdû deng di birrek peyv de du watayên cuda di yek ristika peyvê de didin. Ev yek me digihêne wê encamê ku ev deng fonêm e, pêwîstî bi lêkolîneke feretir jî nake, êdî yek dikare birryara fonemiyê tê de bidawî bike. Ev nimûneyên ku min li jor dan xuyakirin nasnameya fonemtiya wê dide nîşankirin. Ev yek ji encamên vê lêkolîne ye.

4. Dengê [p], [p̄]

Dengê [p]ê, herçende bi du şêwedengan: [nerim û stûr] tê dengkirin, carna jî du watayan dide, wek peyva (par: ango sala bûrî), [p] stûrkî tê bilêvkirin, belê (par: ango beş yan behir) bi nermî tê axaftin. Lê eva han nakeve ber sînoren fonêman de jiber nimûneyên bi vî rengî gelek kêr in. Dengê [p]ê di yek peyvê de ji devokê ta devokeke dîtir stûr dibe, û carna jî tenik dibe. Lewra ev herdû bi yekfonêmî tene jimartin wek dengê standard. Herçî dengên [p] hene alofon in, wek:

nerim	hişk	wata
<i>pend</i>	<i>nependî</i>	nediyar
<i>pîvaz</i>	<i>penîr (bi zarê xerbiyan)</i>	cheese
<i>pel</i>	<i>pez</i>	
<i>por</i>	<i>poz</i>	bêvil
<i>pîrpizanê çêleka</i>		

Lê di hin devok de peyva (por) bi dengê [p]eya stûr dibêjin, hinên dîtir bi [p]eya nerim dibêjin, ango devok bi roleke bêwatayî di guhartina hin deng de radibin, ku her ev jî taybetiyeke devokane ye bi deverekê ve yan bi herêmekê ve pabend e, ku wek van diyardeyan kartêkeriyê di sîstima ziman de nakin. Ez vê yekê dibêjim li demeke ku her heft dengên Kurmancî [tt], [çç], [ss], [zz], [dd], [ll], [pp] ku bi rola alofonan radibin.

5. Dengê [t], [t̥]:

Dengê [t]eya stûr di Kurmancî de heye, bi awakî weha ku rêjeya wî di hin devok de jî hin devokên dîtir pirtir yan kêmtir peyda dibe, wek devoka Aşîtan li binxetê ku ev deng pirtir tê de diyar dibe hemberî devoka Roavayîyan (xerbiyan), bo nimûne, Aşîtî peyva (tenî) stûrkî dibêjin, lê Roavayî heman peyvê tenik dibêjin. Ya dîtir jî hemû devok ne wek hev dengê [t] stûr dikin, ku hin peyv bi dengê stûr di devokekê de diyar dibe, lê heman peyv di devokine dîtir de tenik dibe. Stûrbûna dengê [t] di Kurmancî de vî dengî nagihêne radeya fonêmiyê, ango nikare bibe fonêm, tenê şêwedengek e ji dengên [t], ku di van nimûneyên jêrî de diyar dibe:

[t]eya stûr	wata
ţivir	şînî ye, liba wî wek gêzrê binerd e.
ţeşo	alavake, pê kolanê dikin
ţevtî	navê ţirşikêye
ţenbûr	navê amêreke mosîqaye.
ţewaş	duhin, rûn
ţeyrok	zîpik
peţrîşok	Ji celebê şebeşa ye, lê ji wan biçûktir e
Tak (ne stûr e)	navê nexweşiyekê ye (bi tayê ketiye)
ţak	Tayê dirûtinê
ţarî	dark (bi Englîzî)
ţav	sunliġt
şewaţ	burning

Lê ev stûrbûn wataya peyvê naguhêrê, ango nakeve ber beramberkirina zopeyvan de. Lewra, wek van dangan dikevin ber sînorê alofonan de, wek diyardeyeke dengsazî (fonetîkî) tete jimartin, ji bilî ku di warê zardevî de tete jimartin. Li vê pêkê, di Englîzî de jî heye wek [t]eya normal di peyva (ten) de, û [t]eya stûr di peyva (tal) de. Lê her yek fonêm û yek tîp jê re hatiye terxandin, ku ew jî [t]e ye.

Di peyvên Arebî de ku dengê [t]eya stûr wek fonêm tê de xwe diyar dike. Areb li ser axaftina Kurdan ya Arebî dibêjin: Kurd dengê [ط]eya Arebî dikin wek [t]eya Kurdî wekçawa di dengkirina van peyvên de diyar dibe¹⁶⁸:

Bilêvkirina Kurdî	bi Arebî
qeht	قحط
qet	قطعة
qetran	قطران
wetenî	وطني

Dengê [t] di Arebî de du fonêm in, lewra jî du tîp in [ط، ت] weku peyvên [طاب، تاب], ku her yek ji wan watayeke taybetî dide, lê di zimanê Kurdî de stûrbûna [t]eyê ne wek ya Arebî tê, ji alîkî ve, herweha [t]eya stûr nikare bibe fonêm, jiber ku pîvana watacadakerî tê de nîne, her alofon dimêne. Ji bilî ku diyarbûna vî dengê stûr di Kurmancî de hindik e.

6. Dengê [ç] , [č]

Dengê /ç/ hin car di hin peyvên de ji awayê xweyî normal (asayî) derdikeve û piçekî sirt dibe, ku eva han jî ne yekî Kurd bê, ticarî pê dernaxê, wek dengê /ç/eya nerim ya [çiya] ku mebest jê bersiva (belê, yan libê) ji kesê ku ban mirov dike, lê bi dengê piçekî sirt mebesta (čiya) ku deverêke bilind wek kwêstan û zozan nîşan dike. Weha jî peyva (çar) ango navê jimara (4) bi nermî tê, lê heman qalibpeyva (čar) (čare, nečarî, čareserî) bi sirtî tê, lê watayeke dîtir dide ku (çareserî) ye. Peyva (ço) bi herdû şêweyan heye (sirt û nerm) û her yek ji wan watayeke cîyawaz dide. Emê vî dengî bixin bin lêkolîna beramberkirina zoeyvan de, û şîrove bikin, wek:

čo : 1. Sê pendên Kurdî di babeta (ço) de hene¹⁶⁹:

1. ((čo ji čo vedigerê)). Mebest ji vê gotinê ew e ku (xurtî bi xurtiyê radiwestê), yan jî (zor zorî jê re divê).
2. Pêşiya gotiyê: ((Heçî čowê wî stûr e, arvanê wî hûr e.)) (čo) darek e, bi destê xwe digirin, pê şer dikin.
3. čo ji cenetê hatiye. Baram bi zorçone mafê xwe stand, ya bi çowê zorê, ya bi darê zorê heqê xwe stand.

čo : Dema ku mirovek ji kerê bixwazê bimeşê, vê gotina (ço) jê re dibêje.

¹⁶⁸ Vegere ferhenga (Elhediye Elhemêdiye) yan Al-Hadiyatul-Hamîdiyah, Dia'ud-Din Basha al-Khidî.

¹⁶⁹ Ferhenga Kurdî, Cegerxwîn, bexda, 1962

Dema mirov herdû peyvên (ço) û (çiya) danê ber lêkolîna fonêmsaziyê, dengê (ç) dibe fonêm, lê eger kêşe di çend nimûneyan de bimênê, û nebê diyarde, ango peyvên gelek nebin, hinganê em nikarin fonêmekî dîtir bi çend peyvan drust bikin. Hin car di hin peyvan de sirtbûn û hişkbûna dengêkî bi sedema stûrbûnê heger rêjeya peyvên beramberkirî hindik bin, fonêmiya deng lawaz dibe. Încâ ka em binerin ka çend zopeyv vî barî hildigirin, ku ew jî ev in:

	nerm	wata	sirt	wata
1	ço	bimeş(ji keran re) dibêjin	čo	navê dara berrû ye
2	çiya	çi, belê, libê,	çiya	kwêstan û zozan
3	çil	40	čil (čil)	berçemk
4	çira	çima	çirra	fînd
5	çire	çima	çirr	himbiz (dens)
6.	çar	Jimara 4	çar	çare, (çareserî

Dixwazim wê rastiye bêjim ku diyarbûna dengê [ç]e pêwîstî bi lêkolîneke statistîkî heye ku lêger di ferhengên Kurmancî de baş bigere ka ew peyvên bi [ç]e **çend in**, bi dû de yek dikare birryara fonêmtî û nefonêmtiya vî dengî bide. Lê niha ez bi vê lêkolînê nikarim birryara fonêmtiya dengê [ç]e bidim, ji ber ku jmareke kê mî jî zopeyvan heq nade bibe fonêm, lewra ev deng nakeve ber fonêmbûnê de. Belê ez dikarim bêjim, yan ez weha hest pê dikim, ku ev deng di berbijêriya fonêmbûnê de ye. Lê ta vê lêkolînê ev deng alofon dimêne.

7. Dengê [s] , [ş]:

Dengê (s) di Kurdî de yek fonêm e, lewra divê ku yek (tîp) jê re bê terxankirin, herçende di şêwedengê axaftinê de, di hin devok de, peyda dibe, ku ji warê xweristiya xwey normal, yan jî standard derdikeve û hinekî stûr dibe, lê ev stûrbûn hîç watayeke nû bi xwe re na-ênê, bo vê yekê dengê stûr jê re (alofon) dibêjin, ku ew jî di peyvên wek (şor, şol, îsot, şotin, şed, şal, şe, şewik, şar, şope) diyar dibe, nemaze di zarê Badînanî de. Lê ev diyardeya han di zimanê Arebî de heye û dengê (s), yê nerim fonêmek e bi şêweya [s]êya nerim tê nivîsîn, û yê stûr fonêmekî dîtir e bi şêweya [س] e, jiber ku her yek ji wan watayeke cuda dide, wek [سار - سار]. Di zimanê Englîzî de jî dengê [s] yek fonêm e, lê du şêwedeng jê re hene, wek [sand = lem, remil] bi [s]a normal tê bilêvkirin, lê [s]eya peyva [sun]a Englîzî hinekî stûr tê bilêvkirin, lewra jê re şêwedeng dibêjin, û yek [tîp] di Englîzî û Kurdî de jê re hatiye danîn. Jiber ku alofon di zimanvanî de wek fonêm nayê jimartin,

jiber wilo jî girafîm yan şewetîpek jê re nayê terxankirin. Di zimanê Arebî de peyvên ku dengê [s] tê de heye, wek fonêm xwe diyar dike. Ev peyv dema tê nav Kurdî de dengê [s]eya stûr ku bi Arebî [ص]e ye dibe [s]eya Kurdî a tenik û normal, ango tenik dibe, ev diyarde wê watayê dide ku stûrbûna dengê [s] di koka Kurdî de nîne, di bawerya min de, ev stûrbûn di şeweyeke devokî û cografî de hatiye, wekçawa di van nimûneyên jêrîn de, dengên fonêma [s]eya stûr di peyvên Arebî de tên, ku heman peyv di axaftina Kurdan de bi dengê [s]eya tenik diyar dibin, wek:¹⁷⁰

bi Kurdî	bi Arebî	bi Kurdî	bi Arebî
qestî	قصد	qesp	قصب
qesar, qesarçî	قصار	qesir	القصر

Dengê [s]eya stûr ji ber nebûna mercê yekem, ku watacudakerî tê de nîne, herweha diyarbûna wî mewdayekî mezin nagire, lewra ev deng wek fonêm xwe diyar nake, tenê alofonek e.

8. Dengê [z] [z̤]

Ev deng jî, wek yên dîtir, carcaran di hin devokên Kurmancî de, wek Badînan, bi stûrî tê bilêvkirin, lê dîsa eva han di navçeyeke teng de dimîne, ji bilî ku hîç watayeke nû nadê. Lewra, ev deng wek stûr alofon e, lê wek tenik fonêm e û yek tîp e. Stûrbûna vî dengî di hin peyvên de nabe ku bibe destûreke fonêmsaziya Kurdî ku şeweya stûr bibe fonêmeke serbixwe, jiber ku ev dengê stûr wataya peyvê naguherênê, lewra wekû vî dengî di sînôrê alofonan de dimîne. Peyvên wek: (**zorr**, **zîrrav**, **zîrrî**) çî bi dengê asayî û tenik bê gotin, û çî bi dengê stûr bê gotin, her peyv wek xwe dimîne, û hîç guhartin nakeve wataya peyvê de.

9. Dengê [d], [d̤]

Dengê [d]eya stûr di Kurmancî de di peyvên wek (d̤olmik), (d̤abeļandin), (d̤asî), (d̤eppd̤eppandin), (d̤ipd̤ippe), (d̤abeļot), (d̤ep) de derdikeve, ji bilî van peyvên, hinên dîtir jî hene, lê jimara wan peyvên bi [d]eya stûr gelek hindik in. Di baweriyê min de stûrbûna vî dengî di bin kartêkirina zimanê Arebî de hatiye. Ji xwe ev deng jî warê fonêmtiyê dûr e, her alofonekî bêwata ye.

2.5.2. Rêjeya Stûrbûna Deng di Devokan de

Ev mijar lêkolîneke meydanî û piratîkî taybet dixwaze, ku lêkol û lêger li nav devokên Kurmancî baş bigere û lêpirsiyanê bike, û têbîniyên xwe binivîse, ta ku bikare

¹⁷⁰ Vegere ferhenga (Elhediye Elhemêdiye) yan Al-Hadiyatul-Hamîdiyah, Dia'ud-Din Basha al-Khlidî.

barekî weha bi hûrbînî tomar bike, da ku şaşî tê de diyar nebin. Bo ronîkirina barê stûrbûna heft deng di devokên Kurmancî de, pêwîstî bi lêkolîneke statîkî heye, ku cudawaziyên devokî bide xuyanîkirin wek ku di vê cedwela jêrîn¹⁷¹ de diyar dibe, bi mercê nîşana (+) wataya hebûna durvê stûrbûna deng bide, lê nîşana (-) wataya nebûna durvê stûrbûnê dide, wek:

Deng	t	p	s	z	ç	l	d
Peyv	tarî	penîr	sed	zor	çav	Bel	dasî
Aşîta	+	+	+	+	+	+	+
Ro-avayî	+	-	-	-	+	+	+
Efrînî	+	-	-	-	+	+	+
Botî	+	+	+	+	+	+	+
Badînan	+	+	+	+	+	+	+
Serheda	+	-	-	-	+	+	+

Encamên BIRRê VI: Ji nav nih dengên stûr, dengê [r] û [l] ji wan wek fonêm hatine nîşankirin, ku her heftên dîtir wek alofon man yên ku temsîla wan di alîfba de nîne.

BIRR: VII 2.7.

2.7. Zirrdeng di Kurmacî de [q, h, g, ɣ]/[ق - ح - غ - ع]

Zimanê Kurdî yek ji wan zimanên Hindo-Iranî ye, ku di binyata xweyî dengsazî û peyvsazî de li gor siruşt û awayên malbata zimanên Îranî tê. Lê jiber hoyên cogarfî û dîrokî û dînî, zimanê Kurdî, wek Farisî û Tirkî, ketiye bin kartêkirina zimanê Arebî de, nemaze ji aliyê dengên zimanê wî ve ku deng wek biçûktirîn dane di riya wergirtina peyvên Arebî de bikar tên, yên ku şêweya dengên xwe di nav zimanên misilman de belav kirin, herweha, bi dirêjahiya salan re ev dengane hatin çespandin û riya xwe tê de vekirin. Em tev jî dizanin ku sedema vê kartêkirinê hevpişkiya Kurda û Areba di zimanê misilmantiyê de ye, nekû encama cîrantî û hevsînoriyê ye. Kêşe bi xwe di riya dîn de çû serî. Sedema wê jî ew bû, ku di xwendina têkistên dînî de jibîlî zimanê Arebî pê ve, nabê ku ev têkist bi riya wergerdinê de bo zimanên dîtir bikar were. Lewra zimanê Arebî sebarek zilam û pîrek û xort û jin û zarokan zimanê Qur-an û limêjê ye, zimanê rabûn û

¹⁷¹ Min ev cedwel wek nimûne li gor texmîna xwe daniye bi mebesta mîtod bête xuyakirin, lê heye hin agahî tê de ne hewqas di cihê xwe de rast bin.

rûniştina mirovan e, yê bûn û mirina wan e, yê nivêj û duçayên wan e, ku evane hemî jî pêwîst bû û pêwîst e bi zimanê Arebî pêk werin, bo nimûne, ta bi silav û xêrhatinê bû bi Arebî, wek: (Selam çaleykum, merhebe, Ehlen wesehlen, inşa-el lah...htd). Inca zimanê Arebî bi awakî xweristî kete nav Kurdî de, û bû beşek ji rewşenbîriya Kurdan. Jiber wilo jî Arebî hin taybetiyên sîstima xweyî dengsazî avête nav zimanê Kurdî, ku ew jî ew bû dengine Arebnijad bi demê re û bikarhênanê re hatine nav zimanê Kurdî, nemaze, ku Kurdî bi xwe zimanekî ta niha li gelek deveran li ber xwe dide bi mebesta ku ew jî wek zimanên dîtir serbest bijî, da ku bikare mafê jiyana xwe biparêze, û wek zimanên dîtir bikar were.

Em ne di barê pejirandina dengên Arebî de ne, lêbelê tiştêkî dîtir tê meydanê, ew jî şeweya hersê tîpan bi Latîni wê çawe di vê lêkolînê de were? Wek diyar e hincar min du şeweya Latîni dane nîşankirin, ku yek jê dubarekirina birapiştê dengê Arebî tê, wek em dubarekirina dengê [h]eya Kurdî bikin [h/ح], yan jî pirtir nîşaneyên tîpên Arebî li pal van dangan danin, da ku xwêner bi serve bibe. Lê jiber ku kêşe di warê pêşniyaran de ye, ango bûn û nebûna wan di erêna de ye. Sê dengên Arebî di zimanê meyê îro de bi şeweyeke hindik bikar tên, ew jî [h, g, ç]/[ح, غ, ع] in, herweha ez weha dibînim ku dengê qafê jî [q] Arebî û Turkî ye, lê jiber ku ji mêj ve ye, û cihê xwe jî di Kurdî de girtiye, îro ev deng wek fonemekî resen tê jimartin, lewra jî ev deng hincar nakeve ber dengên Arebî de, ango wek zirrdeng (ji xwe min navê zirrdeng, wek zirrbav jê re libar dît). Ez bi xwe gihamê bîrûrayekê di kêşeya nasnameya van dangan de. Lê herwekî dengê [q] wek fonem tê jimartin, inca ya pêwîst ew e wek heyî bikar were. Nimûneyên van dangan bi nîşanên ku min ji wan re hilbijartine di hin peyvên Kurmancî de diyar dibin, wek:

nimûne	tîpa piçûk	tîpa mezin	tîpa Arebî
heft, herfî,	h	H	ح
çewr, çenirî,	ç	Ç	ع
gar, gaz, gem, gar, gaz,	g	G	غ
qepal, qêrîn, qirik	q	Q	ق

Kartêkirina dengên Arebî ne tenê di sînorê peyvên Arebî de tê, lê belê hin deng xwe berdana nav peyvên Kurdî de jî, û ketine cihê dengên Kurdî de, wekçawa dengê /h/eya Kurdî ya resen di hin peyv de bûye / h/eya Arebî wek van nimûneyan:

Kurdî bi /h/

Kurdî bi /h/ ح

hemû	hemû
heft	heft
heşt	heşt

A) Qunaxên Peydabûna Dengên Arebî:

Dr John Christopher Sylak-Glaśman¹⁷² tekeze dike ku dengên imfatîk (emphatic), ango yên stûr wek /t̪, d̪, ʃ, ʒ/ li Rojhilata Navîn belav bûne di riya belavbûna zimanê Aramî de, nemaze Arebî, li wê deverê dema ku dibêje: "However, post-velars are present throughout the Near East and Saharan North Africa due to the spread of Arabic and Berber"¹⁷³.

Eger em ferhengên Kurdî vekin, emê bibînin ku vaye gelek peyvên biyanî hene ku bi şeweyên hemecor peyda dibin, ango hin peyv hene dengên biyanî di wan de ne diyar in, û hin peyv hene dengên biyanî di wan de diyar in, lewra jî ev peyv bi dengên xwe ve çî biyanî, û çî resen wilo hatine nivîsîn. Ev diyardeya han wê yekê dide nîşankirin, ku her peyvek di demeke taybet de hatiye nav zimanê Kurdî, wek em bêjin peyva Arebî: (weqt) ku di Kurdî de (wext) tê gotin, ne (weqt). Baş e, çima em îro vê peyvê bi /x/ dibêjin, ne bi /q/, bi ser ku dengê /q/ îro-roj di nav zimanê Kurdî de bikar tê, û gelek peyvên dîtir yên biyanî hene ku dengê /q/ di wan de wek xwe maye, bi taybetî yên Turkî û Arebî, wek: (qîr, qîz, qet, qalûqîl, qap). Herweha ne tenê dengê /q/, lêbelê dengine dîtir jî hene ku heman şop digirin, wek em bêjin peyva (ehd) ya ku di "Ferhenga Hediyeel Himêdiye" de hatiye, wek peyva (ehd, ehd dan, ehd kirin). Ev (ehd) bi xwe jî peyva Arebî ya (عهد) hatiye, lêbelê gelek peyvên dîtir hene yên ku dengê /ع/ di wan de heye wek xwe têne bilêvkirin, wek (çelî) bi Kurdî, û (علي) bi Arebî. Heman pirs tê bîra me: Baş e, çima wilo çêbûye? Ev dengên biyanî ku di sîstima Kurdî de nînin di hin peyvên de têne bilêvkirin, û di hin peyvên dîtir de heman deng li nik heman devokê yan zaravî nayên bilêvkirin? Bersiva vê pirsê li gor dîtina min ew e ku wergirtina dengên biyanî di rêveçûneke dîrokî de derbas bûye ta ku cih girtiye, ango ne heme jî pêşî ve Kurd hînî van dengên Arebî bûne, û pê peyivîne, yan jî ev deng ne biyanî ye. Încê hînbûna dengên biyanî, li gor dîtina min, di hin qunaxan de bûriye ta gihaye îro, ku ew jî ev in:

Qunaxa Yekem: Kurdîkirina Deng

¹⁷² Dr John Christopher Sylak-Glassman (2014), "Deriving Natural Classes: The Phonology and Typology of Post-Velar Consonants", A dissertation submitted in partial satisfaction of the requirements for the degree of Doctor of Philosophy in Linguistics in the Graduate Division of the University of California, (rûp 77)

¹⁷³ John Christopher Sylak-Glassman (2014), (rûp 77)

Wek em tev dizanin ku wergirtina dengên biyanî di riya wergirtina peyvên zimanê biyanî de çê dibe. Lê di qunaxa yekê de peyva biyanî tê wergirtin piştî avêtina dengên ku ne ji sîstima zimanê wergir e, û danîna şûngirekî, yan anîna pêguharta li dewsa wî dengî, çî bi riya zirrdeng bê, û çî jî bi riya danîna dengê nêzî wî dengê biyanî bê, wek em bêjin dengê /p / li nik Areban nîne, lewra naçar dibin ku nêziktirîn deng li şûnê (şûna wî) danin ku ew jî /b/ê ye wek peyva (Orupa) li ba Areban dibe: (Oruba); yan dengê /f/ li şûna /v/êya biyanî dideynin ku peyva (şivan)a Kurdî dibe (şifan) li nik Areban, weha jî dengê /g/êya Hindo-ewrupî dibe /ġ / û carna jî dibe /ج /, wek peyva (Gotê), navekî Elmanî ye, bibû navûnîşana jimarekê ji jimarên govara (Alem Elmaarîfa) ya Kuwêti. Inca ew navê biyanî (Gotê) bi Arebî hatibû nivîsandin û weha hatibû: (جوتنه). Areban ji zû ve bîr li vê kêşeyê kirine û kirasê Arebî li peyvên biyanî kirine, da li gor deng û qalibê zimanê mirovê Areb bê guhartin ta radeyekê ku xwediyê peyvê bi xwe jî nema êdî peyva xwe nas dike, bo nimûne, peyva (binefş)a Kurdî di Arebî de bûye (binefsec). Areban dengê yan du dengên Arebî bi ser peyva biyanî de zêde dikirin ta ku peyva Biyanî şeweya Arebî bistênê. Eva han jî, wek diyar e, li ser destê zimanvana drust dibû. Di Kurdî de jî heman kêşe hebû, lê ne wek Arebî bi zanebûn diçû serî, lêbelê bi şeweyeke xweristî ava dibû. Inca di vê qunaxê de Kurd hînî zimanê Arebî nebibûn, lewra dengên Arebî jî li wan giran bû û nedikarîn wan dengên bibêjin, vêca heme yekser ew dengane dihatin wergerandin û li şûna wan, dengên Kurdî dihate danîn, wek:

peyva Arebî	Bi şeweya Kurdî
جامع	camî
جمعة	Cimo
عطل	etlahî
ملك الموت	melkemot
مقر	mukir
مفتاح	mifte
فائدة	fejde
مقصد	mexsed

Navên Mirova

Di baweriya min de navê mirovan bi Arebî, yê mîr û jinan, peyvên pêşî bûn ketine nav zimanê Kurdî de. Inca em dikarin wa bêjin ku peyvên Arebî cara pêşî di riya bankirina

navan re ketine ser zimanan de. Lê ev peyvên Arebî wek xwe bi forma xweyî Arebî nediman û li gor dengsaziya Kurdî dihatin guhartin, wek: (عثمان) bû (Osman), ku herdû dengên Arebî عث ji şeweya Kurdî hatine avêtin. Peyva (hêt) ne Kurdî ye, ji peyva Arebî (حائط) ku /û ev jî belgeyeke zimanî ye ku Kurda di despêkê de nizanîbûn vî dengî bêjin, jiber wilo jî li şûna bêjin (عثمان) digotin (Osman) ango dengê (عث) a Arebî bû (os) a Kurdî. Her weha gelek navên mirovan yê Arebnijad ketine Kurdî de piştî ku dengên xweyî nijadî wunda kirin, wek:

Mamed,	محمد
Berhîm,	إبراهيم
Simko, Simayîl, Simê, Simo	إسماعيل
Evdile, evdilla, Evdo, Apo	عبدالله
Osê, Oskê , Osko	يوسف
Osman	عثمان
Silo, Silê, Silêman	سليمان
Mistê, Misto, Miçê, Mistikê	مصطفى
Fatê, Fato, Fatikê, Fatim, Fatimê	فاطمة
Xecê, Xeco, Xecokê	خديجة

Qûnaxa Duyem:

Di vê qunaxê de wa diyar dibe ku Kurdan pîş bi zimanê Arebî kirine û mele û şêx û feqe û sofîyên wan çêbûne, yê ku li ber destê zanayên misilmantiyê xwendine di tekî û hîcre û mizgeft û cihên xwendina dersên dînî de. Hikûmeta Islamî jî, bê guman, di geşekirina vê tevgerê de nemedî nekiriye ta ku hinohino zimanê Arebî li nav Kurdan belav bûye. Helbet dengên taybet bi zimanê Arebî wek: (ع ، ق ، غ ، ح) eger di qunaxa yekê de nikarîn cihê xwe di nav Kurdan bibînin, lê di qunaxa duwa de wê bibînin, ji ber ku mirov di riya xwendin û hînkirin û fêrkirinê de dikarê hemî zimanan werbigire. Inca wa çêbû ku herçar dengên Arebî (ع ، ق ، غ ، ح) hatin fêrkirin. Lewra jî peyvên Arebî bi dengên xwe yê taybetî ve li ser zimanê mirovê Kurd hatine gotin, herçend hin guhartin tê de heye lê ne hewqas tewaw e, wek:

Peyva Arebî bi Kurdî	Peyva Arebî
nifhet, nifçet	نفعة

çibret	عبرة
qefast	قفز
zîrih	ذي روح
Êelê, êelo	حليمة
Ehmê, Ehmô	أحمد
Mihê, Miho	محي الدين
Êesîka, Êesê, Êesenîko	حسن
Êisî, Êisko, Êiso, Êisê, Êesîka,	حسين

Qunaxa Sêyem:

Di vê qunaxê de wa çêbû ku ji van herçar dengên Arebî (ع ، ق ، غ ، ح) dengê (q) riya xwe pirtir di Kurdî de vekir, û gelek peyvên nû pê hatine drust kirin. Ne tenê wilo jî hin peyvên Kurdî ku bi dengê (k) bûn, bi qafê (q) hatine guhartin wek: **(qop)** ji peyva Kurdî ya **(kuppîya)** hatiye; û **(qûn)** ji peyva Kurdî ya kevintir **(kun, kunkunî)** hatiye, jiber ku ta niha ev peyvên Kurdî yê resen di têvajoyeke taybet de bikar tên. Încê dengê (q) îroroj wek fonêmekî Kurdî tê jimartin, lêbelê ew bi xwe zirr fonê e, ango ne fonêmekî resen e di Kurdî de. Hin zimanzan wa dibînin ku dengê (q) dengê resen e di Kurdî de, ne dût e ev jî rast bê, nemaze eger hebûna vî dengî di belgeyên kevin de isbat bibe. Ji alîkî din ve hersê dengên dîtir, herçende hebûna xwe di zimanê Kurdî de çêkirin, lê ne di riya peyvên nû de, ne di riya peyvên Kurdnîjad de, hebûna wan tenê di riya peyvên Arebî de diyar dibe. Vê yekê jî lawazî bi ser deng de anî, jiber ku ev deng di peyvên biyanî de mane bendkirî, herçende hin peyv hene di zimanê Arebî de diyar nabin, lê ev jî gelek hindik in, ta radeyekê mirov dikarê dev ji wan berdê, yan jî dengê Kurdî nêzî wan û resen bikar bîne, wek em bêjin şûngirê deng, wek dengê (h) şûna (h) di gelek peyvên de dikarê cih bigirê jiber ku berdêliya wan heye.

Eger em li sîstima dengsaziyê ya zimanê Kurdî baş binerin, emê wa hişkere bibînin ku çend dengên Arebî wek (ط ، ت ، ث ، ض ، ظ) nikarîne cihê xwe di sîstima zimanê Kurdî de xweşik bibînin, herçende ev dengane bi şeweyeke nêzîkî wan di Kurdî de heye, lê ne di astê fonêman de ye, û ne di astê şeweya standard de ye, ango pirtir di warê zardevî de peyda dibe, wek van nimûneyên jêrî:

Şeweya Kurdî		Peyva Arebî		tîp	
Fatimê	t	فاطمة	ط		1
wetenî	t	وطني	ط		1

qadî / qazî	d/z	قاضي	ض	2
Zerîfa	z	ظريفة	ظ	3
Sabîr	s	صابر	ص	4
Ĥaris	s	حارث	ث	5

B) Diyardeya Zirrdengên (ĥ, ġ, ʕ/ ح غ ع)

Encama nebûna guhdan û dam û dezgehên pispors di zimanê Kurdî de, zimanê me bê xudî maye, û wek kerîkî bêşivan li deveran biterqehê, yan jî wek bexçekî ji xwe re şîn bibê, helbet wê gelek gelş û qelş bikevin erda wê de. Bê guman berê wê jî wê kêmbê û nexweşiyên wê jî peyda bibin. Wilo jî hin peyvên saxlem jî di zimanê me de wê bikevin ber kartêkirina zimanên dîtir, ku hinohino ta bi dengên resen jî kirasê xwe diguherê, û kirasekî biyanî li xwe bikê. Lewra jî ya pêwîst ew e ku zimanzanên Kurda bala rewşenbîran bikişênin ser van kêşeyan, û bikarin bi awakî rast teliya xwe danin ser nexweşiyê, û ranewestin ta ku dermanekî jê re bibînin.

Wek me berî niha jî dupat kir ku ev hersê deng tozîk li ser wan nîne ku ji Arebî hatine nav Kurdî û ev rastiya han ferhenga Kurdî dupat dike, ango ev hersê deng di wan peyvande tîn, yên ku ji ferhenga Arebî hatine nav Kurdî, û ti pêwendiya van peyva bi zimanê Kurdî nîne, lewra dengên van bêjeyan jî ser bi zimanê Arebîne, û bi vî awayî dengên (ĥ, ġ, ʕ) / (ح غ ع) ketine nav zimanê Kurdî de. Lê ne dîr e ku hin peyv bi van dengên di Kurdî de peyda bibin bê ku di Arebîde hebin, yan jî van dengên kartêkirinek li dengên Kurdî kirine bi awakî ku peyva Kurdî ya resen ketiye ber van dengên de, wek dengê /h/ya Kurdî di hin peyv de bûye wek /ĥ/, ango hatiye şewhandin, herifandin, wek guhartina dengê van peyvên jêrî:

<i>heft</i>	bûye <i>ĥeft</i>
<i>heşt</i>	bûye <i>ĥeşt</i>
<i>herçî/heçî</i>	bûye <i>ĥeçî</i>
<i>hemi</i>	bûye <i>ĥemî</i>
<i>ta</i>	bûye <i>heta</i>
<i>hezkirin</i>	bûye <i>ĥezkirin</i>

Peyva Kurdî	şûngirê deng	şûngirê peyvê
<i>herrî</i>	<i>herrî</i>	<i>qurr</i>

Peyvên Arebî, wek:

Şeweya Arebî

h

qehir

qehwe

Şeweya Kurdî

ĥ/ç

qeherandin

qeĥwe

Dengê Heywan û Teyrikanû (q, ĥ, ĝ, ç) / (ق ح غ ع):

Di zimanê Kurdî de gelek peyv hene yê ku zarbêjiya dengê heywanan dikin, û ev peyvane bi dengên Arebî (q, ĥ, ĝ, ç) / (ق ح غ ع) despê dikin, wek:

çirr-çirra kera

çorr-çorra çêleka

çûz-çûza kûçika

çewt-çewta kûçika

qarqara van qaza

qirçeqirça dirana

qîjqîja zarokan

qirqira zilaman

qebqeba kewan

ĥimĥim ji odê tê.

ĥirrĥirra van hespan

ĥîrĥîra van hespan

ĥingeding zilama ye

ĝirĝira van zaroka

1. Dengê [q]

Herçende hin wa dibêjin ku dengê [q] ji mêj ve di zimanê Kurdî de heye, ez bi xwe ji vê yekê ne bawer im, û weha dibînim ku dengê [q] ne dengê resen e, ango ne dengê nijadKurd e, lewra jî min ew xistiye nav zirrfonêman de. Lê ev deng ji hersêkên dîtir cuda ye, û cihekî xwe di zimanê meyî îro de girtiye, û bihayê wî jî wek bihayê Kurdfonêmên dîtir e, wek b, p, t, k... htd. Lê bi ser wilo de jî, nabê em wê rastiye piştguh bixin û nebêjin ku piraniya peyvên qafdar - ango ew peyvên dengê [q] di wan de heye, çî di despêka wan gotinan de bê, û çî jî di dawî û navîka wan de bê - gelek ji van peyvên koka wan ji zimanê

Arebî ye, yan jî ji zimanê Tirkî ye. Eva han jî di ferhenga Kurdî de diyare, wek van nimûneyê jêrî ku me ji ferhenga Hemîdiyê wergirtine, wek¹⁷⁴:

Arebî	wata bi Kurdî	peyvên tirkî	Wata bi Kurdî
qublet	başûr	qapî	dergeh
qefes	rekeh	qapqap	pêlava darî
qalûqîl	gotgot	qapût	seko
qam	bejin	qîz	keç
qanûn	yasa	qereç	polatî
qebûlbûn	pejirandin	qaz	qaz
qehêrîn	silbûn, torebûn	qalind	stûr
qeda	buwart	qamîş	çîtik, karûş
qazî	dadpirs	qamçî	qamçî
qedandin	buwartin	qarîş	kemer, pişte

Peyvên Kurdî :

qafik	qeşartin	
qarqarok	qaşil	
qalib	qalik	
qelen	qarçik	
qaqreş	qayim	
qêrîn	qeba	
qajik	qebale	
qayil	qebilîn	
qawît	quraftin	
qewîtî	qerpal	
qutik	qirçmandin	qurçmandin
qetandin	qurçmîn	
qetek	qerax	
qerisandin		

¹⁷⁴ Vegere ferhenga (Elhediye Elhemêdiye) yan Al-Hadiyatu'l-Hamîdiyah, Dia'ud-Din Basha al-Khlidî. (Bi zimanê Arebî ye)

qurifîn quraftin

Lê Tirkîbûn û Arebîbûna van peyvan nebûye sedemeke pir mezin ku ev deng peyvên nû jî drust bikin, herwekî ketiye nav mîkanîzima zimanê Kurdî de, lewra wê peyvin hebin jî ku ti pêwendî bi zimanê Tirkî û Arebî ve nîne, wek:

Eger em li ferhenga Kurdî ya (Alhedîye Al-hemîdiye) binerin, emê bibînin ku daner gelek peyvên îro bikar nayên tomar kirine, yan jî wek van peyvan li devereke taybetî bikartên yan jî li nik hin mirovên ku têkiliyê wan bi Tirkan re gelek hene. Ya dîtir jî li şûna van peyvên biyanî peyvên Kurdî hene, lewra gerek em bêje û peyvên xweyên resen bikar bênin, wek li şûna em bêjin (qapî) em dikarin (derî, dergeh) bêjin, wilo jî (qap) û (berg), (qalind) û (stûr). Li ber dengê /k / yê ku biramakê hev in, ango nêzîkî hev in di sazgeha deng de, ku ev jî di peregrafa jêrîn de tê şîrovekirin.

Dengê [k] yan [q]?

Hincar dengên peyvên di zimanê meyî îro de bi du coran tene gotin, wek dengê [q] û dengê [k] di hin peyvan de cihê hev digirin. Di baweriya min de, bilêvkirina dengê [k] di zimanê Kurdî de ji yê [q] kevintir û resantir e, jibilî ku dengê [k] ji yê [q] xweştir û naziktir e. Ev diyardeya han encama kartêkirina zimanên biyanî ye, nemaze, yê Arebî û Tirkî, ku ev peyvên jêrî wek nimûne vê yeka han pêş me dikin, wek:

<i>q</i>	<i>k</i>	<i>q</i>	<i>k</i>
qeliştin	keliştin	xelq	xelk
peqandin	pekandin	qop	kop, kupiyayî
çiqil	çikil	qiç	kiç, keç
pijiqndin	pijikandin	qirç	kirç
qezwan	kezwan	qîz	kenîz, keç, kîjol
qelişîn	kelişîn		

Lê, gelo em kîjan dengî? [k] yan [q] hilbijêrin? Eva han ne hewqas bi kêfa me ye, ango piroseya pêşveçûna ziman bi şeweya rasteqîne di jiyanê de xwe li ser me disepênê. Belê di hin peyvan de dengê [k] pirtir bikar tê, lewra gerek bi kêmanî peyvên wilo bi dengê [k] bêne çespanandin, nemaze dengê [k] ji [q] di Kurdî de kevintir û resantir e. Ev boçûn û bîroke hem nik Bakayêv¹⁷⁵ hem jî li nik Thakiston¹⁷⁶ di kurmançî û Soranî¹⁷⁷ de hatiye

¹⁷⁵BAKAEV, Ç ERKES XUDOEVIC. 1973. Jazyk kurdov SSSR. Moscow: Nauka. (rûp 41-56)

¹⁷⁶THACKSTON, W. M. 2006a. Kurmanji kurdish - a reference grammar with selected readings. URL: [http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji complete.pdf](http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji%20complete.pdf).(rûp 2)

tekezirin ku Dr John Christopher Sylak-Glaśman (2014) heman bîrûra tekeze dike dema ku çend zimanan dide ber hev¹⁷⁸.

Kurdish 26	k, kh, g	q, x, xw, k	ĥ	h	Bakaev (1973: 41-56)
Kurdish (Central)	k, g, x, y	q	ĥ	h	Thackston (2006b:1)
Kurmanji	k, q̄, g, x, y	q	ĥ		Thackston (2006a:2)

C) Dengên (ĥ, ĝ, q̄) Zirrdeng in? Yan Zirrfonêm in?

Ji dengên (ĥ, ĝ, q̄) / (ح غ ع) re (zirrdeng) dibêjim, jiber ku ev dengên hanê eger wek fonêm neyên standin, nabê em nav li wan bikin, û nabê jî ev dengane bikevin nav alîfbaya Kurdî de, lewra jî tîpên wan di sîstima Alîfbaya Kurdî de wê nebê. Inca ev deng ne ji fonêman têne jimartin, û ne jî ji tîpan. Lê dengê (q/ق) jiber ku wek fonêm bikar tê, lewra ez wî dibînim wek zirrfonêm, û pêwîst e tîpek taybet pê hebe, ku ew jî (q)e ye, ya ku di sîstima alîfbaya Kurdî de îro-roj hatiye çespanandin. Ne tenê ez, belê gelek ji zimanzanên Kurd wa dibînin ku dengên (q, ĥ, ĝ, q̄) / (ق ح غ ع) jî wextekî ne gelek dûr ve hatine nav zimanê Kurdî, ango ev deng ne Kurdnijad in. Wa diyar e ku ji zimanê Arebî hatine nav zimanê Kurdî. Ez jî ji wan re zirrdeng û zirrfonêm dibêjim. Dengê /q/ق/ wek fonêm ji wan herçar dengan cihê xwe di alîfbaya Kurdî de girtiye, nemaze ku Bedirxan ji despêkê ve kar bi tîpa (q) kiriye, û îro jî ev deng pirtir ji hersêkên dîtir bikar tê.

Pirsa di vir de tê bîra me ew e: Gelo em van hersê dengên (ĥ, ĝ, q̄ ح غ ع/) wek fonêmên Kurdî bikar bênin wekçawe dengê /q/a neKurdî bûye fonêm? Yan jî em wan bikar neyênin, û li şûna wan dengên (ح غ ع), dengên Kurdî yên nêzîkî wan bikar bênin?

Bersiva van pirsan helbet ne hesanî ye, lê pêwîst e zimanzanên Kurd raya xwe zanistiyane bidin. Wek xuyanî dike du bîrûra li meydanê hene:

Raya yekem wek zirrfonêm bikar werin. Ev raya han li nik Kurdên Iraqê û Îranê derdikeve, ewên ku bi alîfbaya Arebî dinivîsin, wa dibînin ku ev deng herwekî di zimanê me de bikar tên, ew jî ti ziyankariyê tê de nabînin ku wek fonêmên Kurdî bikar werin, û simbolek yan tîpeke taybet bi her yekî ji wan bê terxankirin, û wan wek fonêm hilbijêrin, û di alîfbaya Kurdî de jî hebûna wan wek tîp bidin xuyanîkirin, û di xwendin û di nivîsînê

¹⁷⁷THACKSTON, W. M. 2006b. Sorani kurdish - a reference grammar with selected readings. URL: http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Sorani/sorani_complete.pdf. (rûp 1)

¹⁷⁸John Christopher Sylak-Glassman (2014), "Deriving Natural Classes: The Phonology and Typology of Post-Velar Consonants", A dissertation submitted in partial satisfaction of the requirements for the degree of Doctor of Philosophy in Linguistics in the Graduate Division of the University of California, Berkeley (rûp 28 – 29)

de jî bikar bênin. Kurdên Iraqê û Îranê van dengan wek fonêman dibînin herçend ne Kurdîbûna wan jî têne ziman, lewra wek tîp di rênivîsê de bikar tênin.

Raya Duyem: Zirrdeng

Cihê amajepêkirinê ye ku Celadet û Rojê Lîsko di pertûka xweyî rêziman de dengên (h, g, q)/(ح غ ع) wek fonêm nexistine nav alîfbaya Kurdî de. Rast e kêşe ne bi birryara takekesekî ve ye, lêbelê pêwîst e ku zimanzanên Kurda pevra bigihin birryara dawî ta ku yek şewetîp wek standard ku hemî kes wê yekê tenê bikar bêne, ne ku her yek li gor kêfa xwe herê meselê. Lê berî ku zimanzan pevra bigihin vê birryara dawî, ya baş ew e ku zimanzan lêkolînên xwe di kêşeyên zimanê Kurdî de belav bikin, da ku zimanzanên dîtir jî û her rewşenbîrekî Kurd bîrûrayên têvel bixwênin û bi zanîneke zimanvanî girêkên ziman ji hev vekin. Ez bi xwe wek helwêst ne gelekî meylarê bûna wan im, jiber ew peyvên bi van hersê dengan hewqas gelek di zimanê Kurdî de nînin, lewra anîna wan cihekî binerx jê re nine. Rast e çend peyv hene, lê hewqa ne gelek in ku em pêwîstî bi wan bibînin. Ya dîtir jî peyvên bi dengê /g/ dibe bi /x/ê jî bêne xwendin, weha jî dengê /h/ dikarê hincar şûna (h, ç) bigirê, bo nimûne, li şûna em (çewteçewt)ê bikar bênin, em dikarin peyvên sade Kurdî bênine ziman wek (kewtkewt). Ya dîtir jî gelek ji van peyvên bizirrdeng biyanî ne, û peyvên Kurdî yê resen hene li şûna wan bikar werin, wilo emê hem ji van zirrdengan rizgar bibin, hem jî emê peyvên xwe yê Kurdewariyê bixin şûna wan peyvên ku mele û şêxên me li nav me belav kirin. Inca du şûngir (bedîl بديل) tên. Inca çareserkirina vê giriftariyê ji du aliyan ve çêdibe: yekem, anîna şûngirê deng, duyem, anîna şûngirê peyvê.

D) Dengên (غ ع ح) di Ferhengên Kurdî de

Helwêst ji van dengên biyanî sebarete ferhengên Kurdî ew e ku li gor nofê tîpên ferhengê dihat: tîpên Arebî yan tîpên Latînî, vêca em dikarin bêjin ku helwêst weha bû:

1. Ferhengên Tîpên Latînî:

Ev nof guh li hersê dengên Arebî nedidan, bo nimûne, ferhenga Goranî dengê ح wek tîp bikar aniye, û hincar jî dengê ع wek (ç) bikar aniye, nemaze, di beşê dengdêrên wek: (î, î, u, û, o, e, a, ê) de. Goranî dengê (غ ع ح) wek tîpên serbixwe bikar anîne, tenê ev deng di nav tîpên biratîp de anîne, wek غ bi (x)e re anîne, ku şextek li ser (x) daniye, weha jî dengê ح di nav tîpa (h)ê de aniye piştî ku şextek li ser tîpa (h)ê daniye.

2. Ferhengên Tîpên Arebî:

Lêbelê ev nofê duwa guh didan dengên Arebî, jiber nivîsîna wan bi hesanî dibû, ya dîtir jî hebûna van tîpan di Arebî de, û nebûna wan di Latînî de kartêkirinek li ser hişê danerê ferhengê dikir, çî ya Latînî û çî ya Arebî.

Xaleke dîtirî balkêş heye ku jimara rûpelên van tîpan di ferhengê de gelek kême e sebarete tîpên dîtir, her ev jî dibe belgeyek ku ev dengine zirrdeng in, ne resen in, lewra jî çîhê wan di ferhengê de kême e. Jibo ku eva han ronî bibê, emê xîstexaneyekê bi berê van hersê dangan û dengine dîtir jî daku rastiya kêşeyê bê ronîkirin, wek:

	Hejar	Mukiryani	Goranî	Estêregeşe
giştî	1035	940	670	770
ح	10	10	2	7
ع	7	3	2	3
غ	3	2	-	1
Q	45	47	28	22
b	58	90	51	55
x	36	42	22	39
k	86	77	48	49
h	89	34	42	30
dengdêr	35	47		

Encamên Birrê Zirrdengan

Derbarî hebûn û nebûna van zirrdengan di Kurdî de, ez weha dibînim ku ji zimanê Arebî ketine nav Kurdî de, û baştir e ku di sîstima fonemên Kurmancî de bikar newin, û di warê nivîsînê de jî nebin tîpên alîfba, ji ber ku ev deng bi tevahî ta niha nivîserekî Kurdî jî nebûna wan ji alîfbaya Kurmancî ya Latînî kazkaz nekiriye ango pêwîstî bi wan nekiriye. Ya dîtir jî hebûna van dangan zimanê Kurdî ber bi Arebîkirinê de dibe, lewra ya baş ew em zimanê xwe biparêzin, yan wê zimanê me li ber xurtbûna wan biçilmise wekçawa gelek ji Kurmancan peyva hemû bi dengê / h ح iya Arebî dibêjin, inca wilo wê gelek peyvên Kurdî bi dengên Arebî bêne guhartin ku ev bi xwe metirsiyeke fonolojî ye, wekçawa dengê goşiya /xw/ya Kurmancî li nav xelkên Kurmancên Xuresanê bûye /x/ ango jidêvla bêjin (min xwar) dibêjin (min xar) ku hin bi hin ev êrîş tête nav devoka Serhedê jî yên ku /xw/ bi /x/ dibêjin.

BIRR VIII

2.8. Encamên Beşê Duyem

Di vî beşî de, me 46 dengên zimanê Kurmancî xistine ber bêjîngkirina fonolojî de ku em bikarin wan dengên kartêker û standard hilbijêrin ku di van xalên jêrî de kom dibin:

2.8.1. Dengên Stûr

Herçende dengê [d̪]eya stûr ya Arebî di piroseya bilêvkirina Kurdî de tenik dibe, û normal dibe, wek (قضاء) bi Kurmancî dibe (qeda, qeda û bela), peyvya (qaçî) bi Arebî ye, li nik Kurdên Iraqê dibe (qazî). Dixwazim wê yekê bêjim ku Kurdan hewl daye xwe dûrî rûçikên zimanê Arebî bikin, lê dîsa bi salan re siha zimanê Arebî di hinek ji van alofonên dengê stûr de diyar e, wek ([t̪], [s̪], [d̪], [z̪]), neku piroseya dengên stûr bi tevahî ji Arebî hatiye, bo nimûne, dengên ([f̪], [k̪], [pp], [ʃ], [ç]) nakevin ber vê kartêkeriya Arebî de wek zimanekî dînî û keltûrî bo Kurdan, yan wek di zimanvanî de jê re (contact language) dibêjin. Herweha dixwazim vê yekê tekez bikim şeweya stûrkî di van her pênc dengên dawî de me anîne ziman ji xwe di zimanê Arebî de nîne ta ku em bêjin ji Arebî hatiye, ya dîtir jî siruştî stûrbûnê wek pirose ji zû ve di Kurdî de heye, ji ber ku wergirtin jî amadekariyeke saykolojî jê re divê. Ez goman dikim ku ne dû re, wek li gor celebê peyvyan, ji min ve weha diyar dibe, ku herçar dengên stûr: [t̪], [s̪], [d̪], [z̪] di bin kartêkirina zimanê Arebî de çê bûne.

Li encamê em dikarin bêjin ku heft dengên: [l̪] , [p̪] , [t̪] , [ç] , [s̪] , [z̪] , [d̪], ji bilî [ç]e ta radeyekê, bi şeweya stûrkî, di zaravê Kurmancî de, wataya peyvê naguhêrin, lewra jî li gor yasayên fonêm, heft dengên stûr pirtir wek alofon kar dikin, lê du dengên [f̪] û [k̪] wek fonêm dikarin di zimanê Kurmancî de karê xwe bikin. Inca, herçî alofon in, nakevin nav fonêman de, û erkê wan di nav alîfba de nîne, ango cihê wan wekû tîp di nivîsînê de nîne, ji ber ku tîp tenê nîşana fonêmtiyê ye. Ya dîtir jî rênivîsa Kurdî li ber ronîya fonêm ziman orgenîze dike. Eva han jî di alîfbaya Celadet Bedirxan de xuyanî dike ku wilo bîr biriye, û hîç şewê tîpên ciyawaz ji şewedengan (alofon) re nedaniye, ku ev jî şarezabûneke zimanvanî di vê babetê de dide xuyakirin. Lê zanyarê me Qenatê Kurdo di pertûka xwe de ya bi navê (Rêzimana zimanê Kurdî) weha çûye ku piraniya dengên stûr wek alofonan nabîne, lê wan wek fonêm dibîne, û ji wan re jî tîpên nîşandar danîne, ku her tîpeke dengên bingehîn niçikek daniye ser, da ku ji hevalê xwe yê cewî bêne naskirin û cudakirin. Di baweriya min de Qenatê Kurdo wêneyê deng di şeweya xweyî fonetîkî de kêşaye, ne di

şêweya xwey fonêmkî de. Bi rastî ev core rênivîs durvê nivîsînê zehmet dike, ji ber wilo jî zimanzanên cîhanê vê yekê ji rênivîsê dûr dixin. Lê Celadet û gelekên dîtir ji zimanzanên Kurda şêweya rênivîsa Kurdî li gor fonêman zimanê Kurdî danîne, herçende ciyawazî di hin xalan de navbera wan de heye. Lewra, guh nedane şêweyên deng û alofonan. Bi vî awayî jimara fonêman ji ya deng û alofonan hindiktir e, û wilo jî ziman dikarê xwe pirtir nêzîkî şêweya standard bike. Ji ber ku di ziman de gelek şêwe dengên zarekî yan devkî hene, nabe evane bikevin ber tîpên alîfba de, wekû diyardeyeke şaristanî û netewî ber bi yekîtiya ziman de gavên xwe tavêje.

Herçende peywendiyê xurt navbera fonêm û deng de heye, belê cudabûneke zimanî jî navbera wan de heye, ew e ku zimanvan wa dibêjin: “Her fonêmek deng e, belê her dengek ne fonêm e”, her wilo jî di warê nivîsînê de, ne her deng divê tîpek cuda jê re hebe. Eva han jî ne tenê ji ber wê yekê ye ku giriftarî di pêşiya yekîtiya zimanê Kurdî de peyda nebin, lêbelê ev kêşe di barê zanistî de jî her bi vî rengî tê. Di alîkî dîtir de jî îro-roj ciyawazî navbera hin dengên zimanê Kurdî de di hin devokan de pêwîstî bi yekîtiya fonêman heye, da ku em nekevin ber şap û lehiya diyalektan de, nemaze di rêjeya peyvan de, ku yek peyv bi du şêwe tê gotin û tê nivîsîn, bo nimûne:

I-

mar	мечер	مه عەر
tal	течел	ته عه ل
hişk	чиşk	wuşk عشك
hengirî	ченгрî	هه نرî
zehf/zehf	зечef	زه عه ف
av	aw (Sorani)	
dev	dem (Sorani)	

II- Dengên hin peyv navbera xelkên Silêmanî û xelkên Hewlêrê û xelkên Kwêsinceq tîp guhartin:

<u>Hewlêr</u>	<u>Silêmanî</u>	<u>Kwêsinceq</u>	<u>Kurmancî</u>
mal	maļ	mar	mal
xal	xaļ	xar	xal

Ji ber vê yekê jî em nikarin dengên ziman bi şêweyê berela danin, yan binivîsin, pêwîst e ku şêweyê standard were, ku her ew jî dikeve ber sînore fonêm weku pêkhênerekî giring di binyata peyvê de ya ku bi şêweyê taybet bi standarkirina forma

peyva ferhengî radiwestê, bo nimûne, divê em yek formî ji van her çar formên yek peyvê hilbijêrên, wek: (wilo, welê, halo, wefê) yan ji van herdûkan: (bûk, bîk). Belê, ji alîkî din ve, fonêm bi erkekî ferhengî ango leksîkal (lexical) radibe û watayan nîşan dike, wek: (par - bar). Lewra nîrxê deng weku fonêm di rêzika birrek dengên dîtir de xuyanî dike, û roleke watayî distênê. Vê yekê jî hiştiye ku fonêm di lêkolîna zimanvanî de cihekî girîng bigire. Her weha di zarê Soranî de, û bi taybetî şêwezare Silêmanî, eger dengdêrên /i/ , (ê/ , (wî), (wê) bi dû dengê /k/ yan /g/ de were, guhartin dikeve şêweya dengê /k/ û /g/ de, ku dibine wek dengê /ç/, bo nimûne¹⁷⁹:

(xelkî Silêmanî) dibe (xelçî Silêmanî)
 (hengwîn) dibe (hencwîn)

Diyardeyeke dîtir jî heye ku xelkên devera Xoşnaw û Dizeyî û Rewandiz û Koysinceq li Kurdistana Iraqê ji devla peyvên wek (mal) û (kilaw) bixwênin, wek (mar) û (kiraw) dixwênin: Lê pêwîst e (mal, kilaw) bibe şêweya standard û wilo bête nivîsîn. Pêwîst e, tevayiya van guhartinan dikevin ber diyardeya dengsazî de, û hîç kartêkirin bi ser rênivîsê de nebe. Lewra, zimanê Kurdî li ser sîstîma fonêmsaziyê, rênivîs û alîfbaya xwe ava dike.

2.8.2. Zêdebûna Du Fonêman di Kurmancî de

Di vî beşê fonolojî de em digihin wê encamê ku me fonêmên zimanê Kurdî li ber roniya dengsazî û fonolojî şîrove kir û em gihanê wê encamê ku ne hemî dengên stûr alofon in, û ne hemî jî fonêm in wek ku hin zimanzanên Kurd, nemze yên Sovyêta berê, wek fonêm didîtin, ji ber ku yasayên fonolojî di vî lêkolînê de weha diyar kir, lewra dengên stûr ji bilî duwan /r/ û /k/ yê dîtir nakevin ber şêweya fonêman de û wek diyardeyeke dengsazî tê jimartin û şîrovekirin, ku dikevin ber celebê alofonan de, ji ber wilo jî terxankirina tîpan bo wan di warê alîfbaya nivîsînê de nayê pejirandin.

Di vî tezê de min xwest isbat bikim ku du fonêmên dîtir di Kurmancî de hene ta vî kêlîkê wek alofonan têne jimartin, lê di şopandina lêkolînê de bi dû van herdû dangan de [r], [r̥] diyar bi analîzekirina folojî diyar dibe du fonêm in, ne alofon in. Herweha herdû dengê [k], [k̥] bi heman analîzê du fonêm in, ne alofon in. Inca ez pêşniyar dikim ku du tîp li alîfbaya Kurdî zêde bibin, ku ev herdû deng rola xwe di xwendina rast û nivîsîna rast bibînin.

¹⁷⁹4. Dr. Ewrehmanî Hacî Marif, Zimanê Kurdî Li ber Roşnayî Fonetîk de, Bexda, 1976 (rup 61)

2.8.3. Tevahiya Fonêmên Kurmancî di vê lêkolînê de:

Di dawî de em digihin wê encamê ku tevahiya fonêmên Kurdî, jibîlî sê dengên biyanî (\hat{h} \hat{g} $\var�$ / ξ ξ ζ), di baweriya min de ku jimara fonêman di zarê Kurmancî de, di roja îro de, bi tevahiya herdû celean (dengdêr û dengdaran), dibin (34) fonêmên sade, yek jê hemza ye, û du fonêmên dîtir wek du tîpan li alîfbaya Celadet Bedirxan zêde bibe, ku ew jî bi dengdar û dengdêran bi tevahî 33 tîp in:

(a b c ç d e ê f g h i î j k κ l m n o p q r \acute{r} s ş t u û v w x y z).

Jimara fonêm û alofon û tîpan di Kurmancî de:

Fonolojiya Kurmancî bi tevahiya jimara deng û fonêman ve weha tê:

fonêm: (34), alofon: (9), zirrdeng: (3)

26 dengdar + 8 dengdêr = 34 fonêm tevî hemza

34 fonêm – 1 hemza = 33 tîp

2.8.4. Sîstîma Fonêmên Kurmancî:

- 1) **9ên westaw (stops):** / p, b, t, d, k, κ , g, q, ə /. I wane sisê / b, d, g / girr in, yên dîtir kip in. kipek ji bilî /q/ û /k/ yên dîtir bapek in, di piraniya sazgehan de.

/p/ û /b/ lêvkî (bilabial)

/t/ and /d/ diran û pidûkî dental-alveolar,

/k/ and /g/ paş-esmankî (velar)

/q/ post-velar (or uvular),

/ʔ/ qirikî (gloţal), pirtir di seretaya birrîgê de tê yênkû bi dengdêr despê dikin.

/k/ and /g/ gelek caran pêşesmankî dibin dema ku bi dû wan de dengdêrên bilind tên (palatalized before high vowels).

- 2) **Heştên xişoke:** / f, v, s, z, ş, j, x, h /. /v, z, j/ girr in, yên dî kip in,

/f, v/ lêvdrankî (labio-dental),

/s, z/ dirankî-pidûkî (dental-alveolar),

/ş, j/ pidûkî-esmankî (alveo-palatal),

/x/ paşesmankî (velar),

/h/ qirikî (gloţal articulation).

/v/ di Soranî de gelek kême. xişokên girr wek westokên girr heye ji girrî bikevin dema ku li dawîya peyvê tên

- 3) **Didoyên şkandek /c, ç/girr** û kip, pidû-pêşesmankî, dengê [ç] bi ser fonêm de dice, ku ev jî pêwîstî bi lêkolîneke statistîkî û jimêyarî heye ku birryar tê de bête standin.
- 4) **Doyên bêvilok (nasal):/ m, n/** m lêvkî, n diran-pidûkî,
- 5) **Yeke rexkî: I zelal(clear), I (paş-esmankî, velarized),** (pidûkî û pêşesmankî), Herdû deng /l/ û /l̥/ di Soranî de wek fonêm bikar tên, wek [di], gu]. Lê di Kurmancî de dengê /l/eya normal tenê fonêm e, ya stûr alofon e.
- 6) **Didoyên hejok/ r, ř /**pidû-pêşesmank, girr in, /r/ yek tep e (flap, tap), /ř/ dutepe (trill), ji zû ve ev herdû deng di Soranî de wek du fonêman bikar tên wek [di], gu]
- 7) **Didoyên rewan: /w/, /y/.** lêvkî **bilabial**, esmankî (palatal articulation). /w/ û /y/ ji dengsazî ve dengdêr in, lê ji aliyê fonolojî ve dengdar in¹⁸⁰. Piraniya /v/eya Kurmancî dibe /w/ di Soranî de, ango dengê /v/ di soranî kêma diyar dibe.

2.8.5. Zimanê Kurmancî ji bilî 31 fonêmên ku îroroj di sîstima alîfbaya Kurdî de wek tîp bikar tên, sê fonêmên dîtir wek cara pêşî diyar dibin, ku ew jî ev in:

- 1) Dengê hemza [ʔ] fonêm e. Min girafîma /ʔ/ jê re pesend dît, lê pêwîstî pê nîne bibe tîpa alîfbayê, tenê di lêkolînan de bikar were.
- 2) Dengê [f]eya stûrk yan ya baştir (lerok)jê re bê wesfdan, ku wek fonêm cara yekem e di vê tezê de isbat dibe.

Di Kurdî de sîmayeke nû wek (distinct feature) derbasî nav fonolojiya zimanê Kurmancî ku watayan ji hev cuda dike, ji ber wilo jî ev herdû deng li gor pîverên fonolojî dibine du fonêm li şûna ku yek fonêm dihate jmartin.

[r] dengdar, girr, zarekî, yekler (flap)

[r̥] dengdar, girr, zarekî, lerok(trill), stûr

Inca ez pêşniyar dikim ku tîpeke nû bo vê fonêmê bête danîn, ez du girafîman dibînim wek: / r̥ / yan dubarekirina heman tîp wek: /rr /. Di sîstima eliktronî de gelek şêwe girafîm hene, lê ya baş ew e ku komîtek bo hîlbijartina girafîma /r/eya lork saz bibe.

- 3) Dengê [k̥]eya babirr(aspirated) wek fonêm cara yekem e isbat dibe, ku ev fonêm /k̥/ pêwîstî tîpeke nû heye. Min jî girafîma (k̥) jê re daniye. Wilo jî em dikarin bêjin ku aspirated babirrkî bû sîmayekî cudaker.
- 4) Heft Dengên stûr yê dîtir wek alofon di vê tezê de diyar dibin.

¹⁸⁰ Rahimpour 2011- (rup 75)

- 5) Heşt zodengên dengdêrkî di Kurdî de hene, ku bi hevgihaştina nîvçedengdêrên /y/, /w/ ligel dengdêrên sade pêk tên, ku ew jî ev in:
/ay/, /oy/, /êy/, /ey/, /ûy/, /aw/, /êw/, /ew/
- 6) Dengên ku ji Arebî ketine nav Kurmancî zirrdeng in, û nabe wek fonêm bikar werin, tenê girafîm bo wan bête nîşankirin bo xwendina helbestên kilaskî.
- 7) Jimara fonêmên Kurmancî tevî hemza di vê tezê de digihe 34 an, lê 33 bigirafîm in û wek tîpên alîfba bikar werin, ango pêwîst e du tîpên nû li alîfbaya Kurmancî zêde bibin ku ew jî tîpek bo /r/a stûr, û tîpek bo /k/eya hişk.
- 8) Girafîm bo alofonan ango dengên stûr, pêwîst in, bo ku di ferhengan de bêne naskirin û destnîşankirin.
- 9) Çilo di Kurdî de girrûkipî wek sîmayekî cudaker tê jimartin, wilo jî babirrkî (ango: stûrî) dibe sîmayekî cudaker (distinctive feature) di herdû dengên [r] û [f], [k] û [ç] de di zaravê Kurmancî de. Her wilo jî babirrkî di dengên [r] û [l]a stûr de di zaravê Soranî de heye. Ev sîma, di baweriya min de, dibe taybetiyeke cudakerî navbera zimanê Kurdî û Farisî.

• Dabeşkirina fonêmên Kurmancî û jimara wan

31 tîpên ku Celadet Bedirxan berî niha çespendine ji xwe temsîla 31 fonêman dikin, ev goman tê de nîne. Di vê tezê de li gor encamên dawî ku ez gihamê de di vî beşî de du fonêmên dîtir hene ku ew jî

- 1) Fonêma /f/ ango /r/a stûr ku fonêmek e di Kurmancî de, wekçawa fonêmek e di Soranî de.
- 2) Dengê /k/eya babirr fonêm e wekçawa /k/eya bapek jî fonêm e.
- 3) Hemza fonêmeke diyar e û bihêz e bo avakirina birrge di Kurdî de; lê pêwîstî bi danîna tîpekê bo hemza nîne ji ber ku diyarbûna wê her di despêka dengkirina dengdêr de ye, wek:êvar, ûr, în eynî, ez, em, ew ... htd.

Belê dema ku dengdar dikeve pêşiya dengdêr de hemza namêne, wek: (ar) û (dar).

2.8.6. Dabeşkirina Tevahiya Jimara Dengên Kurmancî

•Tevahiya jimara dengên Kurmancî çil û şeş (46) deng in, dengdêr û dengdar.

•Heşt zodengên vokalî wek (-aw, -ew- ...htd) di Kurmancî de wek ku di vê lêkolînê de diyar bû hem dikevin û hem jî nakevin ber dîftongan de, herçende hin zimanzan wan li ser dîftongan dijimêrin.

•Jimara fonêmên Kurmancî /34/in, û /33/ tîp in (piştî pêşniyara vê lêkolînê, du tîpên dîtir bo kurmancîpêwîst e zêde bûn, ji ber ku danîna alîfbayê li ser bingeha fonêman saz dibe.

•Jimara alofonan nih in,heft stûrk in, [uî] , [ŋ]

•Jimara zirrdengan sisê ne.

•Dabeşkirina tevahiya deng û kategoriyên wan ligel jimar û girafimên wani vê cedwela jêrî dediyar dibin:

kategorî	Deng û fonêm û alofon(D46 + Z8 = 54 DZ)	
Deng 46		[a] , [b] , [c] , [ç] , [ç̣] , [d] , [ḍ] , [e] , [ê] , [f] , [g] , [h] , [ə] , [i] , [î] , [j] , [k] , [ḳ] , [l] , [ḷ] , [m] , [n] , [ŋ] , [o] , [p] , [p̣] , [q] , [r] , [ṛ] , [s] , [ṣ] , [ş] , [t] , [ṭ] , [u] , [û] , [uî] , [v] , [w] , [x] , [g̃] , [ç̣] , [y] , [h̃] , [z] , [ẓ]
Zodeng		[-ay] , [-oy] , [-êy] , [-ey] , [-ûy] , [-aw] , [-êw] , [-ew]
Fonêm 34	K 26	[b] , [c] , [ç] , [d] , [f] , [g] , [h] , [j] , [k] , [ḳ] , [l] , [m][n] , [ŋ] , [p][q] , [r] , [ṛ] , [s] , [t] , [v] , [x] , [z] , [w] , [y] , [ə]
	V	[a] , [e] , [ê] , [i] , [î] , [o] , [u] , [û]
	Zo	/ay/ , /oy/ , /êy/ , /ey/ , /ûy/ , /aw/ , /êw/ , /ew/
tîp 33	33	[a] , [b] , [c] , [ç] , [d] , [e] , [ê] , [f] , [g] , [h] , [i] , [î] , [j] , [k] , [ḳ] , [l] , [m] , [n] , [o] , [p] , [q] , [r] , [ṛ] , [s] , [ṣ] , [ş] , [t] , [u] , [û] , [v] , [w] , [x] , [y] , [z]
alofon	9	[ç̣] , [ḍ] , [ḷ] , [p̣] , [ṣ] , [ṭ] , [ẓ] , [uî] , [ŋ]
zirrdeng	3	[g̃] , [ç̣] , [h̃]

Dengrêşî û Fonolojiya Tevinsaziya Dengan di Kurdiya Kurmancî de

Di herdû beşên çûyî de, me dengên zimanê Kurmancî di çarçova kategoriyên alofon û fonêm û zirrdengan de li gor tiyoriya dengsaziyê û tiyoriya fonolojî şîrove kir; niha di vî beşî de, emê rola wan dengan di çarova sîmayên cudaker û birrge û tekez û awazê de, yê ku di tevinsaziya peyv û destewaje û risteyan de derdikevin, bidin xuyakirin, ku li ser pênc tewer û birran de dabeş dibin:

3.0. Pêşekî

- 3.1. Birr I: Sîmayên Cudaker di Kurmancî de
- 3.2. Birr II: Dengrêşî di Kurmancî de
- 3.3. Birr III: Birrge di Kurmancî de
- 3.4. Birr IV: Tekez di Kurmancî de
- 3.5. Birr V Awaz û Ton (Intonation) di Kurmancî de

3.0. Pêşekî

Tiyoriya fonetîk û fonolojî di kertkirina (segmentation) dengên ziman de li ser çend kategoriyên bingehî ava dibe ku ew jî ev in: Di astê yekem de, **deng** (fon - phone) û **alofon** (allophone) û **fonêm** (phoneme), û **sîmayên cudaker** (distinctive features) ku dibe wek navbendek navber herdû astên şîrovekirin û analîzekirina ziman de. Di astê duyem de çend tewerên dengrêsiyê derdikevin ku ew jî: **birrge**(syllable), û **tekez** (stress), û ton (**tone**), û **awaz** (intonation), yê ku dikevin bin astê şîkariya fonolojî (suprasegmental level of phonological analyses). Di vî beşî de emê li ser tewerine nû bikolin ku ew jî mijarên astê duyem in, li gel sîmayên cudaker wek navbend navbera herdû astan de, bi armanca şîrovekirin û analîzekirina zimanê Kurdiya Kurmancî ligel amajekirin bi diyardeyên devokî di warê hemrengî û guhartina dengsazî û fonolojî ya pergala zimanê Kurmancî de. Hêjay gotinê ye ku min hin têrimên nû beramber yê Englîzî danîne, wek (kiltpeyv keywords), (tekez – stress), (dengrêşî – combinatory phonetics), (hemrengî – variation),

(pêşke – onset), (navke – nucleus), (paşke – koda), ...htd. Despêkê, emê sîmayên cudaker di çarçove taybetiyên fonetîkî û fonolojî de şîrove bikin, bi dû de emê biçin nav astê duyem ku dengrêsi û guhartina dengan wek ruwekî fonolojî di axaftina Kurmancî de, paşê emê kêşeya birrge û tekez û awazê di peyv û rista Kurdî de analîze bikin bo ku em bigihin wêneyekî fonoetîkî û fonolojî gişber di zimanê Kurdiya Kurmancî de.

BIRR I 3.1.

3.1. Sîmayên Cudaker di Kurmancî de

Di beşên bûrî yê vê tezê de me deng û fonêm û alofon bi şîrovekirina dengsazî û fonolojî destnîşan kir, wek awayê drustbûna dengan ka çilo derdikeve, û rûçikên fizîkî yê van dengan, û kartêkeriya wan di sazkirin û afirandina fonêmên ziman de, yê ku bi riya tiyoriya fonêm û yasayên fonolojî têne orgenîzekirin li gor erkên wan di birrge û peyvên watadar de ku dibine yekîneyên avakirina ziman. Inca ev rûçik û taybetiyên fonetîkî û fonolojî di tiyoriya sîmayên cudaker (distinctive-feature theory) de pirtir ronî dibe¹⁸¹. Armanca vê tiyoriyê ji bo vewejartin û pênasîna pêwendiyên navbera deng û danîna sîstîmeke dengsazî cihanî bo şîrovekirina dengan di hemî zimanên dinyayê de¹⁸². Em gelekî kûr tê de naçin, şîrovekirin tenê di taybetiyên dengên axaftinê de pabend e. Babeta sîmaya cudakirinê di ferhenga David Crystal de têgeha têrima (**feature**) ango (**sîma**) yan rûçik di şîrovekirina zimanvanî de bikar tê ku mebest jê taybetiyên zimanvanî bi hemî rûçikên (fonetîkî û fonolojî û rêzimanî û ristesazî)¹⁸³. Bi kurtî em bêjin ev sîma di zimanvanî de amrazek e bo cudakirina ruwalet û rûçikên aspektên ziman di warê dengsazî û fonolojî û rêziman û sîntaksê de, yan jî wek têrim rehendên şîrovekirinê diyar dike, ku wek tiyoriya sîmayên cudaker di warê fonolojî de pirtir bikar tê, bo cudakirina kategoriyên dengan û fonêman. Ji ber ku her zimanek jimarek ji fonêman tê de peyda dibin û cudakirina wan fonêman ji nav hev, ji zimanekî ta zimanekî, ne yeksan e, jiber ku her zimanek sîmayine xwe hene taybet bi xwe ne. Bo nimûne, taybetiya dengên babirrkî û bapekî (yan hişkî û nermiya hin deng, stûrî û normalî) di bîfek ji dengdarên zimanê Kurmancî de wek dengê [k̠] û [k], [l̠] û [l], [f̠] û [r] ...htd yê ku di vê lêkolînê de diyar

¹⁸¹An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981, (rûpel 66)

¹⁸²2. An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981. (rûpel 66)

¹⁸³David Crystal © 2008 A Dictionary of Linguistics and Phonetics 6th Edition. ISBN: 978-1-405-15296-9 "a term used in linguistics and phonetics to refer to any typical or noticeable property of spoken or written language. Features are classified in terms of the various levels of linguistic analysis, e.g. 'phonetic / phonological/ grammatical/syntactic features' or in terms of dimensions of description, e.g. 'acoustic /articulatory/ auditory features'... as in **distinctive feature** theories of phonology"

bûn. Herweha bêvilokî di dengdarên Fransî û Englîzî de heye, lê bêvilokiya Fransî sîmayekî cudaker e di dengdêr de jî, wek Forel û Genoveva dibêjin: "Her zimanek fonemên xwe yê taybet hene ku ji beramberkirina wan ji zimanekî dîtir cuda ye, bo nimûne, bêvilokiya zimanê Fransî ji ya zimanê Englîzî cuda ye..."¹⁸⁴.

Inca fonem û deng di şeweya alofonan de diyar dibin. Alofon û fonem di sîmayên cudaker de hawbeş in, lê her yek ji wan sîmayine xwe yê cuda hene¹⁸⁵. Bo nimûne dengê [s] ku di hin peyvên zimanê Kurdiya Kurmancî de bi şeweyekî stûr di piraniya devokan de tête bilêvkirin, wek peyva (sol) û (sed), lê ev guhartina dengsazî guhartina wata bi xwe re na-ênê ku tenê sîmayekî seyr e, yan di bin kartêkirina zimanekî dîtir de şeweya xwe standiye? Yan jî tiştêkî kevin e di Kurdî de wek hemî zimanên cîhanê?

Sîma taybetiyeke dulayen e, ango rûçîkekî dengsazî (phonetic aspect) ye di di her dengekî ziman de diyar e, yan nediyar e, heye yan nîne, bo nimûne yek ji sîmayên cudaker girrbûn e [girr] inca em dikarin bêjin dengên [e], [d], [l], [b] tene wesfkirin û polênkirin wek [+girr], lê dengên wek [t], [p], [s] wek [-girr] tene nîşankirin. Bo ku em dest danin ser van taybetiyan, pêwîst e termînolojiya sîmayên cudaker di herdû nîşên dangan de, dengdar û dengdêr, bidin naskirin ku ew jî ev in:

Zimanzan wa dibînin ku axaftin berdewamiya livîna organên dengkirinê ne (vocal organs) û ev kertkirina deng, ku (sîgmintkirin) jê re dibêjin¹⁸⁶, bi ser du beşan de: dengdar û dengdêr karekî deskird e, nesiruştî ye, bi ser ku ev kertkirin bi xwe bo şîrovekirina ziman pêwîst e¹⁸⁷. Ev taybetiyên han di sazgeha deng de drust dibin ku tewjima hewayê û strês û radeya deng û kurtbûn û dirêjbûna dangan roleke xweyî girîng dibîne¹⁸⁸. Di lêkolîna dengsazî de gelek têge û teknîkên şîrovekirinê hatine pêşkêşkirin bi mebesta şîkirina rastiyên hemecor di binyada ziman de, ku her ev lêkolîn jî ketin ber tîrên rexnê de. Ji ber wilo jî gelek têgeyên tiyorî bi pêşde çûn, ta ku biçûktirîn daneyên deng bi rêçên hemecor hatine çareserkirin, ku yek ji wan rêçan "sîmayên cudaker"¹⁸⁹ e wek rêbazeke fonolojî ku li ser bingeha dengsaziyê ava dibe bi mebesta destnîşankirina dengên ziman û dabeşkirina wan li gor ciyawaziyên fonetîkî yê pabend bi sazgeh û awayên axaftina van dangan, herweha lêkolîna fakterên fîzîkî û hestpêkirinê ji aliyê bihîzer (bîser) ve. Jiber wilo mijarên

¹⁸⁴Claire-A. Forel & Genoveva Puskás (2005): Phonetics and Phonology, University of Geneva University of Oldenburg (rup 34)

¹⁸⁵Claire-A. Forel & Genoveva Puskás (2005): Phonetics and Phonology, University of Geneva University of Oldenburg (rup 34) : "The realisations of phonemes- or phones- are called allophones. All allophones of a phoneme share the same set of distinctive features but each one can also show additional features"

¹⁸⁶ R. H. Robins, General Linguistics, an Introductory Survey(rûpel 100).

¹⁸⁷-R. H. Robins, General Linguistics, an Introductory Survey, (rûpel 100).

¹⁸⁸- Heman sereçaviya bûrî

¹⁸⁹Dr Wurya Omer Emîn navê (sîmayên cudaker) jê re danî

fonetîkî û fonolojî yên beşê yekem û duyem bo me giring in di têgehiştina sîmayên cudaker de.¹⁹⁰:

Fonolojî ew zanista di binyata (structure) dengên ziman de, erkdarî û rêzkirina wan didê şîrovekirin. Sîmayên cudaker rêbazeke fonolojî ye bo vedozîn û destnîşankirina ciyawazî û lêkçûnê navbera fonêmên ziman de. Bo yekem car, zanay ziman Jakobson cotsîmay ciyaker li ser bingeha taybetiyên fonetîkî danî, bi taybetî livîna endamên axaftinê¹⁹¹

Em ji bîr nekin ku rehmetî Xazî Weys wek yekem kes lêkolînek di mijara sîmayên cudaker de di govara Rewşenbîrî Nuwê de sala 1985-an belav kir. Di lêkolîna fonolojî de zimanzanên despêka sedsala bîstan - berî şerê yekemê cîhanî- bi taybetî, Roman Jakobson û Tirobitskoy, di dibistana Piragê (1926) de gavine çalak û zanyarî di destnîşankirin û polênkirina dengên ziman de di rehendêke bunyadgerî û erkdarî(wezîffî) de ku tîoriya fonêm û sîmayên wê hatine ronîkirin. Yek ji wan têgeyên ku giringî pê dan şîrovekirina fonêman wek sîgmênt û sîmayên cudaker e (distinctive features), ku zimanzan pişt bi rêbaza sîstima duwaneyî ya fonetîkî girê didin bi armanca destnîşankirina sîmayên dengên ziman, ku daneyên deng ne ku serbixwe ne û nayên parçekirin, belê her yek bi erkekî zimanî radibe ku dibe babetê fonolojî. Bo nimûne eger em dêhnê xwe bidin dengê [d], emê bibînin ku ev deng di sazgeha xwe de ku pidûkî ye ji dengên tewjimok wek [b] û [g] cuda ye, û ji [t] jî di nerimbûna xwe de cuda ye, û ji [s] û [z] jî cuda ye ji ber ne xişokî ye, û ji [n] jî cuda ye jiber ne bêvilok e. Inca ev cudabûn bi bi cotsîmayî kar tê de dibe ku herdu sîma dibine hawdij ku jê re (contrast) dibêjin, wek em bêjin girrî û kipî du sîmayên dijî hev in, belê ew dengê girr, nabê kip, vêca hebûna sîmayek bi hêma (+) û nebûna heman sîma hêma bi rengê (-) tê şîrovekirin, û weha tê danîn: dengê /p/ -girr +kip ango kipî di dengê [p] de heye, lê girrî tê de nîne, her ev jî bi awakî dîtir tê diyarkirin:

	girr	kip
p	-	+
b	+	-

Sîstima duwane di destnîşankirina dengên de gelek çalak e, wek:

dengdêr û dengdar

girr û kip

¹⁹⁰Vegere beşê yekem yê vê lêkolînê.

¹⁹¹ Xazî Fatihh Weys , sîmay ciyakerewe û layenêk le fonolojî y zimanî Kurdî, govarî Rewşenîriy nuwê, jimar 106,sal 1985, rûpel 60

dirêj û kurtiya dengdêran

Wilo jî gelek dengên ziman zokî têne nav ziman wek:

/b/	/p/	bar	par
/s/	/z/	ser	zer
/t/	/d/	tar	dar

Ev cudabûn li ser astê zopeyvên ziman (minimal pair) diyar dibe wek cudabûna wata navbera peyva (best) û (mest) de, ku dengê seretaya peyvê, yek /b/ ye, ya dîtir /m/, ya pêşî zarî ye (oral), û ya dîtir bêvilok e (nasal). Di vir de yasayeke fonetîkî- ku jê re (oral nasal distinction) dibêjin- dibê bingeh bo danîna yasayeke fonolojî ku cudabûnê dike wataya peyvên zimanê Kurdî de. Her wilo jî, ev diyarde di zimanê Englîzî de heye wek dengdarê seretaya van herdû peyvên (bad) û (mad), û dawiya van herdû peyvên (rib) û (rim). Di astekî dîtir de dîsa cudabûn navbera zopeyvvan de (minimal pair) diyar dibe wek (seal) ango ew heywanê deryayî û (zeal) ku çêl dilgermiya mirovekî dike. Herdû peyv di hemî dangan de wek hev in, belê dengê /s/ê kip û /z/ê girr ku dibe sedema cudabûnê di wata de, wilo jî (sip) û (zip), /l/ û /m/ di peyvên (leisure) û (measure). Inca ev rûçikên fonetîkî wek: lerînsazî yan lerokî yan zarî û bêvilok ...tad dibine hoyên destnîşankirina dengên ziman. Wek nimûne em dikarin hersê dengên westokî kip (voiceless stops) du sîmayên cudaker bênin, ew jî pêşdev û pêşzar ye yê ku van hersê dangan ji hev cuda dikin ev e:

	p	t	k
girr (voiced)	-	-	-
pêşdev (anterior)	+	+	-
pêşzar (coronal)	-	+	-

Ev diyardeya fonetîkî bûye tiyoriyek bo şîrovekirina dengên sîstima ziman di astê fonolojî de. Jakobson li ser sîstima duwaneyî (binary system) duwazde sîmayên fonetîkî di ciyawazî û lêkçûna dangan de destnîşan kiriye, wek: dengdêr û dengdar, girr û kip, û bêvilok û zarî ...tad. Ya dîtir fonem û alofon¹⁹² dikevin ber sîmayên cudaker de, herweha (bapek û babirr) bi heman destûr dikevin ber sîmayên cudaker de¹⁹³. Bo nimûne di astê fonolojî de bermaberî navbera /b, d, g/ û /p, t, k/ bi rûçikê fonolojî tete naskirin, ku ew [±voice] e, ya ku di hemî zimanan de heye¹⁹⁴. Ji sîmayên cudaker ku di vê lêkolînê de cara

¹⁹²Andrew Moore, 2001 Phonology <http://www.shunsley.eril.net/armoore/>

¹⁹³Andrew Moore, 2001 Phonology <http://www.shunsley.eril.net/armoore/>

¹⁹⁴Mahjoub Zirak (2014): Phonetic and Phonological Changes in Obsolescing Languages, Hiroshima University, a doctoral thesis (rûp 52)

yekem diyar bû ku dengên (kipa bapek) û (kipa babirr) di Kurmancî de wek dengê /k/ku du fonêmên cuda drust dike.

Sîmayên cudaker li ser ciyawaziya fonetîkî li gor sîstima duwaneyî (binary system) şîrovekirina xwe ava dike¹⁹⁵, wek: girr û kip, dengdêr û dengdar, zarî û bêvilok oral û nasal, pêşdev û paşdev, (anterior), stûtbûn û lawazbûn/normal ...tad. Di vî babetî de em dikarin çar celebên dengan li gor sê sîmayên fonetîkî dest nîşan bikin ku ew jî ev in:

sîma (features)	kospekêndevkî (oral stops)	kospekên bêvilok	xişok	şkandek
zirrîngok (sonorant)	-	+	-	-
berdewam (continuant)	-	-	+	-
fîkedar (sibilant)	+	-	+	+

Ji alîkî dîtir ve zimanvan Fant rayeke dîtir xiste pêş, ku sîmaya ciyaker li ser bingeha beşekî destnîşankirî ji regezên inkod (encode) bête avakirin, her ew jî ew bû hawdijên fonêman bèn destnîşankirin wek sîmay cudaker. Ji bilî vê jî, divê li ser bingeha gelek tiştan bixine hesabê xwe de wek livlivîna organan (endaman) û hest pêkirin, ya ku yek e ji regezên giring yên sîstima inkod û dîkod¹⁹⁶ beramber bi hilhênana regezên fonolojî. Buwara diyarkirina celebên sîmayên cudaker zimanzan her yek ji wan giringiyê dixê aliyekî de ku ev bi xwe di baweriya min de vedigerê zanebûna wan taybetiya dengsazî ya hin zimanên berdestê wan, bo nimûne, "Trubetzkoy (1969) giriniyê dide sê rûçikên dengsazî [\pm voice], [\pm tense] and [\pm aspirated]"¹⁹⁷.

Di vê buwarê de, me pêwîstî bi hin zarawayên şaxê dengsaziyê heye, nemaze dengsaziya axaftinê û ya akostokî(acoustic) bo ku em bikarin mijara xwe têbigihî. Inca taybetî û sîmayên fonetîkî li ser bingeha duwaneyî (binary system) ava dibin û li sê astan tene dabeşkirin:

3.1.1. Sîmayên cudaker navbera dengdêr û dengdar de¹⁹⁸

- **Birrgesaz (syllabic)**: ew dengên di avakirina birrge de rola xwe dibîne û jê re sîma+birrgesaz dibêjin. Lê eger deng nikaribê birrgeyê ava bikê wek /y/ û /w/ lewre pirtir bi ser dengdara ve diçe, inca sîma (-birrgesaz) distêne.

¹⁹⁵An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981, (rûpel 66)

¹⁹⁶

¹⁹⁷ Mahjoub Zirak (2014): Phonetic and Phonological Changes in Obsolescing Languages, Hiroshima University, a doctoral thesis (rûp 51)

¹⁹⁸ An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981, (rûpel 67)

3.1.1.1. Sîmayên ku dengdaran ji dengdêran cuda dikin:

Dengdarkî (consonantal) ew dengên ku bitegere û bikosp ji dev derdikevin, sîmaya vî barî [+dengdarkî], lê dengdêr ew dengê ku hewa ji dev bê tegere derdikeve ku sîmaya wê [-dengdarkî]

- **Zirrîngok yan vingok (sonarant)** :zirrîngokiya deng (the resonance of sound) bi awakî ji dev derdikeve ku zingênê bidê deng [+sonarant sound] ku dengên dengdêr û bêvilok wek /m/, /n/, û givok wek /l/, /r/, û nîmçedengdêr wek /y/, /w/, van hemiyan hildigire.

3.1.1.2. Sîmayên ku dengdaran ji hev cuda dikin:

- **Berdewamî** (continuant) sîmayeke di wan dengên ku hewa di cihekî di dev de tê girtin ku ev girtina deng bi awakî weha dikarê dirêj bibê û maweyekê yan demekê distênê wek em bêjin (sssss), û dengên ku vê taybetiyê digirin¹⁹⁹:

- [f] [v] [s] [z] [ʃ] [ʒ] [h] [y] [r] [l]

- **Lerbilind** (strident) ew dengên ku lerîna wan bilind e wek:

[f] [v] [s] [z] [ʃ] [ʒ] [ç] [ç]

- **Bêvilok** (nasal): ew dengên ku ji bêvilê dertên wek: [m] [n]

- **Pêşdev** (anterior): Ew dengên ku sazgeha wan di beşê pêşiya dev de ye wek: [p] [b] [f] [v] [m] [t] [d] [n] [s] [z] [l]

- **Serzar (Koronal)** (Coronal): ji wan dangan re (koronal) dibêjin ku sazgeha wan serê ziman e, wek: [r] [l] [t] [d] [n] [s] [z] [ç] [c] [ʃ]

- **Girrbûn** (voiced): ew dengên ku ku dengejê pê re lerîne dikin wek [v] +girr

3.1.1.3. Ew sîmayên ku dengdêran ji hev cuda dikin:

- Bilind (high) ew dengên ku pêşîka ziman hinekî bilind dibe

- Nizim (low) pêşîka ziman nizim dibe wek dengdêrê /ê/ û /a/

- Paşve (Back) zar xwe bi paşve dibe

- Girover (round) lêv girover dibin

- Têns (tense: the muscles of vocalisation are tensed) her bo dengdaran jî ev sîma bikar tê –têns wek (lax vowels) + têns

3.1.2.Hin yasayên dengsazî

1. Fikedar: Dengên xişok wek /s/, /z/, /ʃ/, /j/ û dengên şkandek wek /ç/ û /ç/

2. Westokên nebêvilok û xişok û şkandek ji nav kospekan têne jimartin, lê dengên dîtir hemî westokên bêvilok in.

¹⁹⁹An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981 (rûp 63)

3. Xişok kospekên berdewam in.
4. Westokên nebêvilok kospekên neberdewam in.²⁰⁰

Inca eger em li tevayiya dengdaran meyzekin, emê cudabûnê di hin aliyan de bibînin wek van nimûneyên jêrî di Kurdî de:

	d	b	g	t	s	z	n
pidûkî	+	-	-	+	+	+	±
dûlêv	-	+	-	-	-	-	-
gewrî	-	-	+	-	-	-	-
nerim	+	+	+	-	-	+	(+)*
teqiyok	+	+	+	+	-	-	-
xişok	-	-	-	-	+	+	-
bêvilok	-	-	-	-	-	-	+

Nîşana + bi wataya ku ev xasîyet/sîmet di wî dengî de heye

Nîşana - bi wataya ku ev xasîyet /sîmet di wî dengî de nîne

Eger em li vê xanerêjê binerin, em bibînin ku koma bihayên (+) û (-) di her dengê de ne wek hev in, û eger du deng bi yek bihayên (+) û (-) wek hev derketin, wê watayê didê ku ev herdû deng yek in, û ti ciyawazî navbera wan de nîne. Ya dîtir pêwîst nakê her dengek yan birrek deng hemî sîmetan bigirê, ango heye ku em sazgeha gewriyê ji xanerêjê bidin alî, û dîsa, bo nimûne dengê [g] ji [d] û [b] ciyawaz e ji ber ku ne ji pidûkê derdikeve û ne ji herdû lêvan²⁰¹. Dengê [n] jî ji yên teqiyok û xişok cuda ye jiber ku [n] ne teqiyok e û ne xişok e.

Sîmayên cudaker buwareke zanyarî giring e di fonolojiya ziman de, ji ber ku bi riya sîmayên fîzîkî û bihîstin û fonetîkê yên taybet bi zimanekî tene diyarkirin, wek sîmaya (xefok, xinkaw/xeniqandî, zeq, qurs/giran, sivik) ji bilî sîmayên giştî ku gelek ziman tê de hawbeş in. Ji ber wilo jî min xwest ez xiştexaneke taybet bi herdû nîşên fonemên Kurdî, dengdar û dengdêr, û yek bo alofonan, danim, wek ku di vê lêkolînê de hatiye, ew jî ev in:

3.1.3. Sîmayên Dengdarên Kurmancî: Di vê xiştexana jêrî de emê dengdarên Kurdiya Kurmancî bixin ber hindêk sîmayên dengsazî de, ku ew jî ev in:

²⁰⁰An Introduction To Linguistics, L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman, USA, 1981 (rûp 63)

²⁰¹L. Ben Crane, Edward Yeager, Randal L. Whiteman(1981): An Introduction To Linguistics, USA, (rûp 63)

Parçê yekem:

sîmayên cudaker	p	b	f	v	m	t	d	n	s	z	ç	c	ş	j	k	q	g
birrgesaz	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
dengdar	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+
zirrîngok	-	-	-	-	+	-	-	+	-	-	-	-	-	-	-	-	-
Berdewamî	-	-	+	+	-	-	-	-	+	+	-	-	+	+	-	-	-
bêvilok	-	-	-	-	+	-	-	+	-	-	-	-	-	-	-	-	-
lerbilind	-	-	+	+	-	-	-	-	+	+	+	+	+	+	-	-	-
pêşdevî	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	-	-	-	-	-	-	-
pêşîk	-	-	-	-	-	+	+	+	+	+	+	+	+	+	-	-	-
girrbûn	-	+	-	+	+	-	+	+	-	+	-	+	-	+	-	-	+
bilind	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	+	+	+	+	+	+	+
nizim	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
paşîk	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	+	+	+
girover	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
Tens	+	-	+	-	-	+	-	-	+	-	+	-	+	-	+	+	-
babirr	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	+	-

Parçê Duyem tewawkerê dengdaran:

sîmayên cudaker	phonetic features	r	rr	l	ll	y	w	x	ğ	h	ç	h
birrgesaz	syllabic	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
dengdar	consnantal	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+
zirrîngok	sonorant	+	+	+	+	+	+	-	-	-	-	-
berdewamî	continuent	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+
bêvilok	nasal	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
strident	lerwaz	-	-	-	-	-	-	+	+	+	+	-
pêşdevî	anterior	-	-	+	+	-	-	-	-	-	-	-
Pêşîk	coronal	+	+	+	+	-	-	-	-	-	-	-
girrbûn	voiced	+	+	+	+	+	+	-	+	-	+	-
bilind	high	+	+	+	+	+	+	-	-	-	-	-

nizim	low	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	+
paşik	back	-	-	-	-	-	-	+	-	-	-	-	-	-
girover	round	-	-	-	-	-	-	+	-	-	-	-	-	-
tens	tense	-	-	-	-	-	-	-	-	-	+	-	-	+
babirr	nonaspirated	-	+	-	+	-	-	-	-	-	-	-	-	-

3.1.4. Sîmayên dengên awarte (fonêm û alofonên) di Kurmancî de

sîmayên cudaker	p	p̣	t	ṭ	k	ḳ	r	í	s	ś	z	ẓ	l	ḷ
birrgesaz	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
zirrîngok	-	-	-	-	-	-	+	+	-	-	-	-	+	+
dengdar	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+	+
berdewamî	-	-	-	-	-	-	-	+	+	+	+	+	+	+
girrbûn	-	-	-	+	-	-	+	+	-	-	+	+	+	+
bêvilok	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-	-
pêşik	-	-	+	+	-	-	+	+	+	+	+	+	+	+
bapek	+	-	+	-	+	-	+	-	+	-	+	-	+	-
stûrbûn	-	+	-	+	-	+	-	+	-	+	-	+	-	+

Belê ev sîmayên cudaker ji zimanekî ta zimanekî dîtir di hemû taybetiyên xwe de nabin yek, ango hin taybetî yan sîmayên cudaker di zimanekî de pêwîst e, lêbelê di zimanekî dîtir de nabê pêwîst, wek em bêjin taybetiya giroverbûna lêvan di derxistina hin dengdêr de di zimanê Fransî û Elmanî û devoka Koçeriya Kurdî de heye, lê heman deng bi vê taybetiyê di zimanê Englîzî de nîne, wek dengê dîftong di peyva Kurdî ya [bwík] de, ku di şeweya standar de formakî dîtir jê re heye ku ew jî [bûk] e. Ji ber vê yekê pêwîst e xwendevanê Englîznijad pêwîstî bi hînbûna vê taybetiyê heye da ku bikarê xwe hînî vî zimanî bikê.

Ya dîtir jî naskirina sazgeha deng di her zimanekî de pêwîst e bo ku axêver yan fêrxwaz bi vî zimanî bikarê bi drustî peyva biyanî bêjê, bo nimûne piraniya Kurdan nikarin hin dengên Arebî wek Areba bêjin, inca Kurd van hersê dengên [ظ], [ذ], [ج] wek dengê [z]a Kurdî dibêjin. Bi vî awayî hokarên cudakirinê navbera dengên de hene ku her yek di alîkî taybetî de dertê.

3.1.5. Sîmayên cudaker yên dengdêr


Bi şeweyekî giştî ew sîmayên ku bi şeweyekî dengdêran ji hev cuda dikin ev in:

1. **bilind** (high) bankê zar hinekî bilindtir e ji pergala wî ya normal.
2. **nizim** (low) bankê zar hinekî nizimtir e ji pergala wî ya normal.
3. **paşîk** (back) paşîka zar bi pergala wî normal e.
4. **girover** (round) lêv şêweya girover digire

3.1.5.1. Dengdêrên Kurdî

Dengdêr ji dengdaran têne cudakirin, ku berbestî di pêşiya derbasbûna hewayê de dernakeve, herweha çalakî û pasîvbûna sazgeha deng. Çar hokarên radeya tengbûna sazgeha dengkirinê hene, ku dengdêr pê têne guhartin û pîvankirin: (girtî, close) , (nîvgirtî, close-mid), (nînekirî, open-mid) û (vekirî, open), her ev jî li gor bilindbûna zar di dev de û pergala zar. Rehendekî dîtir jî heye pergala asoyî ya laşê zar di dev de. Rehendê sêyem (giroverbûn û girovernebûn) ku ne hewqas tête nîşankirin. Rehendê çarem (bêvilok û nebêvilok) ango ka piraniya hewayê di bêvilê re derbas dibe, yan di dev re.²⁰²

Dabeşkirina dengdêrên Kurdî li pêka şêweya zarê mirovan di dev de, û şêweya herdû lêvan di piroseya bilêvkirina deng de, bo nimûne di dengkirina dengê /î/ de, parçê **pêşîka zar bilind dibe** bi awakî ku nêzîkayî li esmankê hişk dike, û herdû **lêv pihin** dibin. Lê di dengkirin û axaftina dengê /u/ de beşê **paşîka zar bilind dibe** û nêzîkayî li paş-esmank dike, û herdû **lêv girover** dibin. Wek zanayên ziman destnîşankirine ku sê vawl /i/, /u/, /e/ li piraniya zimanên cîhanê hene , ji ber wilo jî ev hersê dengdêr ji wan re dengdêrên giştî, yan siruştî dibêjin.



Ev hersê dengdêr ji sîstima dengdêrên zimanê Kurdî ne

	pêşîka zar	paşîka zar
bilind	î i	û u
naverast	ê	o

²⁰²Marcus Kracht Introduction to Linguistics, Department of Linguistics, UCLA, 3125 Campbell Hall, 450 Hilgard Avenue, Los Angeles, CA 90095–1543. kracht@humnet.ucla.edu (rup 17)

nizim	e	a	
-------	---	---	--

/î/ pîr [+ bilind], [+ dirêj], [- kurt], [+pêşik], [+negirover]

1- +bilind, -nizim /î/, /i/, /û/, /u/

2- -bilind, -nizim /ê/, /o/

3- +nizim, - bilind /a/, /e/

Layenê ciyawazî ne tenê di astê dengên dengdar de dertê, lêbelê di aliyê dengdêran de jî heman cudakirin û taybetmendî heye, bo nimûne, emê hin sîmayên cudakerî di dengdêrên Kurdî de bidin xuyakirin, wek:

1. sîmaya (dirêjbûn) û (kinbûn)a van dengan ji hev cuda dike, wek dengê [e]ya kin û [a]ya dirêj di peyvên wek (ber) û (bar), (der) û (dar), (zer) û (zar), (ser) û (sar) de...tad. cudabûna watayî û bêjeyî navbera wan de drust dike, ku her yek ji wan di ferhengê de cihê xwe digire. Wîlo jî [i]ya kin û [î]ya dirêj di zoherên peyvên (bir) û (bîr), (sir) û (sîr), (mir) û (mîr) de ...tad. Herweha dengê [u] û [û] di peyvên (kur) û (kûr), de.

2. Sîmaya (girtî) û (vekirî) di dengdêran de heye wek herdû dengên Kurdî [î] û [û] taybetiya (+girtî) û (-vekirî) distênê, lê dengên [e] û [a] taybetiya (+vekirî) û (-girtî) distênê.

3. Sîmaya (pêşik) û (paşik) dikarê bibê taybetiya cudabûnê di dengdêrên Kurdî de, ku dengê [i:] û [e] taybetiya (+pêşik) (-paşik) digire, lêbelê dengên [û] û [a] taybetiya (+paşik) (-pêşik) digirin, wek:

	i:	û	e	a
girtî	+	+	-	-
vekirî	-	-	+	+
pêşik	+	-	+	-
paşik	-	+	-	+

	i	î	ê	e	a	o	u	û
pêşik	+	+	+	+	-	-	-	-
paşik	-	-	-	-	+	+	+	+
girtî	+	+	-	-	-	-	+	+
nîvgirtî	-	-	-	-	-	-	-	-

vekirî	-	-	-	+	+	+	-	-
nîvvekirî	-	-	+	-	-	-	-	-
girover	-	-	-	-	-	+	+	+
gêr (spread)	+	+	+	-	-	+	+	+
dirêj	-	+	+	-	+	+	-	+
kurt	+	-	-	+	-	-	+	-
bêlayan (neutral)	-	-	-	+	+	-	-	-
petî	+	+	+	+	+	+	+	+
nepetî	-	-	-	-	-	-	-	-

Dengdêrên Kurdî (Kurdish vowels)²⁰³ li gor sîmayên dengsazî û fonêmsazî di vê cedwela jêrîn de diyar dibe²⁰⁴:

sîma	û	u	O	a	e	ê	î	i
birrgesaz	+	+	+	+	+	+	+	+
zirrîngok	+	+	+	+	+	+	+	+
girr	+	+	+	+	+	+	+	+
kip	-	-	-	-	-	-	-	-
pêşîk	-	-	-	+	-	+	+	+
naverast	-	-	+	-	-	-	-	-
paşîk	+	+	+	+	-	-	-	-
xînkaw	+	+	+	+	+	-	-	-
zeq	-	-	-	-	-	+	+	+
qurs	-	+	+	+	-	+	-	-
sivik	+	-	-	-	+	-	+	+

Encam:

Di vî tewerî de, sîmayên cudaker, taybetiyên cudaker, wek rehendekî fonetîkî û fonolojî di dengên zimanê Kurdiya Kurmancî de bi fonêm û alofonan ve, hatine destnîşankirin, ku rehendekî nû, wek babirr û stûrkiya dengên Kurmancî, kete nav

²⁰³- Sîmay Ciyakerewe layenkî ciyawazî, govarî Korî zanyarî kurd

²⁰⁴Zarawayên pêşve, paşve û naverast sazgeha deng ji pergala zar di dev de didê xuyakirin wek me di beşê dengsaziyê de da destnîşankirin

rehendên dîtir. Her ev jî di baweriya min de taybetiyeke zimanê Kurmancî ye, ku ji zimanên Îranî yên dîtir cuda dike.

BIRR II 3.2.

Dengrêsi di Zimanê Kurmancî de (Tevinsaziya Dengan), (Combinatory phonetics)

3.2.1. Pêşekî

Lêkolîn bi analîza fonolojî dengên zimanê Kurmancî wesf dike, ku jê re dibêjin: (speech segmentation) ango kertkirina dengên axaftinê, herweha jê re dibêjin: (segmental phonemes) ango fonêmên kertkirî, yên ku bi sê têrmên serekî: (**deng û alofon û fonêm**) têne dabeşkirin û çareserkin.²⁰⁵ Jibilî kertkirina deng û fonêman diyardeyeke fonolojî dîtir derdikeve meydana lêkolînê ku ew jî **dengrêsi**²⁰⁶ ye, ya ku bi alîkariya dengsaziya fizîkî (acoustic phonetics) durvên ristina dengan di şêweya komkirina fonêmên ziman de diyar dibe, ku **birrge** dibe bingeh û navenda ristina van dengan. Ev pirose bi giştî jê re dibêjin (suprasegmental level) ku ji çend daneyan pêktê²⁰⁷:

1. sîmayên cudaker (distinctive features),
2. Birrge (syllable),
3. Tekez (stress),
4. Awaz (intonation),
5. Movik (juncture)

Di herdû beşên bûrî de, yekem û duyem, me deng pirtir wek daneyekî tak û serbixwe da wesifkirin, belê di vî beşî de, emê hewl bidin li ser komkirin û hevaltiya van dengan di movikên ziman de ku dengdar bi alîkariya dengdêran dikarin bi hesanî werin nik hev, wek dengdarê /b/ li gel dengdêrê /a/ peyva /ba/ didin, wilo jî ligel /wer/ dibe (bawer), û ev jî li gel paşgira /î/ dibe (bawerî) ku dibe sê birrge/birrge (ba + we + rî). Di piroseya hevgirtina dengan de dengdêr roleke giring û bingehîn di likan û hevgirtina dengan de dilîzê ku bê dengdêr dengdar bi tena xwe nikarin ristika peyvan ava bikin. Inca ziman li ser binyata van herdû nifşên dengan dengdêr û dengdar ava dibe, ku ji takedeng dibe birrge û

²⁰⁵Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 92)

²⁰⁶Ev têrim ji dariştin û danîna min e ku beramberî têrma Englîzî (combinatory) hatiye.

²⁰⁷Mareo Pie: Usus ilm Al-Luxe, wergêrana Ahmad Muxtar Umar, Çapa 2, Alem Al-Kutub, Alqahîra, (rûp 92)

jê mestir girûp tê, û bi dû de ristok û riste. Wilo jî komkirina risteyan peregraf û têkistên ziman drust dibin.

“Tevinsazî” û “dengrêsi” wek zarawe cara yekem bikar tên ku ew jî min ev herdû zarawe dariştin bo ku ez têgehekî taybet bi fonoljî û dengsaziyê bidim ku ew jî ristina dengên ziman bi awakî ku birrge û peyv û riste ava dibe, û watayek yan mebestek didê, her ev jî armanca ziman e, ka çilo deng di birrge de kom dibin û digihin hev. Peyva “tevin” wek wata xwe li barê hûnandina dengan dixwê, ji ber ku piroseya tevinê dikeve nav binyata ku ew tişt li ser drust dibe wekçawa deng biçûktirîn dane ye ku birrge li ser ava dibe. Zaraweya duyem ku min danî (Dengsaziya likawbar) e, ya ku wergêrana zaraweya Englîzî ye (Combinatory phonetics). Ev beşê lêkolînê di danîn û likana dengên ziman (dengdar û dengdêr) de dixebitê, ku awayê kombûna dengan di ristika ziman de bi hemî şêweyên xwe ve didê xuyakirin: **birrge û peyv û destwaje û peyv û riste**²⁰⁸ didê xuyakirin, çawa ku mebest û wata didê, her ev jî dibe navgînî navbera mirovan de û pêwendiyên komelayetî drust dike ku li ser bingeha têgeyîştinê drust dibe.

Di danîna vî beşî de ez tê de baş pûnijîm ji ber nêzîkbûn û tevlîheviya du beşan: (dengsazî û fonolojî) ku jê re bi Englîzî (combinatory phonetics) dibêjin, û ya dîtir (evolutionary phonetics/phonemic change) ku destûr û yasayên wan di nav hev de tên ji ber ku tevinsaziya dengan ta ku deng di birrgeyê de saz bibin, pêwîstî bi hin guhartin dibe ku dengên girr û yên kip li gor sîstîmekê li hev dikin, lewre em dibînin (xwaz û dixwazê) di şêweya karê nihokê de dibe (xwestin) di şêweya jêder de, ku dengê /st/ dibe /z/ ev bi xwe hem tevinsazî ye û hem jî guhartin e (dengguhêrî ye) wê Di tevinrêsiya dengên ziman de deng pevne kom dibin û hin ji wan li hev dikin, û hin ji wan li hev nakin, lewre hevalbendî navbera wan de ku her girûpek dikarê pevne diyar bibê, ev jî li gor taybetiyên dengan yên sazgeha axaftina deng (lêvkî, esmankî, pidûkî, nermalayî... tad.) û awayê ku hewa ji dev derdikeve (kospek, xişok, lerok, zirrîngok ...tad.), bo nimûne dengdarin hene pevne ligel hev di yek birrge de ku /n/ bi dû /b/ yan bi dû /d/ yan /k/ û /l/, /ç/ û /l/, /ç/ û /v/, lê dikarin bi riya dengdêrekî navbera wan de di yek peyvê de kom bibin, wek van nimûneyan:

bn	ben	ban	bîn	bûn	
dn	den	dan	dîn	dûn	dûtin
kl	kel	kal	kîl	kil	kol
çl	çel	çal	çil	çol	çêl
çv	çav	çiv	çîv	çûv	

²⁰⁸Bo xwendina agahiyên pirtir vegere pertûka (phonetics) ya Bertil Malmberg û lêkolîna Mes'ûd Mihemed di govare Zanyarî Kurd.

3.2.2. Lawazî û Xurtiya Dengan

Di zimanvanî de zanayê Fransî Mourice Grammont²⁰⁹ di pertûka xwe de ya bi navê (Nameyek di Dengsaziyê de) hin **destûrên giştî** bo hemî zimanan dariştin û tê de weha got: (serkeftin ji ê xurt re ye): *the law of the stronger*,²¹⁰ ango dengê lawaz dikeve bin kartêkirina dengê xurt de, yan bi dû de birrgeyeke tekezdar hat, bo nimûne dengê /i/ di Kurdî de lawaz e, inca eger bi dû de dengdêrekî xurt wek /î/ yan /ê/ yan /a/hat, dengdêrê /i/ tê diçe, û bi vî awayî birrgek ji peyvê kêr dibe, belê ev jî dema ku di birrgeya duyem yan sêyem de were, ango divê peyv ji yek birrgeyê pirtir be, wek:

vekirin vekirna van qotîkan zehmet e.

mirin mirna wî nehatiye.

genim genmê wî pir e

guhik guhkê çuwalê me

werin wî wernê deng

herin wê hernê

• Di rêjeya karan de ev rûçik pirtir derdikeve wek:

nivîsîn [ni – vî – sîn] dinivîsim [di-ni-vî-sim] = [din-vî-sim]

bihîstin [bi-hîs-tin] dibihîsim [di-bi-hî-zim] = [dib-hî-zim]

Wilo jî dengê /e/ya dawîya peyvê wek (name, dame, tawe, zêwe) dema ku dengê dirêj wek morfêma îzafe /ê/, /a/, /ên/ bi dû de tê, dengê kurt di axaftinê qut dibe yan navbend dikeve nav wan de, wek:

name nameya me nama me

riste risteya vê nameyê rista vê namê

Herweha hemî dengdêrên li dawîya peyvê tên dikevin ber van guhatinan, wek (xanî û xanîk, xaniyek), (bira, birak, birê min). Lê di peyvên yekbirrge de dengdêrê /i/ di cihê xwe de dimênê û nayê birrîn, ji ber ku birrîna wê peyv ji birrgeyî dikeve, wek:

bin binê sêlê

dil dilê xorta

kil kilê çava

Lê dîsa hin peyv yan hin birrge ku etmosfêreke taybet ji dengan tê de heye ku dengdêrê /i/ ji gotinê û ji nivîsînê nayê birrîn, wek peyvên

²⁰⁹ Grammont Maurice, Trait de Phonetique, Paris, Ch. Delagrave, 1933, Un vol. grand in-8 de 480 pages (rup 108-111), http://www.persee.fr/doc/rbph_0035-0818_1939_num_18_1_1288_t1_0108_0000_1

²¹⁰ Ev analîza Grammont belkî ez bi awakî dîtir rave bikim ne lawazî û xurtibûn, belkî nerimbûn û hîşkbûna dengên dengdar, kinbûn û dirêjbûn a dengên dengdêr.

bidil Ev xort bidil e. Ev kar bidilê te ye.
 bilbil Bilbilê şadî

Di ristina dengên tevina peyvê de, hin guhartinên bêjekî hene ku cografî û komelgeh rola xwe tê de dibînê, ya dîtir jî ne her deng dikeve ber guhartinê de, her ev jî gelek zimanzanan tekeze kir, bo nimûne dengdêrê /i/ û /u/ li hev suwar tîn ango di hin peyv de ku etmofêreke libar wek (drust, durust, dirust, dirist, durist), herweha hatina dengê /w/ li pêşiyê, herdû deng pev tîn guhartin, wek:

wise	wuse
wiçan	wuçan
win	wun
wirr	wurr
wişe	wuşe
witar	wutar
ciwan	cuwan

Ziman sîstîmek e, organên vê sîstîmê li pêka pêreweke taybet tete rêzkirin û lihevhatin, ta ku risteyên mosîqî li gor selîqa axêver werê, û li guhê wî xweş werê. Inca dengên ziman dikeve ber yasayên fonolojî de, bo nimûne, sîstîma zimanê Kurdî napejirênê ku du dengdêr pevte bi dû hev de di yek birrgeyê de werin wek /ai/ yan /ou/ yan /îi/ yan /ie/ ...tad. Lê di ristina peyvên de di tevina rêzimanî de morfemên rêzimanî diyar dibin ku bê hemdî du dengdêr di rex hev de tîn ku yek ji wan li dawiya peyva pêşî ye, û ya dîtir despêka morfêma rêzimanî ye, wek van firazan:

taybetî + ek	taybetî – y – ek	taybetiyek
taybetî + a	taybetî – y – a	taybetiya
biran + an	biran – y – an	birayan
rû + ê	rû – w – ê	ruwê

Li vir û li gor ronîya nimûneyên jor em dikarin destûreke fonolojî darêjin ku nîmçendengdêrê /y/ yan /w/ wek navbend bi rola xwe radibe û du dengdêran pevte dike, ji ber ku /y/ û /w/ ji wan dengên ku hem piçek ji taybetiya dengdêr hildigire, hem jî piçek ji taybetiya dengdar, lewre hêzeke guncandar di nava xwe de hildigire, ku dikarê bibê navbij navbera dengên ligel hev nayên.

Hin zanayên ziman di van salên dawî de amaje bi wê yekê kirin ku fonem û **goşiyên fonem**²¹¹ takil(ilement)ên guhartina deng in. Ew fonemên ku gelek diyar dibin di ziman de

²¹¹ Goşiyên deng çel zincîrek ji dangan nêzev/dûhev dikê ku di tevina birrgeyên peyvê de bikar tê, wek (st-) di peyva kurdî ya (stêr). Wilo jî (fl-) di peyva (flower) de.

ne wek hev in, yên ku diyarbûna wan di ziman de gelek diyar e. Weha jî diyarbûna dengine ji dengine dîtir pirtir e, inca ew dengên **pirdiyâr** dikarin bikevin şûna yên **kêmdiyâr** de. Inca ew dengên pirdiyâr dikarin rola xwe ji yên kêmdiyâr pirtir bibînin, wekçawa tiştê gelek bikar dihê, û tiştêkî kêmbikar tê, wek bikarhênana dengdêran di seretaya peyvê de ya gelek kême, lewre serpeyvên ferhengê bi dengên dengdêrên Kurdî gelek kême in. Ji bil

3.2.3. Dengrêsiya dengdêran

Dengên ziman di bin yasayên fonolojî de tevina xwe dihûnin û xizmayetiyên li gel hevdu saz dikin, ku zimanzanê Kurd Mesûd Mihemed hin diyardeyên fonolojî di zimanê Kurdî de destnîşan kirin, û du cot zarawayên libar di vê mijarê de danîn: xizmayetî û dijayetî navbera dangan de, guncan û neguncana dangan, wek /s/ û /p/ di pêşiya peyvê de: (spehî, spî, spîka çav), her ev jî di warê hin nimûneyên zimanê Kurdî de peyrew kirin, nemaze di babetê ristokên dangan de. Herweha Dr Wurya Emîn jî di gotara xwe de, fonetîk û fonolojî, li ser van herdû liqên zimanvanî gotarek nivîsand, û naverok û armanc û taybetiyên her yekî ji wan fonetîk(dengsazî) û fonolojî da naskirin, wek nimûne, di zimanê Arebî de du dengên kip lidûhev nayên lê di Kurdî de tên.

YEK: Di zimanê Kurdî de du dengên dengdêr ligel hev di yek birrgeyê de nayên, inca dema ku du morfêm di barê rêzimanî de tên ku morfêmek dawî bi dengdêr werê wek (xanî) ligel morfêmê îzafê /ê/ ku dibe (xaniyê min) wek:

1. Bi alîkariya **-y-**

xanî + ê = xaniyê min xweş e

masî + ê = masiyê min sax e

masî + an = van masiyan bişo

2. Bi alîkariya **-y-**

xwesû + a = xwesûwa min qenc e

mû + ê = muwê serê te himbiz in

Inca em dikarin wê yekê bêjin ku herdû dengên nîmçedengdêr vê giriftariyê çareser dikin ku /y/ bi dû dengdêrên /a/, /ê/, /î/ de tê û dikarê li gel hemiyên jî werê; belê dengê /w/ dikarê bi dengê /o/ û /û/ re werê.

DO: Dengdêrê kurt /i/ tê kurtkirin bi awakî ku nayê naskirin dema ku dengêkî dengdêrê dirêj yan xurt bi dû dengdarê paşdengdêrê /i/ de tê wek (bir û bira/bra), (zim, ziman/zman) , wilo jî di nîvê peyvê de wek peyva (tevin) ku dengê /i/ diyar dibe dema rawestan li ser dengê dengdarê peyre ye ku /n/e ye. Lê dema dengêkî dengdêr, nexasim dirêj, bi dû /n/ de werê, dengê /i/ kurttir dibe bi awakî nema tê naskirin, we:

tevin + a = tevna rîs

genim + ê = genmê me
 Xanim + a = Xanma Semo
 bazin + ê = baznê zêr
 kevir + ê = kevrê reş

3.2.4. Dengrêsiya Nimçevawel (semivowel) /y/, /w/

Ev herdû deng bi roleke fonolojî giring radibin ku ew jî bi hevvekirina dengên dengdêrên Kurdî, çi Kurmancî û çi Soranî û çi Zazakî, ku weke qanûneke morfofonolojî yan jî em dikarin vê piroseyê di bin têrima fonotaktîk de bênin, nemaze rola dengên /y/, /w/ dibe çareseriyek bo hevgihaştina du dengdêran ji ber ku siruştê dengdêrên Kurdî weha ye

- 1) ku du dengdêr di yek birrgeyê pevne nayên ango hev nagirin ji bilî wan dîftongên di dî dengên dengdar yên/ x/ û /g/ û /c/ û /k/di hin devokan de yan zaravan de, wek:

xwe, xwê, xwar, xwîn, dixwin

gwîz,

cwê

kwîr

- 2) herweha dîftonga devoka Koçerî û Badînanî û Botî jî heye ku dengê /û/ di gelek peyvên de wek dîftonga zimanê Fransî dibêjin wek peyva (nû) dikin (nwî), yan (zû) dibe (zwî) yan (zî).

- 3) Inca hevgerîna wan di riya van herdû dangan de bicih dibe wek:

bira + ê birayê min bira – y – ê (bira + yê)

bra brayê min bra + y + ê (bra + yê)

ba + ê bayê xurt

dê + ê dêya min

diya min

rû + ê rûyê min

ruwê min

mû + ê mûyê porê

muwê porê

rê + a rêya dirêj

riya dirêj

xwesû + a xwesûwa min

xwesûya min

tû + a tuwa me tu + w + a (tu + wa)

tûya me tuya me tu + y + a (tu + ya)

co + a cowa avê co + w + a (co + wa)

- 4) Wek diyar e siruştâ van herdû dengan taybetiyekê digire ku ew jî bi dengdêrên Kurdî ve pabend in ku her yek ji wan hez girûpeke dengdêran dike, bo nimûne dengê /y/ hez hevaltiya /ê/, /a/, /e/ /i/, /î/ dike wek:

dê	-a	dibe	diya min
rê	-a	dibe	riya dirêj
ba	-ê	dibe	bayê xurt
masî	-ên	dibe	masiyên çem
	-an		van masyan
	-ê		vî masiyê
kole	-î	dibe	vî koleyî
	-an		van koleyan

- 5) Lê birrge yan peyv bi dengên /o/, /û/, /u/ tewaw dibe, hevgihaştin navbera wan dengên despêka morfêmên dîtir de pirtir bi riya dengê /w/ drust dibe, lê dengê /y/ jî çêdibe, wek:

co	-a	dibe	cowa avê
			coya avê
dû	-ê	dibe	duwê sopê
			duyê sopê
		were	newe
		werê	newê
		were	neyê

- 6) Têbîniyeke dîtir heye ku hin dengên dawîya peyvê dema hevgihatîna drust dibe, ew deng ji dirêbûna xwe dikeve, ango piçîskî kurt dibe ku dengê /û/ya dirêj di dengkirinê de dibe wek /u/, wek çawa me got:

dû duwê

- 7) Wilo jî dengê /ê/ya dawî dibe wek /i/ bo nimûne:

rê -a dibe **riya** min

- 8) Dengê /e/ di hin axaftinan de tête avêtin û dengê morfêma rêzimanî dikeve şûnê de wek:

name -a nama min

birra -ê birê min

9) Ev herdû deng pêkarîneke taybet di wan de heye ku dikarin dîftongan drust bikin dema ku dikevin dawîya birrgê de, û bi dude yan tu dengê dengdêr newê yan jî eger birrge bi dengdar despê kir, ji xwe pirsgirêk nîne, wek:

-ew xew, kew, dew, new, tewtew

-aw daw, baw, caw, çaw, xaw, hawhaw, ,

-êw mêw, kêw, zêw,

-îw pîw, mîwmîw, çîwçîw,

-ey deydîk, pey, peyçûn, haveyn, peyje (Sorani)

peya pe + ya

ay haydar, lay (Sorani)

zayîn (za+yîn), (ka+ yîn)

10) Ev barê jorî linik zimanzanên Kurd wek şeweya goşiyên deng (cluster) têtê jimartin, încê serederî pê re nekirine wek fonêman, ango ev herdû deng di reftarê xwe de wek dengdaran dîtin bi taybetî dema ku dengdêrek bi dû de tê dengê dengdêriya dîftongî dikeve wek:

ew kew kewê ke-wê

eng dengê min den-gê min

dew dewê tirş de-wê

xew xewa xweş

new newe ne-we

aw daw dawa min da-wa

êw mêw

11) Dengê /y/ di zarê Sorani de roleke giring û diyar di avahiya birrge de dibîne, nemaze wek morfêma xistina ser ya îzafê di avakirina firazyolojiya Kurdî de diyar dibe çawa ku dawîya peyvê bi dengê dengdêr tê, wek:

Kurmanci: name nameya min na –me -ya 3 birrge

Sorani: name namey min na –mey 2 birrge

12) Peyva (name) ji du birrgeyan pêk tê, lê dema ku morfêma (-y) pêve tê, birrge tê de zêde nabin, her wek xwe dimîne, wek (name) dibe (namey). Ev bi xwe jî proseyeke

morfofonolojî têtê jimartin, herweha fonotaktîkî ye. Di wan nim[neyan de diyar dibe ku avahiya Kurmancî sê birrge wergirtine, lê ya Soranî du birrge ne, ku ev bi xwe fono-abûrî ango (fono economics) ku birrge çiqas klm bin her çêtir û siviktir e bo ziman.

13) Hêjay gotinê ye ku di zarê Soranî de yek morfêm bo nêr û mê bikar tê, belê di Kurmancî de du morfêmên cuda bikar tên, wek:

Soranî		Kurmancî	
Kiç + î	kiçî min	keç + a	keça min
Kur + î	kurî min	kur + ê	kurê min

3.2.5. Dengrêsiya Dengdaran: Goşiyên Dengdaran

Di dengsazî dema du dengdar yan pirtir bi hev ve diyar dibin bê ku şikandin navbera herdu dengên dengdar hebê wek /st/ ya peyva (mast), /şt/ya ya (rişt), /nd/ ya (xwend), /ng/ ya peyva (reng). Di tevina dengsaziya Kurdî de xizmayetiya deng²¹² li gor sîstîmeke taybetî drust dibe ku birrge di vê tevinê de daneyeke bingehîn e di avahiya peyvê de, herweha di avahiya rista helbestê de ku jê re dane yan yekîneyên kêşsazî (prosodic). Hêjay gotinê ye ku mamosta Mes'ûd Mihemed gotarek bi navê Fonetîk Çîman bo Bikat, Govarî Korî Zanyarî Kurd, ku tê de serinc rakêşand li ser siruştê dengên axaftina Kurdî di aliyê guncan û neguncan de.

Dengrêsi di tevnsaziya dengdêr û dengdaran de, ango çawa ev deng çî dengdêr û dengdêr, û çî dengdar û dengdar, û çî dengdêr ligel dengdaran têne ristin û kert û birrgeyan dide herweha digere çawa dengdêr û dengdêr zodengan drust dikin, çawa dengdar ligel dengdaran goşiyên saz dikin, ku ev goşî li gel dengdêran, û zodeng ligel dengdaran birrgeyan drust dikin wek:

1. dengdarên veşartî²¹³ + dengdêr a (hemze + a), ê (hemze + ê)
2. dengdarê veşartî + dengdêr + kons ar (he + a + r), îr (he + î + n)
3. dengdarê hişkere + dengdêr + kons dar (d + a + r) dîr (d + î + n)

Destûrên avahiya birrge ew in ku di sereta de pêwîstî bi dengdar heye, ango bê dengdara sereta birrge ji xwe drust nabe. Bi dû dengdara sereta de pêwîstî bi dengdêr heye ku birrge pê tewaw bibe, ku jê re dibêjin birrgeya vekirî ji ber ku bi dengdêr tewaw dibe lê

²¹² Mes'ûd Mihemed ,Fonetîk Çîman bo Bikat, Govarî Korî Zanyarî Kurd, berrgê sêyem, beşê yekem, rûpel 568-620

²¹³ Mebest ji dengdarê veşartî hemza ye.

eger dengdarekî dîtir hate ber dengdêr her dîsa birrge wek xwe dimêne, lê bi birrgeya girtî binav dibbe, wek:

A) Birrgeya sade

1. birrga vekirî da, pî, xwe, ko, zo, lo, ra, ma, jê,
2. birrga girtî dar, pîk, xwest, kop, zor, lor, raz, mar, jêr

B) Birrgeyên têkel

1. b. vekirî: stû, şka, xwe, xwa, xwê
2. b. girtî: stûr, şkand, sift, guft, xwar, kwar,

3.2.6. Birrge ji aliyê diyarbûnê ve sê cor in:

1. Hin birrge pir diyar dibin û hin kêr diyar dibin
2. Hin diyar nabin, ango di Kurdî de ew celeb nîne.
3. Hin birrge zordiyar dibin wek li dawiya peyvê /-st/ û li despêka peyvê /st-/ wek:

-st	best, mast, rast, mest, sist, xwast, hest, dest
st-	stêr, stûn, stok, stirî (strî),
-şt	beşt, deşt, mişt, hişt, xişt, tişt, heşt, goşt, buhişt
şt-	şter, şte
-xt	kuxt, bext, zixt, rext

Dengî /k/ wek **paşgir** bo drustkirina navên ku bi (ber-) despê dikin û (ber-) wek kertekî lêkder tê de peyda dibe , wek: **berhavêjk** ew şîraniya ku xwediyê zavê pêşkêşî malbava bûkê dikin. Bereşîşk, berwerk (zembîleke biçûk e). beroş - beroşk, bîbilka çav

- | | |
|------|---|
| -şk | meşk, reşk, hişk, gişk, bawuşk, ... |
| şk- | şkeft, şkêr, şkandin, şkestin, ... |
| -vk | berçavk, berdevk, bersivk, ... |
| -fk | bertifk, |
| -sk | berdesk, hesk, tesk, ... |
| -lk | silik, ... |
|
 | |
| -rç | pirç, miç, kirç, zirç, hirç, qerç, gurç, birçî, |
| -rc | birc, gurc, xerc, merc, |
| -rs | birsî, pirs, hirs, qers, tirs |
| -rg | berg, |

-rk	berk, derk, berserk, berxurk,
-rd	berd, zerd, kird, gurd,
-rz	berz, derz, gurz, hûrz, gûrz, berze
-rx	berx, derx, çerx,
-nd	çend balinde , hind, hindêk, bend, gund, rind, qend,
-ng	deng, reng, zengil, beng, bang, heng, teng,
-nk	bahînk, berşînk, berfiravînk,
-nc	benc, renc, zinc, binc, genc,
-tk	berkatk,
-ft	keft
-fş	kefş, binefş, refş,
-vş	
-mç	kemç
-xş	bexşîş, pexş
-xt	bext, zixt, rext, sext,

- Dengê dengdêrê /k/ bi hesanî li gel dengdarên dîtir xwe digire wek:

hînk, devk, xefk, peşk, desk, teşk,

- Peyvên lêkdayî ji ber û peyveke dîtir bi dûde wek:

berguhk, berxurk, berguhank,

3.2.7. Dengrêşî û Guhartina Dengan

Ziman ji hezarê nîşaneyan (sign) pêk tê ku bi kombûna form û wata saz dibe. Form di piroseya axaftinê de ristikek deng in (a sequence of sounds), û di nivîsînê de ristikek tîp in (a sequence of letters). Di vê lêkolînê de emê li ser zimanê axaftinê rawestin , û nimûneyek ji nîşane Kurmancî û Soranî bînin wek peyva (jin)

nîşane	form		
(sign)	wata	jin	

Dengrêşî ango ristin û rêzkirina dengan di her zimanekî de sîstîmeke xwe ya taybet heye vegere jî pertûka morphology li ser (syntagm paradigm)a dengan heye. Bo nimûne (jin, jan, jîn). Ristikin ji dengan wek (Jir, jib, jix, jiq, jik, jiv, jil) wata nadin, lewra nakevin ber zimanê Kurdî de. Pirsek xwe diayr dike ku ew jî ev e: Çima ziman ne wek hev in? yan: Çima ziman ji hev cuda ne? Şeweyên lêkdanê di ziman ne wek hev tîn, wek:

pêk dihêpêk têtêpêk têtê

Ziman wêneya jiyana komelgeh e ku her komelgehê bi awakî û bi şeweyeke taybet pêş dikeve, ku rengê pêşketinê di jiyana wî de diyar e. Mebesta me ew e ku pêşketin yan paşketin her guhartinek e di jiyana mirovî de peyda dibe ku ew han jî di şeweya zimanê wî de diyar dibe. Inca rastiyeke e naskirî ye ku axaftin û dengkirin di hemî zimanan de herdem wek xwe namêne, belê di rêveçûna dîrokî de û bi derbasbûna hezarê salan re hin guhartin, çî bilez û çî giran, dikeve movikên laşê wî de. Lê ziman di wêneya xweya nivîsînê de wek xwe dimênê ku guhartin têtê de drust nabê. Ji ber wilo jî ciyawazî dikeve şeweya axaftin û şeweya nivîsînê de, bo nimûne, dengê zimanokî ku di peyva (night) de bi herdû tîpên (gh) dihate nuwandin û Englîziyan di demekê ji deman ew deng di axaftinê de tanîn ziman lê îro roj ev deng di fonêmsaziya zimanê Englîzî de bikar nayê, belê ta niha di nivîsînê de maye. Lewre şagirtên ziman dema Englîzî dixwênin pêrgî vê pirsgerêkê dibin, ew ciyawaziya navbera şeweya nivîsînê û şeweya axaftinê. Her wilo jî wênenivîsa (gnaw), (know) di axaftinê de dengê /g/ û /k/ nayên dengkirin ku li ser zarê Englîziyên îro zehmet e dengê /g/ yan /k/ bi /n/ re werê xwendin, lê di dema berê de ev kombûn yan ev birrge hebû. Belê em jibîr nekin ku axaftin bi xwe dikeve ber yasayên sivikkirinê de, her ev jî tiştêkî siruştî ye ku giraniya ziman hin bi hin ber bi sivikbûnê de herê. Wilo jî çendayetiya deng, dirêjbûn û kurtbûn, di dengdêran de (vowel quantity) kete ber guhartinê de, herweha çilonayetiya dengdêran (vowel quality) jibîlî ku cîwariya zimanan û kartêkirina wan li ser hev rêçêk bû di şeweya guhartinê de ku zimanê Kurdî li Tirkiya îro dikeve ber guhartinên fonetîkî de ji ber bişaftinkariya deselata Turkan bi ser Kurdan de gelek xurt bû, ku hinohino Kurd dîrî zimanê xwe ketin û nêzî zimanê Turkî bûn di riya xwedingeh û tilvizyon û wezîfe û fermanberî û xwendin û nivîsînê de, bi ser ku zimanê Kurdî rojekê li Turkiya qedexe bû, ango gunehkarî bû bo her kesê li cihekî yan li qehwexanê bi Kurdî baxêvê, ku sizayê vê gunehkariyê li ser Kurdan hatibû sepanin.

Ev beş ku me jê re navê (Dengsaziya Guhêrbar) daniye, ew jî beramberî zarawayê Englîzî (Evolutionary Phonetics) ku fonetîkzan Bertill Malbêrg di pertûka xwe de (phonetic) bikar aniye û têtê de ew buwara han şîrove kiriye ku wek beşek ji dengsaziyê daye naskirin belê di baweriya min de ew beş hawbeş e navbera dengsazî û fonolojî de ji ber ku gelek ruwalet(aspects) û aliyên dengsazî û fonêmsazî di nav herdûkan de hawbeş in. Ya dîtir peyva (evolutionary) ew guhartina pêşketî didê. Di vî beşî de emê hewl bidin wan faktor û zarawayên fonetîkî bi kurtî bidin naskirin û rûdana wan di zimanê Kurdî û hin zimanê dîtir de. Em dixwazin wê yekê tekeze bikin ku guhartinên dîrokî yên ku bi ser

miletêkî de tîn, rengê xwe didê zimanê wî jî çî di sîstima dengsazî de û çî di sîstima fonolojî de.

Belkî me di cihekî de jî amaje bi wê yekê kir rola dengrêsiyê ango tevinsaziya dengan di dengsaziya guhêrbarî de gelek e, ji ber ristin û hûnandina dengan di hundurê binyateke zimanî de (structure) hawtêkirinek (tefa'ul) bi xwe re tînê, bo nimûne peyva (hênan)a Kurdî wek kar bikar tê, ku di rêjeya nihokê pêşrêsa (di) ligel regê kar ku weha dibe:

(hênan/anîn) jêder e (di – hênê) dibe (têne)
(hatin) (di – hê) dibe (tê)

Eger em vê diyardeyê bixin bin yasaya çî ravekirinê de, her ew e ku sivikkirin û şayikkirina axaftina ziman karekî rast û siruştî ye ku ji siruştî mirovan derdikeve ku mirov her dem berê xwe bi alî sivikbûnê de didê, ji ber ku dengê /h/ di axaftina peyvê de giran e, ya dîtir dema /d/ dikeve pêşiyê de, dengê /d/ dibe /t/ û /h/ jî jêdiçe ango tê birrîn, ku ev pirose wek assimilation dibe ku /h/ têtê bişaftin. Badînan rêjeya karê nihokê (tê) dikin (têt/tête) yan (dihêt) ku her ev jî di baweriya min de spehîtir e. Inca, zimannas teqeze dikin ku rola dengrêsiyê bi ruwaletên xwe ve (bişaftin, assimilation, dissimilation, differentiation, ease of pronunciation) girêbidin, ev hemî jî ruwaletên serekî ne ku guhartin tê de çê dibe.

3.2.8. Mijarên dengrêsiyê û guhartina fonolojî²¹⁴

Herdû zanist çî dengsazî û çî fonêmsazî di gelek sînoran de tevlihev dibin, bo wilo jî yek zarawe û yek têtê bikar tînin. Helbet eva han ne tenê di navbera fonetîk û fonolojî de peyda dibe, lêbelê di navbera gelek liqên dîtir yê zimanvanî de peyda dibe, wek em bêjin navbera dengsaziya giştî û dengsaziya dîrokî û dengsaziya berawird. Inca, di vî beşê fonoljîya kombar de hin babetên zimanvanî xwe didin pêş²¹⁵, ku li nik hin zimanvanine dîtir wek Mareo Pei di bin navûnîşana guhartina fonolojî û analojî²¹⁶:

1. sivikahiya peyvê (ease of pronunciation)
2. komika dengan (sound cluster)
3. birrge (syllable)
4. taybetiyên awarte (secondary characteristics):
5. bişaftin/tuwandinewe (assimilation)
6. jêketina dengên sereta (haplology)

²¹⁴- Ev beş sûd ji pertûka Mario Pay 142 – 150

²¹⁵Hin ji van zaraweyan wek diyarde di beşê dengsazî de hatine şîrovekirin.

²¹⁶- Mareo Pei, an invitation to linguistics.

7. pevvekirina denga (sandahi)
8. hawkatî û hawdîrokî (synchrony û diachrony)
9. peyv, grûpa peyvvan, riste (word, group, phrase)

Emê li ser hin ji van mijaran rawestî di lêkolîna zimanê Kurmancî de:

1- Sivikbûna Dengên Ziman²¹⁷ (ease of pronunciation)

Hêjay gotinê ye ku kak Ismayîl Taha Şahîn gotareke serkeftî bi zimanekî Kurdî rewan nivîsiye û bi navê (rewşa her zimanekî sivikî ye) di *Govara Roşinbîrî Nwê de, 1985²¹⁸, belavkiribû, ku di babeta sivikbûna ziman de hatiye, çilo dar û mêw di warê çandiniyê de her sal dikevin ber kezaxê de, ji bo ku ew dar xweştir û baştir şîn were û sipehî bibe, wilo jî ziman wek hişkere ye xasiyeteke şaristanî ye, rewîşt û tîtal û ravêjên civakî û pîka şaristanî û hişmendiya karekî mezin lê dikin. Pêwîst e em guh bidine zimanê xwe û wî ji devxwhriyê biparêzin, wek: (şerjêkirin) û (serjêkirin) ku dengê (ş) şûna dengê (s) girtiye. Her wilo jî nabê xwe-asêkirin di çarçêweya devok û zaravê xwe de. Mercek ji mercên zimanê yekgirtî divê **sivik** bit, ku ev sivikî jî nebê fakterê herifandin û berdê berdanê. Inca ya baş ew e em ji destûrên zimanvaniyê dernekevin ku taybetiyên siruştî zimanê me biparêze. Ya dîtir aliyê sivikbûna siruştî ye ku ew jî di riyên dengsazî de dibûre bi mebesta abûrîkirina ziman ango ji barê giraniyê biçê barê sivikbûnê ku ev bi du riyan naveder dibit: **Kêmkirina tîp û alavan** ew e ku axaftin û nivîsîn ji giraniyê bête şuştin. Ji ber giraniyê hincar peyvên biyanî cihê peyvên Kurdî digirin. Ez weha dibînim ku ya pêwîst em piroseya sivikbûnê wek karekî saxlem bibînin ku ber bi zimanekî yekgirtî de herin.*

Inca, emê werin ser wan aspektên dengsazî û fonolojî di piroseya sivikbûna zimanê Kurdî de diyar dibin, ku ew jî ev in:

1. Pevguhartinê denga, ji dengên bi hev tene guhartin, wek:

t = ç mîna tet = çeç, wîtwî = wîçwîç, tepole = çepole,

tune = çune,

tu zanim = çu zanim.

Têbînî: Bi hizra min /t/ dibe /ç/ û dengê /ç/ li vêderê xweştir û siviktir e.

2.. Dengê /ç , p/

çirtikandin pirtikandin,

çirîsk pirîsk

²¹⁷- Ismayîl Taha Şahîn, Gotara rewşa her zimanekî sivikî ye di *Govara Roşinbîrî Nwê de*, jimare 106, sal 1985. (Rup 117-119)

²¹⁸ Ismayîl Taha Şahîn, Gotara rewşa her zimanekî sivikî ye di *Govara Roşinbîrî Nwê de*, jimare 106, sal 1985. (Rup 117-119)

3. Dengên [x , k]

xenîn = kenîn,

xer = ker

4. Dengên [h , a], wek: hasin asin

5. Dengên [d , z], **wek:** dilop zilop, lê dilop xweştir e ji zilop, kaxez û kaxed, xidmet xizmet,

6. dengên [k , q] wek: keliştan qeliştan, çiqil û çikil, bijiqandin û pijikandin, peqandin û pekandin, qezwan û kezwan,

xelq û xelk. Ev nimûneyên me anîn wê yekê tekez dike ku fonêma /k/ ji ya /q/ resentir û xweştir e.

7. Dengên lêvkî [b, m, v , w] di Kurdî de gelek caran cihê hev digirin, wek:

tebayî û tevayî,

zibir û zivir,

nixamtin û nixavtin,

zemîn û zevîn,

selam û silv ,

simore û sivore,

diram û dirav

xewn û xevin

aw û av

nimêj û nivêj

8. Dengên [k , y] wek:

sekvan seyvan

mekteb meyteb

9. Dengên [c , j] wek:

bacêr û bajêr,

hencîr û henjîr

ducûn û dujûn

nicde û nejda.

10. Dengên [ş , s]

şubat subat

babelîsk bagelişk
şewitîn sotin
taşt tast

11. Dengên [w , h]

wuşk hişk
wurç hirç
zuwa zuha
ewr hewr
xurî hirî

12. Dengên [j , z]

dilsoz dilsoj
zîrek jîrek

13. Dengên [d , t]

nardin hinartin/nartin,

14. Dengên [x , ĝ]

bax baĝ, ĝelet xelet, ĝulam xulam

15. Dengên [s , ç] birsî birçî,

16. Dengên [l , r]

bilûr bilûl
alîkarî arîkarî
bila bere

17. Dengên [û dîftonga -wî -wê]

xûn xwîn, xwên
dûr dwîr

18. Dengên [o , dîftong -wî]

kor kwîr
sor swîr

19. Dengên [a , î]

danan danîn,
tenya tenê,
anîn înan

20. Dengên [û , o]

çûn çon,
 sûr sor,
 sûtan sotin,
 cût cot

21. Dengên [a , ê]

danan dênan
 kitab kitêb
 çak çê

22. Dengên [e , ê]

yek êk,

23. Dengên [û , î]

tûj tîj, tuîj
 şûr şîr, şuîr

24. Dengên [ey , ê]

heyv hêv
 keyf kêf
 heyv hêv

2- Bişaftina denga, Tuwandinewe (assimilation المماثلة)

Ev diyarde ew e ku ku du dengên ne yeksan (ne wek hev) dike yeksan (wek hev) bo nimûne herdû dengên /nd/ yê Hindo-Ewropî di gotina Latînî (spondeo) de dibe /nn/ di Elmanî de di peyva (spannen) de. Wilo jî xelkên London navê bajarê xwe (London) dibêjin bi awakî wek /Lunnon/. Herweha Amrîkî peyva (wonderful) wek (wunnerful) dibêjin ²¹⁹. Di zimanê Englîzî de dengê /s/ a koya navan (plural of noun) di ristina peyvê de ne wek hev tê dengkirin li gor hevaldengên wê, wek rêjeya ko di (dogs) û (cats) de ku dengê tîpa /s/ ya (dogs) wek [z] tê xwendin, û ya (cats) wek [s], ji ber dengê /k/ kip e helbet hevaltîya dengê wek xwe kip dike, lewre wek /s/ tê xwendin, lê dengê /g/ girr e lewre dengê ligel werê divê girr bê, inca /s/ a ko(plural) wek [z] tê xwendin. Wilo jî di zimanê Kurdî de heye, ku tuwandineweya denga nêzî guncana denga e ku lihevhatîneke dengsazî di etmosfêra peyvê de peyda dibe, wek çilo dengê /z/ dengdarê girr e, dema li gel /t/ tê, ku kip e, dengê //z/ dibe /s/ û /st/ wek:

biguhêzê guwastin
 bixwaze xwestin

²¹⁹Mario Pei, Invitation to Linguistics (A basic introduction to the science of language) (rup 32)

bilîze	lîstin
bimîze	mîstin
bihîvêze	hîvastin

Girrî û kipiya dengan di Kurdî de dibe fakterekî fonolojî û dengsazî li gor ku deng li gor sîstîmekê têne hûnandin, û di nav tevna peyvê de dengê /j/ya girr dema ligel /t/ya kip tê, dengê girr/z/ dibe kip/ş/ li gel /t/ û pevra dibe /şt/ wek:

kuj	= ez an nakujim	kuştin
kevaj	= van hestiyar nekevêje	kevaştin
darêj	= van peyvî darêje	dariştin

kuj + tin --- kuştin

kevaj + tin --- kevaştin

darêj + tin --- dariştin

birêj + tin --- biraştin

Ji te re = ştere

şerê = ji ber ku

Azad jê aciz e, şerê, seba wî dike (şer-rê)

ser piya = şipya

Di zarê Soranî de, û bi taybetî şêwezare Silêmanî, eger yek ji dengdêrên /i/ , /ê/, /wî/, /wê/ bi dû dengê /k/ yan /g/ de werê, guhartin dikeve şeweya dengê /k/ û /g/ ku dibine wek dengê /ç/ û /c/, bo nimûne:

kîsell	dibe	çîsell
kêw	dibe	çêw
kwêstan	dibe	çwêstan
kurêkî	dibe	kurêçî
<i>xelkî Silêmanî</i>	<i>dibe</i>	<i>xelçî Silêmanî</i>

penagîr penacîr

giya ciya,

gîrfan cîrfan

Henguwîn hencuwîn.

Diyardeyeke dîtir jî heye ku xelkên devera Xoşnaw û Dizeyî û Rewandiz û Koysinceq li Kurdistanê Iraqê jî dêvla (mal), (kilaw) bixwênin, (mar), (kiraw) dixwênin: Lê pêwîst e (mal, kilaw) bibê şeweya standard bête nivîsîn. Tevayiya van guhartinan dikevin

ber diyardeya dengsazî de, û hîç kartêkirin bi ser rênivîsê de nebê. Lewre, zimanê Kurdî li ser sîstima fonêmsaziyê, rênivîs û Alfebêya xwe ava dike.

3. Têçûna dengdêrê sereta (apheresis)

estêr	stêr
bi alî	ba + lî balî
bi aqilê min	baqilê min
di wê re	têre tê re
ji te re	jê re jê re
ji wî/wê	jê
li wî/wê	lê

bi hev	pev
bi hev re	pev re
ji hev	jev
ji hev re	jev re
di hev	tev
di hev re	tev re
ev ro	îro
ev şev	îşev

4. Jêketina dengdar ji dawiya birrgeyê, wek:

çend bûye çen, bend bûye ben

5. Zêdekirina dengdar (epenehehe), wek: tê û têt, nayê û nayêt, bike bikit, bike/dikê dikit

5.Zêdebûna dengdêrek li dawiyê (paragoge) Ehmo, Ehmê, şêrînê,

6. Pêguharta dengê (r) û (l)

Pirtir dengê /r/ dibe /l/ wek peyva latînî Blanco bûye branco di Pirtuxalî de

- Pêguharta dengdaran (consonant shift)wek peyva (alîkar û arîkar), (pel û per),

- Pêguharta dengdêran wek peyvên (li) di Kurmancî de dibe (le) di Soranî de, wilo jî peyva (dike) û (dikê) û (dikit), (dekat) wek yek wata didê, wilo jî (borî) û (bûrî).

7. Cêguhêrk: Guhartina cihê denga di nav tevina peyvê de wek peyva Kurdî (berf û befir), herweha di Frensî de (moustique) ji Espanî hatiye ku (mosquito) ye. Cêgorrkê, ango guhartina cihê deng, ku du deng yan du birrge cihê xwe bi hev diguhêrin. Ev

diyardeya han hin car di yek şêwezarî de heye, û hincar jî her şêweyek di devokekê de bikar tê, lê di yeke dîtir de bikar naye, wek navbera Badînan û devokên Kurdên Turkiya û Sûriya ku peyva (**berfir**) li Badînan û Silêmaniyê tê gotin, lê Kurdên Turkiya dibêjin: (**berf**). Weha jî navbera du zimanan de heye wek peyva (**le'net**) di Arebî de dibe (**ne'let**) di Kurdî de.

8. Zodengîbûn (diphthongization)

Mebest ji zodengîbûn ew e dengdêrê tak dibe zodeng (du dengdêr)

kor kwîr

xûn xwîn

xo xwe

nû nwê

9. Stûrbûna Dengdaran²²⁰

Di zimanê Kurdî de diyardeya stûrbûna dengdaran التفتيح heye, nemaze di zarê Kurmancî de û pirtir di şêwezarê Badînanî de, ku hin fonêm hene bi du dengên tene bilêvkirin, ew jî ev in:

Dengê /k/ bi du şêweyan tê bilêvkirin, û di hin peyvên de wata diguherênê di heman têtavajoyê de (siyaq, context) de derdikeve, wek :

Filankes bê kêr e. Peyva bê kêr du watayan didê:

1. kêr ku emrazê birrîn û parçekirin û qutkirinê ye wek em bêjin: (*Min şebeşê xwe bi kêrê qet kir, yan kire qet*).

2. kêr ango jêhatîbûn e, filankes bikêr e ango jêhatî ye, weha jî *bêkêr* e, ango ne jêhatî ye. Inca dengê /k/ di peyva (kêr) de bi du şêweyan tê gotin: yek jê nerm e, û ya dîtir hinekî sirt e. Bi vî awayî çend peyvên dîtir jî hene, ew jî ev in:

kar: îş, şol, şixul

kkar: dikare, dikane, ango ez dikarim vî karî bikim.

Ev diyarde di beşê bûrî de hate şirovekirin û çareserkirin.

10- Jêketina Dengdêrê Kurt (i)

Giriftariyeke dîtir di şêweya peyvê de peyda dibe ew jî ewe ku fonêma (i) di axaftina hin peyvên dubirre de tê qurmiçandin dema ku dengê dirêj bi dû de tê, wek:

Genim, kirin, bêhin, mezin, torin,

1. *Ev (genim) paqije. (Genmê) me bikorike. (Genimê) me bikorike.*

2. *(Tornê) malê. yan (Torinê) malê (torin)*

3. *(Meznê) gund yan (mezinê) gund (mezin)*

²²⁰Stûrbûna Dengdaran التفتيح والترقيق nêzîkî (palatalization) e.

Ez wa dibînim ku peyv bi şêweya morfolojî bê nivîsîn, û em nekevin bin gelşên awayê axaftinê de, herçende em nirx didin warê dengsaziyê, lê eva han di sînoren ku dengsazî û morfolojî pevra birêve biçin. Inca peyv di şêweya duwan de werê nivîsîn, baştir e wek:

(*Genimê*) *me bikorik e.* ne (*Genmê*)
 (*Torinê*) *malê.* ne (*Tornê*)
 (*Mezinê*) *gund.* ne (*Meznê*)

11. Dengê /i/ di birrgeya sereta de

Dengdêrê /i/ di Kurmancî de herweha di Soran de taybetiyeye xwe di tevina dengrêsiyê de heye, nemaze di birrgeya sereta de, ku hin car weha sivik û kurt dibe ku ji hêza xwe yî birrgeyarî dikeve nemaze eger bi dû de dengdêrekî dirêj hat. Ev bi xwe cihê lêkolîneke feretir e ku zmanzanên Kurd li ser rawestin ka ev peyvên wilo çi şêweya nivîsînê jê re danin aya ev dengdêr bête nivîsîn yan na?

br- bra, bro, yan bira, biro
 gr- grî, gring, gro, gran
 dr- dran, drust, dro, drist
 st- stûr, stewr, stirh, stok, strî
 sp- spî, spartin, spart, spehî, spih, spinax, di zimanê Englîzî de peyvên wek (spin, steak, skin) heman tevin dide xuyakirin.
 şk- şkêr, şkan, şkar, şkeft
 şx- şxat, şx, çxat,

Lê peyvên hene ku di bingeha xwe de biyanî ne, wek (proje, prose, prinsîp, *protesto*) û bûne Kurdî, yan ketine kirasê Kurdî de di hin şêweyên guhartina dengsazî de derbas bûne ta ku kirasê zimanê Kurdî li wan hatiye, bo nimûne:

(**piroje**), dengên (-ct) ji dawiya peyva (project) hatiye birrîn, û dengê /i/ ketiye navbera herdû dengên dengdar /p r/, herweha dengê -(e)ya Kurdî bûye dawiya peyva nû. Wilo jî peyva (**prose, pirose**); herweha peyva Englîzî (prosess) herdû tîpên (-ess) yê dawî hatine birrîn, û dengê -(e)ya Kurdî ketiye dawiya peyva nû. **pirinsîp** jî peyva (principle)a Englîzî hatiye, lê herdû dengên dawî (-le) jê hatine birrîn, û (prinsîp) maye

Kurdîkiras	Biyani	wata bi Arebî
piroje (proje)	project	مشروع
pirose (prose)	prosess	عملية
pirinsîp (prinsîp)	principle	مبدأ
pirotesto (protesto)	protest	احتجاج
operasyon	operation	عملية

Ji alîkî dî ve, du girûp peyv di Kurdî de bikar tên: yek jê peyvên Kurdnijad in, û ya dîtir peyvên Kurdkiras in, ango di bingeha xwe de (biyani) ne. Ev peyv bi du dengdaran des pê dikin (pr). Peyvên biyani yên kiraskirî (Kurdkiras) wek: (proje, prose, prinsîp, protesto,) pirseke dengsazî û rênivîsî di hebûna wan de xwe derdixê, ew jî ew e: Aya ev peyv di axaftina Kurdî de bi du dengdarên (pr) des pê bikin? Yan bi sê dengên wek (pir)?

Di van peyvên de ez wek xwêner wa dibînim ku di piroseya dengkirina wan de xwêner hest nakê ku dengê kurt navbera dengê pêşî yê /p/ û /r/ de heye. Lê di baweriya min de herdû alî çê dibin: bi (pir), û bi (pr) ji ber ku herdû birrge di binyata xwe de gelek nêzingî hev in, herçende jimara birrgeyan di peyvê de tê guhartin, wek:

pr pir
 prose pro - sepirose pi - ro - se
 prinsîp prin - sîp pirinsîp pi-rin- îp
 pro - tes - to pro - tes - to pirotesto pi-ro-tes-to

• Di vir de xaleke dengsazî û fonolojî xwe dide pêş ka yebirrgeyî û dubirrgeyiya (pr-) yan (pir-) çawa bibe? Di zimanê Kurdî de peyvên hene bi birrgekeke dengdêrê kurt /i/ drust dibin. Inca heger dengê dirêj bi dû vê birrgeya kurt de hat, ew dengê kurtî /i/ ji ber yê dirêj tê birrîn, yan jî gelekî lawaz dibe ku, heme bêje, ji birrgetiyê dikeve, wek:

genim - genmê
birin - birna wî

bra / bira
 gir, girû/grûp

- Weha jî di wan peyvên Kurdkiras (biyanî) de tekez (strês) dikeve birrgeya dawî de, wek: (proje, prose, prinsîp, protesto)

Proje prose prinsîp pro – tes - to

12. Jêketina dengdêrê /h/ di hin peyv de, wek:

ji navîka peyvê

Hebûna /h/	Jêketina /h/	Hebûna /h/	Jêketina /h/
pehîz	payîz	buhtan	botan
kehnî	kanî	ciht	cot
dehnû	danû	bihust	bost
dehşik	daşik	nihêrîn	nêrîn
cehnû	canî	gerihan	geriyan
reh	ra	pehtin	patin
behwerî	bawerî	sohtin	sotin
pehnî	panî	gohtin	gotin
şehir	şar	bihurîn	borîn
xwehir	xwar	Ji dawîka peyvê	
bêhvil	bêvil	şeh	şe
rehil	rêl	sih	sî
mêhvan	mêvan	pêncih	pêncî
bêhtir	bêtir	sipih	sipê
bihin	bîn	tirih	tirî
dihin	dîn	gilih	gilî
rihnî	ruhnî	sih	sî
tihin	tî	gilih	gilî
rêhtin	rêtin	mih	mî
avehtin	avêtin		

- Di Kurmancî de çend peyv hene wek (îro, îsal, îşev) ku encama têkilbûna peyva (ev)a Kurmancî ligel peyva (sal û roj û şev) ku di Soranî de deng naye guhartin, wek:

Soranî	Kurmancî	dengê sivik
Em	ev	î-
emsal (em sal)	ev sal	îsal
emro (em ro)	ev ro	îro

emşew (em şew)	ev şev	îşev
emcar (em car)	ev car	Îcar, incar

Peyvên wek (îsal, îro, îcar, îşev) ku ev çar peyv peyvên demkî ne, ango bi demê ve pabend in, û bi dengê î- despê dikin. Pirs di vir de ew e çima ev her çar peyv bi î- despê dikin? Di baweriya min de bersiva vê pirsê me vedigerêne warê dîrokî ji aliyekî ve, ya dîtir lêpirsiyan dinav zimanên Hindo-Îranî de ka ev rûdan bi heman bêje û peyv heye? Ya dîtir ew e ku di Kurmancî de her (ev) wek (ev ro), (ev sal), yan (vê salê), (ev car), û (ev şev) ...tad. Ez goman dikim ku ev (î-) ji peyva (îm)a Kurdî yan (în)a Farisî hatibê ku dibêjin (îm roj), yan (în roz).

Encam:

Piroseyên denngêsiyê ku dengên ziman di tevina peyvê de tene hûnandin û ristin ku hin piroseyên dîtir bi xwe re tine wek jêketina dangan û guhartina wan li encama kartêkeriya dengên dîtir ku pevte atmosfêreke nû drust dike, ku ev bi xwe dikeve ber şirovekirina dengsazî û fonolojî.

BIRR III 3.3.

3.3. Birrge di Kurmancî de (syllables)

Zimanzanên Kurd bi giştî peyva birrge (kîte) beramberî (syllable) bikar tînin. Peyva birrge di Kurdî de ji jêdera (birrîn) hatiye, Kurd dibêjin birrek zilam yan birrek zarok kom bûn, ango girûpek kes li hev civiyan. Min jî ev peyv drust dît ku beramberî (syllable)a Englîzî bikar bînim, herçend di zarê Soranî de jî bi heman wata bikar tê. Peyva (syllable) di bineçeya xwe de ji Yonanî hatiye, bi wataya komkirin²²¹ û sazkirina dangan di yek birrgeyê de.

3.3.1. Giringiya birrge

Birrge ji nav daneyên dîtirî ziman ew e ku gelek axaftin û giftûgo ji kevin de li ser heye, lê bi peydabûna zanista fonetîkî û fonolojî re birrge pirtir cihekî giring girt ku ne tenê di nav tevinsaziya ziman de lêbelê di nav mosîqa helbestê de nemaze helbest kêşsaz ya ku li ser daneya birrge ava dibe. Birrge daneyekî giring e bo wergirtina tekez (stress) di ristika axaftina peyvên ziman de. Birrge ne tenê di lêkolîna zimanvanî de, lêbelê di rîzima helbestê û kêşsazî (prosody) de rola xwe wek daneyeke bingeîn dibîne ku pîkên (foot)

²²¹ Al-misedî Abdiselam(1981): Al-tefkîr Al-lîsanî fî Al-Hedara Al-Arabiya, Al-Dar Al-Arabiya Lilkitab, Lîbiya- Tûnis, (rup 262- 263).

helbestê li ser bingeha birrgeyan ava dibe, ango pîk bi xwe ji birrgeyan pêk tê. Lewra birrge bûye bingeha kertkirina helbestê di hemî zimanên cîhanê de, wilo jî di helbesta Kurdî de. Herweha di tiyoriya sîmayên cudaker de birrge bi rola navkeyî têtê jimartin. Crystal (2003:447) û Bolinger (1975:56) rola birrge wek pêkhênerê rezîma (rhythm) ziman tekez dîkin, ku her ev bi xwe daneyeke bingehîn e di mosîqa de. Her mirovek dema dipeyive rezîmekê dide, dengê axaftina xwe ku her ev jî di riya tekezkirina hin birrgehyan axaftinê ye, bi mebesta gihastina wata bo bihîzer.

3.3.2. Pênaseya Birrge

Birrge daneyeke bingehîn e di piroseya axaftinê de, ku ji aliyê analîza dengsazî û fonolojî ve roleke xweyî girîng heye. Herçende hesanî ye bo mirovekî axêver bikare birrgehyan peyvên zimanê xwe bijimêre, lê hêsta hevdengiyê geştî li ser pênasekirina birrge di nav zimanzanên cîhanê de nîne²²². Birrge ji aliyê fonetîkî ve têtê pênasekirin û wesfîkirin ku ji **navkeyeke dengî** ye, weha bê tegere, bê kelemek di riya hewayê derketina wê de hebe, ku berî wê yan bi dû de, deng bilind dibe ku kelemek berî wê yan piştî wê derdikeve û deng berî wê yan piştî wê bilind dibe yan nizim dibe.²²³

Peter Roach, zanayê dengsaziyê yê binavûdeng²²⁴ dibêje: "Piraniya birrgeyan di hemî zimanan de dengdêrê navîkê ye bi awakî weha ku berî wê dengdarek yan pirtir derdikeve"²²⁵. Herçend ziman di danîna dengdaran de ne wek hev in. Lê di hin barên kêr û hindik de birrgeyek weha diyar dibe ku dengdêr wilo hişkere têtê de peyda nabe, belê wek sîka wê têtê de diyar dibe, bo nimûne birrgeya yekem ji navê peyva (Biro) û (Bro). Di hin zimanan de dengdêr bi şeweyê gelek bilez têtê gotin yan yek car namêne wek di Kurdî de birrgeya dengdêrê /i/ ku gelek caran lawaz dibe heta radeyekê naye dengîkirin wek em bêjin: (mirîna vî mirovî), yan di hin devokên Kurdî de birrgeya yekem di peyva (dikim) de lawaz dibe, yan wek birrgeya duyem ya peyva (baran) ku tekez li ser duyem e, lewra ji ya yekem dirêjtir diyar dibe. Ev lêkolîna han geşekirinek e di warê kêşsazî (prosody) û helbestsazî (versification) de heye

Di analîza fonolojî de Laver (1994: 114) birrgeya fonolojî dide **naskirin** wek "daneyeke têtêkrêj ji takilên navkeyî û alîwar drust dibe" ("a complex unit made up of

²²² Marcelo Andrade The Structure of Syllable (rup 2)

<https://englishphonetics.wikispaces.com/file/view/The+structure+of+a+syllable.pdf>

²²³ Phonetically syllables "are usually described as consisting of a centre which has little or no obstruction to airflow and which sounds comparatively loud; before and after that centre (...) there will be greater obstruction to airflow and/or less loud sound" (Roach, 2000: 70).

²²⁴ Professor of Phonetics University of Reading, UK. Peter Roach 2002 A Little Encyclopaedia Of Phonetics

²²⁵ Peter Roach 2002 A Little Encyclopaedia Of Phonetics (rup 76)

<http://www.linguistics.reading.ac.uk/staff/Peter.Roach>

nuclear and marginal elements”)²²⁶. Takilên navkeyî dengdêr in, yan taviên birrgeyî ne, takilên alîwar dengdar in, yan ne taviên nebirrgeyî ne. Bo nimûne, di birrgeya (sîng) de, dengdêrê /î/ takilê navkeyî ye, belê dengdarê sereta /s/ û goşiyê dawî /ng/ takilên alîwar in²²⁷.

Birrge wek daneyekî fonolojî dijimêrin ku car heye ji dengdêrekî tenê pêk were wek pênameya Hanckok²²⁸ "as a group of one or more sounds with a peak or nucleus". bi awakî ku ev dengdêr bê hemze naye bilêvkin, lewra em nikarin bêjin ji dengdêrekî tenê pêk tê, ya rast ew e em bêjin ji hemze, ya ku daneyekî dengdarakî ye, ango birrge ji dengdarek yan pirtir di pêşî de tê û dengdêr CV, û hin car dengdar di paşî de tê ku dibe wek CVC.²²⁹

3.3.3. Terzên Birrge, Birrge di ziman de du tarz in:

1. Birrgeya girtî (closed syllable)

Ev tarz birrge ye ku dengê dawî yek yan du dengdar di paşke de derdikeve, wek CVC, CVCC, CCVC, CCVCC. Lê hin zimanzan (Brosnahan and Malmberg, 1970:210)²³⁰ wa dibînin ku ev birrge bi tarzê CVC tewawkerê birrgeya vekirî ye CV ye, ku bi dû de hatiye, yek ji belavtîrîn qalibên birrge ye di ziman de ku di nav hemû zimanên cîhanê de diyar dibe, wek: (wer, nav, kar, dêr, sor, dar, rêz, kîs, zor, gund, reng, rist, bej ...)

2. Birrgeya vekirî (open syllable)

Ev tarz birrge ku dawî bi dengdêr tê CV, wek: (zo, na, ka, rê, dê, ba, kî ...). Wek daneyekî fonolojî ku pirtirîn tarz e di diyarbûna xwe de, her ev jî vedigere despêk peydabûna ziman ji aliyekî ve û bikaranîna zarokan dema nû hîn ziman de dibin, despêkê hîn birrgeyên tarzê CV dibin û bi dû de tarzê CVC tê, wilo hin bi hint a ku mezin dibe tarzê birrgeyên wî jî mezin dibin ku dibe CCV, CCVC, CVCC, CCVCC. Peyvên zimanê Kurdî yê ji nîfşê daçek û girêdekan (connectives) wek (di, bi, li, ji, be, le, û, lê, pê, jê, tê, kê, kî, ku ... tad). Avahiya zimanê Kurdî hez ji birrgeyên vekirî dike, ango riste di axaftinê de pirtir ji birrgeyên vekirî ne.

²²⁶ Laver, J. (1994). Principles of Phonetics. Cambridge: Cambridge University Press. (rup 154)

²²⁷ Marcelo Andrade The Structure of Syllable (rup 4) "Nuclear elements are the vowels or syllabic segments; marginal elements are the consonants or non-syllabic segments. In the syllable *paɪnt/peɪnt/*, the diphthong */eɪ/* is the nuclear element, while initial consonant */p/* and the final cluster */nt/* are marginal elements" <https://englishphonetics.wikispaces.com/file/view/The+structure+of+a+syllable.pdf>

²²⁸ Rasim Tayeh Jehjoo Computer-assisted Programme for the Teaching of the English Syllable in RP Allophonic Pronunciation (rup 131) <http://www.iasj.net/iasj?func=fulltext&aId=45954>

²²⁹ John Goldsmith (2009) The Syllable, December 7 (rup 165) <http://udel.edu/~heinz/classes/2014/607/materials/readings/Goldsmith-2011-The-Syllable.pdf>

²³⁰ Rasim Tayeh Jehjoo Computer-assisted Programme for the Teaching of the English Syllable in RP Allophonic Pronunciation (rup 138)

3.3.4. Qalibên Birrge

3.3.4.1. Qalibê birrge di Kurdî de

Birrge laşek e, binyat û avahiya wê ji van kategoriyên dengdar (C) û dengdêran (V) pêk tê: ku di Kurdî de bi heşt qalibên jêrîn peyda dibin:

1. CV a, ya, di, da, bi, be, **ba, za, ka, pî, dî, ve,**
2. CCV dwa, sta, stû, şte,
3. CCCV strî, stra (ev qalib kêm e)
4. CVC **ar,** ew, av, hew, bar, zar, dar, bîr, mîr, kor, ..
5. CCVC cwan, stan, stewr, stûr, **şkêr,**
6. CVCC pişt, rist, sist, gird, **kuşt, bend, deng,**
7. CCVCC şkeft, şkest, şkand, stewr
8. CVCCC royşt (ev qalib kêm e)

3.3.4.2. Qalibên Birrge di Englîzî de

Hêjayê gotinê ye ku ciyawazî navbera Kurdî û Englîzî de di qalibê birrge de ji aliyê hebûna goşiyên dengdaran ve heye, ku di zimanê Englîzî de goşiyên doke û sêke di pêşke û paşke de peyda dibin, ku ev şêwe aloziyê di mîkanîzma bilêvkirina wan de derdixe, nemaze bo kesên biyanî-axêv ku zehmetiyan di dengkirinê de dibînin. Nimûneyên van birrgeyan weha ye²³¹:

syllable structure	narrow Trans.	The word
CCCVCCC	[skr'æʔʃ t]	scratched
CCCVCCC	[str'eIʔts]	straights
CCCVCCC	[str'eʔʃt]	stretched

Birrgeyên girtî di Englîzî de

(A). Closed syllables

['iz]	is	VC
['end]	end	VCC
['ænts]	ants	VCCC
[prompts]	prompts	CCVCCCC
[m'u:n]	moon	CVC
[dʒ ʌ mp]	jump	CVCC

²³¹ Rasim Tayeh Jehjooh Computer-assisted Programme for the Teaching of the English Syllable in RP Allophonic Pronunciation (rup 138) <http://www.iasj.net/iasj?func=fulltext&aId=45954>

[h'ændz]	hands	CVCCC
[s'İksθs]	sixths	CVCCCC
[pl'ænts]	plants	CCVCCC
[twelf θ]	twelfths	CCVCCC
[str'ɒŋ]	strong	CCCVC
[spr'İŋz]	springs	CCCVCC
[spl'İnts]	splints	CCCVCCC

Birrgeyên vekirî

(B.) Open syllables

['ɔ:]	or	V
[s'i:]	sea	CV
[θr'u:]	through	CCV
[skr'u:]	screw	CCCV

3.3.5. Diyarbûna Qalibên Birrge di Kurdî de

Ev her heşt qalibên ku min dan xuyakirin ne wek hev diyar dibin, ango hizûra hin qaliban di nav tevina peyvan de hindik e, yan gelek e. Eger bi awakî dîtir em bêjin hin qalib hizûra wan ji hizûra yên dîtir pirtir e, yan kêmtir e, wek qalibê /CV/ bêhtirîn qalib e di nav tevina zimanê Kurdî de. Duyem qalib di pîrbûna hizûra xwe de qalibê /CVC/ e ye. Weha em dikarin hizûra qaliban ji aliyê pîrbûnê ve despê bikin û berjêr de dakevin ku her dadikeve her wilo kêmtir dibe, ku ew jî ev in:

Pileya yekem

1. CV a, ya, di, da, bi, be, ba, za, ka, pî, dî, ve,
2. CVC ar, ew, av, hew, bar, zar, dar, bîr, mîr, kor, ..

Pileya duyem

3. CVCC pişt, rist, sist, gird, kuşt, bend, deng, zerk
4. CCVC cwan, stan, stewr, stûr, şkêr,
5. CCVCC şkeft, şkest, şkand, stewr
6. CCV dwa, sta, stû, şte,

Pileya sêyem

7. CCCV strî, stra (ev qalib kême)
8. CCCV strîk
8. CVCCC royşt, (ev qalib kême)

Radeya diyarbûna celebên birrgeyan ew e ku hin celeb gelek diyar dibin, û hin celeb hene gelek diyar nabin wek birrgeyên sade di Kurdî de pirtir ji birrgeyên têkel derdikevin.

3.3.6. Birrge û mosîqa helbestê

Eger em li ser movikên helbestê rawestin, emê bibînin birrge roleke bingehîn di sazkirina mosîqa helbestê de dilîze, ku jê re kêş û wezin tê gotin. Kêş li gor xwendina helbestê tê sazkirin, lewre hin movik eger di nivîsînê de bi awakî tîn berçav kirin, nemaze di warê morfolojî de, lê belê ji aliyê xwendinê ve tîn guhartin, ku li gel movika pêş yan paş tîn bişaftin, û çî jî guhartina dengê birrge navbera dirêjkirin û kurtkirinê de diçe û tê, ku ev jî di van nimûneyên jêrî yên helbesta Cegerxwîn de diyar e²³², wek:

Ji bo ne her kesî yarek heye ê min welat yar e
- / / / - / / / - / / / - / / /
Mefaçîlun mefaçîlun mefaçîlun mefaçîlun

Belê çî bikim di destê dijminê xwîn xwar û xeddare
- / / / - / / / - / / / - / / /
Mefaçîlun mefaçîlun mefaçîlun mefaçîlun

1. Bişaftina Birrge

Hin birrge di ristina ziman de lawaz tîn û hin bihêz tîn, wek peyva (çî bikim) ku di morfolojîya xwe de sê birrge ne, lê di xwendinê de dibe du birrge, ew jî weha tê: (çîb + kim) ku birrgeya (çî) û (bi) dibe yek, ku (çîb) e.

2. Guhartina deng

Dengên dengdêr nemaze /e/û /û/ di Kurdî de yan sivik dibin yan jî dirêj dibin ku ev diyaredeya dengsazî karê xwe li kêşa movikê dike wek çawa dengê /e/ yan /ye/ di peyva (heye) ya helbestê de dirêj tê, lewre li gor (Mefaçîlon) tê sazkirin. Weha jî dengê /e/ya dawîya firdikê bilind tê û dirêj dibe (welat yar e), (û xeddare e). ji alîkî din ve jî girêdeka /û/ di pîka (û xeddare e) kurt tê sazkirin ji ber ku bi dawîya peyva berî xwe ve tê bilêvkirin (xwîn xwar û xeddare e)²³³

3.3.7. Celebên Goşiyên Dengdarên Kurdî:

Goşiyên dengdaran roleke çalak û hemerengiyeyeke mûsîqî di hûnandina peyvên zimanê Kurdî de dibîne ku taybetiyeyeke fonolojî dide zimanê Kurdî ku ev goşî hem di seretaya birrge de, hem di dawîya wê de diyar dibe, wek van nimûneyên jêrî:

3.3.7.1. Goşiyên despêka birrge

²³²Berzo Mehmûd (destnivîs): Kêşsazî di Helbesta Kurdî de.

²³³Berzo Mehmûd (destnivîs): Kêşsazî di Helbesta Kurdî de.

Goşiyên dengdar ango do yan sê dengên dengdar pevra diyar dibin, çi di despêka birrgeyê de, çi jî di dawiya wê de şêweyeke resen e di Kurdî de, lê goşiyên dengdar yên sereta kêmtir in ji yên dawiya birrge, ji ber ku despêk yan sereta di gotina deng de di ristika dengan de ji dawiya peyvê dirêjtir e, lewre di hin peyv de şkandin dikeve navbera herdû dengdaran de ku ew jî dengdêrê kurt /i/ ku gelek sivik tê gotin bi awakî weha nayê bilêvkin, ango wunda bibê. Ev diyarde li nik Tewfîq Wehbî jî hatiye ku birrge dibe (nîvbirrge), inca bi jêketina dengdêrê kurt /i/ goşiyek deng wek şêweya (cluster) drust dike. Ev goşeyên han (clusters) bi dengên wek b- (b-, ç-, c- . z-, s-, ş-, d-, t-, j-) di van peyvên jêrî de despê dike. Lê ne kû hercar tê birrîn, wek van nimûneyan:

Pêşke	Nimûne		
br-	bra	bira	Braştin, biraştin
	"brother"		
bl-	blûr	bilûr	
by-	byan	biyan	
zm-	zman	ziman	ziman, zmanok
	"language"		
çk-	çkole	çikole	"small"
dl-	dlop	dilop	"drop"
dr-	dran	diran	durust, drêj / drêj
dy-	dya min	diya min	
fr-	frotin	firotin	
jm-	jmartin	jimartin	
qr-	qrêj	qirêj	
çl-	çle	çile	"fourty"
cw	cwan	ciwan, cuwan	
xr-	xrap	xirap	
	"destroy"		
şk-	şkov	şikov	"blossom"
gy	gyan	giyan	şkêr, şikêr "piles of stones"
my	mya	miya	
py	pya	piya	
cya	cya min	ciya min	

ty | tyade tiyade |

3.3.7.2. Goşiyên dawiya birrge

-şk	mişk, hişk, meşk, teşk
-sk	misk, nîsk, gîsk, hesk
-rk	terk, çirk, firik, kurk
-rg	berg, dirrg, merrg
-rq	berq, terq, çerq,
-rd	berd, Kurd, gerd, zerd,
-rz	berz, gurz, derz,
-rş	tirş, qirş,
-rs	tirs, girs, qurs, hers, xurs
-rb	derb, kerb, tirb, xirb
-rt	çirt, kirt, pert, kert
-rc	birc, gurc, zirrc, xurc
-rç	qirç, birç, hirç, mirç
-rx	berx, derx, kerx,
-nd	bend, gund, rind, zend
-nc	benc, renc, qenc, genc
-ng	reng, deng, zeng, heng
-sp	hesp, kesp, kosp ...
-lp	qelp, gulp, çelp, telp ...
-ls	bels, qels, kils, fils, hels,
-xs	dexs, bexs,
-xş	bexş, nexş, kexş, neqş
-xt	bext, sext, next, rext, text
-st	best, rist, sist, mest
-şt	beşt, rişt, mişt, hişt
-şk	Peşk, meşk, reşk
-wt	kewt, rewt,
-ft	keft, left, heft, neft, axaft

3.3.8. Kertkirin û Destnîşankirina Qalibên Birrge

Birrge yek ji daneyên herî kevin e²³⁴, û herî giring e ku ji du fonêman yan çend fonêman pêk tê bi mercê ku dengdêr di nav tevina wê birrge de (sereta yan navî yan dawî) hebê²³⁵. Eger dengdêr nebê, ji xwe birrge pêk nayê, ango birrge bê dengdêr nabê. Peyv yan firaz yan riste di piroseya axaftinê de nayê kertkirin û birrîn bê ku rawestaneke dirêj bikeviyê. Birrîn bi xwe rawestaneke kurt e, di piroseya axaftinê de hest pê dibe, wek em bêjin: (Par ez çûm Serxetê. Par/ ez/ çûm/ Ser/xetê.) Ev zincîrepeyv yan axaftin ji şeş parçe deng pêkhatiye ku şeş rawestan navbera wan xelekên zincîra deng de hene, ku hersê xelekên pêşî her yek ji wan bêjeyek e, û hersêkên dîtir sê parçên yek peyvê ne (ser/xetê). Di vê zincîrê de her xelekek birrgeyek e, şeş birrge: çar ji wan (par ez çûm xet) girtî ne, ango bi dengdar dawî pê tê, herdu birrgeyên dîtir (xe, tê) vekirî ne, ango bi dengdêr dawî pê tên. Inca birrge parçek ji dengê gotinê ye, ji ber ku piroseya gotinê û peyvînê bayek e, yan hewayek e, ji dev û lêvên mirov tête derê ku tekan û rawestan dikeve ristika wê hewayê de, ango ew hewayê deng wek movikan ji dev derdikeve. Yek ji belgeyên herî giring di bûyîna birrge de ew e ku axêverên hemû zimanan bi hesanî dikarin hest pê bikin û dikarin jî bijimêrin wek me berî niha da xuyakirin. Lê hin zimanvan di vê xalê de li vê dawiyê ne yekdeng bûn ku di yekzimanî de xelk ne wek hev birrgeyên ziman destnîşan dikin. Inca kertkirin û destnîşankirin û sînoranan bo birrge yek ji kêşeyên zimanvanî ye ku gengeşe gelek li ser çêbû. Çilo fonêm wek kertekî peyvê kete nav xwendina ziman de, wilo jî birrge wek daneyeke fonolojî serê xwe hilda (Çomiskî û Halî 1968). Di hin ziman de diyarkirina sînorên birrge dibe pirsgerêk ku her axêverek bi awakî cuda hest bi birrge dike, wek peyva Englîzî (ekstra):

- i) e-kstra
- ii) ek-stra
- iii) eks-tra
- iv) ekst-ra
- v) ekstr-a

Lê belê di hin zimanên dîtir de, wek Kurdî, ew pirsgerêk diyar nabe, ji ber tevinsaziya dengên di hin ziman de, hûnandina birrgeyan zelaltir xuyanî dike, ji ber coreyên bunyata birrge ristikên dengên dengdar bi şeweya sade tê de tên, yan bi goşiyekî ji du dengdaran zêdetir pevne naye, herweha yek dengdêr tenê dikeve birrgeyê de, inca sînorên kertkirina birrge mirov zû hest pê dike, ji ber ku qalibên birrge di ziman de hindik

²³⁴John Goldsmith (2009) The Syllable, December 7 (rup 164)

²³⁵John Goldsmith (2009) The Syllable, December 7,(rup 165)

in ku bi hezarê peyvên zimanê Kurdî pirtir di **şêş qalibên birrge** de tînan wek van nimûneyên jêrîn:

1. a, ê, û, ba, be, bi, ba, de, da CV
2. bar, ber, ben, den, meş CVC
3. stû, şkû, drû, şka CCV
4. stêr, şkêr, stûr CCVC
5. berz, beng, deng, meşk, CVCC
6. şkeft, drust, CCVCC

Şêweyên yekbirrge bi giştî weha wek nimûneyên jor tînan, eger zêdebûn tê de çêbibe, ji xwe bi dû dengên dengdêr de nabe ku dengdêr were, eger hat divê dengê /y/ yan /w/ wek navbend yan wek dengdar bikevê nav wan de wek (beyar, bayan). Lê dengdêr dikare bi dû dengdaran were: (ar). (ûr) ku her dîsa yek birrge ye, wilo jî bi dû corê duyem de wek (ba) dikar bibe (bar), (da) dibe (dar); wilo jî eger dengê dengdar bi dû corê sêyem de hat her dîsa wek xwe dimêne ango ti birrge lê êde nabe wek corê çuwarem ku (ber) bi zêdebûna /z/ dibe (berz), (ben) dibe (beng), (den) dibe (deng) her dîsa yek birrge ye. Lê dema dengdêr bi dû corê sêyem de were birrgeyêke dîtir lê zêde dibe wek (bar) bi zêdebûna dengdêrê /î/ dibe (barî) ku du birrge ye (ba + rî), (ben + î) dibe (be + nî), wilo jî core çarem ku (berz) yek birrge ye bi zêdebûna (-î) dibe du birrge (berzî) (ber + zî), (dengîn) dibe (den + gîn) ango ew dengê konsnant yê dawîya yekbirrge jê vediqete û bi dengdêrê zêdebûyî re dibe heval û birrgeyêkê dîtir drust dike. Di her zimanekî şêweyêke taybet ji qalib wek ku me li jê re da xuyakirin, ku her ew jî bi awayê rêzkirina fonêmên dengdêr û dengdarên peyvê ve pabend e, ya dîtir bi goşiyên dengdaran ve, wek em bêjin goşiyê /-nd/ di Kurdî de û di Englîzî de tenê di dawîya birrge de tê, ango bi seretaya birrge ve naye, wek: (bend, çend, gund, rind, zend, hend) lê eger me birrge bi şêweyêke dîtir dengdarên birrge rz kirin wek (ndbe, ndgu, ndez) yan (dneh, dnug) her yek ji me bi hesanî dikare bizane ku ev bêje ne Kurdî ne. Inca rêzkirina dengdaran di dengrêsiyê de gelek giring e, lewra min dengrêsi û awayê rêzkirina dengdaran û qalibê goşiyên dengdaran xiste berî tewera birrge.

3.3.9. Du Şêweyên Analîzkirina Birrge

Yasayên ziman wek bûna deng û fonêm û tekez û dirêjîya dengdêran û rawestan, evane hemû bi hebûna birrge ve bend in. Inca eger birrge nebê, ji xwe her evane jî nînin, naxwe axaftin û qisekirin û ziman jî nîne. Ji ber wilo zimanvanî bawerî bi wê yekê heye ku birrge daneyekî bisûd e, ji ber ku di axaftinê de em dikarin sûtê jê werbigirin. Inca çawa fonêm heye û tê dengkirin û bihîstin, wilo jî birrge tê dengkirin û bihîstin, dengê fonêman hemû ne wek hev tînan bihîstin, wek derbirrîna dengê /g/ giran e, eger dengdêrek pê re nebe,

berî wê yan piştî wê. Herweha dengê /t/ herçende dikare bi tena xwe jî derbibirrê, lê ji ber ku nizm û kip derdiçe pêwîstî bi alîkariya dengê dengdêr heye. Inca kombûna dengdar û dengdêran daneye li encamê derdiçe ku axaftin aniye meydana. Vekolîn û analîzkirina birrge bi du şeweyên fonetîkî dibe:

- 1) Birrge di tiyoriya zirrîngokî de
- 2) Birrge di analîza fonotaktîkî(phonotactics / fonosazî) de

3.3.9.1. Birrge di Tiyoriya Zirrîngokî de“Sonority theory”

Peyva "sonority" ji Englîzî hatiye, dengê e, di nav ristika dengên dîtir de pirtir tê bihîstin, ango ji hevalên xwe bilindtir e, yan pirtir e, nemaze ku di navkeya birrge de kom dibe û rola xwe dibîne²³⁶. Peyva (zirrîngok) beramberî (sonority) wek ku berî niha zimanzan Xazî Weys bikar aniye, lê Dr. M. M. Fetah peyva derkewtû (derkeftî, derketî)²³⁷ bikar aniye. Eger tenê yek dengê derkeftî di peyvê de hebê, ew peyv yekbirrgeyî tête jimartin; ji xwe heger çend dengên zirrîngok(derketî) hebin, ew peyv pîrbirrge ye. Ne merc e dengê zirrîngok her dengdêr be, herçende dengdêr ji dengdar zirrîngoktir e, zimanzan zirrîngokiya deng li çend hokaran vedigerênin ku ew jî ev in²³⁸:

1. Zirrîngokiya dengên gîr ji yê kip pirtir e, bo nimûne dengê /d/ ji yê /t/ zirrîngoktir e.
2. Dirêjî: dengdêrên dirêj ji dengdêrên kurt pirtir derdikevin, wek dengdêrê /a/ ji dengê /e/ pirtir derdikeve, ango zirrîngoktir e.
3. Tekez (hêz): Ew dengên ku tekez li ser heye zêdetir derdikeve wek dengê /a/ya duyem di peyva /baran/ de ji /a/ya birrgeya yekem bihêztir û tekeztir e.
4. Dûr û nêzîkîbûna deng ji dengê zirrîngok: ew dengê ku ji dengê zirrîngok nêzîk be, zirrîngokiya wî kêmtir dibe, lê heger dengê kete pala dengê zirrîngok, zêdetir derdikeve ango zirrîngoktir dibe, wek dengê /r/ di peyva /tirî/ de wilo hatiye ku pala xwe daye dengê kipa /t/ ku dengê zirrîngoktir e.


Li gor tiyoriya zirrîngokî em dikarin bêjin ku birrge ji birrek deng pêktê, ku yek ji wan ji hemûyên dîtir zirrîngoktir û derketîtir e. Bi awakî giştî dengên ziman li gor **pileya zirrîngokiya wan ji zêdebûnê ta kêmbûnê** weha tene rêzkirin(Rogers, 2000: 268).²³⁹:

²³⁶Rasim Tayeh Jehjoo, Computer-assisted Programme for the Teaching of the English Syllable in RP Allophonic Pronunciation (rup 135) <http://www.iasj.net/iasj?func=fulltext&aId=45954>

²³⁷ Mihemed Marûf Fettah (1987): Zimanewanî, Zakoy Selahedîn, kolicî Adab, Beşî Kurdî, Hewlêr.(rup 62)

²³⁸Mihemed Marûf Fettah (1987): Zimanewanî, Zakoy Selahedîn, kolicî Adab, Beşî Kurdî, Hewlêr.(rup 63)

²³⁹Rasim Tayeh Jehjoo, Computer-assisted Programme for the Teaching of the English Syllable in RP Allophonic Pronunciation (rup 135) <http://www.iasj.net/iasj?func=fulltext&aId=45954>



Em dikarin beşek ji dengên Kurdî, li gor nexşeya (Rogers) ya ku me li jor aniye ji herdu aliyan ve dabeş bikin:

1. Yekem: ji pileya zêdezirîngok diçe kêmezirîngok,
2. Duyem: ji pileya kêmezirîngok ber bi zêdezirîngokiyê ve diçe ku dabeşkirin weha tê:

Yekem: berjêr

ji zêde ber bi kêmbûnê de diçe

- 1) dengdêr / a , o /
- 2) dengdêr / u , e , i / , / î , û /
- 3) rewan / w , y /
- 4) lerok / r , rr /
- 5) layekî / l /
- 6) bêvilok / m , n /
- 7) şkandek / ç /
- 8) xişokên girr / b , d , g /
- 9) şkandek / ç /
- 10) xişokên kip / f , s , ş /
- 11) xişokên kip / p , t , k /

Duyem: berjor

ji kêmbûnê ber bi zêdebûnê de diçe

- 1) xişokên kip / p , t , k /
- 2) xişokên kip / f , s , ş /
- 3) şkandek / ç /
- 4) xişokên girr / b , d , g /
- 5) şkandek / ç /
- 6) bêvilok / m , n /
- 7) layekî / l /
- 8) lerok / r , rr /
- 9) rewan / w , y /
- 10) dengdêr / î , û / , / u , e , i /
- 11) dengdêr / a , o /

Li gor vê tiyoriyê du lûtkeyên zirrîngokî di ristika dengên peyva /şk-a-n-d-i-n/ de peyda dibin: dengdêrê yekem /a/ya zirrîngok û dengdêrê duyem /i/ya zirrîngok; ji ber wilo em dikarin bêjin ku du birrge di peyva (şkandin) de hene.

3.3.9.2. Birrgesazî di Analîza Fonosazî de: (Phonotactics)

Zanayên dengsazî sînorên avahiya binyata birrgê bi yasayên fonosazî (phonotactics) analîze dikin, ku rêzbûna dengên di çarçêweya birrge yan peyvê de diyar dikin, bo nimûne yasayekî fonosazî di Kurdî de heye ew e heger dengdarek navbera du dengdêran de hat, ew kosoant dibe parçek ji birrgeya duyem²⁴⁰ wek peyva (zêr) yek birrge ye /z ê r/, lê (zêrîn) du birrge ye /z ê - r î n/ ku dengê /r/ di peyva duyem de ligel birrgeya duyem e, wilo jî /pîrî , pî -rî/, /na-çim/. Em dikarin yasayeke dîtir ya fonosazî di Kurdî de darêjin, ew jî ew e eger du dengên dengdar bi hev ve di yek birrgeyê de hatin û herdu pevne ketin navbera du dengdêran de, ew dengên kosoant yê pêşî dibe paşke ji birrge pêşî re, lê dengdarê dîtir dibe pêşke di birrgeya bi dû ya pêşî de, wek:

$$\begin{array}{l} \text{yekbirrge} \longrightarrow \text{reng} \quad (r \underset{1}{e} \text{ng}) + (-\underset{2}{în}) = \text{rengî} \\ \text{dubirrge} \longrightarrow \text{rengî} \quad (r \underset{1}{e} \text{n}) / (\underset{2}{g} \text{î n}) = \text{rengî} \end{array}$$


Birrge di fonosazî de bi du awayan şrove dibe, hin ji zimanzanan birrge bi şeweyeke stûnî (hierarchical structure) lê dinerin, hinên dîtir bi şeweya asoyî (linear structure)²⁴¹ (bi sigma Yonanî (σ) tête naskirin), hin zimanzan birrge dibînin ku ji du takilan(elements) pêktê: ji pêşke (onset) ya ku dengdar e, ya ku berî takila navkeyî tê, (dengdêr) û serwe (raym) (R) ya ku ji takila navkeyî (dengdêr) li gel tavilên alîwar eger bi dû de hat. Raym dibe du çiqil: lûtke (peak) (P) ku her navke (Nuclues) (N) ye û coda (CO) ku paşke ye²⁴². Navke yan lûtke beşê herî zirrîngok e di birrge de. Koda ew beşê ku her dengdarî ye.

²⁴⁰Mihemed Marûf Fettah (1987): Zimanewanî, Zakoy Selahedîn, kolficî Adab, Beşî Kurdî, Hewlêr.(rup 63)


²⁴¹ Marcelo Andrade The Structure of Syllable (rup 5)

<https://englishphonetics.wikispaces.com/file/view/The+structure+of+a+syllable.pdf>

²⁴²John Goldsmith (2009) The Syllable, December 7 (rup 169 - 170)



Kar û xebatên nûjen di warê fonolojî de sûdê ji şîkirina zelal ya kertkirina birrge digirin, ya ku dengdêr û koda (eger koda hebû) wek serwe dibînin, eger em li sîstima serweya helbesta Kurdî binerin emê bibînin ku serwe ji wî beşê dawî yê birrge dawî di malika helbestê de tê. Serwe tete kertkirin ku hin zimanzan bi (**peak**) ango **lûtke** binav dikin, û hinên dîtir bi (**nucleus**) ango (**navke**) binav dikin, ku ew jî beşê dengdêr e û beşê dîtir (**coda** – koda) ango **paşke**²⁴³, lê bizane ku ev beş (coda) carna heye û carna nîne wek peyvên (me, ba, xwe) ji beşê yekem û duyem tenê pêk tê. Inca parçebeşên serekî yên birrge sisê ne:



²⁴³ Min sê têrim nû dariştin ku ew jî pêşke beramber têrima Ingilîzî (onset), û navke beramber (nucleus), û têrima (paşke) beramber (koda).

Birrgesazî ('syllabification procedure', 'syllabification algorithm')²⁴⁴ ew e ku di awayê kertkirina birrgê de kar dike wekçawa di zimanê Englîzî de çend birrge weha tên:

Englîzî:

	Syllable	Onset	Nucleus	Coda
ban	[bæn]	[b]	[æ]	[n]
be	[bi]	[b]	[i]	NONE
an	[æn]	NONE	[æ]	[n]
stand	[stænd]	[st]	[æ]	[nd]
plank	[plæNk]	[pl]	[æ]	[Nk]
boy	[bOY]	[b]	[Oy]	NONE
I	[ay]	NONE	[ay]	NON

Kurdî

	Syllable	Onset	Nucleus	Coda
	[ban]	[b]	[a]	[n]
	[mû]	[m]	[û]	NONE
	[an]	[æ]	[n]	
	[stand]	[st]	[a]	[nd]
	[şkeft]	[şk]	[e]	[ft]
	[û]	[3]	[û]	

3.3.9.3. Gavên Kertkirina Birrge di Fonosazî de

1. Her birrgeyek **navke** heye
2. Dengdêr hemî di Kurdî de dikarin bibin **pêşke (onset) O û navke (nucleus) N** di birrge de. Dengdêr dibe nasnameya birrge.

Di analîza Englîzî de li nik du zimanzan weha hatiye ew birrgeya ku ji dengdêr tenê pêk tê, wek peyva (I) ango (ez), eger em tenê wek dengdêr bistênin ji xwe, ne onset tê de heye, ne koda tê de heye. Birrge li gorî analîza wan weha hatiye²⁴⁵:

	onset	navke	koda
Englîzî	non	[ai]	non
Kurdî	3	[ay]	nîne

²⁴⁴ Syllables and Phonotactics (rup 24)

<http://people.umass.edu/scable/LING201-SP13/Slides-Handouts/Syllables-Phonotactics.pdf>

²⁴⁵ Ev şêwe nexşe û kertkirin ji ber pirtûka syllable phonotactics (rup 36)

Dixwazim bîrûrayeke ciyawaz, ne wek ya hin zimanzanên Englîzî bidim yên ku di cedwela jor de birrgeya (I) ango (ez) wek [ai] diyar dibe, herweha peyva (an) di cedwela bertir de hatiye ku bê pêşke dibînin, ez bi xwe vê yekê şaş dibînim ji ber ku piroseya despêkirin bi lêvkirina dengê wavel pêknaye eger em dengê hemza nebêjin ku jê re (glottal stop) dibêjin. Herçende David Crystal bi xwe jî (glottal stop) tekez kiriye û wek dengê dengdar jimartiye ku li pêşiya wavel derdikeve, lewra, nabê em bikevin şaşiya grafimên nivîskî de ku tê de diyar nabe. Ji ber wilo ez weha dibînim ku pêwîstî bi pêşke heye di pêşiya dengê dengdêr de wek piroseyeke fîzyolojî û fonetîkî. Lewra pêwîst e pêşke jê re bê danîn di binyata birrge de wekçawa di ya Kurdî de min daye xuyakirin.

Binyata birrge di analîza fonosazî de bi çar gavan şîrove dibe, ku emê ji we re van her çar gavan yek dû yekê peyrew bikin, bi wêneya birrge di ristina du peyvên Kurdî de: (zeredeş, zeredeştî). Wek em dizanin birrge ji do yan sê beşan pêk tê:

1. Di gava yekem de emê beşê **navke** ji hemî birrgeyên peyvê nîşan bikin.
2. Di gava duyem de emê beşê **pêşke** li gel **navke** nîşan bikin.
3. Di gava sêyem de emê beşê **paşke** ligel **pêşke** û **navke** nîşan bikin.
4. Di gava çarem de emê **wan beşan** di bin **sigma birrge** de nîşan bikin.

Inca emê niha van gavan yek li dû yekê wêneya fonosazî bi nexşe destnîşan bikin, ku ew jî ev in:

1. **Gava yekem:** beşê **navke** ji hemî beşên dîtirî birrgeya peyvê tete nîşan bikin.

Zeredeş

N N N
 ↓ ↓ ↓
 Z e r e d e ş t

Zeredeştî

N N N N
 ↓ ↓ ↓ ↓
 Z E R E D E Ş T Î

2. Gava yekem û duyem: Beşê pêşke li gel navke nîşan dibe.

Zeredeşt

P N P N P N
↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
Z E R E D E Ş T

Zeredeştî

P N P N P N P N
↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
Z E R E D E Ş T Î

3. Gava yekem û duyem û sêyem beşê paşke ligel pêşke û navke

gav 1+2+3

Zeredeşt


P N P N P N K
↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
Z e r e d e ş t

Zeredeştî


P N P N P N K P N
↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓ ↓
Z e r e d e ş t î

4. Gava yekem û duyem û sêyem û Çarem (A)

gav 1 + 2 + 3 + 4 (A)




Zeredeşti




Gava yekem û duyem û sêyem û Çarem (B)

gav 1 + 2 + 3 + 4 (B)

Zeredeşt




Zeredeştî




5. Gava çarem (C) û dawî

Zeredeşt




Zeredeştî




3.3.10. Şêweyên Binyata Birrge di Kurdî de

Bunyata birrgeya bi dengdêr despê dike li gor analîzkirina zimanê Englîzî wek peyva (I) **pêşke** tê de nîne, lê di zimanê Kurdî de ev analîzekirin şaş e, wek peyvên (aw, av, ar), ku dengê di pêşiya dengdêr de heye lê ne diyar e ango veşartîye ku ew jî (hemze) jê re dibêjin ji ber ku dengdêr bê hemze dernakeve, lewra dema em dibêjin (ar) em sê dangan derdixin (hemze + a + r) inca bunyata birrgeya Kurdî li gor yasayên fonosazî weha diyar dibe:


1. yekem şêwe:



2. duyem şêwe:



3. sêyem şêwe:



Wek diyar e birrge ji dengdar û dengdêran ava dibe, mercê herî bingehî ew e ku birrge bê dengdêr nabe²⁴⁶, ango dengdêr takilê bingehîn e di hebûna birrgeyê de, heye birrge ji dengdêr tenê drust bibê wek dengê /ê/ di rista (ê zanê zanê, ê nizanê, baqê nîska ye). Em jibîr nekin ku dengdêr di Kurdî de bi dengê/hemze/ despê dike, ku hemze dengêkî bêwêne ye, ku tîp jê re nîne, lewre dengdêr bi tena xwe di nivîsînê de diyar dibe, lê di dema bilêvkirinê de ev dengdêr bi hemze despê dike û bi dû de dengdêr tê wek em bêjin (û)wa peywend (conjunction) du firaza (Azad û Serbest) eger me dengwestan li ser dengê dengdarê dawî ya peyva Azad saz kir, lê eger me ew dengdar bi (û)ve girê da û bilêv kir, inca me pêwîstî bi hemze û firazê nine, û weha çêdibe:


Azad û Serbest A/zad/ û/ Ser/best

Azad û Serbest A/za/dû/ Ser/best

3.3.11. Rola dengdêr wek navke di piroseya morfofonolojî de

A) Peyvên ku bi dengdêr despê dikin wek peyva (êvar) û peyva (ûr) dîsa dengdarê hemza dikeve pêşiya dengdêr de, ango dengdêrê despêkê bi du fonêman tê jimartin, wek van nexşeyên jêrîn:

²⁴⁶Claire-A. Forel & Genoveva Puskás (1986): Phonetics and phnology, University of Geneva



B) Dengdêr wek navika birrêgê tê jimartin, ango birrge bi dengdêr despê nake, herçende dengdêr bi tena xwe di şêweya nivîsînê de diyar dibe wek (ar) lê dengê /a/ û hemî dengdêr dema wilo rût tê gotin pêwîst e di piroseya bilêvkirinê de bi **hemze** bête despêkirin.²⁴⁷ Bo nimûne peyva (stûr) di Kurdî de yek birrge ye, ji sê konsoantan û yek dengdêrî pêkhatiye. Eger em dengê /s/ jê hilênin peyv dibe (tûr) ku dîsa birrge wek xwe dimênê, û peyveke Kurdî dîtir dide. Her dîsa eger me (st-) peyvre jê avêt, peyv bi laşê (ûr) dimêne ku her dîsa wataya (zik) dide û birrgeyek e. Baş e, eger me /r/ ji (ûr) hilanî, birrge dîsa dimêne ji ber ku (û) wek peyveke pêwendrês di Kurdî de bikar tê wek (Azad û Serbest). Inca peyva (stûr) di piroseya morfofonolojî de şeş birrgeyan û şeş peyvan dide (stûr, stû, tûr, tû, ûr, û). Peyva (û) wilo dengdêr bi tena xwe jî biser ket, lê eger me dengdêrê /û/ jî jê hilanî peyv hem ji birrgeyî dikeve û hem jî ji watayî dikeve. Wilo jî peyva (gav) bi tena xwe yek birrge ye, û li gor dabirrin û tavilkirina wê dibe çar birrgeyên biwata, wek: (gav), (ga), (av), (a), lê eger me dengê /a/ jê hilanî yek peyv jî wata nade.

C) Dengdêr wek peyv û birrge

1) Fonêma dengdêr eger bi tena xwe wek peyv bikar hat, bo nimûne, peyva (û) ya bestrês, yan peyva (ê)ya cênava ...htd. bi du fonêman tene jimatin, ku fonêma pêşke (onset) dengdarê hemza ye û fonêma duyem dengê dengdêr bi xwe ye. Nimûne di nexşeyê jêrîn de diyar dibe:



²⁴⁷Massoud Rahimpour (Corresponding author) (2011): A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English, The University of Tabriz, Iran, Published by Canadian Center of Science and Education, International Journal of English Linguistics Vol. 1, No. 2; September 2011, (rup 75) www.ccsenet.org/ijel

D) Birrge û Peyv

Peyv di binyata xweyî dengsazî de ji dengekî yan komek deng yan ristikek deng pêk tê. Ev dengên hanê di tevna birrgeyan de têne rêzkirin û dibe ku ew birrge bi tena xwe peyvek be, wek (na, ka, la, ber, zer, kor, gund, sirt), û dibe jî ji yekê zêdetir bê wek peyva (xanî) ji du birrgeyan pêk tê: (xa – nî), yan ji sê birrgeyan wek pîrozî, (pî-ro-zî). Ji alîkî din ve jî birrgeyek ji peyvê dengekî bilindtir werdigire, û jê re dibêjin (stress), bo nimûne em dibêjin (ev tişt rast e), peyva (raste) ji du birrgeyan pêk tê: (ras + te) ku birrgeya pêşî (ras) dengekî bihêztir ji birrgeya (te) distênê, lewre jê re tê gotin birrgeya hêzdar. Zaraweya (hêz) zanayên zimanê Kurdî berî niha bikar anîne beramber (stress) a Englîzî. Inca birrge ji aliyê fonetîkê ve ji wê koma dengan re tê gotin, wek (gul) peyveke yekbirrgeyî ye ango ji yekbirrge pêktê, lê peyva (gulzar) ji du birrgeyan ava dibe: (gul + zar). Inca peyva (gulzar) ji sê birrgeyan çê dibe, ew jî: (gu + lî + zar). Di vir de wa diyar bû ku sînoren birrge di peyvê de li gor avakirina dengên peyvê saz dibe²⁴⁸. Inca birrge, ji aliyê fîzîkî ve, li gor dirêjahiya lerîna wê tê destnîşankirin. Lêbelê ji aliyê fonolojî ve birrge ji dengderekî û dengdarekî yan zêdetir ji dengdarekî pêktê. Dengdêr dibe haveynê drustbûna birrge. Şeweya birrge, çi dirêj yan kurt, ji zimanekî ta zimanekî dîtir tê guhartin, lê di Kurdî de her divê dengderek û dengdarek yan pirtir ji dengdarekî hebê, wek:

Yek	do	Sê	çar	pênc
Ez	ezê	serbestî	dirêjahî	dirêjahiyan
Ew	ewan	tolazî	pîrozbayî	pîrozbahiyan

Pêwendiyên morfolojî ji yên dengsazî têne guhartin bo nimûne peyvên qalibê karê nihokê wek (dikim, diçim, dibim, têm) li gor analîza morfolojî peyv sê morfêman di binyata xwe de hildigire:

Analîza	peyv	jimar
morfolojî	di-k-im, di-ç-im, di-b-im, têm(di-hê-m)	sê morfêm
dengsazî	di – kim, di-çim, di-bim, têm(di-hêm)	du birrge
	têm (sê morfêm)	yek birrge ye
	strîzerk [strî - zerk], stûxwar [stû-xwar]	dubirrgeyî
	bermihokayetî	şeşbirrgeyî

²⁴⁸Associate Prof. Dr. Rafik Sulaiman(2015): A Comparative Study of the Category of Anteriority (in English, Kurdish and Arabic), Berlin. (Checked by Prof.Dr. D.Melenciuc)(rup 63)

Encam

Birrege, di zimanê Kurmancî de, ji aliyê qalib û binyata xwe ve li gor analîza fonetîkî û fonolojî hate şîrovekirin, ku dibe bingeha şîrovekirina **tekez** û **awazê** di herdû tewerên bê yên dawî de. Ji ber ku tekez hêlîna xwe li ser seraya birrê ava dike, lewra emê îca biçin nav beçê tekezê di tewerê bê de.

Birr IV 3.4. Tekez di Kurmancî de

3.4.1. Tekez (stress)

Herçend ev mijar di Kurdî de ta niha neketiye ber lêkolîneke têrûtesel de, heta ew lêkolînên dengsaziyê yên zarê Soranî, ji bilî pertûkên rêzimanê Kurdî ku tevahiya van nivîsaran vexepartin û vekolîn di mijara tekezê de nekirine, ji bilî çend rêzikan, yan çend gotinan. Ez vê yekê dibêjim bi mebesta ku ev mijar di lêkolîna min de belkî dîsa mafê xwe bi tewawî nestandiye, lê bihêvî me di derfeteke dîtir de mijara tekez û awazê pirtir tê de bikolim. Lê dîsa emê hewl bidin ku hin ruwên fonetîkî û fonolojî û watasazî yên rol û erkê tekezê di binyata peyva zimanê Kurmancî de destnîşan bikin, ku ev jî bibe bingehê bo lêkolînên kûrtir û feretir di paşerojê de.

Ji bilî tavilkirin(sigmintkirin)a dengên ziman, dengdar û dengdêr, sîma û durvine dengsazî dîtir hene, nemaze di aliyê fizîkiya deng de wek dirêjbûn û kurtbûna deng, awayên pêl û pileya deng (pitch) û strê, ku ji van mijar û rûçikan re diyardeyan re (plurisegmental features) dibêjin²⁴⁹. Inca yek ji van mijaran di vî tewerî de tê diyardeya tekez e, ango (stress) di zimanê Kurmancî de. Min jî peyva (tekez) libar dît ku beramberî (stress)a Englîzî bikar bînim²⁵⁰.

Di hemî zimanan de gelek mijarên dengsaziyê (fonetîkî) hene, wek: tekez (stress), tone, awaz, nizmî û bilindiya deng (intonation), ..htd) ku jê re (suprasegmentals) wek zarawe ji beşê dengsaziya akostîk (acoustic phonetics) tê jimartin, lê rola wan di guhartina wataya peyvê de ne kêrî ya fonem e, lewre ev diyarde di beşê fonolojî de jî tê xwendin. Li encamê, zimanzanên cîhanê guh nadine kêşeyên dengsaziyê di vî astê han de, çunke hemî jî pêşbîn in (predictable), ango xwêner mebesta peyvê ji tevahiya têkistê nas dike, weha jî guhdêr mebestê ji axaftina axêver nas dike. Di vê buwarê de em tenê nimûneyêkê ji zimanê Kurdî bixin bin lêkolînê de, ka ev çawa dibe, bo nimûne risteya Kurdî: (Azad li mal e) du

²⁴⁹/ R.L. Trask (1996): A dictionary of phonetics and phonology, London and Newyork

²⁵⁰ Peter Roach 2002 A LITTLE ENCYCLOPAEDIA OF PHONETICS, Professor of Phonetics University of Reading, UK. (rup 85-88) <http://www.linguistics.reading.ac.uk/staff/Peter.Roach>

mebest tê de hene ku ton û awaza dengê ristê mebesta axêver diyar dike ka pirs e yan saloxdanek e? Ji ber wilo jî dengsazî di gelek ruwan de ziman şirove dike, wekçawa di vê lêkolînê de me ji deng despê kir, em gihane fonêm wek dengê standard û orgenayzker, komkirina van fonêman birrge û peyv û riste drust kir, wek: *ber, ben, beş, bes, bel, berr, bez*, ku ev peyv bi riya fonêmên /r/, /n/, /ş/, /s/, /l/, /rr/, /z/ hatine drustkirin. Wilo jî peyvên sade û morfêmên darêjer wek pêşgir û paşgir bûne tovê avakirina ziman ku pê re jî piroseyeke dengsazkerî dîtir derdikeve, ew jî dengên ku bi binyata peyvê û ristê ve diyar dibin, herweha rola watasazî pê re feretir dibe, ev dengsazker di diyardeyên tekez û ton û awazê de xwe dinwêne. Ji van diyardeyan emê li ser **tekezê** rawestin ka di Kurdî de çilo diyar dibe û çî erkê rêzimanî û watasazî didê.

Sê taybetiyên fîzîkî yê tekezê hene: radeya deng (pitch), dirêjahiya deng, (length) bilindbûna deng (loudness)²⁵¹. Yekîneya bingehîn ku tekez tê de peyda dibe birrge/kîte ye (syllable). Birrge ji dengdêr pêk tê wek bingeh û pê re jî dengên dengdar tên, ew jî li gor sîstima her zimanekî. Inca birrgeya tekezdar radeya bilindkirin û dirêjkirina deng tê de heye. Ne dût e ku tekez ji sîmayên cudaker bête jimartin, wilo jî (+tekez), (-tekez).

3.4.2. Sîstima tekez (stress) di zimanê Kurdî de²⁵²

Sîstima tekez ji du aliyan ve tê baskirin:

- Ka kîjan birrge di peyva Kurdî de tekezê werdigire?
- Dengê dengdêr çî kin çî dirêj tekezê werdigire
- Rola tekez di guhartina wataya peyvê de çiya?
- Bi şêweyekî giştî tekez dikeve ser birrgeya dawî ji peyvê , lê hin car birrgeya berdawî tekezê distênê, hin car heye ku di birrgeya pêşî de were, wek:

Mirin mi rin (bêtekez), (du birrge)

B1 B2

1. Mirin mi **rin** (bitekez), (nave jêder)

B1 B2

²⁵¹ Peter Roach 2002 A LITTLE ENCYCLOPAEDIA OF PHONETICS, Professor of Phonetics University of Reading, UK. (rup 85-88) <http://www.linguistics.reading.ac.uk/staff/Peter.Roach>

²⁵² Kurdish Phonology (Mahabadi dialect) ji malpera tora internêt, ku ev jî bi zimanê Inglîzî hatiye: ((Stress falls on the last syllable in nouns, adjectives, adverbs, numbers, pronouns and prepositions, e.g.

Bira, Karwan, xirap, haşsat, balam

2. According to this is only true when the word stands alone/ He further adds that the combination accent or the accent which the word has in the sentence is very irregular but it is usually on the second syllable.

1. Stress in nouns, when it is in vocative case falls on the first syllable.

/bir/a

2. Mirin **mi** rin (bitekez), (kar û kes)

B1 B2

Niha em li ser sîstima tekezê di zimanê Kurdî de rawestin, û wan peyvên ziman ku tekezê distênin wek nav û hevalnav, cênnav, kar û hevalkar û jêder, ...tad.

3.4.3. Tekez Li Ser Birrgeya Dawî

Heçî nav e çî sade û çî lêkdayî di şêweya hevalnav, awelkar, jimar, cênnav û daçek, wek²⁵³:

NAV:

1. Nav bi giştî: zava, birazî, zevî, kadîn, kozîk, xanî, mase, pênûs, gulzar, perde, gotin, kuştî, êzing, mersef, bergiş,
2. NAVÊ SADE: şimamok, gêzer, pîvaz, masî, xerdel, kezî, Sînem
3. HEVALNAV: Sipî, kotek, bedew, dirêj, bikêr, bilind,htd
4. Navên lêkdayî bi giştî tekeza xwe li ser birrgeya dawî distênê, wek²⁵⁴:
havîngeh, virrker, dergevan, keskesor, herêna, seyrangeh

3.4.4. Li ser birrgeya dawî

Ew peyvên ku jimara birrgeyan ji doyan pirtir in, ji wan peyvan yên ku dawî bi paşgira (-ik, -î)- lê eger dengdêrê kurt ji paşgir hate birrîn, dê stress bikevê birrgeya dawî de, wek:

bê /i/, bi /-k/

sorevêrk

erzînk

xelîtk

teşîrêsk

dirêşk

burçîlk

tilotozk

zengelork

darkutk

bilbilîtank

²⁵³ Mîr Celadet Bedirxan û Rojê Lîsko, Rêzimanê Kurdî, Zarê Kurmancî, wergerandina Dilawer Zengi bi zimanê Arebî, (rup 91- 104)

²⁵⁴ Serekaviya derbasbûyî

pîrqeloçk

3.4.5. Navên dariştî ku bi paşgira (-î , -tî , -ayetî –îtî) tên dariştin, û wataya wan abstrakt (mucerid) didin, stress li ser birrgeya dawî tê, wek:

mezinahî, spehîtî. Mêranî, kêmasî, Kurdîtî, hizbayetî, hevaltî,

■ **Navên watayî** ku ji hevalnav tekeza xwe li ser birrgeya dawî didanê, wek:

mêranî , kamranî , bextyarî , qencî, bêbextî

3.4.6. Navên êl û hoza û eşîran

1. Eger peyv wek navê eşîrê bi tena xwe bê gotin, tekez liser birrgeya berdawî dikeve, ji xwe peyv sêbirrgeyî ye, lê eger peyv dubirrgeyî bû, tekez li ser ya birrgeya dawî tê.
2. Dema ku peyv wek sîfetek bo kesekî ku ji wê eşîrê ye, yan ji wê êlê ye, eger sê birrge bû, tekez dîsa li ser birrgeya berdawî dikeve, lê paşgira (-a) nîşana eşîretê dibe (-î) ku nîşana nisbet û sîfeta, wek:

Navê Eşîrê	sîfeta yan nisbeta kesekî ji wê eşîrê
Harûna	Harûnî
Beraza	Berazî
Dorika	Dorikî
Abasa	Abasî
Ş(i)kaka	Şkakî
Hes-sena	Hesenî
Heydera	Heyderî
Milla	Millî
Kîka	Kîkî

Lê dema ku wek van peyvên navên nîsbet û sîfeta (Berazî, Hevêrkî, Gabarî, Harûnî, ...) bi wataya **têgeh** û fikira wî navî yan wî sîfeta tekez li ser birrgeya dawî tê wek:

Harûnî	Harûnî (ango harûniyet yan harûnîbûn)
Hevêrkî	Hevêrkî (hevêrkîbûn)
Kasikî	kasikî

3.4.7. Navên gund û bajaran

1. Dema ku tenê navê gund e, yan navê bajar bê gotin, tekez li ser birrgeya dawî tê,

2. Lê dema ku dibe navê nisbet, ango dibe sîftek bo ew kesê ku ji wî gundî ye, yan ji wî bajarî ye, yan ji wî cihî ye, birrge li ser birrgeya berdwaî tê, wek van nimûneyên jêrî wek navê cih, û wek navê sîfet û nisbet :

navê gund	navê nîsbet
Hezex,	Hezexî
Termok	Termokî,
Zaxo	Zaxoyî,
Cizîr	Cizîrî
Dazwan	Dazwanî
Xirbeban	Xirbebanî
Gurîza	Gurîzî
Alaqemş	Alaqemşî

3.4.8 Tekez dikeve ser **peyvên dariştî** de, ji ber ku ev core peyv bi kêmayî ji du kîtan pêk tê, lewre tekez cihê xwe di peyvên wilo de dibîne.

1. Morfêma (-ek)

Ka em van hersê risteyan li gor tekezê bixwênin, emê bibînin tekez wata diguherêne, wekçawa paşgir û pêşgir di morfolojya peyvê de rola xwe dibîne, wilo jî tekez rola xwe di warê fonetîkî û fonolojî de dibîne ku peyvê ji watayekî dixwe watayekî dîtir:

- 1) Ev **birrek** kuh e/ko ye, dara nabirrê. (Birrek navê alava birrînê ye)
- 2) Min **birrek** defter û pênuş kirîn. (birrek ango komek defter)
- 3) Min **birrekek** nû ji xwe re kirî, ji bo ez pênuşa xwe pê bibirrim.

2. Lê eger peyvên dawî bi **-ik** in ji du birrgeyan tenê pêktên, ji xwe stress li ser birrgeya dawî tê, wek:

kurik, dêrik, keçik, kêrik, holik

3. Peyvên sîfet dawî bi -î tîn:

1. Eger peyv ji du birrgeyan bûn, ji xwe stress li ser ser birrgeya dawî tê, wek:

Remî, Memî, kerî, Jêlî, Botî, avî, kovî, ...htd.

2. Eger peyv ji du birrgeyan zêdetir bû, ji xwe tekez (stress) li ser birrgeya **berdawî** tê, wek:

Garisî, Mêrsînî, Hesînî, bajarî, beredayî, kenokî, dawerivandî

4. Hevalkar

Hevalkarên dawî bi **-kî** tînin, her car stress li ser birrgeya dawî tê, wek:

dirêjkî, êvarkî, pehinkî, tîtikî, demkî,

- Ev mirov nexweş e, dirêjkî xwarinê dixwê.
- Ezê êvarkî werim mala we.
- Hosta kevrê xwe pehinkî danîne.

5. Ew peyvên bi paşgira **-çî** tî, tekez li ser birrgeya dawî tê, wek:

qehweçî, hîleçî, qewmeçî, Apoçî, dikançî ...htd.

3.4.9. Dema nav di barê **bangkirinê** de be, tekez dikeve ser birrgeya berdawî, wek:

Dubirrge Wa xalo, wa kardo,

Sîbirrgeyî zarokno, Gelî hevalan, Gelî misilmanan

3.4.10. Hin peyvên kurtkirî wek peyva namekê di vê rista xwarê de:

Ezê namekê (namek-kê) bo te rê bikim.

Sê kî di vê peyvê de hene (na - mek - kê). Tekez dikeve ser dengê /ek/ yan jî kîta duwa. Wilo jî peyvên heman şêwe, wek: Keçikkê, lawikkî, **keçikê** (keçik-kê) ku peyv di forma xweyî bincî de (keçikekê) ye.

Law, Lawikî (lawik-kî), lawikekî

Masî, masîkî (masîk-kî, masiyekî)

3.4.11. Tekez bi awakî giştî em bêjin di birrgeya dawîya peyvê de tê, wek:

1. Nav û hevalnavên giştî

ziman zimanan

gavan gavanan

giran giranî

cuwan cuwanî

karwan karwanî

2. Di navên hoz û tîreyan (êl, eşîr) de tekez li ser birrgeya duyem e eger peyv sê birrge bin, wek (Harûna) ku tekez li ser birrgeya duyem tê. Lê eger peyv du birrge bin, ji xwe birrgeya dawî û duyem yek. Lêbelê dema ku em kesekî ji wê êlê yan ji wê eşîrê destnîşan bikin, wek em bêjin (Harûnî) tekez li ser birrgeya dawî tê. Tekezê di van peyvan de destnîşan bike:

Bûblana Bûblanî

hevêrka Hevêrkî

bota/botan Botî

Rema Remî

Remaka

Elîka	Elîkî
Harûna	Harûnî
Beraza	Berazî
Gabara	Gabarî

3.4.12. Nav di barê tewangê de

1) Navên tewangî tekeza xwe li ser birrgeya bi nîşana tewangê dideyne, wek van nimûneyan:

Cênav:	ew	ewî/ewê/ewan bi xwe re bibe
Nav	xem	Xemê
	nîsrîn	Nîsrînê pertûk xwend
	sêv	Werin sêva/gula/pîvaza
	şebes	Şebesekî ji me re bikire
	mirîşk	Vê mirîşkê bigire
	kurik	Vî kurikî bide xwendin
	goşt	Goştî bixwe

3.4.13 nîşana nenasîyê (-ek) tekezê nastênê

keç	keçek
kur	kurek
blûr	blûrek

3) Nîşana nenasîyê (-ek) ligel nîşana îzafê dibe du birrge (-ek-î/e) saz dike ku birrgeya dawî (-kî) ya nêrîne ye, û (-ke) ya mêyîne ye, tekez her dîsa li ser birrgeya yekem tê, wek:

keç	keçek	keçeke baş
kur	kurek	kurekî zîrek
blûr	blûrek	blûreke dengxweş

3.4.14. Morfêma (-ek)

Eger em li peyvên ku dawî bi (-ek) tên temaşê bikin, emê bibînin ku morfêma (-ek) bi çend rol û watayên hemecor radibe, ku ew jî ev in:

Morfêma (-ek) bi dû erkan radibe:

1. Wek **nîşane** dikeve dawîya peyva navê tak de û navê nenaskirî didê, wek:

birr	birrek
------	---------------

xort	xortek
gul	gulek
beş	beşek

2. Wek **paşgir** bi du watayan radibe û du berên peyva ava dike:

A. ji bo avakirina **hevalnavekî** bi wataya ew tişt, yan ew mirovê gelek caran bi wî karî radibe, wek:

xir: (regê peyva xirbûn û xirkirin) e

xirek: çêl wî tiştî dike ku gelekî xir bûye (tekez li ser **-ek** tê)

virr: nav e, wataya (derewan) didê

virrek: Ew kesê gelek virr û derewan dike (tekez li ser **-ek** tê)

çillek: Ew kesê gelek hez xwarinê dike. (tekez li ser **-ek** tê)

Pirs di vir de ew e ka çawa emê ciyawaziyê navbera herdû rolên morfêma (-ek) nas bikin, nemaze eger (-ek) di yek peyvê de herdû aliyan bidê, ango nîşane û paşgir? Gelo ji tevahiya ristê di çarçêweya wataya giştî de, yan jî di awayê dengkirinê de? Bersiv ew e ku herdû alî kar tê de dikin, ku bi vî awayê xwarê tê ravekirin:

Eger du (-ek) di yek peyvê de û li dû hev hatin, ya pêşî pêşgir e, û ya dawî nîşane ye, ango kurtkirina peyva (yek) e. Inca em dikarin wa bêjin ku (-ek) bi du rolan radibe:

3.4.15. Rola Paşgir

1. Bêjeya (-ek) wek paşgir bi wataya ew kesê gelek caran wî karî dike, di dengkirinê de hêza deng (stress النبرة) dikeve ser kîta dawî ya (-ek)de (wek:

diz + ek dizek [diz-zek] ew kesê gelek diziyê dike

virr + ek virrek [vir-rek] ew kesê gelek virra dike

2. Rola nîşane (paşrês)

Dema morfêma (-ek) wek nîşane bikar tê, hêza dengkirina tekez dikeve kîta yekê de ji peyvê, wek: **dizek**

*diz + ek **dizek** yekî diz*

*virr + ek **virrek** yek virr*

Encam: Tekez rolekê di guhartina wata de dibîne, ku dema li birrgeya yekem be watayek e, û heman peyv dema ku li birrgeya duyem be, watayeke dîtir dide. **Dizek** û **dizek**, **virrek** **virrek**

1. ta (tayê dirûtinê) tak (yek ta) **takî¹** bêne, ango yek tayî bêne.

2. tak (tek singular) **takî²** (singularity)

3.4.16. Tekez navbera nîşaneyên rêzimanî û paşgira dariştinê cuda dike.

takî¹ (ta + k + î) tekez li ser birrga yekem e.

takî² (tak + î) tekez li ser birrga duyem e.

Tekez bi rola fonêm radibe ku wata dihuherêne. Wata ji hev cuda dike, sîmayekî cudaker.

Karwan + î

Karwanî kar-**wa**-nî ew kesê ku karwanîyê dike

Karwanî kar-**wa-nî** karê karwanîyê

3.4.17. Şedde û tekez

Inca, ciyawazî di awayê axaftinê de heye, ku ew jî ew e tekez (stress) bi rola morfêm û fonêm di sîstima ziman de radibe ku cihê xwe diguhêze bi awakî ku wata pê re tê guhartin. Eva han jî di gelek zimanan de heye. Baş e, herwekî wa ye, aya em dikarin vê ciyawaziyê di sîstima nivîsînê de jî bidin xuyanîkirin bê ku em mebestê ji wataya giştî nas bikin? Bersiva vê pirsê di zimanvanî de ew e ku hêza deng, ku jê re (stress) dibêjin di rênivîsê de nayê xuyakirin û ti nîşan jê re nayên danîn, û eva han jî wek diyarde di hemî zimanan de heye.

Nivîserekî Kurd di gotareke xwe de di intirnetê de belavkiribû û tê de weha dibînê ku peyvên wek (dizek û virek û pîrek) bi du şêwe bêne nivîsîn, ango ciyawazî navbera herduwan de bi dubarekirina nivîsîna tîpên dubare (yektîp, û dutîp) diyar dibe, wek bêjeyên ("diz", "**dizek**" û "**dizzek**". Ew kesê ku dizî kiriye, em jê re "diz" dibêjin. Gava ev navdêr nebinavkirî (nenas) be, hingê em "dizek" dibêjin. Lê gava ev mirovê diz herdem diziyê bike, hingê em jê re "dizzek" dibêjin. Bi rastî jî, divêt em li vir navdêrê nebinavkirî "dizek" û navdêrê "dizzek", yê bi maneya ku herdem diziyê dike, ji hevdu cuda binivîsînin. Bilêvkirina wan jî ne mîna hev e. Navdêrê nebinavkirî bê "**şedde**" tê bilêvkirin, lê belê navdêrê din bi "şeddeyê" tê bilêvkirin). Wilo jî peyvên wek "**vir**" bi mana derew, bêjeya "**virek**" bi mana "yek vir" û bêjeya "virrek" bi maneya ew kesê ku herdem derewan dike. Nimûneyên din jî gelek pir in. Bi rastî jî em dibînin, ku mana herdû komên bêjeyan ji hev gelek cuda ye. Bêjeyên wek **pîr - pîrek - pîrrek** jî wisa ne. Lê belê, ka em niha ji nû ve pirsê bingehîn bikin. Gelo çima em pêşinde birryarê didin û hukûm dikin, ku **tîpa dubare, yan jî "şedde"** di zimanê me de heye? Di bawerîya min de wesfîkirina vê diyardeyê nakeve bin navlêkirina "şedde"ya Arebî de ji ber ku herdû diyarde ji hev cuda ne. Wek em tev dizanin "şedde" di bunyata peyva Arebî de

morfêmekî zêde dike ku watayeke taybet bi xwe re têne wek (ke-ze-be) bi wataya derew kir, û (kez-ze-be) ango ew derewîn derxist, yan li derewê qeliband. Ev diyarde pêwendî bi zimanê Kurdî nîne, û ev peyvên wek (**dizek**) ku tekez li ser birrgeya yekem e, bi wataya yek diz ji nav dizan, û (**dizek**) ku tekez li ser birrgeya duyem e bi wataya ew kesê karê diziyê dike. Wilo jî peyva (**virrek**) yek virr watayek e û (**virrek**) ango mirovekî virroker wataya duyem e. Di baweriya min de **tekez** yek peyvê yan yek bêjeyê dike du peyvên watacê (wata cuda, cê bi wataya cuda tê bikar anîn).

Pîrek: jin, afret

pîrek: jineke pîr yan zilamekî pîr, ango temenmezin.

Tekez di vir de bi rola fonêm û rola morfêm radibe yên ku dikarin wataya peyvê biguherênin. Di encamê de ez wa dibînim nabe ku em diyardeya tekezê (stress) wek diyardeya (şeddê) ya Arebî bibînin, ji ber wilo jî tîpa dubare bikar naye, weha jî şedde û tekez navbera Kurdî û Arebî de ne wek hev tête temsîlkirin wek (deq-qeqe), ku ev bi xwe sebare zimanê Kurdî tiştêkî şaş e, ango herdû diyarde, (şedd)a Arebî û (tekez)a Kurdî ji hev cuda ne. Jiber wilo, nabê em tîpa dubare di vî barî de bikar bînin, yan jî wê bi seda tîpên dubare ji me re derkevin, ango gelek barûdoxên tekezê di zimanê Kurdî de belû dibin, li vê gorê wê gelek dubarekirin peyda bibê, bi awakî ku destûr nema dikare vê yekê kontrol bike, nemaze ku her yek ji me jî lipêka tekeza nava xwe, wê ziman bihûnê û baxêvê.

3.4.18. Fonêmên dengdêrên tekezdar ji yên bêtekez dirêjtir in, wek (**baran**) ku /a/ya (**ran**) tekezdar e û ji ya (ba) dirêjtir e.

3.4.19. Tekez di Rêjeyên kar de:

1. Di rêjeya karê nihokê de wek (dikim, dibînim, dizanim, dixwênim ..) tekez dikeve ser birrgeya yekem ya pêşrêsa (di-) ku delaleta rêjeya nihokê ye, nimûne jî weha tên:

A) Karên têneper

dikevin **dixilxilê**

dişuxxile diçin

digere digerî

B) Karên têper

dikim dike dikin 2 birrge

dibînim dibîne dibînin 3 birrge

dizanim	dizanî	dizanin	3 birrge
dixwênim	dixwêne	dixwênin	3 birrge

C) Peyvên di ser sêbirrge de, tekez dîsa dikeve ser birrgeya yekem de, wek:
digerênê dişuxilênê

2. Tekez dikeve ser **pêşrêşên** wek (di-, bi- , ne- , na-) ku di birrgeya yekem de diyar dibin, wek:

- (bi-) ya peyva **bide, bêje, bike,**
- (di-) di rêjekarên wek (**diçim, dikim, dibêjim**);
- (na-) pêşrêsa nerênî di peyvên (**naxwim, nakim, naçim**);
- û pêşrêsa (**ne-**) di rêjeyên wek (**nexwe, neke, neçe**)
- û pêşrêsa (**na-**) wek : **nadim, naçim, nakim, naxwazim**

3. Peyva (**pêşrêsan**) di piroseya tekezbûnê de em dikarin bizanin ka peyva (pêşrêsan) gelejimara peyva (pêşrê) e ku bi riya (-an) bûye gelejimar, yan qalibê jêdera lêkdayî ye ku ji du peyvan pêk tê (pêş + rêsan) wek jêder. Inca ev bar weha tê şîrovekirin:

Pêşrêsan gelejimara peyva (pêşrê) e, ku (-an) nîşana gelejimariyê ye.

Pêşrêsan jêdera lêkdayî ye: (pêş + rêsan)

4. **Rêjeya sade** ya karê **buhêrkê** tekeza xwe li ser birrgeya yekem didanê, wek:

biraşt , guvaşt , kizirî , qewimî, firiya , geriya,

5. **Di Kurdî de jêder hem wek kar** bikar tê, hem jî wek **nav** , bi yek qalibî di rênivîsê de diyar dibe, lê bi du şêwe xwendin pêwîst e, ta ku du watayên ciyawaz ji hev bêne veqetandin, wek: jêder û karê buhêrkê bi çend kesan, wek:

1. *Mirin nexweş e.*

2. *Sê zilam di şer de mirin.*

Piştî em herdû risteyên jor bixwênin, emê bibînin ku peyva (mirin) di herdû risteyan de hatiye, lê (mirin) di ya yekê de wek navê jêder, navekî rût, bikar hatiye. Lêbelê heman peyv di rista duwa de wek karê ku çel mirina çend kesan dike bikar hatiye. Dêmek peyva (mirin) ku yek şêwe rênivîs di herdû ristan de wergirtiye, ne wek hev wata didê. Baş e em çilo vê yekê ji hev der bixin? Bersiv ev e: Em dikarin vê yekê bi du awa nas bikin li gor awayê diyarkirina peyvê di ristê de, çi di şêweya nivîskî de, û çi di şêweya axaftinê de:

1. **Di nivîsînê de:** Eger peyv wek nivîsîn û têkist hat, emê wê li gor peyvên hevalên wê û cihê wan di ristê de mebestê nas bikin.

2. **Di axaftinê de:** Lê eger peyv wek axaftin hate guhê me, emê li gor tekeza axêver û bêjer yan xwêner wata jê nas bikin, ku ev jî li pêka ku tekez li ser kîjan birrgeyê di peyvê de belû bûye: Di risteya yekê de tekez ketiye ser kîta duwa de ji peyva (mi-**rin**), û eva han jî bi xwe wek fonêmekî bihadar xwe diyar dike, lêbelê peyva (**mirin**) ya risteya duwa tekeza xwe li ser kîta pêşî (**mi-** rin) standiye. Di vir de bihayê tekezê ewe ku bi rola morfêm radibe, wekçawe di zimanê Englîzî de paşgir yan pêşgir peyvê ji barê nav bikê barê kar de, wek:

<i>glad</i>	<i>gladen (English.)</i>
<i>ger</i>	<i>gerand (Kurd)</i>

Belê ev şêwe dengsazî riya xwe di piroseya rênivîsê de di hemî zimanên cîhanê de nedîtiye. Jiber wilo jî nabe em dervî rênivîsa destûrên cîhanê bin, nemaze ku em dawîya xelkê hatine meydana lêkolînên zanista ziman.

6- **Karên fermanî** (imperative), tekez li birrgeya pêşî tê, li ser (**bi-**) tê, wek:

Bişo, bixwe, bide, bike
Bişon, bixwin, bidin, bikin

Di vê mijarê de Celadet Bedirxan karê ferman ne weha şîrove kiriye, wî tekez di karên fermanî de li ser birrgeya dawî dibîne, ku ev jî di rûpelê (102 – 103)²⁵⁵ de hatiye û van nimûneyan têne:

hatin	bê
çûn	biçe
ketin	bikeve
bezîn	bibeze

7- Karê **buhûrkê** tekez li **birrga yekem tê**²⁵⁶

8- Karê teneper: Ez **ketim**, Ez **hatim**,

9- Karê têper: Ez **girtim**, ez **birim**, ez **hiştim**

10- karê tewaw: tekez li ser birrgeya dawî tê: min xwendiyê, min biriye

11- karê buhûrkê tewaw: tekez li ser birrgeya dawî tê²⁵⁷:

²⁵⁵ Mîr Celadet Bedirxan û Rocê Lîsco Rêzimana zimanê Kurdî (zarava kurmançî) ya, wergêrana Dilawerê Zengî bi zimanê Arebî, Beyrût 1992(rup 102-103)

²⁵⁶ Mîr Celadet Bedirxan û Rocê Lîsco Rêzimana zimanê Kurdî (zarava kurmançî), wergêrana Dilawerê Zengî bi zimanê Arebî, Beyrût,1992 (rup 35)

²⁵⁷ Hin yasayên tekezê bi zimanê Englîzî:

min xwendibû, wan ez girtibûm

12- Rêjeya navê kara yê karê têneper: **ketî**, **hatî**, **çûyî**, **mirî**

13- Rêjeya navê berkar yê karê têper: **girtî**, **kuştî**, **xwestî**, **gurandî**,

14- Rêjeya navê kara yê karê têper: **nivîser**, **xwêner**, **daner**, **lêker**,

15- Rêjeya navê kara yê karê têperê lêkdayî: **bertîlxwer**, **quranxwên**, **limêjker**, **namenûs**.

3.4.20. Morfêma (-î) wek paşrêş û wek paşgir bi riya rola tekez tête guhartin, wek van herdû nimûneyên jêrî ku rengê reşê tarî nîşana tekezê ye:

hevalnav	(-î) wek paşrêş morphosyntax	(-î) wek paşgirê navê wata (morpholexic)
Azad	Tu azad î [azadî]	azadî (navê wata)
serbest	Tu serbest î [serbestî]	Serbestî (navê wata)

Encam:

Di encamê de **tekez** dikeve ser birrgeyeke peyvê û dibe hokarê drustkirina wataya wê peyvê, yan jî dibe tekezkirina peyvê di nav zincîra peyvên ristê de ku ev bi xwe wek takilekî fonolojî ji binyata ristê tê jimartin. Herweha tekez (stress) çar cor hene: bihêz û bihêztir, sivik û siviktir ku pêwîstî bi lêkolîneke feretir û kûrtir heye.

Di encama vê lêkolînê de wêneyeke fonolojî bo tekezê hate avakirin û weha diyar bû, ku tekez bi roleke zimanî giring radibe wek watacadakerek di sîstima zimanê Kurmancî de, ku li gor yasayên fonolojî û fonotîkî riya xwe di hûnandina birrgeyên ziman de dibîne.

-
1. In **verbs** that start with bi, da, or negative pre/x na// the stress falls upon these prefixes
 2. In simple past, stress falls on the first syllable.
 3. In present perfect tense, stress falls on the last syllable of the verb root.
Min xwendiyê, min xwariyê, min dêtiyê
 4. In past perfect and past subjunctive verbs, stress falls on the last syllable of the the verb root)).

Birr V 3.5. Awaz di Kurmancî de

3.5.1. Pêşekî

Tewerê dawî di vî beşî de "awaz" e ku yek ji tewerên herî giring e di lêkolîna fonolojiya ziman de di astê kertkirina dengsaziya ziman de (suprasegmental level), ku jê re mîlodiya axaftinê (speech melody)²⁵⁸ dibêjin. Zimanzanên Kurdiya Soranî têrima (awaz) wek zarawe beramberî peyva (intonation) bikar anîne, min jî ev yek pesend û libar dît, ji ber ku (awaz) bi xwe wataya (melody) dide ku bi Arebî jê re (tenêgîm) dibêjin. Awaz dibe navê awayê danîna solfêca stran û dîlokana. Axaftin jî wek ristikek ji bilindbûn û nizimbûna dengana pêktê, wekçawa rezim (rhythm) pê drust dibe.

Berî em dest bi şîrovekirina awazê bikin, dixwazim wê yekê bibêjim ku ev mijar yek ji tewerên ku ta niha di zimanê Kurdî de bas tê de çê nebûye, ne tenê wilo jî di nav nivîskaran de jî ev babet hîç lêkolîn tê de nebûye. Ji ber wilo jî lêkolîna min çilo be, her tiştêkî nû ye, dixwazim wek derwazekê di vî babetî de vekim bihêvî me ku ev babet ji aliyê lêkolên Kurd guhdaneke taybet pê were dan ji ber ku ev pirose di axaftina ziman de, nemaze zimanê kêmetewe yên ku pergala zimanê wan ne sazkar e, tûşî gelek arîşeyan dibe, ku bandora zimanên hawsê yên serdest roleke xirap di têkçûna taybetiyên zimanên bindest de dilîze, wekçawa Kurdên Turkiya di bin vê bandorê de dijîn.

3.5.2. Awaz

Di ferhenga Routledge de pênasekirina awazê weha tê ku ew taybetiyên dengên ziman ku bi şêweya axaftina gotinê ve pabend e. Sê rûçik di wesfêkirin û şîrovekirina awazê de diyar dibin ku ew jî ev in: (a) tekez (b) radeya deng (pitch) (c) rawestana deng (pausing). Ya dîtir jî "awaz dikar bibe kartêkerek e li ser birrgeyeke taybet, yan peyvekê, yan firazekê, yan risteyekê"²⁵⁹.

Sêyem erk awaz dibe hokarê drustkirina watayeke rêzimanî di riste de wek:

Azad duh çû bajêr.

Ev riste dikare her car watayeke nû bide li gor bilindkirin û nizimkirina dengê axêver di ristika dengê birrgeyên ristê de, ku wata carekê bi pirsyarî dide famkirin, û carekê wek xeberdan, ku ev pirose jê re **awaz** dibêjin. Di têvejoya awazê de piroseyeke dîtir heye ku jê re (**focus**)²⁶⁰ dibêjin ya ku naveroka ristê yan gotinê dike mebesta ku dixwaze bibêje, bo nimûne:

Pirs

Bersiv

²⁵⁸ Martine Grice¹ & Stefan Baumann² 1,2 IfL – Phonetik, Universität Köln [an introduction to intonation – functions - GToBI www.gtobi.uni-koeln.de/.../grice-baumann-int-func-models-revised-110](http://www.gtobi.uni-koeln.de/.../grice-baumann-int-func-models-revised-110). (rup 1)

²⁵⁹ Ferhenga Roultdge

²⁶⁰ Bolinger, D. 1989. Intonation and its uses. London. (rup 47)

- | | |
|-------------------------|-------|
| 1. Azad kengî çû bajêr? | duh |
| 2. Azad duh çû kîderê? | bajêr |
| 3. Kî duh çû bajêr? | Azad |

Çarem: Di tiyoriya karê axaftinê (speech act theory) de ya J. L. Austin and J.R. Searle wan rûçikên bingehîn yên pirosey axaftinê diyar dikin ku bi navê hêza axaftinê (illocutionary force) wesf dikin, ku tê de awaz û xalbendî û cênave pirsyarî hevalkarên pirsyariyê û gelek alav û sîmayên dîtir²⁶¹ rola xwe dibînin.

Awaz yek ji beşên herî giring e di fêrbûna zimanekî biyanî de²⁶², ji ber ku xwendina ziman ne hewqas giran e bo ku mirov xwe hînî zimanekî bike, lê a dijwar fêrbûna awazê axaftinê ye, nemaze ew zimanên ku tekez (stress) tê de roleke mezin dilîze, wek zimanê Englîzî ku kesên ne Englîz in lê wek mamostayên zimanê Englîzî li welatên Areba kar dikin, belê dema ku dipeyvin yekser bihîzer dizane ku ev axêver mirovekî ne Englîzî ye ji ber du hokaran: tona peyvê û awazê riste û axaftinê. Axafin deng in, bi awakî ku tona (ton – nexme) deng radeyekî taybet werdigire ku jê re dibêjin (pitch) ango deng bi riya lere û lerînên dengejê tête destnîşankirin. Hin lêkolêr radeya bilindbûn û nizimbûna deng bi du hokaran dipîvin²⁶³:

1. ton encama jimareyên lerînên deng di axaftina peyvê de.
2. komkirin û sazkirina van tonan di zincîra axaftina riste de

Inca, zimanin hene wek Sînî û Nerwîcî û Swêdî, ku ton tê de wek pîverekî fonêmî bikar tê, ya ku watayên peyvê li gor wan tonan tê guhartin. Ji van zimanan re (zimanên Tonêmkî) dibêjin. Lê di aliyê dîtir de piraniya zimanên naskirî awaz tê de bikar tê, ya ku bi erkên rêzimanî radibe wek pirsyarî û sersûrmayî û tekez xwazî; lewra ji van re zimanên awazkî dibêjin²⁶⁴.

Ton çar radeyên xwe hene²⁶⁵:

1. Tona nizim
2. Tona normal
3. Tona bilind
4. Tona gelek bilind

²⁶¹ Bolinger, D. 1978. Intonation across languages. In J.H.Greenberg (ed.), *Universals of human language*. Stanford, CA. 471–524.

²⁶² Martine Grice1 & Stefan Baumann2 1,2 IfL – Phonetik, Universität Köln [an introduction to intonation – functions - GToBI](http://www.gtoBI.uni-koeln.de/.../grice-baumann-int-func-models-revised-110..) www.gtoBI.uni-koeln.de/.../grice-baumann-int-func-models-revised-110.. (rup 6)

